



**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN JÎNDAR  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBIYATA KURDÎ  
BERAWIRDKIRINA BEYTA MEM Ê ZÎNÊ YA KURMANCÎ  
(VARYANTA OSKAR MANN) Ê MEM Ê ZÎNA MÎRZA YA  
HEWRAMÎ**

**Parviz JAHANY**

**TEZA DOKTORAYÊ**

**ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ  
Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ**

**Bîngol - 2020**



**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

**KURMANCÎ MEM Û ZÎN DESTANI (OSKAR MANN  
VARYANTI) İLE MÎRZA'NIN HEVRAMÎ MEM Û ZÎN'IN  
KARŞILAŞTIRILMASI**

**Parviz JAHANY**

**DOKTORA TEZİ**

**TEZ DANIŞMANI**  
**Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ**

**Bingöl – 2020**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

*Parviz JAHANY* tarafından hazırlanan *Berawirdkirina Beyta Mem û Zînê* (*Varyanta Oskar Mann A Kurmancî*) *û Mem û Zîna Mîrza Ya Hewramî* başlıklı bu çalışma, 27.07.2020 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [*oybirliği/oy çokluğuyla*] başarılı / başarısız bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

**TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

<b>Başkan</b>	: Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	İmza: .....
<b>Danışman</b>	: Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ	İmza: .....
<b>Üye</b>	: Doç. Dr. Hayrullah ACAR	İmza: .....
<b>Üye</b>	: Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN	İmza: .....
<b>Üye</b>	: Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY	İmza: .....

**ONAY**

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun ...../...../ 20..... tarih ve ..... Sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT  
Enstitü Müdür

## Naverok

<b>BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ</b> .....	<b>VIII</b>
<b>KURTEŞAN</b> .....	<b>IX</b>
<b>LÎSTEYA TABLOYAN</b> .....	<b>X</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>XI</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>XIII</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>XV</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>XVII</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<b>A. METODOLOJÎ</b> .....	<b>1</b>
<b>A.1. MIJAR</b> .....	<b>1</b>
<b>A.2. ARMANC û GIRINGÎYA MIJARÊ</b> .....	<b>2</b>
<b>A.3. RÊBAZ</b> .....	<b>4</b>
<b>A.4. ÇARÇOVE û SÎNOR</b> .....	<b>4</b>
<b>B. EDEBÎYATA GELÊRÎYA KURDÎ</b> .....	<b>5</b>
<b>B.1. Edebîyata Gelêrîya Kurdî û Beyt</b> .....	<b>5</b>
<b>B.2. Pênase û Çemk û Taybetmendiyên Beytê</b> .....	<b>8</b>
<b>B.3. Peyva beytê di nav mêjûya wêjeya Farsî û Kurdî da</b> .....	<b>11</b>
<b>B.4. Beytên Kurdî ji Alîyê Naverokê va</b> .....	<b>14</b>
<b>B.5. Beytên Kurdî ji Alîyê Ruxsarî va</b> .....	<b>14</b>
<b>B.6. Beytên yekkêş û çendserwayî</b> .....	<b>15</b>
<b>B.7. Beytên çend kêş û çend serwayî</b> .....	<b>15</b>
<b>B.8. Beytên nîv helbest û nîv pexşan</b> .....	<b>15</b>
<b>C. EDEBÎYATA KLASÎK</b> .....	<b>15</b>
<b>C.1. Pênase û Teşeyên Edebîyata Klasîk</b> .....	<b>15</b>



C.2. Mesnewî.....	16
C.3. Pişkên Mesnewîyê yên Giring .....	17
C.4. Mesnewî di Edebîyata Kurdî da .....	17
C.5. 1. Bi Goranî/Hewramî.....	17
C.5.2. Bi Kurmancî .....	18
C.5.3. Bi Soranî: .....	19
C.5.4. Bi Zazakî .....	19
D. EDEBÎYATA BERAWIRDKARÎ .....	19
PIŞKA YEKEM .....	22
1. Beyta Mem û Zînê .....	22
1.1. Agahdarîyeke Giştî li ser Beyta Mem û Zînê .....	22
1.2. Pêşîneya Kar û Lêkolînan li ser Beyta Mem û Zînê .....	23
1.3. Jînenigarîya Oskar Mannî wek Komkerê Beyta Mem û Zînê .....	26
1.4. Nasandin Beyta Mem û Zînê (Varyanta Oskar Mannî).....	27
1.5. Metna Beyta Mem û Zînê (Varyanta Oskar Mannî).....	27
1.6. Beyta Mem û Zînê ji Alîyê Ruxsarî va .....	53
1.6.1. Pêkhate û Teşe.....	53
1.6.2. Kêş û Serwa .....	54
1.6.3. Cuwankarîyên Toreyî.....	57
1.6.4. Qehremanên Beytê.....	60
1.6.5. Çemk û Wateya Navên Çend Qehremanên Beytê .....	62
1.6.5.1. Hersê Qîzên Paşayê Perîyan .....	62
1.6.5.2. Zîn.....	62
1.6.5.3. Mem.....	63
1.6.5.4. Beko .....	65
1.6.5.5. Sifî.....	66

1.6.5.6. ‘Alî Paşa .....	66
1.6.5.7. Zelîxa(n) .....	67
1.6.6. Vegêran .....	67
1.6.7. Ziman .....	67
1.6.8. Dîyalog .....	68
1.6.9. Mekan û Zeman /Cîh û Dem.....	68
1.6.9.1. Mekan/Cîh .....	68
1.6.9.2. Zeman/Dem .....	70
1.7. Beyta Mem û Zînê ji Alîyê Naverokî va.....	72
1.7.1. Xelekên Beytê .....	72
1.6.1.1. Nasandina bajarê Mu’xribistanê û Desthelatên wê.....	72
1.7.1.2. Zewaca ‘Alî Paşa û Bûyîna Memê .....	73
1.7.1.3. Peydabûna Bozê Rewan .....	73
1.7.1.4. Nêçîr û Qizên Padişahê Pêrîyan .....	73
1.7.1.5. Dîdara Efsûnawîya Memê û Zînê .....	73
1.7.1.6. Hişyarîya ji Xewa Evînê .....	74
1.7.1.7. Zîn, Beko û Qîza Beko .....	74
1.7.1.8. Mem digîje Cizîra Botan .....	74
1.7.1.9. Dîdara Duyem ya Evîndaran .....	74
1.7.1.10. Fesadîya Beko.....	75
1.7.1.11. Nêçîr û Nêçîrgeh.....	75
1.7.1.12. Fedakarîya Hesên.....	75
1.7.1.13. Kişikanê û Nexşe û Pîlana Beko .....	75
1.7.1.14. Her sê birayên Celalî dixeyîdin.....	76
1.7.1.15. Mirina Memê bi Henarên jehrîkirî û xwekujîya Zînê.....	76

1.7.1.16. Kuştina Beko û Dawîya Bûyerê .....	76
1.7.2. Huzûra bêjer yan danerê berhemê di metna berhemê da.....	76
1.7.3. Hêmanên Mîtolojîkî û Dînî di Beyta Mem û Zînê da .....	76
1.8. Danasîna Dariştenasî (Morphology) ya V.Propp .....	78
1.8.1. Beyta Mem û Zînê bi pêka Dariştenasî (Morphology) ya V.Propp....	78
1.8.2. Karkirdên Qehremanên Beytê bi pêka Dariştenasîya V.Propp .....	80
1.9. Numad û Numadnasîya Hejmaran.....	85
1.9.1. Numad û Hejmarên Numadîn di vê Beyta da .....	85
1.10. Erdnigarî û Cêderka Beyta Mem û Zînê .....	92
1.11. Mu'xribistan/Mexribzemîn .....	93
1.12. Rastîya Bûyerê .....	94
PIŞKA DUYEM .....	97
2. MEM û ZÎNA HEWRAMÎ .....	97
2.1. ZaraveyêGoranî û Caygeha wî di nav Zimanê Kurdî da .....	97
2.2. Mesnewîyên Mem û Zînê bi Goranî/Hewramî .....	99
2.3.Danasîna Destnivîsa Mem û Zîna Hewramî.....	100
2.4. Agahdarî li Ser Jîyana Danerê Mem û Zîna Hewramî.....	102
2.5. Rêbaza Transkirîpsîyona Mem û Zîna Hewramî .....	104
2.6. Metna Mesnewî ya Mem û Zînê ya (Hewramî).....	105
2.6.1. Wergêran û Şirove ya Mem û Zîna Hewramî bi Kurmancî .....	105
2.3. Danasîna Mesnewîya Mem û Zîna Mîrza ji Alîyê Ruxsarî va .....	207
2.3.1. Pêkhate û darêjka vê mesnewîyê .....	207
2.3.2. Kêş û Serwa .....	207
2.3.3. Cuwankarîyên Toreyî.....	208
2.3.5. Qehremanên Mesnewîyê.....	213

2.3.5. Vegêran .....	214
2.3.6. Ziman .....	214
2.3.7. Dîyalog .....	215
2.3.8. Mekan û Zeman .....	217
2.3.8.1. Mekan.....	217
2.3.8.21. Zeman.....	218
2.4. Danasîna Mesnewîyê ji Alîyê Naverokî va.....	220
2.4.1. Xelekên Mesnewîyê .....	220
2.4.2. Huzûra bêjer yan danerê berhemê di metna berhemê da.....	223
2.4.3. Hêmanên Mîtolojîkû Dînî di Mem û Zîna Hewramî da .....	223
PIŞKA SÊYEM .....	227
3. BERAWIRDKARÎ.....	227
3.1.Edebîyata Berawirdî.....	227
3.1.1.Daneberheva Ruxsarî .....	227
3.1.2. Kêş û Serwa di her du Metnan da .....	227
3.1.3. Cuwankarî di her du Metnan da .....	228
3.1.4. Daneberheva Qehremanên Serekî yên her du Metnan .....	229
3.1.5. Vegêran .....	231
3.1.6. Huzûra bêjer yan danerê berhemê di metna berhemê da.....	231
3.1.7. Ziman .....	232
3.1.8. Rêjeya Peyvên Bîyanî di Her du Berheman da .....	233
3.1.8.1.Rêjeya Peyvên Bîyanî di Beytê da .....	233
3.1.8.2. Rêjeya Peyvên Bîyanî di Mesnewîyê da .....	234
3.1.9. Peyvên Erebi û Turkî yên Hevpişk di Her du Berheman da .....	234
3.1.10. Dîyalog .....	236

3.1.11. Mekan/Cîh .....	237
3.1.12. Zeman/Dem .....	240
3.2. Tevereya Duyem Daneberheva Naverokî .....	241
3.2.1. Naveroka her du Berheman bi kurtî.....	241
3.2.2. Berawirdîya Rêçên Ayînî di Mesnewî û Beytê da .....	242
3.2.3. Meqamê Jinê di her du Berheman da bi Nihêrîna Ayînî û Civakî... 243	
3.2.4. Berawirdek Giştî û Encamî di nîveka Her du Berheman da .....	245
3.2.4.1. Wekhevî û Hevpişkîya her du Berheman .....	245
3.2.4.2. Newekhevî û Cudatî.....	246
3.2.4.3. Wêkçûn û Hevrenî .....	252
ENCAM .....	255
ÇAVKANÎ Û JÊDER .....	261
PÊVEK.....	269
Destnivîsa Mem û Zîna Hewramî .....	275
Ferhengok .....	345
Jînenigarîya Xwandekarî .....	419

## **BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ**

Doktora tezi olarak hazırladığım *Berawirdkirina Beyta Mem û Zînê (Varyanta Oskar Mann A Kurmancî) û Mem û Zîna Mîrza Ya Hewramî* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

10 / 06 / 2020

Parviz JAHANY

## KURTEŞAN

BMZ.	: Beyta Mem û Zînê
bnr.	: binêrrin
dx.	: dirûdê Xwedê lê bin.
hb.	: heman berhem
hj.	: hejmar
hq.	: Hicrîya Qemerî
hş.	: Hicrîya Şemsî
mal.	Malik, beyta mesnewîyê
mî.	Mîladî
nşr.	: neşrê
r.	: rûpel
rê.	: rêzik (rêzên beytê/setir)
rr.	: rûpelêd
s.	: sefhe
ss.	: sedsal/qern
tes.	: teshîh
w.	:wefat
wer.	: werger
↓	: şirove li jêrê tê

## LÎSTEYA TABLOYAN

Tabloya hj. 1. Hejmara Rêzikên Pexşankî û Helbestkî, r. 54-57.

Tabloya hj. 2. Nav û neqşên qehremanan di beytê da, r. 60-62.

Tabloya hj. 3. Navê cîhên ku di beytê da hatine, r. 69-70.

Tabloya hj. 4. Demên ku di beytê da hatine, r. 71.

Tabloya hj. 5. Heft Kesayetîyên beytê û karkirdên wan, r. 79.

Tabloya hj. 6. Dariştenasîya Beyta Mem û Zînê bi pêka teorîya V. Propp, r. 80-84.

Tabloya hj. 7. Berawirdî ya Tîpên Erebi û Transkirîpsîyona wan, r. 105.

Tabloya hj. 9 . Nav û neqşên qehremanên mesnewîyê, r. 207-208.

Tabloya hj.10. Navê mekanên/cîhên ku di mesnewîyê da hatine, r. 211-212.

Tabloya hj.11. Dem di mesnewîyê da, r. 213.

Tabloya hj. 12. Qehreman di her du Metnan da, r. 223.

Tabloya hj. 13. Berawida peyvên hevpişk di her du berheman da, r. 228-229.

Tabloya hj. 14. Mekan di her du berheman da, r. 231-233.

Tabloya hj. 15. Zeman di her du berheman da, r. 234- 235.



## KURTE

Ev xebata doktorayê li ser Edebiyata Gelêrî ya Kurdî ye û ji berawirdkirina du cure berhemên bi navê *Mem û Zînê* pêk tê. Yek ji wan bi zaraveyê Kurmancî ye û ya dî bi zaraveyê Hewramî ye. Ya Kurmancî beyteke folklorî ye û ya Hewramî mesnewîyeke klasîk e, ku jêdera wê jî folklorê kurdî ye. Bi dîtina gelek lêvekol û zanayên edeba gelan, edebiyata Kurdî ya gelêrî yek ji dewlemendtirîn edebîyatên cîhanê ye gelêrî tê hejmarê. Ev edebîyata ji layê şiklî û naverokî va di nav xwe da ji gelek cureyan pêk tê û yek ji van cureyan jî beyt in. Ji nava beytan da jî Beyta Mem û Zînê ya herî navdar e ku varyantên wê bi awayên devkî û nivîskî bi gelek zarave û devokên zimanê Kurdî hene.

Heta roja îro gelek xebat li ser Mem û Zînê hatine kirin. Lê ev xebata me wekî mijar berawirdkirina du versiyonên cuda ne, ku yek nusxeyeke destxet e ku bi zaraveyê Hewramî ye û di qalibê mesnewîyê da hatîye nivîsînê û ya dî versiyoneke ji Beyta Mem û Zînê ku bi zaraveyê Kurmancî ye. Ev destnivîsa Hewramî li sala 2016an ji layê Enstituya Kurdî ya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardîn Artuklu'yê va ji pirtûkxaneya giştîya bajarê Berlînê hatibû bidestxistin û ji bo istifadekirina lêkolera li ber destan bû. Versiyona beytê jî ji layê rojhelatnasê Almanî Oskar Mann va li sala 1906an li Rihayê hatîye berhevkirin. Ev versiyona beytê ta niha nehatîye çapkirin û tu xebatên akademîk jî li ser wê nehatine kirin.

Ev xebata ji destpêkek û sê pişkan pêk tê. Di destpêkê da li bareya girîngiya folklorê Kurdî, têgehên girêdayî bi babetê va, ji layê mijar û naverokê va û cureyên edebiyata gelêrî bi kurtî hin agahî hatine dayîn.

Di pişka yekem da piştî ku li ser Beyta Mem û Zînê û taybetîyên wê agahî hatine dayîn, metna Oskar Mann ya Kurmancî tê pêşkêşkirin û ev metn ji layên mîtolojîk, ayînî, tarîxî û edebî va hatîye vekolan.

Di pişka duyem da destxeta Mesnewîya Mem û Zînê ya bi Hewramî hatîye nasandin û transkrîpsiyona metnê li gel wergera wê ya Kurmancî hatîye raberkirin û metn ji layên ayînî û edebî va hatîye vekolan.

Di pişka sêyem da jî ev her du metnên folklorîk û klasîk ji layên naverok, şikl û hunerên cuwankariyê va hatine berawirdkirin. Taybetîyên wan yên hevpar û cihê hatine tespîtîkirin.

**Peyvên sereke:** Mem û Zîn, Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Beyt, Mesnewî, Edebiyata Berawirdî, Kurmancî, Hewramî.

## ÖZET

Bu doktora tezi, Kürt Halk Edebiyatı üzerinedir ve *Mem û Zîn* [Mem ile Zîn] adlı eserin iki varyantının karşılaştırılmasından oluşur. Biri Kurmanci lehçesinde, diğeri Hevrami lehçesindedir. Kurmanji olan folklorik bir destandır ve Hevrami olan ise kaynağı Kürt folkloru olan klasik bir mesnevidir. Birçok halk edebiyatı araştırması ve bilginine göre, Kürt halk edebiyatı dünyanın en zengin halk edebiyatından biri olarak kabul edilmektedir. Bu edebiyat, biçim ve içerik yönünden birçok türden oluşmaktadır ve bu türlerden biri destandır. Destanlar arasında Mem û Zîn Destanı en ünlü olanıdır ve Kürtçenin birçok lehçesinde ve ağızında sözlü ve yazılı olarak bulunmaktadır.

Bugüne kadar Mem û Zîn adlı eser üzerine pek çok çalışma yapılmıştır. Bizim çalışmamız ise, Mem û Zîn destanının Hevrami Kürtçesi ile yazılmış ve mesnevi olan bir elyazması ile Mem û Zîn destanının Kurmancî bir versiyonunun karşılaştırılmıştır. Hevrami el yazması, 2016 yılında Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından Berlin şehrinin halk kütüphanesinden elde edildi ve araştırmacılar tarafından kullanıma sunuldu. Destanın versiyonu da 1906'da Urfa'da Alman oryantalist Oskar Mann tarafından derlendi. Destanın bu versiyonu henüz yayınlanmamıştır ve üzerinde hiçbir akademik çalışma yapılmamıştır.

Bu çalışmama giriş ve üç bölümden oluşmaktadır. Girişte Kürt Folklorunun önemi, konuyla ilgili kavramlar, konu ve şekil açısından halk edebiyatı türleri hakkında kısaca bilgi verildi.

İlk bölümde Mem û Zîn destanı ve özellikleri hakkında bilgi verildikten sonra, Oskar Mann'ın derlediği Kurmanci versiyonunun metnine yer verilmiştir. Ayrıca bu metin mitolojik, dini, tarihi ve edebi açılardan incelenmiştir.

İkinci bölümde Mem û Zîn'le ilgili mesnevi şeklindeki Hevramice elyazması tanıtılmış ve elyazmasının orijinali (kopyası) transkribe edilip Kurmanciye çevrilen şekli verilmiş, dini ve edebi açılardan analiz edilmiştir.

Üçüncü bölümde ise bu iki folklorik ve klasik metin içerik, şekil ve edebi sanatlar yönünden karşılaştırılmıştır. Ortak ve farklı özellikleri tespit edilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Mem ve Zin, Krt Halk Edebiyatı, Mesnevi, Karşılaştırmalı Edebiyat, Kurmanci, Hevrami.

## ABSTRACT

This doctoral thesis is on Kurdish Folk Literature and consists of comparing two variants of the work titled Mem û Zîn [Mem and Zin]. One is in Kurmanji dialect and the other is in Hawrami dialect. The Kurmanji one is a folkloric epic, and the Hawrami one is a classical mesnevi whose source is Kurdish folklore. According to many folk literature researches and scholars, Kurdish folk literature is considered one of the richest folk literature in the world. This literature consists of many genres in terms of form and content, and one of these genres is epic. Among the epics, the Mem û Zîn Epic is the most famous one and is found in many dialects and variants of Kurdish, both orally and in writing.

To date, many studies have been done on the work titled Mem û Zîn. In our study, a manuscript written in Hawrami Kurdish of the Mem û Zîn epic was compared with a Kurmanji version of the Mem û Zîn epic. The Hawrami manuscript was obtained from the public library of the city of Berlin by the Kurdish Living Languages Institute of Mardin Artuklu University in 2016 and made available to researchers. The version of the epic was compiled by German orientalist Oskar Mann in Urfa in 1906. This version of the epic has not been published yet and no academic work has been done on it.

My work consists of an introduction and three parts. In the introduction, there is short information about the importance of Kurdish folklore, concepts related to the subject and the forms of Kurdish Folk Literature in terms of genre and topic.

In the first part, after giving information about Mem û Zîn epics and their features, the text of the Kurmanji version compiled by Oskar Mann is given. In addition, this text is examined in terms of mythological, religious, historical and literary aspects.

In the second part, the Hawrami manuscript in the form of masnawi about Mem û Zîn was introduced and the original (copy) of the manuscript was transcribed and translated into Kurmanji and analyzed in terms of religious, and literary aspects.

In the third part, these two folkloric and classical texts are compared in terms of content, shape and literary arts. Common and different features have been identified.

**Key Words:** Mem and Zîn, Kurdish Folk Literature, Masnawi, Comparative Literature, Kurmanci, Hawrami.

## PÊŞGOTIN

Binêşa vê tîzê li ser edebîyata Kurdî ya zarkî yanê Beyta Mem û Zînê hatîye danînê. Di nav edebîyata Kurdî ya gelêrî da beyt xudanê cayigaheke taybetî ye. Beyt yek ji giringtirîn û dewlemendtirîn çiqên edebîyata Kurdî ye.

Edebîyata gelêrî ya Kurdî gelek caran ji edebîyata nûjen û ya klasîka Kurdî ra bûye jêdera berhemên sereke. Ji nava edebîyata gelêrî ya Kurdî da Beyta Mem û Zînê ji hemûyên dî zêdetir bala helbestkar û lêvekolan li ser xwe da rakêşaye û bûye çavkanîya afirandina berhemên klasîk û lêkolîna babetên akademîkî.

Yek ji kesên ku berî hemûyan bi giringîya Beyta Mem û Zînê hesîyaye û ew ji xwe ra kirîye bingeha afirandinê, helbestkarê Kurd Ehmedê Xanî (1650/1-1707) ye, ku şahkara xwe Mem û Zîn, ji wê beytê vergirtîye. Helbet berî Xanî, Melayê Cizîrî (ss. 16.) jî navên Memê û Zînê di helbestên xwe da anîye.

Ji bilî Xanî (1650/1-1707) du kesên dî jî mesnewî li ber Beyta Mem û Zînê afirandine, ku her duyan jî bi zaraveyê Hewramî nivîsîne. Yek ji wan mesnewîyek e ku ser û binê wê ketîye û nivîşkan e. Ev mesnewîya nivîşkan ku ji 482 malikan pêk tê, ta niha du caran hatîye weşandinê. Cara yekem Keyûmersê Nîkreftar sala 2013an ji layê Enstîtûya Kelepûrê Kurdî li Silêmanîyê di nav keşkolekê da daye weşandinê û cara dûyem jî Namiq Hewramî ew li Tehranê ji layê Neşrê Cengel va daye weşandinê. Berhema dî jî mesnewîyek e ku ji 975 malikan pêk tê û ji layê kesekî bi navê Mîrza va hatîye nivîsînê. Destnivîsa vê mesnewîyê di pirtûkxana giştî ya bajarê Berlînê (SBB) da hatîye parastinê.

Me ji bo vê tîzê yek ev mesnewîya Hewramî û yek jî celebek/versiyonek ji Beyta Mem û Zînê bi zaraveyê Kurmancî ku li sala 1906an ji layê lêvekolê Almanî Oskar Mann (1867-1917) va hatîye berhev kirinê, helbijartîye.

Oskar Mann ev beyta ji zarê beytbêjekî Kurd bi navê Eyûb Axa Temir, xelkê bajarê Rihayê bihîstîye û bi tîpên latînî yên fonetîk anîye ser kaxezê.

Lêvekol û Kurdîzana Siwîsrî Barbara Sträuli yê ev beyta Kurmancî ji arşîva Oskar Mann (1867-1917) bi dest xistîye û tîpguhêzî rênivîsa Kurdî ya latînî ya nûjen kirîye û hê ew neweşandîye.

Li ber mêjînbûn û bi naverokbûna vê beytê me ev beyta û yek jî mesnewîya Mem û Zînê ya Hewramî ji vî karê xwe ra kirine binêşe.

Çunku Mem û Zîn beyteke folklorîk e û mesnewîya Hewramî ya Mîrza jî ji ber varyanteke wê hatîye nivîsînê, me pêdivî dît ku pêş da li ser Beyta Mem û Zînê û li dû ra li ser mesnewîya wê bixebitin. Lewra ev karê me ji destpêkekê û sê pişkan pêk têt: Di destpêkê da pêş da agahdarîyên pêdivî li ser edebîyata zarkî ya Kurdî û çiq û şaxên wê yên cur be cur û rengareng hatîye dayînê. Li dû ra beyt û çemka peyva beytê û çawanîya karbirda vê peyvê di nav dîroka edebîyata Kurdî ya zarkî da lêkolîn hatîye kirinê. Piştî ronkirina çemk û wateya peyva beytê, pişka yekem dest pê dibe.

Di pişka yekem da li ser Beyta Mem û Zînê û giringîya wê beytê di edebîyata zarkî ya Kurdî da û rewşa toreyî, hunerî ya vê beytê kar hatîye kirinê. Li dû ra metna Beyta Mem û Zînê çawa ku Oskar Mannî (1867-1917) qeyd kirîye, hatîye. Çun mafê kesî tune ye dest li metna folklorê bide, me jî dest li deqa wê nedaye, lê li perawêzan da li cîhên pêdivî şirove û ronkirineve hatine nivîsînê.

Li dû ra Beyta Mem û Zînê hatîye veçirandinê û li ser binmayeyên efsaneyan ku di vê beytê da zeq û berceste ne, herwisan li ser neqşa hejmaran û numadîbûna wan hejmarana lêkolîn hatîye kirinê û agahdarîyên pêdivî hatine dayînê.

Di dawîya pişka yekem da bi palpiştîya jêderên mêjûyî li ser rastîya hebûna Mem û Zînê û daneberheva wê di gel hindek qewimînên dîrokî agahdarî hatine raber kirinê.

Di pişka dûyem da kar li ser mesnewîyê dest pê dibe. Pêş da destnivîsa metna mesnewîyê tê nasandinê. Li dû ra metna destnivîsa Mesnewîya Mem û Zînê ku bi arîkarîya çend Hewramîzanan hatîye xwendinê, bi şeweya transkripsiyonê tîpguhêz bûye. Di gel tîpguhestinê me ew wergerandîye ser zaravê Kurmancî û li cîhên pêdivî da şirove kirîye. Ji bo kesên ku Hewramî nizanin, me ferhengokek amade kirîye ku di paşkoya tîzê da di pişka pêvekan da cî digire.

Di pişka sêyem da her du berhem; Mem û Zîna Hewramî û Mem û Zîna Kurmancî hatine daneberhev kirin û layên wekhev û yên newekhev, layên lawaz û bi



hêz û qehreman û rewşa wan her du berhemana ya edebî berawird bûye û li dû ra encam û jêderên karî hatine raber kirin. Li dû jêderan ra pêvek cî digirin.

- Sipasdarî

Di amadekirina vê tîzê da gelek kesan arîkarîya min kirine, lêre da pêdivî dizanim ku ji dil sipasdarîya wan bikim.

Pêş da sipasê ji şêvirmendê xwe yê hêja Prof. Dr. Hasan Çiftci dikim ku li hemû layan da bû arîkarê min.

Herwisa sipas ji bo hêja Doç. Dr. M. Zahir Ertekin, ku li bara rêk û pêkkirina metna vî karî da ji min ra bû arîkar.

Sipas ji bo mamostayan Prof. Dr. Abdurrahman Adak û Doç. Dr. Hayrullah Acar ku ev tîza xwandin û di gelek waran da rênimûnî û raîkarîza me kirin.

Sipas ji bo Hewramîzanên hêja mamostayan: Sedîq Babayî, Namiq Hewramî, ‘Ednan Muradî ku li nasandin û tîgehîştian metna Hewramî da ji min ra bûn arîkar.

Sipas ji xanima Kurdîzan Dr. Barbara Srtâuli ra ku metna Beyta Mem û Zîna Kurmancî ku bixwe tîpguhêz kiribû, berî ku wê biweşîne ew beyta da min.

Sipas ji bo hêja Ziya Yildirim ku kurteya vê lêkolînê ji min ra wergerande ser zimanên Înglîzî û Turkî.

# DESTPÊK

## A. METODOLOJÎ

### A.1. MIJAR

Mijara vê xebatê berawirdkirina du berhemên folklorîk û klasîk e. Berhema folklorîk varyantek ji Beyta Mem û Zînê ye. Ev berhema sala 1906an ji layê rojhelatnasê Almanî Oskar Mannî (1867-1917) va hatiye berhevkirinê. Beytbêjê vê beytê Eyûb Axa Temir, xelkê bajarê Rihayê ye. Beyt ji 644 rêzikan pêk tê û bi şeweya helbestkî û pexşankî hatiye darijtinê.

Berhema duyem mesnewîyeke destnivîs e, ku bi zaraveyê Goranî devoka Hewramî hatiye nivîsînê. Ev destnivîsa li pirtûkxaneya giştî ya bajarê Berlînê da hatiye parastinê. Nusxeyek tekane ye û hê varyanetên wê yan jî nusxebedelên wê bi dest neketine. Mesnewî ji 975 malikan pêk tê û bi xetê neste'liq û bi şeweyeke pir xweşik û xwana hatiye nivîsînê. Dîroka istinsaxa wê sala 1266ê hicrîya qemerî ye, ku beranber e di gel sala 1849ê mîladî. Mustensixî ev mesnewîya ji bo feqîyekî istinsax kirîye. Ne navê nivîskarî li ser heye, ne jî navê mustensixî. Tenê di dwîya mesnewîyê da em rastî peyva Mîrza tîn ku mexlesa nivîskarî ye.

Serenavên mijara lêkolîna me beyt û mesnewî ne. Herçiqas ku ev her du berhem li bara teşeyî û zaraveyî da du berhemên ji hevdu cuda bin jî, lê kakil û binêşeya her dûyan jî yek e. Beyt şiklek ji edebîyata gelêrî ya Kurdî ye, ku bi serê xwe janrekê serrast dike. Ew zortir çîrokeke evîndarîyê yan serpêhatîyeke hemasî, ayînî, civakî... vedigêre û di forma helbestên gelêrî da hatine dariştinê, ku di hindekan da beytbêj ji bo şiroveya mijarê hindek agadarîyan jî bi pexşankî vedigêre.

Beyt taybetî edebîyata Kurdî ye û bi vî navî û bi vê formê di edebîyata dîtir gelan da tune. <sup>1</sup> Lê mesnewî berewajî beytê janreke ku di nav edebîyata gelek gelên cîhanê da nimûneya wê heye. Peyva mesnewîyê peyveke Erebi ye û wateya wê dulib dulib e. Lewra her malikeke wê ji du misra'ên hevkes û hevserwa pêk tê. Pişka zora mesnewîyan jî weke beytê çîrokekê vedigêrin. Beyt û mesnewî di vê xalê da hevpişk in. Lê forma mesnewîyê ji ya beytê cuda ye. Di mesnewîyê da her malikek bi serê xwe xudanê serwayekê ye, û hemû malikên wê,

---

<sup>1</sup> Şems, Îsmail, „Beyt-ê Kurdî“ *Merkez-ê Dâiretu'l-Me'ârif -ê Bozorg-ê Îslâmî*, Gihan: 03.11.2019/22:13. (<https://www.cgie.org.ir/fa/article/153284/>: Gihan: 03.11.2019/22:13)

ji serî ta binî debê bi yek kêşê bêne nivîsînê.<sup>2</sup> Lê di beytê da kêş serbest e û her pişkeke wê ku jê ra bend dibêjin di nav xwe da hevserwa ye. Her bendeke beytê ji çendîn rêzikên hevserwa pêk tê.

Evê mesnewîya Hewramî jî mijara xwe ji varyanteke Beyta Mem û Zînê wergirtîye. Herçiqa ku ev her du berhem jî heman serpêhatîyê vedigêrin û her du jî li ser evîna Memo û Zînê hatine gotin û nivîsînê, lê di gelek xalan da newekhevî di nîveka wan da heye, ku di pişka sêyem ya vê lêkolînê da ew newekhevî hatine destnîşankirinê.

Çunku çavkanîya van herdu berhemên ku mijara lêkolîna me ye, edebîyata gelêrî ye, me pêdivî dît ku li destpêkê da pêş da hindê agahdarî li ser edebîyata gelêrîya Kurdî bidin û peyva beytê û çemk û wateya wê bidin nasandinê. Li dû nasandina beytê ra Mesnewî hatîye nasandinê. Bi giştî ji bilî destpêkê karê me li ser sê pişkan hatîye parvekirinê. Di pişka yekem da Beyta Mem û Zînê û şirove û analîza wê cî digire. Di pişka düyem da Mesnewî hatîye tîpguhêzkirinê û bi zaraveyê Kurmancî hatîye wergerandin û di cîhên pêdivî da şirove hatien kirinê. Ji bo kesên ku Hewramî nizanin, me ferhengokek amade kirîye ku şirove û wateya peyvên Hewramî bi zaraveyê Kurmancî hatîye raberkirinê. Ev ferhengoka di pişka pêvekan da cî digire. Di pişka sêyem da ev her du berhem hatine berawirdkirinê û layên wan yê wekhev, newekhev û wêkçûna wan hatine destnîşan kirinê.

## **A.2. ARMANC û GIRINGÎYA MIJARÊ**

Çawa ku jêdera *Mem û Zîna* Xanî Mem û Zîna folklorîk e, tiştekî asayî ye ku jêdera Mem û Zîna Hewramî jî folklorîk be. Ji bo ku em nizanin Mîrza ji kîjan varyantê sûd wergirtîye divê li ser Mem û Zîna Mîrza û varyantên Mem û Zîna folklorîk bi rêya berawirdkirinê xebat bêne kirin. Ji ber vê hindê me jî ev mesnewîya Hewramî di gel varyanteke Mem û Zîna folklorîk berawird kir.

Ev her du berhem jî li bara naverok û mijara xwe va zengîn û li pileyeke bilind da nin. Amanca me ji vî karî di pileya yekem da nasandina van her du berhemên edebî ne, ku hêştaya wisan ku pêdivî bin ji cîhana edebîyata Kurdî ra nehatine nasandinê û lewra me ev her du berhemên giranbuha bi lêkolîn, şirove û werger û ta cîhê ku mumkin be bê hele û çewtî amade kirin, ku rojekê bikevin nav pirtûkxana Kurdî. Ev varyanta Beyta Mem û Zînê nimûneyek ji zargotina devoka Rihayê tê hejmarê û ji bo kar û lêkolîna devoknasîyê jî dikare bibe jêdereke cîhê pêbawerîyê.

---

<sup>2</sup> Dêhxudâ, ‘Elî Ekber, „Mesnevî“, *Lu’xetnâme-yê Dêhxudâ*, Muessisse-yê Dânişgah-ê Tehran 1377 hş., ; Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, Nûbihar, İstanbul 2019, r. 245.

Giringîya van her du berhemana di pileya yekem da zengînîya wan û di pileya duyem da jî nenasmana wan e. Ev beyta hê li çî derî nehatîye weşandinê. Lê Mesnewî carekê bi rênivîsa Kurdî-Aramî li sala 2018an li Almanîya bi tîrajeke pir kêr hatîye weşandinê<sup>3</sup> û ev mesnewîya cara duyem jî sala 2018an li zanîngeha Artukluya Mêrdînê bûye mijara têza lîsansa Cumhûr Ölmez. Lê muxabin çunku amadekarê vê tîzê ne Farsî dizane, ne jî zaraveyê Hewramî û herwisan dijwarîya wî ya xwandina destxetê hebûye, di şîrove û tîpguhêzîya wê mesnewîyê da tûşî gelek şaşîyên zeq û berceste bûye. Bo nimûne di dawîya destxetê da mustensix dinivîse: “Xetim der sene-yê hezar û dused û şest û şîşê-hicrî est, der şehri Sefer”

Lê di tîzê da weha hatîye: “... der sene-î hizar û dused û şêşt û şeşê hicrî esr der şehre sefer” û li perawêza wê hevokê da jî hatîye: “Sala hezar û dused û şêst û şeşê, 5î heyva seferê ya hicrî.”<sup>4</sup>

Lê di destxetê da ne “esr” heye ne jî “5î seferê”.

Mîrza dinivîse:

*Gunehbarendan bibexşî gunam*

*Be Taha û Yasîn be Sûrey Kelam*

Lê di tîzê da di cîhê “be Sûrey Kelam” da “bore’y kelam” hatîye,<sup>5</sup> ku çewt e û hîç wateyê jî nade.

Mîrza dinivîse:

*Ewsa domay medihi yektay yegane*

*Goş der we destan dewri zeman*

Lê ev malika di tîzê da weha bi şaşî hatîye:

*Ewsa dumay meth yektay yegane*

*Gûş derû destan dewr-i zeman*<sup>6</sup>

Mîrza dinivîse :

*“Ce ewweş zeman ney çerxi keçzen*

*Zen aman pey merd, merd naman pey zen”*

Ev malika di tîzê da weha bi şaşî û kêmasî hatîye wergerandin: “Ji zemanê berê ve ye mêr nadin pey jinan, jin didin pey mêran.”<sup>7</sup>

---

<sup>3</sup> Babayî, Sedîq, *Memê Alan be Horamî*, Naşir Gote û Hafîz, Alman, Bonn, sal 2018, şabek: 9783940762535

**Têbînî:** Ev metna bi rênivîsa Aramî min amade kir û ji Sedîq Babayî ra şand ku em pêkve li ser deqa wê bixebitin. Piştî ku karê me kuta bû, Sedîq Babayî bêy agadarîya min ew deq bi navê xwe weşandîye.

<sup>4</sup> Ölmez, Cumhur, *Mem û Zîneke bi Hewramî* (Tekst- Vekolîn) Lîsansa bi tîz, Zanîngeha Artuklu Mardin, 2018, r. 26.

<sup>5</sup> Ölmez, hb. r. 34.

<sup>6</sup> Ölmez, hb.r. 34.

<sup>7</sup> Ölmez, hb. r. 35.

Lê peyva pey di zaraveyê Hewramî da ne bi wateya peyva peya Kurmancî ye. Pey di Hewramî da wate ji bo, bonetî, bona, keçzen jî bi şaşî keçzen hatîye qeydkirinê. Keçzen wate: derewîn, xwar û nedurust, fêlbaz...

Ji bilî van şaşîyên ku di pişkên destpêkê da hatine û hejmara wan gelek in, di transkirpsîyona wê da jî bi sedan şaşîyên weha zeq û berceste li ber çavan dikevin. Ji bilî şaşîyan hîç şiroveya peyv û biwêjan yan ferhengokek ji bo wê nehatîye amadekirinê. Yanê ji ber şaşîyên tîpguhêzê û nebûna ferhengokekê kesek nikare sûdekê ji metna wê ya Hewramî vergire.

### **A.3. RÊBAZ**

Karê me di vê xebatê da daneberhev û helsengandinek e di nîveka toreyên gelêrî û klasîka Kurdî da. Rêbaza me berawidrkari ye û me ev kara bi şêweya tewzîhî û teşrîhî domandîye. Me du berhemên ku bi du zaraveyên cuda yên zimanê Kurdî hatine afirandinê û her yek jî di qalib û teşeyeke cuda da ne, dane ber hev. Me pêş da her du metn cuda cuda şirove kirine û her yek li bara pileya hunerî û edebî, ziman, karakter û... cuda analîze kirine. Metna Mesnewîyê bi arîkariya çend Hewramîxêv û Hewramîzanan hatîye transkirpsîyonkirinê. Di gel tîpguhêzîya wê me ew wergerandîye ser zaraveyê Kurmancî û di cîhên pêdivî da me ew şirove kirîye. Li dû ra her du metn bi hûrgilî hatine berawirdkirinê. Me ew her du metn li bara wekhevî, newekhevî û wêkçûna wan da dane ber hev. Serratî û kêmasîyên her yekê ji wan hatine destnîşankirinê.

### **A.4. ÇARÇOVE û SÎNOR**

Sînor û çarçoveya karê me nasandin û şirovekirin û daneberheva van her du babetên folklorîk û klasîk yên navborî ne. Ji bo vî karî di pileya yekem da me pala xwe daye metnên van her du babetana û di cîhên pêdivî da me serî li wan pirtûk û gotarên giring dane, yên ku ta niha li ser mijara vê beytê hatine nivîsîn û weşandinê û haya me ji wan heye. Em dizanin ku di nav edebîyata gelêrî da bi dehan varyantên Mem û Zînê hene û di nav edebîyata klasîk da jî ta niha sê mesnewî li jêr kartêkirina Beyta Mem û Zînê da li ser evîna Mem û Zînê hatine nivîsînê. Yek mesnewîya Mem û Zîna Ehmedê Xanî (1650/1-1707) ye û her du mesnewîyên dî jî bi zaraveyê Goranî devoka Hewramî hatine nivîsînê. Lê hindî ji me hat me mijarên varyantên dî tevî vî karê xwe nekir û tenê em li ser van her du berhemên ku me destnîşan kirine xebitîn. Lewra daneberhev û berawidrkariya di nîveka wan hemû varyantana da bi xwe karekî serbixwe û mijareke cuda ye. Sînorê karê me danasîn, şirove û karê berawirdîyê di

nîveka van her du berhemên folklorî û klasîkî da ye. Di gel wê hindê ku ta niha gelek lêkolîn û karên akademîkî li ser Beyta Mem û Zînê hatine kirinê, lê ev karê me bi serê xwe ji wan karana cuda ye û berawirdek e di nîveka du berhemên folklorîk û klasîk da, ku her yek bi zaraveyekî cuda û bi teşeyên ne ji hevûdin hatine nivîsînê.

### **A.5. ASTENGÎYÊN LÊKOLÎNÊ**

Astengîya here mezin ji bo vî karê me kêmbûn çavkanî û jêderên sereke û nebûna ferhengeke tekûz ya zaraveyê Hewramî bû. Gelek caran ji bo wateya peyvekê me serî li paşko û ferhengokên wan pirtûkên Hewramî yên ku ta niha hatine weşandinê didan. Lê ewana jî têrê nedikirin. Eger me ew peyv peyda nekira, me bi rêka telefon û dîtir desgahên peywendîyê ew peyv ji hewramîzana dipirsî. Lê gelek caran hewramîzan jî li bin barê wan dernediketin. Li ber wê hindê me siparişa çendîn pirtûkên Hewramî û ferhengên bi wî zaraveyî dane pirtûkfiroşîyêke Kurdî li Rojhelatê. Lê bi derengî be jî hindê ji wan pirtûkana gehîştin destê me. Bi her cureyî me ew astenga li pişt xwe ra hêla û bi arîkarîya ferhengên ku giheştin destê me pirsgirêk çareser bû.

Astenga dî xwandina destxetê bû. Destnivîsa mesnewî ya Hewramî bi xetê neste'liq e. Herçiqa ku ev nusxeya bi xetekî xwana û xweşik hatîye nivîsînê jî, lê çun di xetê neste'liq da ser û ber û jêr wate herekeyên tîpan nayêne danînê, durustxwandina hindê peyvan dijwar bû.

Dijwarîya dî ya xwandina vê nusxeyê nebûna nîşaneyekê ji bo tîpa “گ گ” ye. Di vê nusxeyê da hemû tîpên “گ گ” weke tîpa “ک ک” hatine nivîsînê, mirov tenê dikare bi rêka kontekstê û peyvnaşîyê wana jêk cuda bike. Em dilniya ne ku me karî em vê astengê jî li pişt serê xwe ra bihêlin.

## **B. EDEBÎYATA GELÊRÎYA KURDÎ**

### **B.1. Edebîyata Gelêrîya Kurdî û Beyt**

Çun binêşa karê me li ser edebîyata zarkî wate Mem û Zînê ye, pêdivî ye, ku berî danasîna van her du berhemên Mem û Zînê em avirekî bidin ser edebîyata Kurdî ya zarkî û bi kurtî be jî şax û çiqên wê bidin nasandinê û bizanin kanê Beyta Mem û Zînê dikeve nav kîjan şaxên vê edebîyatê û li dû ra li ser mijarê bixwe rawestin.

Gelek kesên Kurd û bîyanî li ser cur û celebên edebîyata zarkî ya Kurdî lêkolîn kirine û bîr û boçûn û dîtînen xwe li ser vê toreyê ragehandine.

Hecîyê Cindî (1908-1990) li ser zargotina Kurdî weha dinivîse: “Zargotina Kurmancîyê gelekî dewlemend e û pirjanr e. Gelek in beyt-serhatîyêd wê ye eyan, çawa „Memê û Zînê“, „Dimdim“ û yê dinê. Gelek in hikayetêd wê ye hezarnavî, serhatî, mijûlîyêd wê. Bêhesab in kilamêd wê yê mêra, keçika, xebatê, govendê, metelok û meselêd wê.”<sup>8</sup>

Şukrîye Resûl dinivîse: “Janrên folklorê gelek in, ewên ku gelekî belaw in evana ne: istiran, lorîk, lawandineve, bextgirtineve, serpehatî û çîrok, (çîrokê dirêj û çîrokê kurt) efsane, dasitan, nukte, metel, pêhelagotin, zûgotinok, bizarîkirin, pirûpûç, pend û qiseyên nesteq/gotinên bi şîret.”<sup>9</sup>

Ş. Resûl van navana ji yêk cuda nake û nabêje ka heryek ji van navana ser bi kîjan pişka edebîyata zarkî ya Kurdî ne.

‘Îzzedîn Mustefa Resûl (1934-2019) jî di pirtûka xwe ya bi navê: *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî* da li ser van nav û çiqên edebîyata folklorîka Kurdî dinivîse: “Edeba folklorî Kurdî -çawa ku ev edeba li bal pitirê gelan û bi taybetî jî li bal gelên rojhelatê heye- ji çend cure çîrokên binşeyî pêk tê, wekî: Efsane, êposîya, ku di Kurdî da ji hindêk curên wê ra “beyt” dibêjin. Ew jî dibe du pişkan: Beytên qehremanî û beytên dildarî. Wek çîrok, wate hikayet, ku li hindêk cîyan jê ra neqil û metelok jî dibêjin û vehûnokên dildarî ku helgirê hemû pişkên istiranê e. Wekî lorîkên zarokan û lawandineveya zarrokan...”<sup>10</sup>

Lê ew jî wana ji hevdu cuda nake û li ser her mijarê cuda cuda dinivîse.

Ayhan Yildiz edebîyata Kurdî ya gelêrî li ser du pişkan weha par ve dike: “Berhemên vê edebîyatê bi du teşeyan hatine dayîn. Berhemên menzûm û berhemên pexşan. 1. Berhemên nezmî: Ev cure berhem ev in: kilam, manî/dilok, zêmarî/lawij, zûgotinok, tiştanok, lorî, stran.

2. Berhemên Pexşanî: Cûreyên van berhemên ev in: Çîrok/metelok, destan, efsane, hikayeya gel, pêkenî, şanoya gelêrî, biwêj û gotinên pêşîyan.”<sup>11</sup>

Lê bi dîtina me çend şaşî di vê parvekirinê da haye. Lewra her du peyvên kilam û stran (istiran) hevwater û hevçemk in. Di Kurdî da istiranek bi navê dilok hevwatera manîyê tune ye. Navê vê pişka istiranê dilok e û ew bi watera istiranên dilanê ne, ne istiranên dilan. Zêmarî û lawij du mijarên cuda ne. Zûgotinok nakevin nava pişka nezmê. Çîrok û metelok ne yek in.

Abdurrahman Adak di pirtûka *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk* da edebîyata Kurdî li ser du pişkên edebîyata zarkî û edebîyata nivîskî parve dike û li ser edebîyata zarkî weha

<sup>8</sup> Cindî, Hecî, *Hikayetêd Cimeata Kurda I*, Weşanxaneyê Rûpelê, çapa 1. Stenbol 2014, r. 13.

<sup>9</sup> Resûl Îbrahîm, Şukrîye, *Pendî Pêşînan û Qisey Nesteqî Kurdî*, Çapkirawekanî Emîndariyê Giştî Roşnîbirî û Lawan, Be'xda 1984, r. 12.

<sup>10</sup> Mustefa Resûl, ‘Îzzedîn, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Be'xda 1970, r. 11.

<sup>11</sup> Yildiz, Ayhan, *Hunera Vegotina Bedew A Devkî û Nivîskî I*, Van 2017, r. 121.

dinivîse: „Edebîyata zarkî edebîyata herî kevn a gelekî/miletekî ye. Edebîyata devkî berî ku edebîyata nivîskî dest pê bike heye û piştî ku edebîyata nivîskî dest pê dike jî li kêleka wê hebûna xwe berdewam dike. Nexwe mirov dikare wan form û cureyên edebî yên ku ji demên herî kevn ve bi riya gotinê tîr veguhastin wekî „edebîyata zarkî“ bi nav bike. Kilam, destan, şerên ku dengbêj dibêjin, gotinên pêşîyan, lawîj, mamik, biwêj, lorîk hwd. dikevin nav cureyên edebî yên edebîyata zarkî de...“<sup>12</sup>

Li dû lêkolînan ra em giheştine wê encamê ku edebîyata gelêrî ya Kurdî di pileya yekem da li bara ruxsarî li ser du pişkan weha par ve dibe:

### **I. Edebîyata Gelêrî ya Pexşankî**

#### **II. Edebîyata Gelêrî ya Helbestkî**

**I.** Edebîyata gelêrî ya pexşankî ew edebîyata ye, ya ku bi şêweya pexşanê hatîye dariştinê

û ne bi deng lê bi devkî <sup>13</sup> tîr gotinê.

Edebîyata Kurdî ya pexşankî li bara naverokê va li ser çendîn pişkan tîr parvekirinê, ku pişkên wê yên herî giring ev in:

1.Çîrok<sup>14</sup> 2.Gotinên Pêşîyan 3 Biwêj 4.Nifir û Du'a û Dujîn 5.Zûgotinok/ lezlezok 6.Leyz û ferhenga leyzan û biwêjên leyistinê 7. Pêkenok 8. Çimamk/mamik <sup>15</sup>

**II.** Edebîyata gelêrî ya helbestkî, ew edebîyata ye, ya ku bi şêweya helbestê bi teql û aheng hatîye vehûnandinê û xudanê kêş û serwayê ye. Ev çîqa edebîyata Kurdî li bara ruxsarî va li ser çendîn çîqan dihêne parvekirinê:

1. Istiran<sup>16</sup> 2. Beyt 3. Qewl 4. Qewlik 5. Çimamk/mamik / tiştanok 6. Duxîştî 7. Sêxîştî 8. Çarxîşt/çarîn 9. Lorî 10. Helbestên zarokan/lawandineve...

Heryek ji van du pişkana bixwe dibin çendîn şax û çiqên dî, ku şiroveya wan dervayî mijara vê lêkolîna me ye. Ji nav van hemû celebana da em ê li ser beytê ku mijareke vê teza me ye, rawestin.

<sup>12</sup> Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasik*, Çapa Duyem, Nûbihar, İstanbul 2014, r. 30.

<sup>13</sup> Biwêjên devkî û bi deng du biwêjên gelêrî ne, eger mijarek weke istiran û beytan bi dengê bilind û bi aheng bête gotinê, dibêjin bi deng hate gotinê, lê eger bê aheng û bi dengê asayî û nizim bête gotinê dibêjin devkî hate gotinê. Peyva dengbêj bi wateya kesên ku bi deng mijarekê vedibêjin, ji vê biwêjê hatîye wergirtinê.

<sup>14</sup> Çîrok bixwe dibe çendîn çiqên dî, wekî: çîvanok, efsane, serpêhatî...

<sup>15</sup> Pêkenok û çimamk/mamik/ tiştanok bi her du şêweyên helbestkî û pexşankî hene.

<sup>16</sup> Peyvên istiran/sitiran, kilam, qayîde û lawije di hindêk devokên kurmançî da hev wate ne. Istiran bixwe li ser çendîn çîqan tîr parvekirinê, wekî: lawik, heyran, dûrik, dîlok, (bi dîtina min peyva istirana Kurdî di gel peyvên story û îstûreyê hevrişe ye.)



## B.2. Pênase û Çemk û Taybetmendîyên Beytê

Bi vê parvekirinê ra em dibînin ku beyt di nav edebîyata gelêrî ya Kurdî da dikeve nav pişka helbestkî. Lê em bizanin kanê peyva beytê ji ku hatîye û wateya wê ya ferhengî û giştî çî ye?

Peyva beytê di edebîyata Erebi, Farsî, Turkî û Kurdî da biwêjeke hevpar e. Gelek kes binêşa vê peyvê ji zimanê Erebi dizanin. Lê beyta Kurdî ku mijara vê lêkolîna me ye, janereke edebî ya serbixwe ye û ji peyva beyta Erebi ku bi wateya malikeke helbestê ye, cuda ye.

Gelek kesan li ser vê peyvê bîr û boçûnên xwe nivîsîne.

Şemseddîn Muhemed, Qeys er-Râzî, di pirtûka xwe ya bi navê *el-Mu'cem fî Me'ayiri Eş'aril-'Ecem* da li ser peyva beytê weha dinivîse: „Di zimanê Erebi da ji xanî yan malê ra beyt dibêjin. Ereban yekîneyeke helbesta klasîk jî wekandine/şubandine mal yan xanî û ji wê ra jî beyt gotine. Ji nîvmalikeke helbestê ra jî misra' gotine. Beyt yanê xanî û misra' jî wate layek ji du layên dergehî. Çun mala Ereban di binêşê da 'kon bûye, li dû ra navên sing, û sitûn û hebinên konan jî li sê rûknên Erûzê yê binêşeyî kirine.“<sup>17</sup>

Di cilda yekem ya *Dânişnâme-yê Cehân-ê Îslâmî* da li jêr peyva beytê weha hatîye: „Di zimanê Erebi da ji du misra'ên helbestê ra beyt dibêjin. Di zimanên Samîyan da ji kon û çadirê koçeran û xanîyan ra beyt gotinê... Ereban beyta şê'rê (helbestê) wekandine/şubandine beyta şê'irê (mû) û rîşala wê peyvê bi beyta mûyîn (kon û çadirên Ereban ku ji mû çê dikin.) ra peywendîdar zanîne. Hegera wê jî ew e, çawa ku beyta şê'irê (helbestê) gotinê hildigire, beyta şê'irê (mû) jî wisan kesên ku tê da dirûnên hildigire. Lewra ji pişkên ku beyteke helbestê serrast dikin ra esbab û ewtad gotine.“<sup>18</sup>

Di *Dairetu'l-me'arif-ê Bozorg-ê Îslâmî* da beyt weha hatîya nasandinê: „Beyt di edebîyatê da biçûktirîn yekîneya helbesta klasîk e. Her beytek ji du pişkên hev kêş pêk tên, ku jê ra misra' dibêjin.“<sup>19</sup>

Abdurrahman Adak peyva beytê weha şirove dîke: „Beyt peyveke bi Erebi ye ku wateya wê ya ferhengî xanî ye... Wek têgeheke edebîyata klasîk beyt ew yekeya helbestê ye ku ji du misrayên hev kêş û hevgirtî pêk tê.“<sup>20</sup>

<sup>17</sup> Qeys er-Râzî, Şemseddîn Muhemed, *el-Mu'cem fî me'ayiri eş'aril-'Ecem*, Beyrût 1909, r. 15.

<sup>18</sup> Fişârekî, Muhammed, „Beyt“, *Dânişnâme-yê Cehân-ê Îslâm*, cild 1. 2364.

<http://lib.eshia.ir/23019/1/2364>

<sup>19</sup> Şâygânfer, Heyder Rîzâ, „Beyt“, *Dairetu'l-me'arif-ê Bozorg-ê Îslâmî*, XIII, 271-272;

<https://www.cgie.org.ir/fa/publication/entryview/8253> (Gihan: 04.11.2019/09:57)

<sup>20</sup> Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, r.98.

Em dibînin ku di van jêderana da tenê çemk û wateya beyta Erebî li ber çavên lêvekolan bûye, ne beyta Kurdî. Lê em serekî li wan jêderan bidin yên ku mijara lêkolîna wan li ser beytê bi çemka wê ya Kurdî bûye, da ku bizanin bîr û boçûnên wan di vê bareyê da çî ye?

Ehmedê Şerîfî (1945-2015) di lêkolînên xwe yên li ser beytên Kurdî da li ser peyva beyta Kurdî weha dinivîse:

„Peyva beytê di zimanê Kurdî da di gel peyva beytê ya toreyî ku di zimanê Farsî da rayic e û bi wateya du misra'ên helbestê ye, cuda ye û beyta Kurdî hindêk caran mesnewîyeke dirêj e ku ji sedan dubeytîyan<sup>21</sup> serrast dibe...Beyta Kurdî bi şêweyeke têkelaw ji helbest û pexşanê pêk tê.“<sup>22</sup>

Hejar Mukrîyanî (1920- 1991) di ferhenga *Henbane Borîne* da, beytê weha şirove dike: “Beyt: çîroka helbestkî, hewa/miqamê istiranê.“<sup>23</sup>

Di ferhenga Herman da li jêr navê beytê weha hatîye: “ 1- Çîrokeşê'ira folklorî (Ayînî, Dildarî, Mêjûyî û...) li ser hewayaya taybeta xwe ku ahengsazên wan dîyar nîn in û piştawpişt gehîştine destê me. 2- Her çîrokeşê'ira ku li ser hewayaya/miqama beytê hatibin dananê û heman mebest jî di wan da hebin û danerên wan jî dîyar bin ka kê ne, yan kê bûne: Beytên Elî Berdeşanî, Beyta Mem û Zîna Xanî.<sup>24</sup> 3- Qiseyên dûr û dirêj û bêmane. 4-Xetek şê'ir ku ji du misr'an pêk tê...Têbînî: gelek gotin li ser peyva beytê heye. Hindekan ew birine ser beyta Erebî, hindêk li ser wê hizrê ne ku ji peyva beyatê ra hatîye. Bi bawerîya min beyt debê li pada evêstayî bi maneya şê'ir hatibe û li zimanên Awropayîyan da “poet“ bi maney şa'ir her ji wê rîşeyê ye. Herwa dûr nîne berîya Îslamê beyt weke horeyê aheng û hewayeke mezheb jî bûbe û li dû ra ew pişka nemabe û ez dûr jî nabînim ku beyat û beyt her yek bûbin, yan xudanê yek serçaweyê bûbin.“<sup>25</sup>

Marif Xeznedar di pirtûka xwe ya *Mêjûy Edebî Kurdî* da li ser beytê weha dinivîse: “Beyt li endaze û qewareya xwe da zor dirêj e, zimanê wê zimanê millî ye û risteyên wê sade ne, zorbeya xelkê jê fam dikin. Kêşa wê xomalî ye û qafiyeyên wê rengareng in. Ji bendan pêk tê ... Beyt wekî babeteke çîrokeşê'irê zortir bi mebesta istirangotinê hatîye dananê û xerîkî

<sup>21</sup> Ya rast ne dubeytî lê beyt e, dibe ku şaşî ya weşangehê be.

<sup>22</sup> Şerîfî, Ehmed, „Ustûrehâ ve Efsânehâ-yê Kurdî“, *Feslnâme-yê Ferheng-ê Merdom-ê Îrân*, Şomârehâ-yê 7 ve 8, behâr 1386 hş., r. 104-106.

<sup>23</sup> Şerefkendî, Ebdurehman, „Beyt“, *Henbane Borîne*, weşanxana Sirûş, Tehran 1369, hş.

<sup>24</sup> Beyta Mem û Zînê ne ya Xanî ye, berewajî wê Xanî Mem û Zîna xwe li ber beyta gelêrî ya Mem û Zînê nivîsiye.

<sup>25</sup> Nanewazade, Elî, „Beyt“, *Ferhengî Herman*, Bergî Yekem, Wezaretî Perwerde, Hewlêr 2005, r. 466.

dildarî û xoşewîstî û siruştê ye. Herwisan rûdanên mêjûyî û qehremanîyetî û pehlewaniya netewî li şoriş û ceng û bergirîya ji nîştiman vedigêre...”<sup>26</sup>

M. L. Chyet, di ferhenga *Kurmancî-İnglîzî* da peyva beytê wehe şirove dike: “Beyt 1) rêzek ji helbestê 2) sirûdên ayînî yên Êzdiyan : „Qewl û Beytê Êzdiyan“ 3) romans, corek çîrok, çîrokehelbest, çîrokên ku bi zarkî têne gotinê, hemû yan bi helbestî ne, yan jî ji têkelawîya helbest û pexşanê pêk tîn.”<sup>27</sup>

Di *Dânişnâme-yê Cehan-ê Islâm* da bi qelesa Emîrê ‘Hesenpûr (1918-1985), li jêr madeya „Beyt“ ê da weha hatîye:

„Beyt curek hunera gelêrî û xocîyî ya Kurdî ye. Wekî çîrok yan hikayetên Azerbayîcanî, istiranên gelêrî yên İnglîzî, Iskatlendî ye ... Beyt dasitanke ku sîng be sîng (ji nîşekê bo nîşka dî) tê vegêranê û bi giştî weke istiran yan jî têkelawîyek ji istiran û gotinên asayî tîn vegotinê. Layê wê yê cuda ji dîtir istiranên Kurdî yên lîrîk (Heyran û Lawik) di binêşê da û bi curekî asayî di taybetmendîya wê ya çîrokî û dirêjbûna wê da ye. Ji ber hebûna teşeyeke helbestkî ya weke istiranan, bi curekî eşkere cuda ji dîtir çîrokên Kurdî ye...“<sup>28</sup>

Îsmâilê Şems li ser peyva beytê weha dinivîse: „Menzûmeyên çîrokî yên Kurdî ku mijara pişka zor ji wan evîn û mîrxasî ye. Dengbêjên Kurd van menzûmeyana bi aheng dibêjin...“<sup>29</sup>

Îsmâilê Şems li berdewamîya nivîsa xwe da ji zar Kirîstensen dinivîse:

„Beytbêjîyê bermaya sunneta dengbêjîya Îrana mêjîn dizanin. Beyt ji giringtirîn û resentirîn hêmanên edebîyata zarkî ya Kurdan e.“<sup>30</sup>

Vassili Nikitine di pirtûka xwe ya bi navê *Kurd û Kurdistan* da li ser edebîyata gelêrî ya Kurdî û beyta Kurdî weha dinivîse: „Tiştê ku di lêkolîna li ser edebîyata Kurdî da mirovî zendegirtî dike, pêşketina ji radebidera folklorê wê ye... û lawij yan beyta Kurdî ku weke helbestên lîrîk in... baştirîn wesîle ne ji bo nîşandana zewqê şa‘iraneya Kurdan.“<sup>31</sup>

Bi pêka hemû kesên ku li ser edebîyata gelêrî ya Kurdî xebitîne, beyt yek ji zengîntirîn şax û çiqên edebîyata gelêrî hatîye hejmarê. Hebîbullehê Tabanî li ser beytên Kurdî weha dinivîse: „Edebîyata gelêrîya Kurdî zortir li ser şaxeya lawije û beytan hatîye damezirandinê ku ji cuwantirîn peyvên evîndarîyê û çîrokên atîfî yan efsane û çîrokên hemasî û qehremanî

<sup>26</sup> Xeznedar, Marif, *Mêjûy edebî kurdî*, Hewlêr 2001, r. 169

<sup>27</sup> Chyet, M. L., „Beyt“, *Kurdish- English Dictionary, Ferhenga Kurmancî İnglîzî*, Yale University press, USA, 2003.

<sup>28</sup> Hesenpûr, Emîr, „Beyt“, *Dânişnâme-yê Cihân-ê Islâm*, (mâdde-yê Beyt 2) cild 1, s. 2365.

(<http://lib.eshia.ir/23019/1/2365>) Gigan 19.02.2020/11.11.

<sup>29</sup> Şems, Îsmâil, „Beyt-ê Kurdî“, *Merkez-ê Dâiretu ‘l-me ‘arif-ê Bozorg-ê Islâmî*

(<https://www.cgie.org/fa/article/153284/>): Gihan: 03.11.2019/22:13.

<sup>30</sup> Şems, hb.

<sup>31</sup> Nikitine, Vassili, *Kurd ve Kurdistan*, wer. Qazî, Muhemed, Kânûn-ê Ferhengî-yê Intişarî-yê Derâyet, çapê sevom, Tehran 1378, hş., rr 499 û 504.

pêk tên, ku heryek efsaneyeke pehlewani yan bûyereke dîrokî vedigêrin û bi şeweyên helbestî û pexşanî ji nifşekê bo nifşa dî tên veguhestinê...”<sup>32</sup>

Em dibînin ku pişka zor ya zimannas û lêvekolan li ser wê hindê ne ku beyta Kurdî û ya Erebî “beyt بيت” ji hevdu cuda ne. Elî Nanewazade li ser wê bawerê ye ku peyva beyt dibe ku ji peyva pad ya evêstayî ku wateya helbestê dide, hatibe.<sup>33</sup> Reng e dîtina E. Nanewazade rast be. Di devokên kurmancên hewzeya Furatê da jî ji peyva beytê ra „bêt“<sup>34</sup> dibêjin. Ku ew cure rabêja jî cîhê têrmanê ye.

Eva hindê agadarî li ser wateya ferhengî ya peyva beytê û taybetmendiyên wê bûn, lê pêdivî ye ku em bizanin kanê ev peyva di edebîyata Kurdî û Farsî da çawa hatîye?

### **B.3. Peyva beytê di nav mêjûya wêjeya Farsî û Kurdî da**

Jêderên mêjûya edebîyata Farsî û Kurdî yên berî Îslamê li ber destên me kêma in, lê gava ku em li ser mêjûya wêjeya Farsî û Kurdî ya piştî Îslamê dixebitin, em dibînin ku Kurdan û Farsan pêş da he ji hemû helbestan ra beyt gotine.

Bo nimûne Necmedînê Razî nivîskarê Îranî yê sedeya heftema hq. di pirtûka xwe ya bi navê *Mirsadu'l-Îbadê* da, dema ku li ser helbestên Omerê Xeyyam (1048-1131) dinivîse, li cîhê peyva şêrê, yan ruba'iyê da peyva beytê weha bi kar dibe: “Yek ji fazilên ku li bal nebînayan bi fezl û hikmet û zanebûnê bi nav û bang e û ew jî Omerê Xeyyam e ku ji ber zêdehiya sergerdanî û zelaleta xwe evê beytê dibêje.”<sup>35</sup>

Necmedînê Razî li dû vê nivîsara xwe ra du çarînen Ommerê Xeyyam dihîne. Wate beyt li bal wî wateya helbestê bi giştî û gelemperî dide.

Muhemed ibnê Munnewer (ss. 6. hq.) nebîyê Ebûse'îdê Ebulxeyr (967-1048. mî.) di pirtûka xwe ya bi navê *Esraru-Tewhîd* da zêde ji pêncî carî peyva beytê di wateya helbestê da diîne. Bo nimûne dema ku neyarên Ebûse'îdê Ebulxeyr li dijî wî raporê didin, dinivîsin: “Mirovek ji Meyheneyê hatîye vira û idiaya sofitîyê dike, lê li ser menberê beytan dibêje, tefsîr û exbaran nabêje.”<sup>36</sup>

Nizamîyê Genceyî hozanê sedeya şeşema hq. di mesnewîya xwe ya *Xosrew û Şîrîn'ê* da di malîkekê da peyva beytê bi kar dibe.

<sup>32</sup> Tâbânî, Hebibullâh, *Vehdet-ê Quwmî-yê Kurd ve Mâd: Menşe-ê Nejâd ve Târîx-ê Temeddun-ê Kurdistan, Neşr-ê Gusterdê*, Tehran 1380 hş., r.433.

<sup>33</sup> Nanewazade, hb.

<sup>34</sup> BMZ. rê.639, di pişka yekem ya vê lêkolînê!

<sup>35</sup> Râzî, Necmuddîn, *Mirsâd 'ul- 'ibâd*, Şirket-ê Intişârât-ê 'İlmî ve Ferhengî, Tehran 1391hş., s.18.

<sup>36</sup> Ibni Munnewer, Muhemmed, *Esraru-Tewhîd* tes. Şefî'î-yê Kedkenî, Muhemmed Rizâ, weblâg-ê Ferheng û Edeb-ê Îranî. s. 68-69. <https://t.me/farhangoadabeirani>

Dema ku Xosrewê Sasanî peyayekî dişîne bal Ferhadî, da ku wî bixapîne û bêjê ku dest ji karî bikêşe, Şîrîna te mir, peyak dîna xwe didê ku Ferhad wa ye beytekê li ser Şîrînê dibêje:

از آن آتش که در جان و جگر داشت  
نه از خویش و نه از عالم خیر داشت  
به یاد روی شیرین بیت می گفت  
چو آتش تیشه می زد کوه می سفت<sup>37</sup>

*“Ji arê ku can û cergî da hebû*

*Haya wî ji xwe û cîhanê nebû*

*Di bîrîya Şîrînê da BEYT digohtin*

*Wek agir paç diweşand çîya dinohtin”*

Ev peyva ku Nizamî bi kar birîye cîhê balkêşîyê ye.

Di gel bi karbirina peyva beytê ji zarê Nizamî ra, mirov dikare bêje ku Nizamî durust ew peyva bi vê çemka ku em Kurd îro bi kar dibin xebitandîye. Lewra bi pêka metna vê helbesta Nizamî ra, ku li jêrê tê, em agahdar dibin ku ji sedî sed dayîka Nizamî Kurd bûye:

گر مادر من رئیسۀ کرد  
مادر صفتانہ پیش من مرد<sup>38</sup>

*Çawa ku dayîka min ew seroka Kurd*

*Wek dayîkekê li ber min da mird*

Nizamî ku di nav edebîyata dasitanbêjîya Farsî da hostayê hemû dasitanbêjan e, ma nabe ku li ber destê dayîka xwe pêş da fêrî gotina beytên Kurdî bûbe û li dû ra li jêr kartêkirina beytên Kurdî da ev dasitanên weha balkêş vehûnabine? Bi her cureyî Nizamî peyva beytê weke çemka wê ya îroyîn di edebîyata Kurdî ya zarkî da bi kar dibe.

Ehmedê Şerîfî (1945-2015) di gotarekê da dinivîse ku Nizamî *Leylî û Mecnûna* xwe li jêr kartêkirina Beyta Mem û Zînê ku ji dayîka xwe fêr bûye, nivîsîye: “Bi dîtina nivîskar, di gel liberçavgirtina vê hindê ku Nizamî helbestkarekî Îranînejad e û li malbata Xalo Omerê Kurd da perwerde bûye, dibe ku ewî çîrok û menzûmeya folklorîka Mem û Zînê zanibe û bihîstibe û fezaya wê çîrokê ji bo afirandina mesnewîya Leylî û Mecnûnê guncaw zanibe û helbestên Erebi yên Qeys û Leylîyê tîkelî Mem û Zînê kiribe û mesnewîya Leylî û Mecnûnê afirandibe.”<sup>39</sup>

<sup>37</sup> Gencewî, Nizâmî, *Kullîyât*, tes. We’hid-ê Destgirdî, Çap-ê Dovom, Intişârât-ê Bêhzâd, Tehran 1381 hş., s.193.

<sup>38</sup> Gencewî, hb. r. 318.

<sup>39</sup> Şerîfî, Ehmed, “Muqâyise-yê Beyn-ê Mesnevî-yê Mem û Zîn-ê Ehmed-ê Xânî ve Leylî ve Mecnûn-ê Nizâmî”, Portâl-ê ‘Ulûm-ê Islâmî, *Ferheng*, pâyîz, sâl 1371 hş., Şomâre 10, rr. 247-258.

Di lêkolînên meydanî û pirtûkxaneyî da em dibînin ku Kurdan zemanekî ji hemû helbestan ra beyt gotine. Ji bo mînak, em dizanin ku helbestên Feqîyê Teyran ( ss.16. mî. w. 1041 hq. ) ji şeweya nivîskî ra derbasî şeweya zarkî bûne.<sup>40</sup> Ta roja îro jî ji hemû helbestên wî yên çîrokî û qesîdeyên wî yên dirêj ra beyt dibêjin. Weke: Beyta Zembîlfiroş, Beyta Bersîsê ‘Abid, Beyta Şêxê Seni’anê, Beyta Dilî (Dilo rabe) û yêd mayîn.<sup>41</sup> Lê bere bere peyva beytê ku pêş da ji hemû curên helbestan ra dihate gotinê, tenê ji hindê qesîdeyên dînî û çîrokehelbestan ra hatîye gotinê û bûye çemkeke taybetî ji çîroke toreyê ra. Herçiqas ku ta niha jî gel ji gelek qesîdeyên dînî ra jî beyt dibêjin, lê beyt weke çîroke toreyê ya serbixwe ji curek ji çîrokehelbestên gelêrî ra têne gotinê û bûye janreke toreyî ya serbixwe û ji çiqên dî yên edebîyata gelêrî cuda bûye. Ji bo pênaseya beytê weke çîroke serbixwe, beytbêj bixwe jî gelek caran dema ku dest bi gotina beytekê dîkin, dibêjin em ê ji we ra beytekê bêjin, yan dema ku beyta wan kuta dibe, dibêjin me ji we ra beytek got. Weke beytên: *Ebas Axa û Mihemed Henîfe, Mîrzam Qelay Xaw, Awrehman Paşa, Sultan Ehmedê Bênar*.<sup>42</sup> He di dawîya vê Beyta Mem û Zînê da jî beytbêj ewê weke bêt bi nav dîke: “*Go va bêta Zînê*.”<sup>43</sup>

Di encama van lêkolînan da em dikarin taybetmendiyên beytê li bara darêjka ruxsarî da weha pênase bikin:

Beyt çîrokekê vedigêre, lê ew çîrok devkî nîne bi deng e.

Beyt weke istiranekê bi miqam û aheng û bi deng tê gotinê, lê istiran jî nîne, lewra barê çîrokîyê di istiranê da kêmtir û di beytê da gelectir e û ev hinda yek ji xalên cudakerên istiran û beytê ye. Beyt istiranek e, lê çîroka wê dûr û dirêj û şiroveya wê berfireh û qehremanên wê ji yên istiranekê zêdetir in.

Beyt weke qesîdeyekê dûr û dirêj e, lê ne qesîde ye jî. Hemû malikên qesîdeyê hev kêş in, lê hev kêşî di nav rêzikên beytê da tune ye. Yekîneyên hejmartina qesîdeyan malikên helbestê ne, lê yekîneyên hejmartina beytan rêzik û bend in. Bi gotineke dî beyt ne bi malik û misra’an lê bi rêzik û bendan tên parvekirinê.

Serwa di beytan da rengareng e. Zimanê beytê sade û sakar û gelêrî ye.

<sup>40</sup> Bi pêka naveroka Mem û Zînê, Ehmedê Xanî (1650/1-1707) şahesra xwe Mem û Zîn ji edebîyata folklorîk vergirtîye, lê berevajî wî, berhemên Feqî ji nivîskî ketine nav zarê gel û bûne edebîyata gelêrî. Gawayê vê bîrokeyê ew beytên folklorîk in, ku metina wan weke beytên Feqî ne, lê li ber nexwandewariya beytbêjan gelek caran kêş wan aloz û serwaya wan hatine têkelkirinê. bnr. Ordîxanê Celîl- Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda II*, Çapa Sêyem Amed 2013, „Feqîyê Teyran û av“: Herê avê herê avê, Kê ra dikî vê t’uabê, r.76. – „Feqîyê Teyran û Evîntî“: Ha hûn werin, lêzim werin, Cîran û xelqê hêcatê, r. 82. „Feqîyê Teyran û Şîretê dilî“: Dilo rabe ji vê lewme, tu li nefesê bike t’ehmê, r. 86. (di van nimûneyana û gelekên dî da em dibînin ku helbestên Feqî ji layê kesên ku ew li ber kirine hatine destkarîkirinê û berhemên wî yên nivîskî kirine nav berhemên folklorîk da.)

<sup>41</sup> Dêreşî, Se’îd, *Dîwana Feqîyê Teyran*, Dezgeha Sipîrêz, Hewlêr, 2005, rr. 31-44.

<sup>42</sup> Berzîger-ê Xâlîqî, Muhemed Rizâ „Âşîqane hâ-yê Kurdî“, *Feslnâme-yê ‘Ilmî Pijûhişî-yê Kâwîşnâme*, sâl 10, Şomâre 18, 1388 hş., rr. 207-208.

<sup>43</sup> BMZ.rê. 639.

#### **B.4. Beytên Kurdî ji Alîyê Naverokê va**

Çiq/şaxa beytan bi xwe li bara naverok, mijar û babetan va dibe çendîn şaxeyên cur be cur. Mezher Îbrahîmî li gotarekê da ji zar Rehber Mehmûdzade va li ser beytê û cur û celebên wê weha dinivîse: „Beyt wek janera here giring û taybetî edeba zarkîya Kurdî, estûna berza koşka wêjeya zarkî û isbatkera dewlemendîya vê edebê ye. Beyt ji layê naverokê va zortir serpehatîyên dildarî, hemasî, mîjûyî, ayînî û irfanî vedigêrin û li ser forma beytê gotine ku, beyt li du pişkên text û bend pêk tê...“<sup>44</sup>

Bi giştî beytên Kurdî li ser van şax û çiqana par ve dibin: Pehlevanî, Evîndarî, Tirajêdî, Mêjûyî, Ayînî, Irfanî, Pêkenokî, Temsîlî/Fêrkarî...<sup>45</sup>

Bo nimûne:

**Pehlewanî** (Hemasî/epîk/şeranî/mêranî): Beyta Rostemê Zal

**Evîndarî**: Beytên Mem û Zînê, Ferx û Sitîyê, Las û Xezalê, Birayîmokî...

**Tirajîkî**: Beyta Seydewanî, Beyta Çûkele Suwar û ‘Ayşe Gulê, Beyta Xec û Sîyabendî...

**Mêjûyî**: Beyta Dimdim, Beyta Hemze Axayê Mengur, Beyta Şêx Şehabedîn<sup>46</sup>

Beyta Bedirxan, Beyta Samsam, Beyta Şêx Se’îdê Pîran...

**Ayînî**: Sîseban, Mihemed Henîfî, Hespê Reş, ‘Xewsê Gêlanî...

**Irfanî**: Beyta Zembîlfiroş

**Pêkenokî**: Beyta Kêçan, Beyta Kîselan...

**Temsîlî/Fêrkarî**: Beyta Kel û Şêr,<sup>47</sup> Beyta Kewan

#### **B.5. Beytên Kurdî ji Alîyê Ruksarî va**

Bi giştî di vê barê da em dikarin beytên Kurdî li ser sê pişkan par ve bikin:

Beytên helbestkî yên yekkêş û çendserwa

Beytên helbestkî yên çendkêş û çendserwa

Beytên nîvhelbest û nîvpexşan

<sup>44</sup> Îbrahîmî, Mezher, „Dariştenasî Beytî Mem û Zîn û Berawirdkirdinî Hêmane Giringekanî le Gel Çîrokî Efsûnawîyî Kurdî da“, *Pijûhişnâme-yê Edebîyât-ê Kurdî*, dewre-yê pencom, Şomâre-yê 6. pâyîz û zemistân 1397 hş., r. 188. (Têbînî: bi dîtina me peyva text li vir heman peyva Almanî ya têkst e, ku bi şeweya TEXT tê nivîsinê û bi şaşî bi telefûza Kurdî hatîye xwandinê û têkst bûye text.)

<sup>45</sup> Mikâyîlî, Hosein, „Beyt der Edeb-ê Folklor-ê Kurdî“, *Pijûhişnâme-yê Edebîyât-ê Kurdî*, sâl-ê evvel, Şomâre-yê 1, pâyîz 1394 hş., r.55.

<sup>46</sup> Ev beyta di nav gel da heye û bi vê şeweyê dest pê dibe: “Çûm Bitlîsê gelî bi gelî, Jê derketin cotek welî, Şêx Şabedîn Seyid ‘Elî... (Dengbêj Ozan Şemdîn jî evê beytê dibêje. )

<sup>47</sup> Fetâhî Qâzî, Qâdir, „Menzûme-yê Kurdî, Kel û Şêr“, *Mecelle-yê Dânişkede-yê Edebîyât ve ‘Ulûm-ê Însânî*, Dânişgah-ê Tebrîz, 1357 hş., Şomâre 136, rr. 205-236.

## **B.6. Beytên yekkêş û çendserwayî**

Beytên ku ji serî ta dawîyê wekî helbesteke nivîskî xudanê yek kêşê û serwaya azad in. Wekî: Sîseban, Kel û Şêr, Yûsif Pêximber/Ûsibê Nebîya, beyta Hetem...<sup>48</sup>

## **B.7. Beytên çend kêş û çend serwayî**

Hindek ji beytan jî ji çend bendan pêk tên û her bendeke wan xudanê kêş û serwayeke cuda ye. Kêşên bendan û rêzikên di van cure beytana da ne wekî hev in. Wek: Mêhr û Wefa,<sup>49</sup> Siwaro, Şêx Mend û Şêx Reş,...

## **B.8. Beytên nîv helbest û nîv pexşan**

Hindek beytên Kurdî jî hene ku beytbêj di gel şêweya helbestkî di nav ra car û bar ji bo şiroveyê hindek agahdarîyan devkî wate pexşankî jî dibêjin. Hindek caran jî he nîvê van beytana bi deng û nîvî jî devkî tene gotinê. Wek: Beyta Şêxê Sen'an, ya bi zareveyê Soranî, Mem û Zîn, Ferx û Sitî...

# **C. EDEBÎYATA KLASÎK**

## **C.1. Pênase û Teşeyên Edebîyata Klasîk**

Gava ku mirov peyva klasîk dibihê, zortir edebîyata kewin xwe di serê mirovî da cî dike. Lê ne tenê ji bo kewinbûnê ew nav lê kirine, belkî ji ber wê hindê navê wê bûye klasîk, ku li pileya xwe da bilind e, xudanê rê û rêbaz û qaide û destûrên taybetî ye û nabe ku ji wan rê û rêbaz û destûrên ku jê ra hatine dananê derkeve. Hegereka dî ya vê navlêkirinê jî ew e, ku ev cure edebîyata di kilas wate di polên xwendinê da weke nimûneyên here bilind ê fêrbûn û fêrkirinê hatine û dihêne xwendinê.

Edebîyata klasîk li bara ruxsarî da dibe du celebên: Klasîka vehûnandî, yan helbest, klasîka piroze yan pexşan.

Helbesta klasîk di nav xwe da li bara teşeyê da li ser çendînan nava parve dibe. Ji wan em dikarin van navana bihejmêrin: 1. Qesîde 2. 'Xezel 3. Mesnewî 4. Ruba'î/Çarîn 5. Dubeytî 6. Ferd 7. Qetiê 8. Mustezad 9. Terkîbê Bend 10. Tercî'ê Bend 11. Musemet 12. Tezmîn û... Ji bilî van teşeyana ku di edebîyata gelên rojhelata navîn da hevparin, di Kurdî da sêxiştî û 'hezlemesnewî jî hene. Jêdera sereke ya sêxiştîyan folkora Kurdên Xorasanê ye.

<sup>48</sup> Kaplan, Yaşar, *Beyt û Destanên Kurdî*, Nûbihar, çapa yekem, Istanbul 2019, rr.249-270 û 309-325.

<sup>49</sup> Fetâhî Qâzî, Qâdir, *Gencîney beytî Kurdî*, çapî yekem, Hewlêr 2007, rr. 243-286.



‘Xezelmesnewî jî taybetî zaraveyê Goranî ye, ku helbestên evîndarîyê yên Mewlewîyê Tawegozî nimûneya here bilind ya vê teşeyê ye.<sup>50</sup>

Çun binêşa vê lêkolîna me mesnewî ye, em pêdivî dizanin ku li vir mesnewîyê bidine nasandinê.

## C.2. Mesnewî

Mem û Zîna Hewramî dikeve nav pişka edebîyata klasîk û bi teşeya mesnewîyê hatîye nivîsînê. Lewra pêdivî ye ku bi kurtî be jî li ser peyva mesnewîyê agahdarî bêne dayîn.

Mesnewî (مثنوی) mensûba mesnayê ye û wateya wê du lib du lib e. Ew nezmek e ku her malikeke wê ji du nîvmalikên hevserwa û hevkeş pêk tê û malikên wê yên dî bi heman kêşê lê bi serê xwe xudanê serwayên cuda ne. Ji mesnewîyê ra muzdewec jî dibêjin. Mesnewî zortir li behrên Remel, Recez û Hezecê da têne nivîsînê...<sup>51</sup>

Hesenê Enverî di *Ferheng-ê Bozorg-ê Suxen* da li ser peyva mesnewîyê weha dinivîse:

“Mesnewî mensûba musennayê ye, ew helbesteke ku ji du misra’ên hevserwa pêk tê. Her malikeke wê bi serê xwe hevserwa ye, malikên wê yên dî bi serwayên cuda ne, lê hemû malik xudanê yek kêşê ne.”<sup>52</sup>

Mesnewî curek ji nezmê ye, ku di kêşê da yek, lê her malikeke wê di serwayê da serbest e. Çunku hejmara malikên wê sînordar nîne, lewra ji bo nivîsîna dîrok, çîrok û efsaneyên dirêj teşeyeke kêrhatî ye.<sup>53</sup>

Bi giştî ji bo nivîsîna van çar babetana ji teşeya mesnewîyê wec tê wergirtinê: 1. Çîrokên hemasî û dîrokî 2. Çîrokên evîndarîyê û sofîyane 3. Fêrkarîyên ‘irfanî 4. Mijarên fêrkarîyê, şîretî û exlaqî... Mesnewî taybetî edeba Farsî ye û di edebîyata Erebî da kêmrwak e.<sup>54</sup>

Serbestîya serwayê di teşeya mesnewîyê da ewê şîyanê dide helbestkaran ku bi dûrî û dirêjî li ser babetekê binivîsin. Ji bilî çîrokên hemasî û evîndarîyê û serhatîyên dirêj, mewlûdname, şîretname, şerî’etname, gaze/munacat û peyamên fêrkarî û hizrî û kurteçîrokên ji bo zarokan, kurteçîrokên temsîlî jî di qalibê mesneviyê da têne darêjtinê.

<sup>50</sup> Ji bo agahîyên berfireh bnr. *Teşeyên Nezmê*, A. Adak.

<sup>51</sup> Dêhxuda, ‘Elî Ekber, „Mesnevî“, *Luxetname.yê Dêhxuda*.

<sup>52</sup> Enverî, Hesen, “Mesnev” *Ferheng-ê Bozorg-ê Soxen*, çâpxane-yê Mehâret, çâp-ê duvom Tâbistân-ê 1382.hş., s. 6690.

<sup>53</sup> Homâyî, Celâleddîn, *Funûn-ê Belâ’xet ve Senâ’ât-ê Edebî*, Nâşir Ehûrâ, çâp-ê Evvel, Tehran 1389 hş., s. 108.

<sup>54</sup> Şemîsa, Sîrûs, hb. s. 331.

### C.3. Pişkên Mesnewîyê yên Giring

Pişka zor ji mesnewîyan weke vê mesnewîya Mem û Zîna Hewramî, çîrokên evîndarîyê ne. Di vehûnandina mesnewîyên çîrokî da weke rêbazeke edebî hatiye pejirandinê ku mesnewî pêş da bi munacatê dest pê dibe. Helbestkar pêş da bi medh û sitayiş û pesinê Xwedê û lavayî û gazîyan û daxwaza arîkarîyê ji Xwedê pirtûka xwe dest pê dibe, ku ji vê bendê ra tehmîdiye dibêjin û li dû ra bendekê yan çend bendan li ser pêxemberê Îslamê dx. û li ser çariyaran û îmaman û li ser rêbaza xwe ya ayînî dinivîse. Li dû ra helbestkar pesna padişah yan mîrê welatê xwe dide.<sup>55</sup> Li dû pesnê mîr yan padişahî ra sebebê teilîfa mesnewîyê tê nivîsîn. Li dû van bendan hemûyê ra helbestkar dest bi çîrokê dibe û di dawîyê da jî ixtitamîyeyê dinivîs.

Bi giştî em dikarin pişkên mesnewîyê yên giring weha bidin rêzê:

1. Besmele 2. Tehmîd 3. Tewhîd 4. Munacat 5. Ne't 6. Medhîye 7. Mê'racîye/ Şefa'et 8. Sebebê Teilîfê kitabê 9. Saqîname 10. Mu'xenîname 11. Çîroka mijarê 12. Ixtitamîye<sup>56</sup>

### C.4. Mesnewî di Edebîyata Kurdî da

Di zimanê Kurdî da mesnewî wek berhema serbixwe cara pêşîn di Kurdîya Goranî da derdikeve pêşîya me. Mela Perîşanê Dînewerî (w.1421. mî.) berhema xwe ya bi navê *Perîşannameyê* di sedsala XVem da bi teşeya mesnewîyê nivîsîye.<sup>57</sup>

Li dû zaraveyê Goranî ra mesnewî bi zaraveyê Kurmancî tîn nivîsînê. Yekemîn mesnewîya Kurmancî bi navê Mem û Zînê ji layê Ehmedê Xanî (1650/1-1707) va hatiye nivîsînê. Li dû ra di sedeya bîstem da mesnewî bi zaraveyên Soranî û Zazakî hatine nivîsînê.

Di edebîyata Kurdî da nivîsîna helbestan bi teşeya mesnewîyê ji sedeya XV ra bi destê Mela Perîşanê Dînewerî ra dest pê dibe.<sup>58</sup> Ta niha bi dehan mesnewî bi hemû zaraveyên zimanê Kurdî hatine nivîsînê. Pişka zor ji van mesnewîyana çîrokên evîndarîyê û yên mêranîyê ne. Ji bilî çîrokan di mijarên ayînî, civakî, fêrkarî, edebîyata zarokan û edebîyata berxwedanê da jî gelek helbestên Kurdî bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsînê, Lê yên ji hemûyê naskirîtir evana ne:

#### C.5. 1. Bi Goranî/Hewramî

1. Mela Perîşan: Perîşanname

<sup>55</sup> Cîhanî, P. , *Şiroveya Mem û Zîna Xanî*, Pêşgotin, Weşanên Sipîrêz, Duhok 2007, r. 17.

<sup>56</sup> Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê*, hb. r. 273-315

<sup>57</sup> Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê*, hb. r. 252

<sup>58</sup> Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê*, hb. r. 252

2. Xanayê Qubadî: 1.Xosrew û Şîrîn- 2. Leylî û Mecnûn 3. Yûsif û Zuleyxa 4. Sultan Ibrahîm 5. Nûşaferîn 6. Iskendername <sup>59</sup> 7. Heftbendî Xanay Qubadî<sup>60</sup>

3. Elmas Xanê Kendoleyî: 1.Nadirname ...

4. Mula Nûrullah Xanê Kendoleyî: 1. Xurşîd û Xawer/Xurşîdê Xeraman

5. Mustefa ibni Mehmûd Goranî Şahnamey Kurdî (Cewahir pûş- Bîjen û Menîje)<sup>61</sup>

6. Mela Muhemed Quliyê Kendoleyî, Leyla û Mecnûn, sala nivîsînê

7. Mîrza Şefî'ê Kuliyayî, Leyla û Mecnûna sala nivîsînê

8. Mela Weledxan, Leyla û Mecnûn. sala nivîsînê

9. 'Ebdulqadir Debayan, Leyla û Mecnûn, sala nivîsînê

10. Mem û Zîn navê nivîskar û sala nivîsînê dîyar nîne

11. Mîrza, Mem û Zîn, sala nivîsînê dîyar nîne.

12. Şanamey Kurdî, çîrokî Rostem û Zorab <sup>62</sup>

13. Rostemname... Hejmara Şahname û Rostemnameyan di vî zaraveyî da gelek in û helbestkarê pişka zor ji wan jî nenaskirî ne.

14. Heftxanî Rostem

15. Behmen û Feramerz

16. Rostem û Isfendiyar <sup>63</sup>

17. Mewlewî Tawegozî, 'Eqîdeyê Merzîye...

Mirov dikare bêje ku hema hemû helbestkarên Goranî pişka zor a berhemên xwe bi teşeya mesnewîyê nivîsîne. Di vî zaraveyî da 'xezel û helbestên evîndarîyê jî zortit bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsînê. Bi gotineke dî hejmara mesnewîyan di vî zaraveyî da gelek in.

### C.5.2. Bi Kurmancî

1. Ehmedê Xanî: 1. Eqîda Îmanê 2. Mem û Zîn

2. Selîmê Silêman: Yûsif û Zuleyxa

3. Sewadî: Leylî û Mecnûn

4. Sîyapoş: Seyfulmulûk

5. Melayê Bateyî: Mewlûdnam

6. Mela Xelîlê Sêrtî: Nehculenam

7. Şêx Abdurrehmanê Aqtepî: Rewdu'n Neîm

8. Şêx Mihemed Can: Leyla û Mecnûn

9. Şêx Eskerî: 'Idê Dûrfam

<sup>59</sup> Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê*, hb. r.253

<sup>60</sup> Borekeyî, Sefizade, Sedîq, *Mêjûy wêjey Kurdî*, Intişarat-ê Nacî, Bane Kurdistan, çap-ê ewwel 1370, hş., cild ewwel, r. 447

<sup>61</sup> Behrâmî, Îrec, *Şahnâme-yê Kurdî*, çâpxane-yê Heyderî, çap-ê ewwel, Tehrân, 1383 hş.

<sup>62</sup> Şanamey Kurdî, *çîrokî Rostem û Zorab*, Amadekirdinî Sîyaweş Goderzî, Apec, sal 2013, Sweden

<sup>63</sup> Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê*, hb. r. 253.

10. Feqe Reşîd: 1. ‘Huneynîye 2. Sirru’l- Mehşer 3. Cîhanşah

11. Şêx Tahirê Şûşî: Gulzar

12. Cegerxûn: Şerefnameya Menzûm

13. ‘Hecî ‘Ebdulfettahê Hezroyî: Leyla û Mecnûna

14. Mela Muhemedê Hezanî, Leyla û Mecnûn

Ji bilî van mesnewîyên naskirî gelek buharîye, şikwaîye, mersîye, med’hîye, fiqhname, ‘eqîdename, tewhîdname, û bi dehan mewlûdname bi Kurmancî hatine nivîsînê ku hanîna navê hemûyê ne gengaze.

### **C.5.3. Bi Soranî:**

1. Mela Ferec Salih Şekîb: Leyla û Mecnûn

2. ‘Elî Kemal Bapîr: Leyla û Mecnûn

3. ‘Ebdulcebbar Axayî Kanî: Leyla û Mecnûna <sup>64</sup>

4. Zarî: Leyla û Mecnûn<sup>65</sup>

5. Şêx Marif Nodêhî: Ferhenga Ehmedî

Ji bilî van mesnewîyana di edebîyata Soranî da gelek buharîye û şikwaîye û gernamhene ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsînê. Ji wan Naley Cudayî ya mamosta Hêmin, Berew Mukrîyan ya mamosta Hejar ji yên mayîn bi nav û bagtir in.

### **C.5.4. Bi Zazakî**

1. Melayê Xasî: Mewlûdname

2. Osman Efendî Babij: Mewlûdname

3. Mihemedê Şêx Ensarî: Raro Raşt û Me’lûmatê Dînîye

Ji bilî van mesnewîyana hindêk ‘eqîdename, fiqhname û siyer jî bi teşeya mesnewîyê bi zaraveyê Zazakî hatine nivîsînê. <sup>66</sup>

## **D. EDEBÎYATA BERAWIRDKARÎ**

Li ser Edebîyata Berawirdî û salixdana wê ta niha gelek dîtinên cur be cur hatine ragehndinê û van dîtinên cur be cur karê salixdana vê çîqa toreyê dijwar kirine.

---

<sup>64</sup> Adak, Abdurehman, *Kovara Wêje û Rexne*, hejmar 3, r. 99-109.

<sup>65</sup> Ebulqâsimê Radfer û Hivâ Hesênûr, *Pejûhişnâme Edebê ‘Xenâyî* Dânişgâhê Sîsîtan û Belûçîstân, Sâlê dewâzdehom, Şumâare-yê bîst û sevom, pâyîz û zemistânê 1393hş., r. 131-150.

<sup>66</sup> Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê*, hb. r. 258.

Li vir em ê li ser çend danasînan ku ji layê pisporên vê zanistê va hatine ragehandinê rawestin:

“ Edebîyata berawirdî zanistek e ku li ser lêkolîn û agahdarî ya peywenda nîveka edebîyata gelên cur be cur di gel hev û peywenda toreyê di gel huner û dîtir zanistên mirovî dixebite.”<sup>67</sup>

Herçiqas ku dihête gotin ev edebîyata li dawîya sedeya nozdehem da peyda bûye, lê gelek kes li ser wê bîr û bawerîyê ne, ku berîya hînga jî lêkolînên berawirdî li nîveka berhemên toreyî da hebûye. Bo nimûne Muhemmed Ebdusselam Kefafî di pirtûka xwe ya bi navê *Edebîyatê Tetbîqî* da dinivîse: “Herçiqas ku edebîyata tetbîqî wek zanistekê nû hatîye nas kirinê, lê ew nayê bi wê wateyê ku edebîyata berawirdî tiştêkî nû ye û berîya hînga tunebûye. Hêsgandin û daneberheva berhemên toreyî di toreyên cur be cur da he berê da hebûye. Bo nimûne di edebîyata Erebi da pirtûka Amêdî ya bi navê *Elmuwazene beyni Ebûtemam ve Elbuhterî* û pirtûka Curcanî ya bi navê *Elwusateti beyne Elmutenebî ve Xusûmihî* pirtûkên berawidkarîyê di edebîyata Erebi da têne hejmarê.”<sup>68</sup>

Bi pêka lêkolerên Firansî, cudatîya zimanî di nav berhemên toreyî da, mercê binêşeyî yê lêkolînên berawirdî ye. Lê paşê ev merca rûberûyî nerazîbûnên berfireh hat. Hindek kesên dijî vî mercî gotin ku ev merca dibe hegera pêvegirêdana gelên lawaz bi dewletên zilhêzên rojavî va.<sup>69</sup>

Bi derbasbûna sal û deman ra ew sînoren ku ji bo edebîyata berawirdî hatibûn danînê ji layê gelek nivîskar û lêvekolan va nehate pejirandinê û edebîyata berawirdî ne tenê helgirê hêsgandina nîveka berhemên du zimanan, belkû hêsgandin û daneberheva berhemên ku bi zimanekî hatine nivîsînê jî di nav xwe da dihebîne. Bo nimûne Zanistgeha Georgia ku yek ji zanistgehên navdarên Eyaletên Hevgirtîyên Amerîkayê ye, evê şaxeyê weha dide nasandinê:

„Edebîyata Berawirdî lêkolîna li ser taybetmendîyên hevpar di tore, sînema û dîtir cureyên berhemên çandî/ferhengî yên di nav sînoren neteweyî û navçeyî da ye. Bi nêrîneke navçandî, navqadî û navneteweyî dixebite.”<sup>70</sup>

<sup>67</sup> Nezerî Munezzem, Hâdî, „Edebîyat-ê Tetbîqî, Teirîf ve Zemînehâ-yê Pijûhiş“, *Neşrîye Edebîyat-ê Tetbîqî*, Şomâreyê 2, ‘İlmî- Pijûhişî, Behâr-ê 1389 hş., s. 222. - 238.

<sup>68</sup> Kefafî, Muhemmed Ebdusselâm, *Edebîyat-ê Tetbîqî*, wer. Seyîdî, Seyîd Huseyn, Intişârât-ê Âsitân-ê Quds-ê Rezevî, Meşhed, 1382 hş., s. 12.

<sup>69</sup> Sâlih Bek, Mecîd- Nezerî Munezzem, Hâdî, „Edebîyat-ê Tetbîqî der Îrân“, *Feslnâme-yê Zebân ve Edeb-ê Pârsî*, Şomâre-yê 38, Zemistânê 1387 hş., s. 12.

<sup>70</sup>bnr. Malpera wê zanîngêhê:

[https://www.cmlt.uga.edu/comparative-literature-major-and-minor?fbclid=IwAR0hhi6m7gHVSwdftIeEMESzCrKq7Ooz9rimhzo6DgN6A-AinhIupD\\_vLww](https://www.cmlt.uga.edu/comparative-literature-major-and-minor?fbclid=IwAR0hhi6m7gHVSwdftIeEMESzCrKq7Ooz9rimhzo6DgN6A-AinhIupD_vLww)

Bi pêka van gotin û bîr û boçûnane ra em digîjn vê encamê ku: Edebîyata Berawirdî yan comparative literature çiçek ji dîroka toreyê ye ku li ser daneberheva mijarên toreyî di nîveka çend welat û zimanan û herwisa daneberheva mijarên toreyî yê welatekî yan zimanekî radiweste. Karê vê zanistê li bara daneberhev û berawirdkirina berhemên çandî yê cur be cur û lêkolîna berawirdî li ser wan cure berhemana ye.

Em jî di vê xebata xwe da du berheman ku her yek bi zaraveyekî cuda û her yek di qalibekî toreyî yê cuda da hatine afirandinê, lê mijara wan yek e, didin ber hev.

Ew jî Beyta Mem û Zîna Kurmancî û Mesnewîya Mem û Zînê ya Hewramî ye.

Herçiqas ku ev her du berhem li ser yek mijarê wate evîna Mem û Zînê hatine nivîsîn û darijtinê, lê heryek bi zaraveyk ji zaraveyên zimanê Kurdî ye, ku cudatîya wan weke du zaraveyên zimanekî ne hindike.

# PIŞKA YEKEM

## 1. Beyta Mem û Zînê

### 1.1. Agahdarîyeke Giştî li ser Beyta Mem û Zînê

Li nav hemû çîrok, beyt, serpêhatî û istiranên Kurdî da Beyta Mem û Zînê ji hemûyê navdartir bûye. Ew di nav folklorê Kurdî da ji hemûyên di balkêştir e û bala gelek dengbêj, beytbêj û çîrokbêjan li ser xwe da rakêşaye û evê baldarîyê we lê kirîye ku ev serpêhatîya bi nav û cur û celebên cuda cuda peyda bibin û li seranserê Kurdistanê da şax bavêjin. Mem û Zîn bi celebên istiran, beyt û çîrok di nav gel da heye. Çunku ev serpêhatîya bi curekî berfireh di nav gel da belaw bûye, her bêjerekî navek lê kirîye. Ew di nav gel da weke Beyta Memê û Zînê, Mem û Zînê, Memo û Zînê, Memê Alan, Memê Ala û Memê Alîyan<sup>71</sup> jî hatîye nasandinê.

Gelek kesan li ser wê lêkolîn kirine û li ser pile û payeya wê ya toreyî bîr û hizrên xwe ragehandine:

Di *Ansiklopediya Îranîka* da li ser Memê Alan/Mem û Zînê weha hatîye nivîsînê: „MEM-Ê ALAN (Romansa Kurdî) Muhtemelen ji navdartirîn dasitanên Kurdî û bi giştî weke nûnera hunera Kurdî ya zarkî hatîye pejirandinê. Versiyonên vê dasitanê di nav edebîyata gelêrî ya Kurdî da ji berî hemûyê kar li ser hatîye kirinê û hatîye weşandinê. (bnr. Prym û Socin, 1890; Von le Coq, 1903; Mann, 1909; û Makas, 1926). (Chyet, 1991 rr.27-28) ... Herçiqa ku versiyoneke vê beytê li Mehabadê ji layê Oskar Mann (1867-1917) va hatîye weşandinê lê ew di forma xwe ya gelêrî da zortir di navçeyên Kurmancîaxêv da baw e.“<sup>72</sup>

Celadet Alî Bedirxan ( 1893- 1951) li ser Memê Alan/Mem û Zînê weha dinivîse:

“Folklorê Kurdan ewçend mezin û fireh e ku em dikarin pê îftixar(ê) bikin û di nav xelkê da serfiraz bigerin. Di folklorê me da bêşik şaheser Memê Alan e. Memê Alan malê milletekî Awropayî buwa, Xudê dizane di heqê wê da heta niha çend cild kitêb dihatine nivîsandin. Me Kurdan ewçend guh nedanê. Şa’ir û rêberê me yê mezin, Ehmedê Xanî (1650/1-1707) pêva. Belê Xanî (1650/1-1707) berî sêsed salî bi qîmeta vê destan çîrokê hesiya û rabû li ser hîmê Memê Alan kitêba xwe ya mezin û abadîn Mem û Zîn anî wucûdê. Bi gotinên din Memê Alan bi navekî din bi nav kir û jê ra Mem û Zîn got<sup>73</sup> û ferqin xiste navbera çîrokîya xelkê û

<sup>71</sup> BMZ., rê. 54, 59...

<sup>72</sup> Ansiklopediya Îranîka, „*Memê Alan*“, <http://www.iranicaonline.org/articles/meme-alan>, (Gihan 27.11. 2019, 21. 56)

<sup>73</sup> Xanî (1650/1-1707) bixwe ev nava lê nekirîye, Memê Alan bi navê Mem û Zînê jî di nav gel da hatîye nas kirin.

esera xwe. Ji xwe herwekî nas e, Xanî (1650/1-1707) bi hinceta çîrokê deng li milletê xwe kir û dil kir wî ji nijad û millîyet û qewmîyeta wî hişyar bike. Ji hingêve ji sêsed salî bêtir wext bi ser me ve çûne. Kesî guh neda Memê Alan. Heta roja ku Kurdîzanê hêja û bilindpaye Roger Lescot ew di gel tercumeyeke Firansî gîhande çapê. ”<sup>74</sup>

Muxabin gelek kes we hizir dikin ku Xanî (1650/1-1707) navê vê çîrokê kirîye Mem û Zîn.<sup>75</sup> Ev hizra çewt ta wê radeyê pêş ketîye ku ji beyta wê ra Memê Alan û ji mesnewîya wê ra Mem û Zîn dibêjin. Lê wisan nîne, Xanî (1650/1-1707) bixwe ev nava li vê çîrok yan beytê nekirîye, Ev serpehatîya bi navê Mem û Zînê, Memo û Zînê, Memê Alan û Memê Alîyan jî di nav gel da hatîye nas kirin.

Bavê Selah ( 1952-2016) -dengbêjê kurd- li ser Memê Alan/Mem û Zînê dibêje:

*“Çîrokeke dûr e dirêj e giran e.*

*Ne bi şoran e, ne bi cengan e, bi rojekê dûyan lo lo nayê hewaldan e.*

*Eva ne karê hemû kesan e.*

*Karê zane û peytûlan e.*

*Di pê ra karê dengbêj û kilamcîyê dîwanên cim’etê giran e.*

*Diherike wek ava çem û kanîyan e.*

*Evînek ji dil û can e.*

*Dasitana Mem Alan e.* ”<sup>76</sup>

Gelek kesên di li ser vê beyte û giringîya wê bîr û hizrên xwe ragehandine, ku anîna navê hemûyan dê bibîte hegera dirêjîya babetê.

## **1.2. Pêşîneya Kar û Lêkolînan li ser Beyta Mem û Zînê**

*Mijara evîna Mem û Zînê, evîna şehzadeyê Kurd û dotmîreke Kurd li ber naveroka xwe ya balkêş, ku pir e ji dildarîyeke efsûnawî bala gelek kesan li ser xwe da rakêşaye. Gelek kesan mijara vê evîna pak û asimanî ji xwe ra kirine jêdera afirandina berhemên balkêş.*

Yekemîn kesê ku ji vê beytê wec wergirtîye hozanê Kurd yê bi nav û bang Ehmedê Xanî (1650/1-1707) (1650-1707) ye.<sup>77</sup>

<sup>74</sup>Bedirxan, Celadet, „Mem û Zîn“, *Kovara Ronahî*, sala 3. jimare 23, r. 8, sal 1944 Şam.

<sup>75</sup> Bedirxan, Celadet, „Mem û Zîn“, r. 8.

<sup>76</sup> Bavê Selah Pêşgotina dengbêjî li ser Beyta Mem û Zînê, ji CD ya dengê wî hate vergirtin.

<sup>77</sup> Çunku Xanî (1650/1-1707) navê Memê Alan di şahesera xwe da neanîye, hinek kes evê ji Xanî (1650/1-1707) ra kêmasî dizanin ku çima navê Memê Alan neanîye. Lê Xanî (1650/1-1707) navê Mem û Zînê li ber xwe da dernexistîye, ev beyta bi navê beyta Mem û Zîn û Memê û Zînê jî di nav gel da bi nav û bang e. Herwisan xudanê hemû mesnevîyên evîndarîyê navê her du evîndaran li berehemên xwe kirine. Weke Şîrîn û Ferhad, Leylî û Mecnûn, Mêhr û Muşterî... Lê di gel wê hindê Xanî (1650/1-1707) di destpêka Mem û Zîna xwe da dîyar dîke ku berî wî Mem û Zîn hebûye û ew dixwaze wê Mem û Zîna ku ji ber guhnedanê lawaz û gewşek û nîvecanî bûye, ji mirinê rizgar bike û ser ji nû vejîne. Herwisan Xanî (1650/1-1707) di dawîya mesnevîya xwe da Mem û



M. Emîn Bozarşlan di pêşgotina wergera Mem û Zînê da li ser vê hindê weha dinivîse: „Hozanê mezin Ehmedê Xanî (1650/1-1707) jî ji çîroka Memê Alan îlhama xwe girtîye û bi wê îlhamê wê çîrokê li gorî jîna dema xwe xistîye kirasekî mişexxes, bi awakî hevdemî û modern nivîsîye. Bi vê yekê hem çîrokê<sup>78</sup> ji windabûnê rizgar kirîye, hem jî ji bêjeyê Kurdî ra eserekî nemir dîyarî kirîye.”<sup>79</sup>

Li dû Xanî (1650/1-1707) ra çawa ku ta niha hatîye zanînê, du hozanên Hewramî ev çîroka vergirtine û bi zaraveyê Hewramî vehûnane.<sup>80</sup>

Ji bilî venivîsînê, Mem û Zîn weke deqeke folklorîk ji layê gelek kesan va hatîye berhev kirinê. Lê gorekî lêkolînên ku ta niha li ser vê beyta Kurdî hatine kirinê, berî kurdan çend kes jî lêkolerên bîhanî ev beyta Kurdî berhev kirine û wergerandine ser zimanê xwe û weşandine. Bi giştî em dikarin kronolojîya berhevkirina Beyta Mem û Zîn bi pêka agahdarîyên ku ketine destê me, weha nîşan bidin:

1. (1869) Eugen Prym û Albert Socin, ji zarê Cano
2. (1870) Eugen Prym û Albert Socin, ji zarê beytbêjekî ji Zaxoyê ku navê wî nenivîsîne.
3. (1896) Hugo Makas ji zarê Mohammed Emîn kurê Şemdîn el-Mendîlkanî
4. (1901) Albert von Le Coq, ji zarê Ja'far Oglu Seîdî Biya
5. (1903) Oskar Mann, ji zarê Rahmanî Bekir (bi zaravê Soranî)<sup>81</sup>
6. (1904) S. Haykuni, ji zarê Oskan Ohaniyan
7. (1904) S. Haykuni, ji zarê Onbaşi Mehori
8. (1904) G. Nijdehiyan, ji zarê beytbêjekî xelkê Eleşgirdê ku navê wî nenivîsîye<sup>82</sup>
9. (1906) Oskar Mann, ji zarê Eyûb Axa Temir ji Ruhayê<sup>83</sup>
10. (1926) Emînê Evdal, ji zarê Fekoyê Miraz
11. (1936) Emînê Evdal, ji zarê Xudoyê Qaşo
12. (1938) L. Vil'chevskii, navê dengbêj û cîhê wî nehatîye<sup>84</sup>

---

Zînê weke efsaneyeke Bohtanê dide nasînê. Ji bilî wê Xanî (1650/1-1707) çendîn caran di Mem û Zînê da dibêje ku min ev çîroka ji zarê zana û temendaran bihistîye...

<sup>78</sup> Di van hevokana da çend şaşîyên rêzimanî hene, ku me dest lê neda.

<sup>79</sup> Bozarşlan, M. Emîn, *Mem û Zîn*, Gün Yayınları, İstanbul 1968, r. 10.

<sup>80</sup> Yek ev mesnevîya ye ku em li ser dixebitin, yek jî mesnevîyeke nivîşkan e ku di pirtûkekê bi navê *Keşkol* da hatîye weşandinê. bnr. Pêvek hejmar 8 (rûpela yekem ya vê mesnevîyê û rûberga keşkolê). Keyomers-ê Nîkreftar, *Keşkol*, Enistîtûti Kelepûrî Kurd- Silêmanî, salî 2013.

<sup>81</sup> Ji bilî vê versiyonê ku bi zaraveyê Soranî ye, versiyonên dî hemû bi zaraveyê Kurmancî ne.

<sup>82</sup> Chyet, M. L., *And a thornbush sprang between them*, Studies on Mem û Zîn: A Kurdish Romance. Vol. 1, UMI Dissertation Services, Ann Arbor. Michigan 1. 1991, r. vii.

<sup>83</sup> Sträuli, Barbara, ji arşîva Oskar Mann.; Ev beyta di nava gel da bi navên beyta Memê Alan, Memê Ala, Memo û Zînê, Mem û Zîn hatîye nas kirinê. Oskar Mann li destpêk û dawîya beytê da ewê weke beyta Mem û Zînê dide nasandin, lê beytbêj jê ra Memê Alîyan dibêje. bnr. BMZ rê. 39, 54, 59...

<sup>84</sup> Chyet, M. L., hb.

13. (1942) Roger Lescot bi arîkarîya Celadet Bedirxan ji zarê çend dengbêjan û ji hemûyê zêdetir jî ji her du dengbêjan; Mişoyê Berazî û Sebrîyê Mihacir<sup>85</sup>

14. (1955) Hacîyê Cindî ji zarê Etarê Şero

15. (1959) Ordîxan û Celîlê Celîl ji zarê Hovhannêsiyan Karapet

16. (1960) Besîm B. Akdemir ji zarê Yûsuf Malke Asmar

17. (1961) Hellmut Ritter, ji zarê Slêman Hanna Maskobi

18. (1963) Ordîxan û Celîlê Celîl ji zarê Ettarê Têcir

19. (1970) Ordîxan û Celîlê Celîl ji zarê Ohaniyan Israel<sup>86</sup>

Ji bilî van varyantana li van salên dawîyê gelek kesan li ser Mem û Zînê lêkolîn kirine, ku em li vira hindî agadarîya xwe navên hindekan diînin.

Yek ji kesên ku li ser varyantên Mem û Zînê xebitîye Michael Lewisohn Chyet e. Chyet têza xwe ya duktorayê li ser Mem û Zînê amade kirîye. Ewî lêkolîneke akademîkî li ser 18 varyantên Mem û Zînê kirîye û ew varyant wergerndine ser zimanê Înglîzî û ew li bara motîvên çîrokan, navên qehremanan û gelek layên dî va berawird kirîye û bi navê „*And a thornbush sprang up between them*” sala 1991 ji layê zanîngeha Berkeley, li California yê daye weşandinê.

Hikmettîn Atti sala 2013 li zanîngeha Mêrdîn Artukluyê têza xwe ya lîsansa bilind li jêr navê *Lêkolîneke Zargotîni Li Ser Destana Mem û Zînê*, nivîsîye.

Remzîye Aslanê gotarek bi navê Berawirdkarîya Destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî, nivîsîye ku di kovara *International Journal of Kurdish Studies* No. 1/2 (July 2015), s. 86-101. da hatîye weşandinê.

Goran Elî Salim sala 2017an li zanistgeha Wanê mastera xwe bi navê: *Rengdana Folklorê di Destana Mem û Zîna Ehmedê Xanî da*, dinivîse.

Hawkar Cemîl Mihemed sala 2017an têza xwe ya masterê bi navê: *Bunyadî Gêranewe le Dastanî Mem û Zînî Oskarman û Memê Alana Ebdurhîm Rehmî Hekarî*, nivîsîye.

Samî Çelîktaş sala 2018an li zanistgeha Mêrdînê têza xwe ya lîsansê li jêr navê: *Tîpolojîya Lehengê Kurd li çarçoveya Nêrînên Cozêf Kembêl, bi Mînakên Rostemê Zal û Memê Alan*, dinivîse.

Mezher Îbrahîmî sala 2018an têza xwe ya lîsansê bi navê *Dariştinasîyî Beytî Mem û Zîn û Berawirdkirdinî Hêmane Giringekanî le Gel Çîrokî Efsûnawîyî Kurdî da*, li zanîngeha Artuklu Mêrdîn dinivîse.

---

<sup>85</sup> Lescot, R., *Mem û Zîn*, Orfeus Bokforlag, Stockholm, çapa nû, İstanbul 1996, r. 40.; Mem, H., *Rastîya Destana Memê Alan*, wer. Farqînî, Zana, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem, Rêbendan 2006, r. 16.

<sup>86</sup> Chyet, M. L., hb.

Şîrzâd Tâyîfî û Muhsin Rehîmî pêkve gotarek bi navê *Cûstârî der Esâtîr-ê Menzûme-yê Kurdî-yê Mem û Zîn, nivîsîne* û di kovara Pijûhişnâme-yê Edebîyat-ê Kurdî, Sâl 3; Şomâre 4, Behâr ve Tâbistân 1396 hş. da weşandine.

Gelek kesên dî jî di qadên cur be cur da li ser Mem û Zînê xebitîne ku em xwe ji anîna wan hemû navana diparêzin.

### **1.3. Jînenigarîya Oskar Mannî wek Komkerê Beyta Mem û Zînê**

Oskar Mann (1867-1917) navê wî yê rastîn, Gottlieb Bernhard Oskar Mann kurê Rentiers Otto Mann e. Ew li roja 18ê meha Septembara sala 1867an di malbateke şênîyê mêjînê Berlînê da hatîye cîhanê.

Oskar Mann piştî qedandin xwandina xwe li sala 1890î li pirtûkxana şahî ya Berlînê da dest bi karî kir û li dû ra bû birêveberê pişka destnivîsên rojhelatî.

Roja çarê meha Julî ya sala 1899an Oskar Mann daxwaznameyek bi nexşeyeke hûrgilî ji akademîya şahî ra nivîsî û tê da daxwaza destûrê ji bo seferê zaniştî û dayîna amûrên pêdivî ji bo lêkolîna li ser zaraveyên Kurdî û Farsî ya nû ku ta wê demê kêma li ser wan lêkolîn hatibûn encamdanê, kir. Daxwaza wî bi balkêşîyê mezîna hate pejirandinê.

Oskar Mannî du seferên zaniştî kirin, ku li ser hev 5 salan domand. Herdu seferên wî jî seferên Îranê û li Rojhelata Nêzik li Kurdistanê bûn. Ew gelek bajar û navçeyên Kurdistanê ji Kirmanşah û Mehabadê bigire ta Ruha û Mûşê geriya. Wî gelek beyt, çîrok, istiran û deqên Kurdî berhev kirin, ku yek ji wan ev beyta Mem û Zînê/Memê Alîyan e ku sala 1906an li Ruhayê ji zarê beytbêj Eyûb A'xa Temir vergirtîye.<sup>87</sup>

Akama kar û lêkolînên wî bûn çar pirtûkên li ser zaravên Farsîya nû û zarave û devokên Kurdî.

Yek ji berhemên kar û lêkolînên wî pirtûkeke bi navê *Die Mundart Der Mukri-Kurden Grammatische Skizze, Text in phonetischer und Persischer Umschrift*. Ku sala 1906an li Berlînê çap bûye. Ev pirtûka ji şeş kurteçîrokên folklorîk û 18 beyt û hindek istiranên kurtên Kurdî pêk tên. Beytên ku di wê pirtûkê da hatine ev in:

1. Dimdim 2. Mem û Zîn 3. Las û Xezal 4. Nasir û Malmal 5. Birayîmok 6. Şêx Ferx û Xatûn Estî 7. Mehmel û Birayîmî Deştîyan 8. Qoç Osman 9. Colindî 10. Xezem 11. Kake

---

<sup>87</sup> Kolivand, Mojtaba, *Persische und Kurdische Reiseberichte*, Herausgegeben von Harassowitz Verlag, Wiesbaden 2014, pêşgotin.

Mîr û Kake Şêx 12. Leşkerî 13. Qer û Gulezer 14. Zembîlfiroş 15. Bapîr Axayî Mengur 16. Ebdurehman paşay Bebe 17. ‘Elî ‘Aşiq<sup>88</sup> 18. Mem û Zîn<sup>89</sup>

Muxabin di dema jîyana wî da tenê ev berga ji karên wî hate weşandinê û berhemên wî yên di dema jîyana wî da nehatin weşandin. Oskar Mann li roja 5ê meha Desambêra sala 1917an mir û roja 8ê wê mehê li Berlînê teslîmî axê bû...<sup>90</sup>

#### **1.4. Nasandin Beyta Mem û Zînê (Varyanta Oskar Mannî)**

Metna vê beytê sala 1906ê mî. ji layê lêvekolê Almanî Oskar Mann (1867-1917) va hatîye berhevkirinê. Oskar Mann ev beyta ji zarê beytbêjekî Kurd bi navê Eyûb Axa Temir bihîstîye û anîye ser kaxezê. Li dû mirina Oskar Mann ra ev beyta di nav arşîva pirtûkxana wî da dikeve destê Kurdîzana Siwîsrayî Barbara Sträuli. Barbara Sträuli berî ku wê bide weşandinê ev beyta da min ku ez li ser bixebitim.

Ji bo amadekirina vê beytê me dest li metina wê nedaye û tenê di perawêzê da me nêrînên xwe destnîşan kirine. Me bi pêka serwaya Beytê û hevokên wê ew rêzbandî kir û ji her rêzîkekê ra hejmarek danî û bendên Beytê bi danîna naweyekê/mesafeyekê û sê îstêrkan \*\*\* destnîşan kir. Me varyantên hindê peyvan li perawêzê da anî.

Ev beyta ji 644 rêzik û 64 bendan pêk tê.

#### **1.5. Metna Beyta Mem û Zînê (Varyanta Oskar Mannî)**

Beytbêj:	Eyûb Axa Temir, xelkê Rihayê
Berhevkar:	Oskar Mann xelkê Berlînê
Sala berhevkirinê:	1906ê zayînî
Tîpguhêzî ji bo rênivîsa latînî ya nû:	Barbara Sträuli

#### **Têbînî:**

Perawêz û peyvên di nava cotkewanan da ( ) ji layê me va hatine nivîsînê.

#### ***Mem û Zîn***

*1. Li bajarê Mu'xribistanê sê bira hebûn, 'Alî Paşa, birayê mezin bû, mîrê meqbûl û begê meş'xûl.*

<sup>88</sup> Mann, Oskar, *Die Mundart der Mukri-Kurden, teil II*, Berlin, Druck und Verlag von Georg Reimer, Berlîn 1909.

<sup>89</sup> Mem û Zîna duyem niv çîrok û niv beyt e.

<sup>90</sup> Kolîvand, *hb.*; Malpera ruwange li ser jîyan û berhemên Oskar Mann : [http://ruwange.blogspot.ch/2014/05/blog-post\\_4.html](http://ruwange.blogspot.ch/2014/05/blog-post_4.html)

2. Her sê bira korocax, warê wan wenda bûn.

\*\*\*

3. Ku dihatin rojê 'aydan û 'arefatan.

4. Her sê biran diterikandin taxt<sup>91</sup> û tacê giran.

5. Hêstir dibarandin sebê xatirî ewladan.

6. Go: Çiqas, ku ji 'Alî Paşa ra, ku qîzê wezîran û hakimî ku dixwestin, rebbil'alemîn tu ewlad nedanî.

\*\*\*

7. Birayê biçûk xewneke şevan dî, Xizir elêhîsselamjê ra dibêje: "Ji 'Alî Paşa ra qîzekî<sup>92</sup> bixwazin ji berê Qurêşîyan, ji sinsileyî hezretî Sileyman.

8. Wê Xudê bi wê de ewladekî pê şên bibe ocaxê her sê biran."

\*\*\*

9. Sibe bû, bajarî Mu'xribistanê bajarekî gewrî mezinî giran e.

10. Li ser sêsed û şêst û şeş me'helan e.

11. Li ser bîst û çar qapîyan e.

12. Her qapîyekî tê da runîştîye wezîrekî heft toqan e.

13. Bajarî Mu'xribistanê li ser etegê heft çîyan e.

14. Di ser ra belekî berfê ne, di bin ra be'hrî 'Umîyan e.

15. Di bin ra mêrg û kanî ne, li ser ra zozan, yaylî û çîyan e.

16. Di bajarê Mu'xribistanê da tê da qasra<sup>93</sup> 'Alî Paşa ne.

17. Qasreke sipî, birceke belek e, qabeke bilind e, odake tûncîn e, hewlîyake bole fireh li ser bîst û çar qeyinterman e.

18. Sêsed û şêst û şeş odan e.

19. Ji maqbûlî pê da berdane zincîrê zêrane.

20. Tê da sê kevirê maqbûldaşî ne, cewher e, şewqê xwe dane çar koşeyî bajarî Mu'xribistanê, li ser ra belekî yê berfê, mêrg û kanîyan e.

21. Sibe da berdane bajarî Mu'xribistanê sê delalan e.

22. Tê da ban dikirin bîst û du rojan e.

23. Dibînin her çar malê Qurêşîyane.

24. Şev dikeve, şevê duduyane.

---

<sup>91</sup> text

<sup>92</sup> qîzekê

<sup>93</sup> Qesra: (koşka)

25. *Li dorê 'Alî Paşa rûdinê cima'etê derbegane.*
26. *Cima'etê hakimî û es'habane.*
27. *Şeva li ya sîyan e.*
28. *Datînin şor û danişevê girane.*
29. *Vêdixînin pozî feneran û çirane.*
30. *Dikişine ser malê Qurêşîyane.*
31. *Yekî<sup>94</sup> dixwazin ji 'Alî Paşa ra ji berê Qurêşîyan, ji sinsilê pêxemberan, navê Şîrîn Zelîxane.*
32. *Bi 'erf û 'adetî dunyayê 'Alî Paşa dişînine ser doşega Zelîxê, rebbil'alemîn damlakê dinûqutîne qursa'xê Zelîxê ji azmanê heftane.*
33. *Ma'hsûmek dikeve qefesê Zelîxê, tamam dibe neh meh, neh roj, neh sa'et, rebbil'alemê dide Zelîxê ewladekî pê şên dibe, ocaxî her sê birane.*
34. *Wê şevê çel ewlad peyda dibe<sup>95</sup> li bajarê Mu'xribistanê wêrane.*
35. *Wî Memê didine destê murebîyane.*
36. *Mem mezin dibe, salê Memê dikeve salane.*
37. *Pê dike sisîyane.*
38. *Rojekî<sup>96</sup> li dorê Memê rûdinin cema'atê hakimî û wezîran û as'haban û cema'atê boz'ebalîyan û cema'atê dîngardaşîyane.*
39. *Navê lê dikin Memê, mîrê maqbûl, Mem A'xa û Memê Alîyan e.*
40. *Salê Memê pê dike şeşan û heftan e.*
41. *Bi destî Memê digirin davêjine ber destî xocan û 'ulemane.*
42. *Salê Memê dikeve heştane.*
43. *Destê Memê dibe sedemê bavîyan û têvîyane.*
44. *Salê Memê dikeve nihane.<sup>97</sup>*
45. *Mem 'hişz dike 'ilmî rebbil-'alemîn, xetim dike sî cuzû Qurane.*
46. *Salê Memê dikeve dehane.*
47. *Mem dibe îmamê hezar û heştased suwarê derebegane.*
48. *'Alî Paşa dide Memê taxt û tacê girane.*
49. *Mem digêrîne 'hukm û 'hukmata bajarê Mu'xribistanê girane.*
50. *Rojekî<sup>98</sup> torçî darine ber be'hrî Belek, digêrine li seydê masîyane.*

<sup>94</sup> yekê

<sup>95</sup> dibin.

<sup>96</sup> rojekê

<sup>97</sup> nehane

<sup>98</sup> rojekê

51. *Torê davêjine be 'hrê, toreke giran e.*
52. *Bi der nakevê ji be 'hrê belek toreke giran e.*
53. *Vê torê bi der dixînin ji be 'hrê Belek, canîkî du salin, dêle li kabane.*
54. *Vî heywanî berdidine hewl û heyata Memê Alîyane.*
55. *Mem dibe xodanê qasrê sipî, bircê belek, qabê bitûn, odê tûncîn, kevirî maqbûl, zincîrê zêrane.*
56. *Qasrê Memê qasreke sipî ye li ser sêsed û şêst û şeş odan e.*
57. *Di bin qasrê Memê da tê nalîna Bozê Rewane.*
58. *Li pêşî yazli 'xê Memê tê şîqîna teyrane.*
59. *Memê nemehrem e, ya salê 'hatanî bi salê dîyê Memê dibînê cemalê Memê Alîyane.*
60. *Rojekî<sup>99</sup> ogir<sup>100</sup> û hevalê Memê rica dikin ji bavan û dîyane.*
61. *Memê bi der dixînin ji qasr û qona 'xê girane.*
62. *Dîfilitînin kostek<sup>101</sup> û pêwandê<sup>102</sup> Bozê Rewane.*
63. *Mem hiltîne şîqîne teyran û bazan û 'hurane.*
64. *Mem nigî xwe dike rikêbên Bozê Rewane.*
65. *Bi Memê ra suwar dibe<sup>103</sup> hezar û heştêsed suwarê derebegane.*
66. *Mem digere li seydê, berî xwe dide çolan û kerbelane.*
67. *Bira bişewite mala her sê qîzê padişayî pêrîyane.*
68. *'Îşqebanû, Qemerbanû, Gulpêrî, biçûka xweyîngan gîyan e.*
69. *Li xwe dikin baskan û perane.*
70. *Dikevine qili 'xî gogercînan û kewane.*
71. *Perwaz dikin li qatî ezmanî heftane.*
72. *Mem bera didê kê şîqîne teyran û bazan û hurane.*
73. *Bi bende va heywanan dikeve bi hêlê zengûyane.*
74. *Berî xwe dide çolan û berîyane.*
75. *Dadixîne baxçeyî gulan û sêvana, baxçeyî her sê qîzê padişayê pêrîyane.*
76. *Memê dî li wî baxçeyî sê qîz dikevîne hewzî gulane.*
77. *Memê jê dizî postî xwênga biçûk, dikete nav baxçeyî girane.*
78. *Her du xweyîngan li xwe kirin post û perane.*

<sup>99</sup> rojekê

<sup>100</sup> hogir

<sup>101</sup> Kostek: zincîr

<sup>102</sup> Pêwend: bend yan zincîra ku mirov pê ajelekê girê dide. Pêwend jî dibêjinê.

<sup>103</sup> dibin

79. *Perwaz dikin bi qatî azmanî heftane.*
80. *Xwênga biçûk dima li erdê, çav diket li cemala Memê Alîyane.*
81. *Di ser xwe ra ban kire her du xweyîngane.*
82. *Gulpêrî go: “Xwêngino! Hûn dibên em ‘hurûke Zînê<sup>104</sup> werin bibînin rind<sup>105</sup> û cemalan bi çavê serîyane.”<sup>106</sup>*
83. *Gulpêrî bi xwêngan ra go: “Dilê min xan e.*
84. *Salê min hindik in, derdî min giran e.”*
85. *Dibên ku “Di ser me ra rebbî ‘alemê du ‘husne û cemal dane.*
86. *Rojekê digerîyan li dewrê dunyayê li ser qasabayî Cizîrê Botane.*
87. *Me dî, di bin me ra xuyan dibê qasreke sipî, birceke belek, di bin ra dimeşe şettê bi du filqan e.<sup>107</sup>*
88. *Li pêşîyê vê qesrê<sup>108</sup> xuyan dibe bejneke zirav, çavê belek, gerdenî sipî, gulîne sor, kiswetek nizanîm qîzan e, nizanîm bûkan e.*
- \*\*\*
89. *Me pirsî, vê ra dibêjin Zîn e.*
90. *Xûşka Mîr ‘Azdîn e, qîza Mîr Zêndîn e.*
91. *Dotmama ‘Hasan û Çeko û Qeretaclîn e.*
92. *Qona ‘xê şeş mehan, li sînori ‘Êcem û musulmîn e.*
93. *Merîyan li baskî felekê dişidîne.*
94. *Qol û qanadî merîyan dişkênîne.*
95. *Hetanî bi roja qametê<sup>109</sup> eqil bi serî merîyan nîne .”*
- \*\*\*
96. *Gulpêrî go bi xwênga ra: “Dilî min li kulê ye.*
97. *Werin, mêze kin ji me her sê xwêngan kîjan lîyaqê vî camêrî xelqê ye?”*
98. *‘Eşqebanê go: “Xwêngê! ‘emelî û ixtibar nabe bi banîademî vê ‘asrê ye.”*
- \*\*\*
99. *‘Eşqebanê go: “Xwêngê! Dilê min li yan e.*
100. *Were, emê rûnin li ser hewzê gulane.*
101. *Bi wa ra dînin<sup>110</sup> şor û danişî ‘xê giran e.”*

<sup>104</sup> Debê wehe be: Hûn dibêjin em hûrîkê cennetê ne...

<sup>105</sup> rindî

<sup>106</sup> Wisan dîyar dîke ku li vir beytbêjî çend rê. Ji beytê ji bîr ve kirîye. Kêmasî di hevokan da heye.

<sup>107</sup> firqan e

<sup>108</sup> Li pêşîya wê qesrê

<sup>109</sup> qîyametê

<sup>110</sup> bi hev ra deynin



102. *Qemberbanû, 'Eşqabanû, Gulpêrî di dest hev da dîkin axd <sup>111</sup> û şurûtane.*
103. *Li ser hewzê gulan datînin şor û danişî'xê girane.*
104. *'Îşqebanê go bi xwênga ra: "Werin, sibe em ji bajarî <sup>112</sup> Mu'xribistanê bi der va mêze kin li navî qabristanê merzelane.*
105. *Heger ku camêr e, heger eksige, ku hatîye kuştinê bi ifteran û buhtanane.*
106. *Nûrekî ji ezmanan daye ser maqamî wane.*
107. *Emê hinek herîne rakin ji tîrbê kuştîyane.*
108. *Di binê şevê da qîrînîyê bikin li bask û perane.*
109. *Peya bin li maqamê Zîna Zêdane.*
110. *Wê herîyê tîrbê kuştîyan bireşîne <sup>113</sup> bi ser heft mehelane.*
111. *Hinekî bireşînin li ser yata'xa Zîna Zêdane.*
112. *Di nivî şevê da rakin xelqê nazilî, bişidînin li ser qanad û baskane.*
113. *Di nivî şevê da li bajarê Mu'xribîstanê, yataxan dêynin muqabilê yataxane.*
114. *Emê bi xwe ra helkişin taqan û pencerane.*
115. *Mêze kin li 'husn û cemalê her dîyane."*
116. *Di mabênê hev da danîn wa qewl û qerar her sêyane.*
117. *Ku şev ketê şevê dudîyane.*
118. *'Ayan bû li canê Zîna Zêdane.*
119. *Dî ji xewnan xewneke şevane.*
120. *Sibe ron bû, Zîne li ber xwe danî kitab û mis'hefê, mêze dike li fa'l û bircane.*
121. *Remilê toqmiş dikê, remilê davêje bircane.*
122. *Li bircê nihan remila Zîne dikeve goleke xwînane.*
123. *Zîn dibarîne hêstirê çavane.*
124. *Ber dide bajarî Cizîrê sê dellalane:*
125. *"Bira kesek hîşev nekeve xewê <sup>114</sup> şevane.*
126. *Her kesek vêxînin pozî çiran û meş'elane.*
127. *Kî ku bikeve xewê şevane.*
128. *Wê rebbî 'alemê bi serî wan da wîne acêbeke pire girane."*
129. *Kew kete sibê, her sê qîzê padişayê pêriyan bi der ketine navî qabristanê û merzelane.*
130. *Mêze kirin, nûrekî dîrek kete ji ezmanê heftane.*

<sup>111</sup> ahd

<sup>112</sup> bajarî

<sup>113</sup> bireşînin

<sup>114</sup> xewa

131. *Daye ser maqamî kuştîyane.*
132. *Heltînin herinê ji tirbê kuştîyane.*
133. *Şev dikeve, şeva dudîyane.*
134. *Şeva li ya sisîyane.*
135. *Dikine qîrînî li ser bask û perane.*
136. *Berê xwe didine sînori 'Êcem, hafê bilind, derbendê asê, bajarê Cizîra Botane.*
137. *Sa'at li sisîyan, peya dibin li ser qesr û qona'xa Zîna Zêdane.*
138. *Mêze dikin di taqan û pencera ra Zîna Zêdane.*
139. *Li ber xwe danîne kitab û mis'hefê remilane.*
140. *Remilê toqmiş dikê, remilê davêje bircane.*
141. *Li bircê nihan remilê Zînê dikeve goleke mezine bane.<sup>115</sup>*
142. *Wê herîyê tirbê kuştîyan direşînin bi ser heft mahallan e.<sup>116</sup>*
143. *Hinekî direşînin bi ser yataxa Zîna Zêdane.*
144. *Zînê ban kire gelî carîyan û gurcîyane.*
145. *Zînê go: "Ez dikime bikevime xewê şevane."*
146. *Bi emrî Xudê ku Zîn kete xewê şevane.*
147. *Her sê qîzê padişayî pêrîyan peya bûn li ser taxt û tacane.*
148. *Sa'at li sisîyan rakirin xelqê nazilî, dişidandin li ser qanad û baskane.*
149. *Berê xwe dane bajarê Mu'xribistanê wêrane.*
150. *Li qesrê<sup>117</sup> Memê cî û yataxa datînine muqabilê textane.*
151. *Her sê qîzê padişayî pêrîyan helkişîyan teqan<sup>118</sup> û pencerane.*
152. *Mêze kirin li cemalê her dîyane.*
153. *'Îşqabanê go: "Memê rind e." Qemberbanê go: "Zînê rind e." Hersê diketine mehakimeke girane.*
154. *Gulpêrî go: "Werin, em rakin ji xewê Memê Alîyane."*
155. *Gulpêrî ban kire Memê. Memê serî xwe rakir, dî ku şewqekî<sup>119</sup> dayê hewl û hayatê girane.*
156. *Memê go: "Ez mame ji nimîya<sup>120</sup> sibê."*
157. *Mêze kir, 'husn û cemalê yatax danîne muqabilê taxtê xonkar, mekanê Memê Alîyane.*

<sup>115</sup> pan e

<sup>116</sup> mi'hellan e

<sup>117</sup> Qesra

<sup>118</sup> taqan

<sup>119</sup> Şewqekê

<sup>120</sup> nimêja

158. *Memê sewtekê ban kire mîvana şevane.*
159. *Memê go: “Xweyîng! Mi tu qewl û qerar bi eksîyê xelqê ra bera nedane.”*
160. *Zînê serê xwe rakir ji xewê, li destî xwe giran<sup>121</sup> dawa Memê Alîyane.*
161. *Go: “Tu merîkî xerîb î, belkî heye da ’wake te girane.*
162. *Te gotîye: Belkî va qona ’xa, qona ’xeke camêrane.*
163. *Ezê da ’wê te çê bikim bi qebzê şûrane.*
164. *Na ku da ’wê te bi şor û mehakimane.<sup>122</sup>*
165. *Ezê da ’wê te çê bikim li huzûrê Mîr ‘Azdîn, li cim ’atê mêrane.”*
166. *Memê go: “Xweyîng! Were, em ban kin gelî carîyan û gurcîyane!”*
167. *Zînê ban kire carîyan û gurcîyane.*
168. *Tu deng nê<sup>123</sup> ji kesane.*
169. *Memê ban kire gelî kolane.*
170. *Bû lebêkê kolan, sekinîn li dîwanî hizûrî Memê*
171. *Memê go bi Zînê ra: “Were , em vêxin pozê çiran û fenerane.*
172. *Em bi derkevîne serî qesrê, em mêze kin, nîşanê bajarê Mu ’xribistanê û qesabî Cizîrê kîjane?”*
173. *Mem bi derkete serî qesrê.*
174. *Zînê mêze kir li qasr û qona ’xê Memê, qesreke sipî ye, birceke belek e, qabeke bitûn e, odeke tûncîn e, di bin ra be ’hrî ‘Umman e.*
175. *Zînê bi Memê ra go: <sup>124</sup> “Ezê niha ban kim ‘Hasan û Çeko, Celalîyê bajarê Cizîrê, wê te bavêne ber devî şûrane.*
176. *Te bikine yêmê masîyane.*
177. *Bavêne şettê Cizîrê bi du firqan e. ”*
178. *Kor û poşman vegerîyan li cî û yataxane.*
- \*\*\*
179. *Zînê go bi Memê ra: “Ez Zîn im, xûşkê <sup>125</sup> Mîr ‘Azdîn im, mêze ke, li sing û berê min mîne xalî heft rengîn e. ”*
180. *Mîne sîne Toqatê dor bi çîn e.*

<sup>121</sup> (gerand?)

<sup>122</sup> Pirjimarîya me’hkeme (Me’hkeman)

<sup>123</sup> nayê

<sup>124</sup> Rêzikên 175 - 177 gerek e li pêş rê. 166 ê da bihata, ku rêzebenda hevpeyvîna Zînê û Memê rêk biba. Li vir beytbêj axiftinên Zînê tevî hev kirîye, ne pêkan e dema ku Zînê qonaxa Memê bibîne, lê dîsan jî bêje ez ê gazî Celalîyan bikim. Dîyar e Zînê ev gotinane berî ku qonaxa Memê mêze bike û bibîne gotîye, li dû van gotinana ra Memê dibêjê kerem ke dîna xwe bide qonaxan ka qonax ya kê ye. Rêzika 177 jî debê berî rê. 176 an bê.

<sup>125</sup> xûşka

181. *Memikê min serê sor in, kokê wana sipî ne.*
182. *Kilîtê wan derzî ne.*
183. *Miftê wan pêçî ne. ”*
- \*\*\*
184. *Memê go: “Bi mi ra dibên Mîrê bajarê Mu’xribistanê, xarzî Kurêşîyan; mêşê me bi haramê<sup>126</sup> li dawê me nê; eme bi te ra di mabênê xwe da deynin şûr û hamêlîyane.*
185. *Bi te ra rakevim mînê xwêng û birane.”*
186. *Her du ketine xewa şevane.*
187. *Bira bişewite mala her sê qîzê padişayê pêrîyane!*
188. *Peya bûn, li ser yataxê girane.*
189. *Dikin rakin Zînê, berî bidine Cizîra Botane.*
190. *Gulpêrî biçûkê<sup>127</sup> gîyane.*
191. *Go: “Xwêngino! aqilî li serîyan e, ne li salan e.*
192. *Mabênê her du bajara qona’xê şeş mehan e.*
193. *Werin, em biguherin her du gustîlê pêçîyane.*
194. *Mem, bira nigî xwe bike rikêba Bozê Rewane.*
195. *Berî xwe bide bajarê Cizîra Botane.”*
196. *Zîn rakirin, şidandin li peran û baskane.*
197. *Berî dane bajarê Cizîra Botane.*
198. *Sibe da Mem rabû ji xewê, ku tune mîvana xwe<sup>128</sup> şevane.*
199. *Memê terikand textê xonkar, kete navî tewlê hespane.*
200. *Digirî mînê xûnîyane.*
201. *Birayê Memê axiretî hate zîyareta Memê, mêze kir, Mem tune li ser taxtê xonkar, li navê cîyane.*
202. *Mêze kir, dengê Memê tê li nav tewlê nijdîyane.*
- \*\*\*
203. *Dakete jêr ba Memê, go: “Memê te xêr e?.,*
- \*\*\*
204. *Memê go: “Şevê<sup>129</sup> çûnî li qesrê sipî li taxtê xonkar Zînê dibînim.*
205. *Carîyan û gurcîyan diwesînim.<sup>130</sup>*

<sup>126</sup> heramî

<sup>127</sup> biçûka

<sup>128</sup> xwe ya

<sup>129</sup> Şeva

206. Çiran û feneran vêdixînim.
207. Wesmê bajarî Mu'xribistanê qesabayî Cizîrê pê dinêmînim.
208. Çarê û mikûnê li wî şuxlî nabînim.
209. Li textê xonkar bi şûn da vedigerînim.
210. Şûr û hamêlîyan di mabênê xwe da datînim.
211. Sibe da radibim, mîvana şevan nabînim.
212. Êqil wenda dikim, 'aşq û sawdan heltînim.
213. Ji mi ra dîyê kûr, bavî ixtîyar, her du apê korocax biwesînin.
214. Nên û xwê helal kim, dikime welatî xwe bi maqamê Zînê ra biguherînim.”
215. Ji Memê ra dîyê kûr, bavî ixtîyar, her du apê korocax diwesînin.

\*\*\*

216. Dîya Memê go: „ Memo! Memê Alîyano!
217. Biçûk û derdî girano!
218. Bilmezo, rêwîyî li rîyano!
219. Istixwarê weletî xerîbano!
220. Belkî te ji xwe ra dîye xewneke şevano!
221. Dikî sebê xewnê şevan dîyê kûr, bavî ixtîyar, her du apê warwenda bêlî li berî

qapîyan û camîyano!”

\*\*\*

222. Memê go: “Dilê min lîyan e.
223. Salê min hindik in, derdî min giran e.
224. Li serî min rabûne sawda û jane.
225. Hinik dibêne bayî cinan û pêrîyan e.
226. Hinik debêne 'aşq û sewdê dilan e.

\*\*\*

227. Ji mi ra nalbend biwesînin.
228. Na'lê Bozê Rewan vêxînin.
229. Kurcê <sup>131</sup> zêran û cewheran di <sup>132</sup> terkîyê min bişidînin.
230. Nên û xwê helal kin, ez dikim herim dermanekî ji derdî xwe ra bibînim.”
231. Çare û mikûnê li Memê nabînin.
232. Bozê Rewan ji qesr û qona'xê giran bi der dixînin.

---

<sup>130</sup> Li vir beytbêj xwe şaş kirîye, li cîhê ku bêje koleyan diwesînim, dibêje: carîyan û gurcîyan diwesînim. Carî û gurcî yên Zînê ne, ne yên Memê.

<sup>131</sup> xurcê

<sup>132</sup> li

233. *Memî biçûk bi ser digêrinin.*

234. *Bajarê Mu'xribistanê yas û reşa Memê digêrinin.*

\*\*\*

235. *Mem bi derket ji bajarî Mu'xribistanê, şeş mehan li çol û kerbelan bi Bozê Rewan gerîya.*

236. *Rojekî mêze kir, ku di mabênê dîwar û zîqaqan da ye.*

237. *Çavê xwe nihêrî, ku va bajarê Mu'xribistanê ye.*

238. *Vê<sup>133</sup> şevê Mem li xanekê peya bû.*

239. *Sibe da Mem bi der ket ji bajarê Mu'xribê,*

240. *Xizir elêyhisselam hate pêşîya Memê, Mem xiste ser rîya bajarê Cizîrê Botanê.*

241. *Pismamê Zînê, Qumsî Beko ixtîyar bû. Ji xwe ra digo: „Ezê Zînê ji xwe ra bixwazim.“*

242. *Beko rojekê di ber qesra Zînê ra derbas bû.*

243. *Çavê xwe li Zînê ket. Zîn (dî) ku di yas û reşan da ye.*

244. *Beko hate ba qîza xwe.*

245. *Qîza Beko xizmetkarê<sup>134</sup> Zînê ye.*

246. *Beko ji qîza xwe ra go: „Çima xatûnê<sup>135</sup> te di va halan da ye?*

247. *Qîza Beko -a wî jî navî wî<sup>136</sup> Zîn bû-. Got ji bavê xwe ra: „Va şeş mehan e,<sup>137</sup> halê xatûnê min va ya, sirê<sup>138</sup> xwe nade kesekî.“*

248. *Beko go: „Salê min heftê û dudu ne, kesekî negotîye: „Rehme li bavî Beko be. Ji mi ra kitab û mis'hefa wîne, ez bibînim, derdî xanimê te çi ye.“*

249. *Beko kitab di ber xwe danî, ji qîza xwe ra go:*

\*\*\*

250. *„Sibe roja îne ye, wê suwarek were ber şettî Cizîrê, gêcûtan pirs ke, were Zînê zebt bike, tu here wî suwarî bixapîne.*

251. *Şalê te ji xwe ra birevîne.*

252. *Ku nebû, di goleke masîyan hilweşîne.*

253. *Mem ku di bajarê Cizîrê keve, qîz û bûk wê aşiqê bibin, 'xayiret û namûs namîne.’”*

\*\*\*

---

<sup>133</sup> wê

<sup>134</sup> xizmetkara

<sup>135</sup> xatûna

<sup>136</sup> navê wê

<sup>137</sup> meh in

<sup>138</sup> Sirra xwe.

254. *Qîza Beko çû ba Zînê, go: "Zînê, qatek kinc bi mi de, bavî min fuqare ye, ez dikim bi hevalê xwe ra herime sa 'hrê."*

255. *Zînê buxçak li pêş qîza Beko danî.*

256. *Qîza Beko teîşt û biroşê kincan hilanî.*

257. *Li ber şettê Cizîrê teîşt û biroşê kincan danî.*

258. *Rîya suwarê Bozê (Rewan) di pêş çavê xwe hilanî.*

\*\*\*

259. *Wextê nîvro, suwarê Bozê (Rewan) bi der ket, hate ber şettê Cizîrê. Ban kire qîza Beko: "Lê xwêngê! Dilê min liyan e.*

260. *Adetê xarîban gêçûtan pirs dikin ji giştî qîzan e. 139*

261. *Ez merîkî xerîb im, nas nakim gêçûtê şettê bi du firqan e.*

262. *Gêçûtê bajarê we kîjan e?"*

263. *Qîzê <sup>140</sup> Beko go: "Memo! Dilê min xan e.*

264. *Mi ji girî wenda kirîye bînayê çavane.*

265. *Va ketîye mehê <sup>141</sup> şeşane.*

266. *Min heram kirîye êmegî cotane.*

267. *Min heram kirîye rojê 'aydîyan û da'wetane.*

268. *Ez hîro Memê xerîb dibînime li ber şettî Cizîrê bi çavê serîyane.*

269. *Were, bi destî min bigre, mi bavêj terkîya Bozê Rewane.*

270. *Berê mi bide cê û maqamê te kîjane."*

\*\*\*

271. *Memê go: "Tu ne Zîn î, tu qîza Beko yî derewîn î.*

272. *Tu dikî li ber şettî Cizîrê rêwîyan bixapînî."*

\*\*\*

273. *Qîza Beko go: "Memo! Dilê min xan e!*

274. *Min benzî xwe pozmiş kirîye, insan mîne gulan e.*

275. *Mêze dikim, Bozê Rewan, ji bîst û çar bizmaran du bizmar bi niga da nemane.*

276. *Goştî Boz helîyaye, hestî dimane.*

277. *Bi destî min bigre, bavê terkîya Bozê Rewane.*

278. *Bozî bi qayret e, wê berî me bide bajarê Mu'xribistanê wêrane."*

\*\*\*

---

<sup>139</sup> kişî qîzan : qîzên camêran

<sup>140</sup> Qîza

<sup>141</sup> meha

279. *Memê go: "Ez Memekî dîn im.*
280. *Çare û munkûnê <sup>142</sup>li 'eşqê dilan nabînim.*
281. *Ezê xwe şettê Cizîrê biqelibînim.*
282. *Ezê melhemekî ji birînê dilî xwe ra wînim"*
- \*\*\*
283. *Qîzê Beko go: "Memo! Dilê min xan e.*
284. *Berî xwe bide kirasşoyê kincane.*
285. *Gêçûtî bajarî me nêzik e, derbas ke şettê bi du firqane.*
286. *Bibîne mîvana xwe (ya) şevane."*
287. *Memê go: "Lê ît qizî 'amelî nabe bi jinane.*
288. *Mêze dikim li wî gêçûtî, ne rîya karwan û tucaran e.*
289. *Goleke meyandî, tê da têye şerpînê maran û masîyane.*
290. *Ezê gêçûtan pirs kime ji kişio 'xlûyekî mêrane."*
291. *Memê terikand kirasşoya kincane.*
292. *Kete bi ber şettê Cizîra Botane.*
293. *Mêze kir yekî pîrî ixtîyar, go: "O'xul! Memê min, bi mi ra dibêjin Xizir elêyhisselam, ez dorexî dikim rîyê xerîban e.*
294. *Berî xwe bide bavî xweyî ixtîyar e, derbas ke şettê bi du firqane.*
295. *Bibîne mîvana xwe (ya) şevane."*
296. *Memê da nav şettê Cizîrê; mêze kir li qîza Bekoyî 'Ewane.*
297. *Daw û dernik <sup>143</sup> hilmalane.*
298. *Da nav şettê Cizîrê, îçî şêtt da girt bi dizgîna Bozê Rewane.*
299. *Go: "Memo! Ya tu yê min bavêjî terkîya Bozê Rewane.*
300. *Yan ezê bi qîrîn kim li gelî pismaman gîyane.*
301. *Wê me bavêjin ber devî arî şêşxanane.*
302. *Wê me bikine yêmê masîyane.*
303. *Hîro hatîye acil û va'da me her duyane."*
304. *Memê go: "Rebbî 'alemê bike mirazî 'eşqîyan gîyane!*
305. *Ku bibe mirazî min û mîvanê <sup>144</sup> min e şevane.*
306. *Ezê bi destî te bigrim, bavêjim qesr û qona 'xê girane.*
307. *Nabêm bi halalî, li şûnê carîyan û gurcîyane."*

<sup>142</sup> mumkunê (imkanê)

<sup>143</sup> derling

<sup>144</sup> mîvana min e



308. *Qîzê Beko go: “Memo! Ji te naxwazim raketinê hamêzê û cîyane.*
309. *Bira ji şeş mehan carê bibînim bejnê begî biçûk bi çavê serîyane.*
- \*\*\*
310. *Memo! Ez Zîn im,*
311. *Qîza şeytan Bekoyî derewîn im.*
312. *Ezê şîretekî li Memî xerîb dînim.*
- \*\*\*
313. *Ku tu ketî bajarî Cizîrê - bi bavî mi ra dibêjin Qumsî Beko- Tuyê bibêji: “Ez nas nakim nîşan û wesmê wî.”: Li serê wî seyidê şêxan e.*
314. *Di ustû da benî tizbîyan e.*
315. *Di nîga da solê keskîn, di desta ekazeyî derwêşane.*
316. *Malê wî bişewite, berîyê xwe tijê jar û derman e.*
317. *Siban û êvaran digere li navê malane.*
318. *Xera dike mabênê dilan û ‘eşqîyane.*
319. *Îşê wî merî fizûlî şeytan e.*
320. *Peya mebe li qona ‘xê Bekoyî ‘Ewan e.*
321. *Pirs ke qona ‘xê ‘Hesen, Çeko, Qeretaclîn, her sê Celalîyan e.*
322. *Zebt kirine sînore ‘Êcem, hafê bilind, derbendê asê, diqetînin<sup>145</sup> merakê dilan e.”*
323. *Mem kete bajarê Cizîrê, mêze kir, yekî bi wê nîşan e.*
324. *Girt bi dizgîna Bozê Rewan e.*
325. *Go: “Birazê! Peya be, ez û bi bavî te va bi hev ra bira ne.*
326. *Bavê te ‘Alî Paşa, sê bira ne.*
327. *Bi min va, ez birayê çaran im, em her çar korê korocax in. Ji bavî te ra xwestin qîzê wezîran û hakîman e.*
328. *Paşê jê ra yek xwestin ji Kurêşîyan, ji sinsîlê hazretî Silêymane.*
329. *Navê Şirîn Zelîxane.*
330. *Sa ‘ata ku tu bi dinyê ketî, me kilît lê xistin li devê xezînane.*
331. *Me bela kir malî dinyayê, ku rebbî ‘alemê tu dayî me her çar birane.*
332. *Bi te şên bû ocaxî me her çarane.*
333. *Bi ro û bi şev dikişînim hasretê girane.*
334. *Rojekê birazê xwe bibînim bi çavê serîyane.*

<sup>145</sup> diqedînin

335. *Rebbi 'alemê hasretan nêle* <sup>146</sup> *di dilane.*
336. *Hîro min birazê xwe dî di qesabayî Cizîra Botane.*
337. *Peya be, ez birazê xwe vejerînim bi tewlê hespane.*
338. *Bi qaterî tûlîyan e,* <sup>147</sup>
339. *Bi gelî carîyan û gurcîyane.*
340. *Bi ermîxanê girane."*
341. *Memê go: "Ez merîkî xerîbî biçûk im, natime xurbetê û hedîyane.*
342. *Ez merîkî birîndar im, dikim ji xwe ra bigerim li hekîman û dermanane.*
343. *Tu îş û gûcî min tune, bi mabênê her du îxtîyarane.*
344. *Mem nabîne çare û munkûnê ji Bekoyî 'Ewane.*
345. *Bozê Rewan da (dide) navî zenguyane.*
346. *Beko ma (dimîne) di zûwax* <sup>148</sup> *û tarîkane.*
347. *Mem sekîni li meydaneke bajarê Cizîra Botane.*
348. *Sî û du esnafan terkandin san'et û li serî Memê civîyane.*
349. *Mem biçûk e, mêze kirin li cemala Memê û li resmê Bozê Rewane.*
350. *Memê dî, rûniştine cim'ateke mêrane.*
351. *Yekî ji cim'atê dest avête dizgîna Bozê Rewane.*
352. *Go: "Keko! Ez merîkî xerîbî bêkes im, ku îşî te diqede bi malî dinyayê, ezê li oxirê te deyinim tewlê nijdîyane.*
353. *Sandixê zêrane.*
354. *Îşî te ku naqede bi malî dinyayê, sandixê zêrane.*
355. *Malê mi danî tunebûnê mêrane."*
356. *Memê go: " îş û gûcî min ku biqede bi malê dinyayê, li terkîyê Bozê Rewan min şidandî qetilê şanzdeh mêrane.*
357. *Îşî min bi qebzê şûran e.*
358. *Bi ser da bi arî şeşxanan e.*
359. *Di pê wî ra bi şor û mehkamê giran e."*
360. *Wî xerîbî girt bi dizgîna Bozê Rewane.*
361. *Kişande qesrê qona'xa her sê Celalîyane.*
362. *Reşma Boz avêtine serî sê tewlîyane.*
363. *'Hesen û Çeko û Qeretaclîn her sê bira ne.*

<sup>146</sup> nahêle

<sup>147</sup> curek hêştirê bi hirî ye.

<sup>148</sup> zuqaq, sûkak, sûk

364. *Peya bûn hewl û hayatî girane.*
365. *Ketine bin pî Memê, bi derxistine qesr û qona 'xane.*
366. *'Hesen î bi aqil e, mêze kir li Memê Alîyane.*
367. *Ban kire her du birane.*
368. *Go: " Birano! Mem tufalek e, biçûk e, ne wexta Memê û welatane.*
369. *Yan ji qetlî Memê ra rabîye fermane.*
370. *Yan Mem sirgûnê wezîran e.*
371. *Yan Memê helanî 'eşq û sawdê dilane.*
372. *Bi pêşîyê Kanîyê Gulan e.*
373. *Mekanê keçikan û bûkan e.*
374. *Sibe ji Memê ra vekin penceran û camane.*
375. *Bira Mem mêze ke li komê gişkîyane.*
376. *Ka kula dilê Memê, sawda serî Memê, derdê canî Memê, merhema birînî*  
*Memê ji komê gîyan kêjan e?*
377. *Bira bi mi da <sup>149</sup> risqatê heftekê û dudîyane.*
378. *Heta biqedînim mirazî her du 'eşqîyane.*
379. *Belkî Memê dîye Sitî helala mine heft salan e.*
380. *Lê kin xeml û xişrê girane.*
381. *Bi destî Sitîyê bigirin, bavêjin terkîya Bozê Rewane.*
382. *Vê ra derbas kin şettê Cizîrê Botane.*
383. *Bira berî Sitîyê bide ka cî û maqamê Memê kîjan e?"*
384. *Sibe da Zîn rabû ku dilê xwe dixwazî ava Kanîka Gulane.*
385. *Ban kire carîyan û gurcîyane.*
386. *Go: "Werin, şeş mehe ne, mi heram kir avê Kanîyê Gulane.*
387. *Mi tobe kir êmegî cotane.*
388. *Mi rakirin 'aynik û kil û dermane.*
389. *Ji mi ra wînin tasek av ji Kanîyê Gulane."*
390. *Carîyek rabû, kete mabênê satilane.*
391. *Di pêş qona 'xê 'Hesen ra berî xwe da Kanîya Gulane.*
392. *Mêze kir, bajarê Cizîrê li dora qesra 'Hesen civîyane.*
- \*\*\*
393. *Carî pirs kir: "We xêr e?"*

---

<sup>149</sup> de

394. *Gotin: "mîvanekî 'Hesen hatîye, em dikine Cemalê wî bibînin."*
395. *Carî di pencerê ra çavê xwe li Memê ket. Aqil wenda kir, bi sawdê ket. Çavê xwe vekirin ku kesek nemaye, wexteke şevê ye.*
396. *Zînê destîyek ço li ba xwe danî, bi carîyan ra go: "Çi çax ku hew carîya hat, dengî li mi kin."*
397. *Carî rabû, şev e. Berê xwe poşman da qona'xa Zînê.*
398. *Qapîyê qona'xê kuta.*
399. *Carîyan deng li Zînê kirin.*
400. *Zînê 'emir kir: "Qapîyê Qona'xê vekin. Wê carîyê wînin huzûrê min."*
401. *Carî hate huzûra Zînê. Zînê go: "Tu li ku mayî? Hew sibe, va şev."*
402. *Carî go: "Tu bi hasreta ku pê dinalî kî, li min mexîne, min nedî, min bihistîye, ku wezîr li merîyan têne xezebê, berê merîyan mehakîme dîkin, paşê bi serî merîyan dixînin."*
403. *Zînê go: "Bibê!"*
404. *Carî go: "Ez çûme ber qona'xê 'Hesen, mi dî, ahalîyê Cizirê li pêş qona'xê civîyane."*
405. *Min pîrs kir: "We xêr e?" Ji min ra gotin: "Mivanekî 'Hesen î xerîb hatîye, em li cemalê wî mêze dikine."*
406. *Mi di pencerê ra mêze kir, min cemalê Memê dî, min aqil wenda kir, ez bayilmîş bûm, mi çavê xwe vekirin: ku kesek li dora min nemaye. Satirê<sup>150</sup> avê ji min birine, kor û poşman mi berî xwe da huzûrê te."*
- \*\*\*
407. *Zînê go: "Hew çito mîvan e?"*
408. *Go: "Jê ra dibêjine Mem Axa, mîrê meqbûl, lawê 'Alî Paşa, mîrê bajarê Mu'xribistanê, xalqê sawdalî, sûwarê Bozê Rewan e."*
- \*\*\*
409. *Zîn ji carîyê hate înamê, go: "rabe, feneran vêxîne, Ji mi ra qîzê ekabiran û bûkê begleran, çendekan bi hev gihîne, Bibêje, sibe Zîn dike ji yas û reşan bi derkeve, here ser Kanîya Gulan, sa'hrê û kêfê."*
- \*\*\*
410. *Carîyê çend qîz û bûk anîne qona'xa Zînê. (Zîna Zêdan)*
411. *Sibe da Zînê bejna zirav da elwanan.*
412. *Kete xemilan û xişran.*

<sup>150</sup> satilê

413. *Kete pêşîya hevalan.*
414. *Berê xwe dane Kanîya Gulan.*
- \*\*\*
415. *Memê çavê xwe li Zînê ket. Memê ban kirê, go: “Lê Zînê!*
416. *Avîyake mine derewînê!*
417. *Merhema dilî minî bi birînê!*
418. *Sedema canî minî şîrînê!*
419. *Tu çima halê mîvanê xerîb birîndar pirs nakî, nabînê?”*
- \*\*\*
420. *Zînê go: “Memo! Ez heta niha di yas û reşan da bûm; eksigan pirs kirina xwe dike, çi be?”*
- \*\*\*
421. *Hêlê jûnîyê min jikestin<sup>151</sup>, ji fedîyê bav û birane.”*
422. *Çeko mêze kir li benzî Memê, benzî Memê kişîya, bû benzî mirîyan e.*
423. *Simêlê zerî li serî lêvan da jikîyane.<sup>152</sup>*
424. *Çavî Memê bû çavî lokane.*
425. *Hêstir têne li henarê rûyane.*
426. *Nigî Memê erdê nagirî, Mem di bin çava ra mêze dikîye li qebzê lahûrê girane.*
427. *Li cotê îpegan dike bajo ser Kanîya Gulane.*
428. *Çeko li alî heremê ban kire ‘Hesen, go: “ ‘Heseno! ‘eşqê dilî Memê, derdê canî Memê, ne Sitî ye, helala te heft salan e.*
429. *Zîn dergistîya<sup>153</sup> min e sê salan e.*
430. *Bira li canê min ‘heram be, mi bexşîş kir Memî ‘xerîb, mivanê me yî du şevan e.*
431. *Were mêze ke li îş û karî her du ‘eşqîyane!”*
432. *‘Hesenî bira hat mêze kir hevalê Zînê, kesek nemaye, gişkî revîyane.*
433. *‘Hesen ban kire gelî seyîsan û kolane.*
434. *Go: “Li Bozê Rewan kin rextane.*
435. *Bikişînin pêş qapîyê qona’xê, lê suwar kin Memî ‘xerîb, dikim bi hev gihînim her du derdlîyane.”*

---

<sup>151</sup> şikestin

<sup>152</sup> şikîyane

<sup>153</sup> destgirtîya

436. *Memê go: “ ‘Heseno! Ez Mem im, Memekî dîn im.*  
 437. *Çarê û munkûnê li ‘eşqê dilan nabînim.*  
 438. *Wînin, destê min ji para bişidînin.*  
 439. *Îçî qona ‘xê ji xûnê min bexemlînin.*  
 440. *Mi bi qurbanê çavê belek bejna zirav bigerînin.*  
 441. *Kêmayeke mezin e, lîyaqê we nabînim.*  
 442. *Ah û yaxusê <sup>154</sup> mi ji qapîyê qona ‘xê xwe bi derxînin*  
 443. *Erdî oyînaşa sûwêr û hespê ye, ezê berê ordîli ‘xê Ezirganî helînim.*  
 444. *Cotê ipegan <sup>155</sup> bişuxlînim.*  
 445. *Kostekê lahûrê giran bifiltînim.*  
 446. *Xûnê li tarîq û zuwaxan <sup>156</sup> bimeşînim.*  
 447. *Gulîyê sor bi destê zorê birevînim.”*  
 448. *‘Hesen ban kire kolan: “Bilezînin!*  
 449. *Bozê Rewan ji tewlê bikişînin!*  
 450. *Rextan û tengan bişidînin!*  
 451. *Memî derdlî bi Kanîya Gulan (bi)gînin!”*  
 \*\*\*  
 452. *Mem li Bozê Rewan suwar kirin, ‘Hesen bi dizgîna Bozê Rewan girt, her du*  
*biran xwe avêtine zenguyan.*  
 453. *Kişandine ser Kanîya Gulan.*  
 \*\*\*  
 454. *Memê go: “ Lê, Zînê! Ro helatîye, wa bi jêr e.*  
 455. *Şewqa xwe da şettê Çizîrê, qasr û qona ‘xa ‘Hesen û Çeko, Kanîya Gulan dewr*  
*û hawêre.*  
 456. *Aqil li serî min nema, nizanîm va çi çax e, te bi xêr e!?”*  
 \*\*\*  
 457. *Mem go: ” Xweying, dilî min lîyan e!*  
 458. *Tu bi ‘hasretê wî dilî kî bi mi de tasek av, ji Kanîya Gulane.”*  
 459. *Zînê go: “Memo! Mêze dikim li xortikê bajarî Cizîrê, dest avêtine qabzî*  
*xenceran e.*  
 460. *Sekinîn <sup>157</sup> li serî koşane.*

<sup>154</sup> yazu ‘xê/yazi ‘xê

<sup>155</sup> Cotê tepancan

<sup>156</sup> zukakan

461. *Mêze dikine li me her du 'eşqîyane.*
462. *Ez nikanim wînim je te ra tasa avê ji Kanîya Gulane."*
463. *Memê go: "Zînê! Sebê xatirî teyî giran, min terikandin dîyê kûr, bavî ixtîyar, her du apê warwenda li berî qapîyane.*
464. *Êl û 'aşîrê girane.*
465. *Ketime rê û çolane.*
466. *Tu bi mi de tasek av ji Kanîya Gulane!"*
- \*\*\*
467. *Zînê go: "Memo! Ez Zîn im.*
468. *Ji 'eşqê dilan bi birîn im.*
469. *Mehê şeşan e, hêstira bi ro, bi şev dibarînim.*
470. *Danzdeh gulîyan di ber kêr û maqesan datînim.*
471. *Şînê te mînê şînê mirîyan digerînim.*
472. *Çare û munkun li 'eşqê dilan nabînim."*
- \*\*\*
473. *Memê go: " Ez Mem im, Memekî şek e.*
474. *Dûr û nêzik bi minî yek e.*
475. *Tasek av bi mi de, bi melhema birîne mi <sup>158</sup> ke!"*
- \*\*\*
476. *Zînê go: " Memo! Dilê min xan e.*
477. *Di serê min û te ra sekinî <sup>159</sup> Celalîyê bajarê Cizîrê, sê peya ne.*
478. *'Hesen û Çako û Qarataclîn, sê peya <sup>160</sup> ne.*
479. *Rebbî 'alemê li vê dunyayê haya û hîjab daye me jinane.*
480. *Ez nikanim wînim ji te ra tasa avê ji Kanîya Gulane."*
- \*\*\*
481. *Zînê go: "Memo! Were! Ez çogê xwe dînim, li serî kanîyê serê xwe bide ser çogê min, bera gerdenî sipî, li simêlê zerî sîyê bike, ji min ra pir çêtir e ji tasa avê ku ez wînim."*
- \*\*\*
482. *Zînê tas kire destê xwe, ber da îçî kanîyê, destî xwe avête cotî memikan.*
483. *Go: "Memo! Bi bira tu bîyê mînê îspirî destan.*

<sup>157</sup> sekinîne

<sup>158</sup> mi (me)

<sup>159</sup> sekinîne

<sup>160</sup> bira ne

484. *Bayî 'xerbî xistîye li qanadan û peran.*
485. *Zînê go: "Cebbar! Tasa avê ji melhemê birînê mi ran."*
486. *Zîn rûnişt li berî Kanîya Gulan.*
- \*\*\*
487. *Memê serî xwe da ser çoga mîvana şevane.*
488. *Hatine hev bi şor û mişavirane.*
489. *Bi gazincê dilane.*
- \*\*\*
490. *Zînê go: "Memo! 'Hesenî pismam ku niha em her du 'eşqî ji hev qetandin, ez ê te li ku bibînim?"*
- \*\*\*
491. *Memê go: "Bawerîya min bi 'Hesenî bira heye, wê hêlê 'heramê ji mi ra boş bike.*
492. *Wê min di koşkî Sitîyê ke.*
493. *Tu jî di maqamî xwe da yî, ka rebbê min çi dike."*
- \*\*\*
494. *'Hesen 'hew di vê şorê da bi dizgîna Boz girt.*
495. *Zînê ji fedîyan ra berî xwe da qona'xa xwe.*
496. *Mem suwar bû. 'Hasen Boz kişande qona'xê.*
497. *Mem kire hêla 'heramê.*
498. *Rojekê Qumsî Beko çû ber qona'xa Mîr 'Azdîn, rûnişt û girîya.*
499. *Mîr 'Azdîn bi der ket qapîyê qona'xê, mêze kir, Beko digirîya.*
500. *Ji Bêko ra got: "Apo! Tu çima digirî?"*
501. *Go: "O'xil! Nanekî teyî pir hayif e. Xelq dixwe û dare, 'hukum û 'hukûmat li qona'xa 'Hesen e.*
502. *Dayinê jinan li qona'xa 'Hesen e.*
503. *Ez sebê vê yekê digirîm."*
504. *Mîr 'Azdîn go: "Apo! 'Hesen jî pismamê min e, bira li qona'xa wî be."*
505. *Beko go: "Mîvanekî 'Hesen hatîye, pirî cemîl e, dikine Zînê pê dine.*
506. *Bavê Memê merîkî 'heramxurî diz bû, fereze Memî cemîl e.*
507. *Sibe kêmayak bibe, wê were di namûsê mi keve.*
508. *Emir bike, di gûna bavê te ra<sup>161</sup> sekman û sûwar em diçûne seyda pezkûfîyan.*

---

<sup>161</sup> da



509. *Li zewq û sefayê em digerîyan.*
510. *Te teyir û bocî kirine qona 'xane, ji dengî van xewê me nê;*
511. *Emir bike, em herine seydê."*
512. *Mîr 'Azdîn go: "Tu çima digrî? Kînga tu dibêjî, em herine seydê."*
513. *'Hesen va şora bihîst, dest avête qabzî şûr, bi Beko ra go: " Hayî, xabîs! Çi îşê te heye mabênê dilan e.*
514. *Ez li ber şorekê ketime, ez bibêm bi Mîr 'Azdîn ra: 'Wîne, em Zînê bi Memê din. (Em Zînê bidin Memê Alîyane)*
515. *Tirsa min e, ku dilî Mîr ji min bimîne, ji mi ra bibêje: Zîn ne carîyak e, va sê sal in xwasteka birayî tê, ezê çito baxşîşe mîvanê te kim?*
516. *Beko go: "Mi go, zava û xesûrê hev in, bira hev du bibînin."*
517. *Mîr ban kire kole, go: "Ban ke li bajarî Cizîrê, bibêje, kesek sibe da merine tu karî. Beg dike sibe here seydê."*
518. *Beko go: "Mîr, bira werg ban neke, bira bibêje: "sekman bi tîfangê xwe va, seyyadî bi tajîyê xwe va, her kes be mîvanê xwe va werin, em herine seydê".*
519. *Mîr go bi kole ra: "Wa ban ke."*
520. *Hesen çû alê 'heremê, go: "Memo! Tidarekî xwe bibîne, em herine seydê, hevalîyê te bi me ra hetanî pêşîyê bajêr e.*
- \*\*\*
521. *Ez ê te bi şî va<sup>162</sup> li bejnê zirav vegerînim.*
522. *Te bi xwe ra li seydê pezkuvîyan nagerînim."*
- \*\*\*
523. *Sitîyê bihîst va şora, go: " 'Heseno! Malê Beko bişewite, dike Memê bi xwe ra bigerîne bi seyda pezkuvîyane.*
524. *'Heram kin li bejna silahan û çekane.*
525. *'Heram kin pîrî cima 'tan û odane.*
526. *Li şûnê şalan girêdin kitanê jinane.*
527. *Mem tufalekî 'xerîbî biçûk e, Beko wê wenda bike suwarê Bozê Rewane.*
528. *Hatanî roja qametê bi mirinê me gîyane."*
529. *Sibe bû, suwar û sekman bi derketin ji bajarê Cizîrê, hetanî hêlê baxçane.*
530. *Mem veqetîya ji bejna zirav.*

---

<sup>162</sup> bi şûn va

531. *Mem ji hevalan bi şin va ma. Qalemtiraş bi derxist, zendê xwe qalaşt, suwar bû, gihîşte hevala.*

532. *'Hesen go: "Memo! Te çima wa kir? Min bi te ra go, ez ê te li bejnê zirav vegeînim."*

533. *Memê go: "Zendê min di mabênê dîwêr û zengûyê da ma, bi birîn bû."*

534. *'Hesen go: "Tu vegere, em e herine seydê."*

535. *Mem vegeîya, suwar û sekman pêş da çûn.*

536. *Beko go ji mîr ra: "Mîrê min, di van da hene tucar û 'xerîb in, wana risqatê pê de, bira vegeînin."*

537. *Mîr emir kir, mîvan û 'xerîb vegeîyan, sekman pêş ta çûn.*

538. *Beko go: "Mîrê min, di van da merî hene, fuqare ne, ji îdareyî xwe aciz in, emir bike, bira vegeînin."*

539. *Mîr emir kir, her kesek vegeîya.*

540. *Ma mîr, 'Hesen û Çeko û Beko, bi xizmekarê xwe va.*

541. *Beko go: "Mîrê min, emir bike, em jî vegeînin."*

542. *Mîr go: "Werin, em vegeînin." Vegeîyan.*

543. *'Hesen hate ba Çeko.*

544. *'Hesen go: "Niha Zînê cem Memê ye. Beko ku her dîyan li ba hev bibîne, wê ji me ra rezîlyake mezin wîne.*

\*\*\*

545. *Hun wînin, hespê xwe bibeîzînin,*

546. *Şalê hûn Zînê ji ba Memê biderînin."*

547. *Çeko go: "Were, em hespan bibeîzînin.*

548. *Em çayî û xerabîyê va heywanan bibînin."*

549. *Ji hevdu meydan xwestin.*

\*\*\*

550. *Qarataclîn bezand, Çeko bi dû ket.*

551. *Beko go: "Mîrê min, wana hesp bihecandin."*

552. *Mîr çiqas ban kir, guhi nedanê. Hatanî qona'xa Mîr 'Azdîn ajotin.*

553. *Mem û bi Zînê va ketine ken û mesxeran e.*

554. *Mêze kirin, Çeko bi Qarataclîn va li qona'xê Mîr 'Azdîn peya bûne.*

555. *Mem û bi Zînê va man her du di oda Mîr 'Azdîn da.*

556. *Mîr 'Azdîn bi hevala va hatin, peya bûn.*

557. *Zîn ma di bin kurkê Memê da.*

558. *Mîr kete odê, Mem dike ji ber Mîr qîyam bike, Zînê di bin kurk da ye.*
559. *Mem ranabe, xezeba wezîran e, çar û neçar, Mem ranebû.*
560. *Mîr ‘Azdîn rûnişt li odê.*
561. *Beko çavê xwe nabire ji kurkê Memê.*
562. *‘Hesen mêze kir li Memê.*
563. *Memê gulîyê Zînê rabere ‘Hesen kir.*
564. *‘Hesen rabû, xwe li dînî na.*
565. *Dakete îçê hewlî, kişand lahûrê giran, danzdeh hesp kuştin, qona’x şa’etan<sup>163</sup> ,  
lawkî xwe çê kire nav arê qona’xê, ban kire Sitîyê, go:*
- \*\*\*
566. *“Sitîyê! Bane Mîr ‘Azdîn ke, bira xwe bi îmdadê te gihîne.*
567. *Ez ku bi te gêm<sup>164</sup> ez ê te bi qurbanê mîvanî xo yî ‘xerîb bigerînim.*
568. *Ez ê belakê mezin ji canî te ra wînim.”*
569. *Sitîyê ban kire Mîr ‘Azdîn; go: “Mîro! Mîr ‘Azdîno! Sawda bi serî ‘Hesen  
rabîye, xanî û koşkan heldiweşîne.*
570. *Lawkî heft rokî ji pêşîyê min radike dişewitîne.*
571. *Çel nig merduyan e jinîyê min şikestine, ku mêrîyake te hê, xwe bi xwêngê xwe  
gihîne.”*
- \*\*\*
572. *Mîr rabû, dakete jêr.*
573. *Beko ji Mîr veneqetîya.*
574. *Zîn ji bin kurkê Memê bi derket, berî xwe da oda xwe.*
575. *Beko ji mîr ra got: “Mîr! Mêze ke di<sup>165</sup> dûmanê.” (damanê ?)*
576. *Mîr mêze kir, çavê Mîr li dawa Zînê ket.*
577. *Zibûnê Zînê û ‘herema Mîr her du rengêk bû.*
578. *Mîr go: “Acaba! Va Zîn bû, yan ‘herema mi bû?”*
579. *‘Amelî bi jinan nabe. Ku Zîn e, min soz daye Memê, lê ku ‘herema min e, ez ê  
çi bikim?”*
580. *‘Hesen girtin, helkişandine odê.*
- \*\*\*
581. *Go: “Werin, em şorekê ji boyî Memê û Zînê em dînin.*

<sup>163</sup> şa’etand (şewitand yan şî’etandin ?),

<sup>164</sup> bigihêm,

<sup>165</sup> (li)

582. Çarekê li vî îşî em bibînin.
583. “Beko go: “Oyîni setrencê dînin,
584. Sê oyîna bi Memê ra qewl û qeraran dînin.
585. Yan gulîyê Zîne bi destî Memê xînin,
586. Yan Memê bavêjin binê zîndana, Memê têda biterikînin.”
- \*\*\*
587. Sê oyîn şert kirin bi Memê ra; şurût danîn ku: “Te ez vexwarim, ez ê gulîyê Zîne bi te dim; ku min tu vexwarî, pênc salan te bavêm binî zîndanê.”
588. Li berê koşkê Zîne satrenc danîn, lîstin.
589. Memê du oyîn ji Mîr vexwarin; oyîne sisîya lîstin.
590. Beko çû koşkê Zîne, go: “Zîne! Ji te ra mizgîn, birayê te Mîr ‘Azdîn tu dayî Memê.”
591. Zîne go: “Tu merîkî kezab î, ez bi kîjan şorê te îna bikim?”
592. Beko go: “Hûn jin in, aqilî we kême; tu îna nakî, were ber pencerê, li oyîni Mîr ‘Azdîn û Memê mêze ke.”
593. Zîne rabû, sekinî, mêze kir li oyîni her duyan.
594. Beko çûye jêr, go: “Mîr! Şîne xwe biguhêrin.”
595. Piştê Memê bi Zîne da bû, vê carê berê Memê hate hemberê Zîne.
596. Memê oyîn ji bîr kir, aqil li serî nema, her du oyîne Memê Mîr jê vexwarin.
597. Emrê kolan kirin, pê û baskê Memê girêdan, Mem avêtine îçî zîndanê.
598. ‘Hesen û Çeko û Qeretaclîn go: “Mîr! Te em bi jinekê guhêrin, va welata bira li me ‘heram be!”
599. Suwar bûn û çûn welatê Şamê.
600. Man semtê sê salan.
601. Rojekê serî Mîr ‘Azdîn teng bû, go: “Min pismamê xwe her yek ejderhayê sebê jinekê mi şandin welatê ‘xeriban.”
602. Se’iyak girt, şande pê ‘Hesen û Çeko û Qeretaclîn: “Werin, ez bikim bi emrî we.
603. Suwar bûn ji bajarê Şamê, hatine Cizîrê.
604. Wê roja îne têkevin.
605. Beko şeş henar anîn, zikî henaran sisîyan ji ja’rê tijî kir.
606. Dane dest qîza xwe, go: “Here, bane Zîne ke, va henaran bibine ji Memê ra.
607. Mizgîne pê din, bibên: “Memo, hîro ‘Hesenî birayê te wê were te biderxîne, Zîne bi te de.”

608. *Qîza Beko bi Zînê va çûne serê zindanê.*
609. *Zînê ban kir: “Memo, mizgîn ji te ra: dîkin te biderînîn, min û te bi hev gihînîn.”*
610. *Zînê henar çê kire Memê.*
- \*\*\*
611. *Memê go: “Zînê, henara hundurî tijî axû û ja’r e.*
612. *Ez e sebê xatirî te çend heban bikime xware.”*
- \*\*\*
613. *Zînê go: “Memo! Melezîne!*
614. *Wê acêbê ji mira mîne <sup>166</sup>*
615. *Xwedê malê Beko dîne.”*
616. *Ji Memê ra li şûnê hedfyan henarê bi ja’r dişîne.*
617. *Memo got: “Ez ku nexum, ez emrî te dişkenînim.”*
- \*\*\*
618. *Memê henarek xwar,*
619. *‘Hesen û Çeko û Qeretaclîn di ser Zîndanê peya bûn.*
620. *Ben û kemend avêtine Memê. Mem nikane ben û kemendan bigire.*
621. *Peya berdanê, Mem bi kemendê bi der xistin.*
622. *Ehlê Cizîrê li serî Memê bûne kom.*
623. *Heneka go: “penzer <sup>167</sup> wînin.”*
- \*\*\*
624. *Beko go: “Na! Bira Zîn xemlê xwe li xwe ke;*
625. *Bira Mem li bejnê Zînê temaşe ke.”*
- \*\*\*
626. *Zînê xwe xemiland, hate hizûra Memê.*
- \*\*\*
627. *Memê go: “Zînê!*
628. *Sedema canî minî şîrînê!*
- \*\*\*
629. *Zînê! Li qusûrê min mêze meke, ‘xumam ketîyê ser çavê min, te nabîneye.*
630. *Dest davême canî xwe, mînê kirasî ma’r dişiqitêye.*
631. *Li ber canî xwe nakevim, di pê mi ra memikê te biherimin bi kê ye.*

<sup>166</sup> meîne, meyîne, neyîne

<sup>167</sup> padizehr

\*\*\*

632. *Zînê go: "Memo! Ez Zîn im.*  
633. *Xûşka Mîr 'Azdîn im.*  
634. *Qîza Mîr Zêndîn im.*  
635. *Ez e qalemtiraşê biderînim.*  
636. *Li ser dilî xwe xînim.*  
637. *Bi qurbana Memê derdî giran bigerînim.*  
638. *Wê hasretê bi Memê 'xerîb ra nêlînim."*

\*\*\*

639. *Go va bêta Zînê.*  
640. *Mem teslîm bû.*  
641. *Zînê qalemtiraş bi der xist, li canê bikir xist, bi kêleka Memê da xwe xist.*  
642. *Beko li ortê her du cenazan çû, hat, kenîya.*  
643. *Mîr 'Azdîn ji erdê rakir balte, li serî Beko xist.*  
644. *Beko bi ba da ramedand.*<sup>168</sup>

\*\*\*

Temam El-hikayeti Mem û Zîn

## 1.6. Beyta Mem û Zînê ji Alîyê Ruxsarî va

### 1.6.1. Pêkhate û Teş

Ev beyta bi teşeya nîvhelbest û nîvpexşan hatîya darijtinê. Beyt ji 64 bendan pêk tê, ku 47 bendên wê helbestkî û 17 bendên wê jî pexşankî ne. Ev bendana hemû 644 rêzikan pêk diînin. Hemû rêzîkên wê yên bendên helbestkî hevserwa ne. Bend bi pêka hevserwabûna rêzikan ji hevdu vediqetin. Bi hejmareke dî ji 644 rêzîkên vê beytê 502 rêzîkên wê bi şeweya helbestê hatine dananê. 142 rêzîk jî pexşankî ne.

Beyt bi du rêzîkên pexşankî dest pê dibe û li dû ra bi şeweya helbestkî didome û di hindek cîyan da dîsan şirove bi pexşanê tene dayîne. Beyt bi nexşe û darêjkeke çîrokî pir balkêş hatîye darijtinê. Destpêka beytê pir rêk û pêk û lihevhatî û zengîn e. Lê bere bere hindî ku ber bi dawîyê diçe, beyt ji hemû layan va lawaz dibe. Mirov dizane ku bendên dawîyê di bîra beytbêjî da nemane.

Ev beyta weke romaneke rivayetî bi wesf û şirove û danasîneke rêk û pêk ya bajarê Mu'xribistanê û qehremanên sereke yên çîroka beytê dest pê dibe. Li dû ra qewimîn û

---

<sup>168</sup> (bi bal wan da ramedand ?)

bûyerên çîrokî û ho û hegerên bûyeran weke zincîrekê li dû hevdu ra tên. Hemû bûyer weke helqeyên zincîrekê bi hevdu ra girêdayî ne. Her qehremanek bi erka xwe ya çîrokîyê radibe. Beytbêj pêş da bajarê cîyê bûyerê bi hûr gilî şirove dike û li dû ra li ser rewşa qehremanên çîrokê agahdarîyên pêdivî dide. Cîhê qewimînê û qehremanê çîrokê yê serekî, wate ‘Alî paşa û bajarê wî û hêz û hukmê wî destnîşan dike. Mirov agahdar dibe ku mijar çî ye û beyt bi danasîneke têr û tijî di 20 rêzikan da tê şirove kirinê.

### 1.6.2. Kêş û Serwa

Kêş û serwa serekîtirîn hêmanên pênaseya beytan dihêne hejmarê. Di vê beytê da kêşeke yeksan ku di hemû rêzikan da kîteyên wê hevdu bigirn tuneye. Her rêzek bi serê xwe xudanê kêşekê ye. Ev beyta beyteke nîv helbest û nîv pexşan e. Gava ku mirov li beytê hûr dibe, mirov dibîne ku destpêka beytê du rêzik tê ne, hemû bi helbestkî hatine vehûnandinê. Lê bendên wê yên dawîyê bere bere ber bi pexşanîyê va diçin. Destpêka beytê li bara hunerî û darêjtina çîrokê û li hevanîna serwayan da zengîn e. Lê dawîya wê li hemû bareyan da bere bere lawaz û lawaztir dibe. Em li ser wê bawrê ne ku ev beyta di binêşa xwe da debê bi giştî helbestkî bûbe. Lê li ber kêmgotinê li dirêjaya temenê beytê da, beyt ji bîra beytbêjan derketîye û bi bihorîna sal û deman ra serwa ji bîra beytbêjan da nameye û hindek ji wê bi pexşankî gotine. Heta ew pişkên pexşankî yên dawîya wê jî narêk û natewaw û nivîşkan in.

Me serwaya vê beytê ji serî ta dawîyê bi hejmara rêzikên bendan destnîşan kirîye. Em dibînin ku di bendên destpêkê da hejmara rêzikên hevserwa gelek in, lê hindî diçe hejmara hevserwayan kêr û kêmtir dibe û hindek caran du serwa tenê dimînin.

Serwayên vê beytê çawa ku di tabloya hejmar yek da dîyar e, ev in:

“an- ane- îne- ê ye- ane- îne- ane- îne- êre- înim- ano- ane- înin/înim- îne- anî- ane- îne- înim- ane- înim- ane- an- îne- ane- înim/înin- an- êre/ere- ane- înim- eke- ane- an- ane- înin- îne/înim- înin- îne- eke- îne- êye- înim”

Gava mirov dîna xwe dide hejmara serwayên vê beytê, mirov dibîne ku pişka zore serwayan ji “ane û an” ê pêk tê. Wate qertafa pirjimarîyê ye ku ew jî bi qertafa “e” ku ji bo rewşê û serrastkirina kêşa dawîya rêzikê hatîye danîn û di gelek cîyan da hîç wateyekê jî nade pêk hatîye.

Di edebîyata klasîk da ji van cure serwayan ra serwaya şayîgan dibêjin. Serwaya şayîgan yek ji serwayên sivik û asan dihête hejmarê.<sup>169</sup>

<sup>169</sup> Vâ'iz-ê Kâşefî-yê Sebiziwârî, Kemâledîn Huseyn, *Bedâyi'u'l-Efkâr fî Senâyi'i'l-Eş'âr*, Tehran 1369 hş., s.188.; Dêhxudâ, „Qâfiye-yê Şâyîgân“, *Lu'xetnâme*.

Rêzbendîya serwayên vê beytê ji serî ta dawîyê di tabloya hejmar 1 da dîyar in:

**Tabloya hj. 1. Hejmara Rêzikên Pexşankî û Helbestkî**

<b>Rêzik</b>	<b>Serwa</b>	<b>Hejmara rêzikên serwa û pexşanê</b>
1-2	pexşan	2
3-5	an	3
6	pexşan	1
7-8	an	2
9-88	ane	80
89-95	îne	7
96-98	ê ye	3
99-178	ane	80
179-183	îne	5
184-202	ane	19
203-	êre	1
204-215	înim û înin	12
216-221	ano	6
222-226	ane	5
227-234	înin û înim	8
235-249	pexşan	15
250-253	îne	4
254-	pexşan	1
255-258	anî	4
259-270	ane	12
271-272	îni	2
273-278	ane	6
279-282	înim	4
283-309	ane	27



310-312	înim	3
313-392	ane	80
393-406	pexşan	14
407-408	ane	2
409	pexşan	1
410-414	an	5
415-419	îne	5
420	pexşan	1
421-435	ane	15
436-451	înim û înin	16
452-453	an	2
454-465	êre û ere	3
457-466	ane	10
467-472	înim	6
473-475	eke	3
476-480	ane	5
481	pexşan	1
482-486	an	5
487-489	ane	3
490	pexşan	1
491-493	Ike/ke	3
494-520	pexşan	27
521-522	înim	2
523-528	ane	6
529-544	pexşan	16
545-549	in	5
550-565	pexşan	16
566-571	îne û înim	6
572-580	pexşan	9

581-586	înim	6
587-610	pexşan	24
611-612	are	2
613-617	în û înim	5
618-623	pexşan	6
624-625	eke	2
626	pexşan	1
627-628	îne	2
629-631	êye	3
632-638	înim	7
639-644	pexşan	6

Çawa ku li pêş da jî hate gotinê, ji 644 rêzikên vê beytê 502 rêzikên wê xudanserwa ne û 142 rêzik jî pexşankî ne. Ji van 502 serwayan 350 rêzik bi serwaya “ane” diqedin. Serewayên di jî ev in:

“an- îne- ê ye- ano- înin/înim- anî- îni- îne- êre/ere- eke- îne/înim- înin- eke- êye- Balkêş e ku serwaya “ane” ji bilî yê perakende sê caran her carê 80 carî dubare dibe.

### 1.6.3. Cuwankarîyên Toreyî

Cuwankarîyên Toreyî ku bi Farsî jê ra Senayi’ê Edebî, Arayehayê Edebî û Senayi’ê Bedî’ û Turkî Edebî Sanatlari dibêjin, hindêk rêbaz in ku raçavkirin û bikarbirina wan dibe hegera cuwanîya gotin û nivîsînê.

Celâllodînê Homayî di pirtûka xwe ya bi navê *Funûn-ê Belâ’xet ve Sinâ’ât.ê Edebî*, da cuwankarîyên toreyî weha şirove dike: Hunerên bela’xetê yan zanista bela’xetê dibe sê pişkan: me’anî, beyan, bedî’. Hindêk caran ji her sêkan ra û hindêk caran jî ji her dûyên dawîyê ra huner yan zanista Bedî’ê dibêjin. Zanista bela’xetê piştî îslamê hatîye saz kirin û darêjtinê. Pêş da her sê huner pêkve bûn. Li dû ra di edebîyata Erebi da ew ji hevdu cuda kirin. Lê nivîskar û afirînerên Fars ew ji hevdu cuda nekirin û ji her sêyan ra zanist û hunera Bedî’ê gotin.

Peyva Bedî'ê wate nû, nûjenkirî, nûawerî, lê di edebîyatê da wate araiş û lihevanîna peyv û gotinê, çî nivîskî û çî jî devkî. <sup>170</sup>

Hunera Bedî'ê li ser du desteyan parve dibe: Dengaryî û wateyî.

Cuwankarîyên dengarayî ku birîtî ne ji araiş û lihevanîna dangan, weke: , cinas, secî', texelus û...

Cuwankarîyên wateyî ku bi rêka wateya peyvan û peywendîya wan di hevok yan rêzikên pexşan, nezm û helbestê da tîn bikarbirinê û dibine hegera cuwanî û hunera axiftin û nivîsinê. Weke: teşbîh, isti'are, tezd, kinaye, mecaz, telmih û... <sup>171</sup>

Bedî' sêyemîn şaxe ji şaxên zanista bela'xetê ye. Di Bedî'ê da li ser araişên gotinên fesîh û belî'x tê axiftinê. Senayi'ên Bedî'î dibin hegera cuwanî û kartêkirina gotinê li ser bihîster yan xwêner. Bi kurtî her çî yê ku ji bo araişa gotinê bête bikaranînê jê ra Senayi'ê Bedî' dibêjin. Senayi'ê Bedî' dibin du desteyan:

1. Senayi'ên Lefzî. Ew sen'et in yê ku bi hemahengî û tenasuba dangan di peyvan da curek mûsîqa diafirînin û dibin hegera cuwanîya deng û mûsîqaya gotinê. Weke: tecnîs, tersî', tescî', tekrîr, ....

2. Seanyi'ên Me'nevî. Ew in yê ku ji bo araişa wateyî tîn bi kar birinê û dibin hegra hizirîn û afirandian wêneyên hizrî, yê weke: teşbîh, isti'are, îham, telmîh, kinaye, mecaz û... <sup>172</sup>

Di vê beytê da pişkeke zor ji celebên cuwankarîyê li ber çavan dikevin, lê ji hemûyê zortir em rastî tewsîf û salixdanên cuwan dihên. Em ê çend nimûne ji cuwankarîyên toreyî yê vê beytê pêkve bibînin.

#### **Tewsîf:**

Salix û tewsîfa bajarê Mu'xribistanê

*“9. ...Bajarî Mu'xribistanê bajarekî gewrî mezinê giran e.”<sup>173</sup>*

*10. Li ser sêsed û şêst û şeş me'helan e.*

*11. Li ser bîst û çar qapîyan e.*

*12. Her qapîyekî tê da runîştîye wezîrekî heft toqan e.*

*13. Bajarî Mu'xribistanê li ser etegê heft çîyan e.*

*14. Di ser ra belekî berfê ne, di bin ra be'hrî 'Umîyan e.*

*15. Di bin ra mêrg û kanî ne, li ser ra zozan, yaylî û çîyan e.”*

<sup>170</sup>Homâyî, Celâlledîn, *Funûn-ê Belâ'xet ve Sinâ'ât.ê Edebî*, Nâşir Ehûrâ, Çâp-ê Evvel, Tehrân 1389 hş., rr. 18-19.

<sup>171</sup> 'Ebdul'ezîm Xân, Mîrzâ, *Kitâb-ê Elbedî'*, çâp-ê dovom, Çâpxâne-yê Firdewsî, Tehrân, 1308 hş., r. 2.

<sup>172</sup> Mîr Sâdiqî, Meymenet, *Vâjenâmeyê Honer-ê şâ'irî*, çâpê dovom, Tehrân 1376 hş. rr. 38- 39.

<sup>173</sup> Hemû hejmarên ku li ber van rêzana da hatine, hejmarên rêzikên beytê ne.

Yan dema ku qesr û qonaxê ‘Alî paşa şirove dike, mirov xwe di qesreke şahane da dibîne ku hemû xemil û dêkorasiyona wê şahane û şairane ye:

“16. Di bajarê Mu’xribistanê da tê da qasra ‘Alî Paşa ne.

17. Qasreke sipî, birceke belek e, qabeke bilind e, odake tûncîn e, hewlîyake bole fireh li ser bîst û çar qeyinterman e.

18. Sêsed û şêst û şeş odan e.

19. Ji maqbûlî pê da berdane zincîrê zêrane.

20. Tê da sê kevirê maqbûldaşî ne, cewher e, şewqê xwe dane çar koşeyî bajarî Mu’xribistanê, li ser ra belekî yê berfê, mêrg û kanîyan e.

Yan dema ku qîza Beko wesmê/wesfê bavê xwe dide:

313. Ku tu ketî bajarî Cizîrê - bi bavî mi ra dibêjin Qumsî Beko- Tuyê bibêji: “Ez nas nakim nîşan û wesmê wî.”: Li serê wî seyidê şêxan e.

314. Di ustu da benî tizbîyan e.

315. Di nîga da solê keskîn, di desta ekazeyî derwêşane.

316. Malê wî bişewite, berîyê xwe tijê jar û derman e.

317. Siban û êvaran digere li navê malane.

318. Xera dike mabênê dilan û ‘eşqîyane.

319. Îşê wî merî fizûlî şeytan e.

320. Peya mebe li qona ‘xê Bekoyî ‘Ewan e.”

Di beytê da ji bilî tewsîf û salixdanê, hunerên cuwankarîyê yên dî jî kêr û zêde bala mirovî li ser xwe da radikêşin. Li vir em ê ji her yekê nimûneyan biînin.

#### **Cinas:**

43. Destê Memê dibe sedemê bavîyan û tavîyane.

#### **Seci’:**

1. “‘Alî Paşa, birayê mezin bû, mîrê meqbûl û begê meş’xûl.

Peyvên meqbûl û meş’xûl pêkve seci’ê diafirînin.

#### **Tenasub û Teraduf:**

4. diterikandin taxt û tacê giran ...

6. qîzê wezîran û hakimîyan ...

374. Sibe ji Memê ra vekin penceran û camane.

481. bera gerdenî sipî, li simêlê zerî sîyê bike.

#### **Teşbîh û Istî’are:**

283. Dilê min xan e.

5. Hêstir dibarandin

179-180. *mêze ke, li sing û berê min mîne xalî heft rengîn e. Mîne sinê Toqatê dor bi çîn e.*

274. *insan mîne gulan e.*

316. *Malê wî bişewite, berîyê xwe tijê jar û derman e.*

**Mecaz:**

392. *Mêze kir, bajarê Cizîrê li dora qesra 'Hesen civîyane.*

411. *Sibe da Zîne bejna zirav da elwanan.*

440. *Mi bi qurbanê çavê belek bejna zirav bigerînin.*

445. *Kostekê lahûrê giran bifiltînim.*

446. *Xûnê li tarîq û zuwaxan bimeşînim.*

470. *Danzdeh gulîyan di ber kêr û maqesan datînim.*

**Kinaye:**

2. *Her sê bira korocax, warê wan wenda bûn.*

356. *Li terkîyê Bozê Rewan min şidandî qetilê şanzdeh mêrane.*

357-358. *Îşî min bi qebzê şûran e. Bi ser da bi arî şeşxanan e.*

408. *Sûwarê Bozê Rewan*

426. *Nigî Memê erdê nagirî.*

### 1.6.4. Qehremanên Beytê

Gelek kesan peyva qehreman di meydana edebîyata çîrokî da şirove kirine, herçiqas ku heryekê bi curekî cuda ji yên dî ew peyva şirove kiribin jî, lê hemû di yek nuqteyê da hevpar in, ew jî ew e ku qehreman çî qehremanê rastîn û çî jî yên ku ji layê nivîskar yan bêjêran va hatine afirandinê ew kes (yan ajel in ) ku bi kiryar yan gotarên xwe çîrokê diafirînin,<sup>174</sup> yan kes û ajelên ku kiriyar û gotar û akarên wan, ew çî dikin û çî dibêjin û neqşa wan di çîrokê da dîyar bibe, qehremanê çîrokê dihên nasandinê..<sup>175</sup>

Di vê beytê da jî weke her berhemeke çîrokî ji bilî her du qehremanên serekî yanê Mem û Zîne gelek qehremanên dî jî hene, ku nav û neqşên wan di pêşdabirina çîrokê da, li tabloya hejmar 2 da tê:

**Tabloya hj. 2. Nav û neqşên qehremanan di beytê da**

hj.	nav	Neqş û Kirên di Beytê Da
-----	-----	--------------------------

<sup>174</sup> Şemîsâ, Sîrûs, *Enwâ'ê Ededî*, Intişârât-ê Bâ'x-ê Âyîne, Tehrân 1370 hş., s. 189.

<sup>175</sup> Mîr Sâdiqî, Cemâl, *Enâsir-ê Dâsitân*, Intişârât-ê Soxen, Çâp-ê Nohom, Tehrân 1394 hş., r. 122.

1	Îşqebanû, qîza paşayê perîyan ya mezin	↓
2	Qemerbanû, qîza paşayê perîyan ya navîn	↓
3	Gulpêrî, qîza paşayê perîyan ya biçûk	Her sê qîzên padişahê perîyan, neqşa sereke ya pêkgehîştina Memê û Zînê dileyzin, ew in ku dibin hegera evîndarîya Memê û Zînê.
4	'Alî Paşa	Bavê Mem û padişahê bajarê Mu'xribistanê ye.
5	Herdu birayên 'Alî Paşa	Navê wan di Beytê da nehatîye, lê birayê biçûk di xewna xwe da Xocê Xizir dibîne ku dibêjê bila 'Alî Paşa bi qîzeke Qureyşîyan ra bizewic.
6	Zelîxa	Qîza Qurêşîyan û dayîka Memê
7	Memê Alîyan	Kurê 'Alî Paşa ye û qehremanê Beytê yê sereke ye. Memê bi rêka qîzên padişahê perîyan di gel Zîna Zêdan nasiyar dibe.
8	Zîna Zêdan	Xûşka Mîr 'Azdîn, mîrê Cizîra Botan û evîndara Memê Alîyan e.
9	Sitî	Xûşka Zînê ya mezin e û hevsera Hesên e.
10	Mîr 'Azdîn	Mîrê Cizîra Botan e û birayê Zînê û Sitîyê ye.
11	Birayê Memê yê axiretê	Navê wî di Beytê da nehatîye. Lê di versiyonên dî da navê wî weke Bengîn, Bengîne û Belgî hatîye
12	Hesên	Zavayê Mîrê Botan û birayê Çeko û Qeretajdîn yê mezin e û yek ji mîrxasên Cizîra Botanê ye.
13	Çeko	Birayê 'Hesên yê biçûk û destgirtiyê Zîna Zêdan e.
14	Qeretajdîn	Birayê Hesên yê dî ye.
15	Beko	Berdevk û pismamê Mîr 'Azdîn û cigir û dijê Memê ye. Ew jî evîndarê Zîna Zêdan e.
16	Zîna qîza Beko	Navê qîza Beko jî Zîn e. Beko wê ya dişne pêşîya Memê ku Memê bixapîne. Her wisan ew hinarê jehrîkirî ji Memê ra dibe.
17	Keniza Zîna Zêdan, navê wê nehatîye	Ew Zînê bi hatina Memê ya Cizîra Botan agahdar dike.
18	Xocê Xizir	Sê caran di Beytê da derdikeve pêş, cara yekem tê

		xewna birayê 'Alî Paşa, cara duyem rê nîşanî Memê dide û cara sêyem jî buhrê şetê Cizîrê nîşanî Memê dide.
19	Bozê Rewan	Kurûyê behrî û hespê Memê ye. Memê ji Mu'xribistanê ta Botanê rêya şeş mehan li ser piştê wî dikudîne.

### 1.6.5. Çemk û Wateya Navên Çend Qehremanên Beytê

Em di di vê Beyta Mem û Zînê da û bi taybetî di wate û çemka navên qehremanên serekî yên vê beytê da rêç û şûnpîyê ayînên kewnên Rojhelata Navîn dibînin. Li vir em ê ewê mijarê bi kurtî veçirrin.

#### 1.6.5.1. Hersê Qîzên Paşayê Perîyan

Di vê celeba Memê Alîyan da navên hersê qîzên padişahê perîyan: 'Işqebanû, Qemerbanû û Gulpêrî/Gulperî ye. Mirov dikare bêje ku peywenda navê 'Işqebanû bi Îzedbanûya Evînê ra û navê Qemerbanû jî bi Îzedbanûya Istêran ra heye. Lê di celeba ku Roger Lescot weşandîye navê hersê qîzên paşayê perîyan: Tavbanû, Hîvbanû, Sitêrbanû ye. Tavbanû Îzedbanûya Rokê, Hîvbanû Îzedbanûya Hîvê û Sitêrbanû jî Îzedbanûya istêran e. Di van hersê navana da em hersê numadên pîroz yên ayînê Mîtrayî wate rok, hîv û istêran dibînin. Ev hersê nav dibin makeyên evîna Mem û Zînê jî. Bi gotineke dî xîmê peydabûna evîna Mem û Zînê û afirînerê wê evînê hersê qîzên padişahê perîyan in.

#### 1.6.5.2. Zîn

Zîn navê dildara Mem e.

Li ser navê Zînê û wateya wî navî gelek kes tûşî şaşîyan bûne. Gelek kesan ew nav kurtkirîya Zeynebê yan jî kurtkirîya Zînet yan Zeynetê zanîne.<sup>176</sup> Lê em dizanin ku kurtkirîya peyva Zeynebê di Kurdî da dibe Zeynê, nabe Zînê. Kes ji Zeynebê ra nabêje Zînê û navê Zînetê jî di Kurdî da pir kême.

<sup>176</sup> Tâyifî, Şîrzâd- Rehîmî, Muhsin, ,, Costârî der Esâtîr-ê Menzûme-yê Kurdî-yê Mem û Zîn“, *Pijûhişnâme-yê Edebîyât-ê Kurdî*, sâl-ê sevvom, Şomâre-yê 4, behâr ve tâbistânê 1396 hş., s. 70 û peynivîşt, s.79, ; Abdullâhzâde, Idrîs. ,,‘Êşq ve Dildâdegî der Xosrew ve Şîrîn-ê Nizâmî ve Mem û Zîn-ê Xânî“, *Kitâb-ê Mâh-ê Edebîyât*, Şomâre-yê 34, sâl 1388 hş., s. 67.

Em debê li ferhengên Îranî û li nav bîr û bawerîyên mêjîn da li dû navê Zînê û wateya wî navî bigerin.

Di van ferhengana da em rastî navê Zîn ê nayên, lê em rastî navekî di tên, ku nêzikî navê Zînê ye. Ew jî navê Sîn e.

Di *Lu 'xetnameya Dêhxuda* da hatiye ku li bal babîlîyan Sîn navê xwedawenda hîvê bûye.  
177

Di Ferhenga *Mîtolojîya Kurdî* weşanên Enstîtûya Kurdî ya Istenbolê da li jêr navê Zînê da weha hatiye: “Xwedawenda heyvê a proto- kurdan e. Mabedgehên wê yekem car li Herranê hatine dîtin û wekî xwedawenda Herranî tê binavkirin... Di çavkanîyên Babilî da di destê vê xwedawendê da hîvik heye. Di nav Kasîtan da ev hîvik di destê Sîn/Zîn da di nav xelegekê da ye...”<sup>178</sup>

Di zimanên Îranî da di gelek peyvan da tîpên “S” û “Z” dikarin cîhê hevdu bigirin. Wate mirov dikare bipejirîne ku peyva Sîn li dû ra bûye Zîn.

Di wê ferhengê da li jêr navê Sîn da ev şiroveya heye: „Sîn. Zîn. Xwedawenda heyvê. Di Sumerê (Sûmerî) de jê re ‘Nanna’ di Babîlê (Babilî) de jî jê re ‘Sîn’ hatiye gotin.”<sup>179</sup>

Wate bi pêka vê ferhengê Zîn heman Sîn xwedawenda hîvê bixwe ye.

### 1.6.5.3. Mem

Navê qehremanê serekî yê vê beytê ne MEMÊ lê MEM e û ev nava dema ku ditewe qertava “ê” digire û dibe Memê û di dema vokatîvê da dibe Memo.

Li ser navê Mem û wateya wî gelek kesan bîr û hizrên cur be cur ragehandine. Hindek kes we dihizirin ku peyva Mem kurtkirîya navê Muhemed e,<sup>180</sup> lê bi pêka hindek çavkanîyan wisan nîne. Durust e ku di Kurdî da hemû navên Erebi têne kurtkirin û tewandinê, ji wan jî navê Muhemed. Lê navê Muhemed gava ku di Kurdî da tê tewandin yan tê kurtkirinê dibe: Mi’hê, Mi’ho, ‘Heme, ‘Hemed, ‘Hemke, ‘Hemko, lê nabe Mem. Ji bilî navê Mem di Kurdî da navê Memşah û Memşad jî heye, ku hîç peywendî û têkilîya wan bi navê Mu’hemed va tune. Navê kiçane Memîyan, Memîxan û Memîcan jî heye, ku ew jî bi peyva Mem ra peywendîdar in. Navê Mem di vê beytê da navekî kewinare ye û peywendîya vî navî bi bîr û bawerî û mîtolojîya Kurdî û bi taybetî bi mîtolojîya gelên Mezopotamîyayê va heye.

<sup>177</sup> Dêhxudâ, „Sîn“ *Lu 'xetnâme*.

<sup>178</sup> Yîtîk, Kamûran,- Çeper, Ramazan, *Ferhenga Mîtolojîya Kurdî*, Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, 2017, r. 250/51

<sup>179</sup> Yîtîk- Çeper, hb. r. 251

<sup>180</sup> Tâiyîfî - Rehîmî, hb. s. 69



Navê Memo di pirttûka *Mu'xamereto-Eleqlol- Ûla, Diraseto Fî El- Ustûreto Sûrîye Erd Elrafedîn* bi qelema Firas Es-swah<sup>181</sup> da bi wateya mija ku li ser avê dikeve hatîye.

Tengezarê Marînî jî di gotareke xwe da li ser navê Mem dinivîse: “Mem di mitolojîya Mezopotamîyan da xudawendê mijê bûye.”<sup>182</sup>

Di mîtolojîya Kurdî da bi şêweyeke dî em rastî navê Mem tên. Ew jî Memê Şivan e. Ev Memê Şivana di bawerîya Êzdîyan da weke Xudawendekî tê hejmarê, ku zêrevanê pezkuvîyan e.<sup>183</sup>

Ev nava di bîr û bawerîya Kurdên musulman da jî maye. Ew kesek e ku li pezên kedîkirî û pezkûvîyan miqate dibe û şivanê wan yê ‘xeybê ye û wan diparêze. Bi pêka vê bawerîyê eger kes yan kesaneke ji radeyê bider nêçîrê biken, yan bêtuen pezkûvîyan yan her ajeleke kuvî biêşînin, Memê Şivan bêtarekê li ser wan da difîne.

Herwisan bawrî bi hebûna Memê Şivan di hişê gel da wisan bi hêz maye, ta roja îro jî, dema ku berx yan kareke virnî nîkaribe şîr ji guhanê maka xwe bimêje û şivan bixwazin wê berxê yan karê bimêjînin, jê ra weha dibêjin: “Memê Şivan lê bike givan.” Û li ser wê bîr û bawerîyê ne, ku Memê Şivan ku şivanê ‘xeybê ye, dê were arîkarîya wan û bihêle ku ew berx yan kara guhanê maka xwe bimêje û ji birçîna nêz nebe. Peyva givan jî pirjimarî ya givê ye. Giv dengê bilûra şivanî ye. Lê bike givan, wate jê ra li bilûrê bide û li ber bigere, lê miqate bibe. Memê Şivan lê bike givan, weke du’ a û nizayekê ye.

Gelek kes li ser wê bawerî ne, ku Memê Şivan ji bilî pezkuvîyan li pezên kedîkirî jî xudan derdikeve. Lewra di ceşna sedepêzê<sup>184</sup> da ku pêncî roj û pêncî şev piştî beranberdanê dihête damezrandinê û di gelek navçeyên Kurdistanê da beranberî şeva Yeldayê ye, kose li nav malan digerin û pêş wê hindê da ku kose silavê bidine merivên malê, diçine nav gova mîhan. Xudanê pezî koseyan xelat dikin û kose jî avê li nav gova mîhan direşînin û dibêje Memê şivan bibe qereçuxê pezên we. Li ser vê bîr û bawerîyê Memê şivan, şivanekî xeybî ye û pêpalê wî pîroz e û ew here nav pezê kê bereket dikeve nav wî pezî.<sup>185</sup>

Li Êzdîxanê da meqamekî pîroz bi navê zêva Memê şivan heye û her wisan çeşnek jî bi navê tewafa Memê şivan di nav Êzdîyan da heye. Ew ceşna li meha Gulanê da tê

<sup>181</sup> Es- Sewah, Firas, *Mu'xamereto-Eleqlol- Ûla, Diraseto Fî El- Ustûreto Sûrîye Erd Elrafedîn*, çapa 11. Dimeşq, 1976, r. 52.

<sup>182</sup> Marînî, Tengezar, „Nav û navnîşanên Mem û Zînê”, *Kovara Pirs*, hejmar 7-8 sal 3, zivistana sala 1995an, buhara 1996, Berlîn, r. 31.

<sup>183</sup> Herçiqas ku ev zanîyarîya di nav gel da berbelaw e û gelek kesan bawerî bi vê hindê heye, lê me ji bo piştrastkirina vê mijarê zivistana sala 2019 bi pisporê bawerîyên Êzdîyan Tosinê Reşid ra peywendî danî, ewî jî ev nav û ev bawerîya Êzdiyatîyê piştrast kir û got ku ji bilî Memê şivan gavanê Zerza jî heye.

<sup>184</sup> Kurdên heşemdar dibêjin: „*Sedê rê ke, Kozê çê ke, Bexê tê ke.*“

<sup>185</sup> Me bixwe ev rê û risma kose û ceşna Sedepêzê dîtîye û gotareke me jî li radyoya Kurdî ya Teheranê li ser vê mijarê hatîye weşandinê.

damezirandinê. Qewleke Êzdîyan heye ku dibêje: “Kîj roj Gulan e, ew roj tewafa Memê Şivan e.”<sup>186</sup>

Bi vê lêkolînê ra em dibînin ku navê Mem navekî mîtolojîk û zor kewn e.

#### 1.6.5.4. Beko

Di vê beytê da navê Bekir, weke Beko ‘Ewan, Qumsî Beko û Bekoyê derewîn hatîye. Em nizanin kanê gelo Beko kurtkirîya Bekir e, yan ew jî ji navekî dî hatîye û li dû ra Beko bûye Bekir. Di vê beytê da em rastî peyva Bekir nayên. Tenê navê wî weke Beko û nasnavê wî jî ‘Ewan, Qumsî û Derewîn hatîye. Di celebên dî yên beyta Mem û Zîn da em kêman rastî navê Bekir tên. Di wan da jî ev nav weke Beko ‘Ewan û Beko Şeytan derbas dibe.

Lê Xanî (1650/1-1707) di Mem û Zîna xwe da navê wî weke Bekir dinivîse.<sup>187</sup>

Navê Beko û nasnavê wî û kiriyarên wî cîhê têramanê ne. بهکر Bekir di Erebi da wate hêştira genc, lê di Qur‘anê da em rastî peyva Bêkrun ‘Ewanun بكرًا عوانٌ dihên. Li ayeta 78 ya sûreya Beqere da weha hatîye:

قَالُوا ادْعُ لَنَا رَبَّكَ يُبَيِّنْ لَنَا مَا هِيَ قَالَ إِنَّهُ يَقُولُ إِنَّهَا بَقَرَةٌ لَا فَارِضٌ وَلَا بِكْرٌ عَوَانٌ بَيْنَ ذَلِكَ فافْعَلُوا مَا تُؤْمَرُونَ

Lê peyva bekir bi kesreya yekem wate bêkir hatîye. Bêkir wate dest lê neketî, nû. ‘Ewan jî di Erebi da wate navsalî, ne pîr û ne genc. Bêkrun ‘Ewanun wate navsalî û dest lê nevedayî, ku di vê ayeta Qurianê da Bêkrun ‘Ewanun sifetê wê çêlekê ye, ya ku debê bête qurbanîkirinê.

Ferhenga Farsî ya *Dêhxuda* li jêr navê ‘Ewan da dinivîse: ‘Ewan wate şer, kaşberkaş, ceng û cidal (wate hegerê fesadî û nexweşîyê)<sup>188</sup>

Di vê beytê da jî Beko nûnerê şer û ajaweyê ye. Ew jî di dawîyê da tête kuştinê û dibe qurbanîyê fesadîya xwe. Çawa ji xûna gayê Mîtrayî mêw, genim û gîya şîn dibin, ji xûna Beko jî ku xudawendê şerî ye, dareke dirîyê şîn dibe. Hebûna vê peyvê di Quranê da durust di mijara qurbanîkirinê da û navê Beko ‘Ewan weke Bekirê ‘Ewan, cîhê têhizirînê ye.

Em nizanin danerê vê beytê navê Bekirê ‘Ewan ji Quranê wergirtîye û çawa ew çêleka genc wate nogin dibe qurbanî, Beko jî dibe qurbanîyê fesadîya xwe, yan jî bêjerê beytê zanîye ku ‘Ewan wateya fesad û şerr û ajaweyê dide, ew nasnava lê kirîye. Bi her cureyî navê Bekirê ‘Ewan layekî da wateya şer û fesadî û kuşt û kuştare dide, layê dî jî sifet e ji bo ajela qurbanîyê. Mirov bi vebirî dikare bêje ku helbijartina vî navî ne tiştê helkeftî/tesadufî ye. Ew nav bi zanetî hatîye helbijartinê.

<sup>186</sup> Merasima tewafa Memê şivanê: [https://www.kurdistan24.net/so/program/c70234cb-4b86-4eb3-afad-138c804d9c45?fbclid=IwAR1ByZsmb0m3k6wydCm4V8HLOD1VqGtgB6UdhRuOgU\\_3D1vSVSL8xxSlvo](https://www.kurdistan24.net/so/program/c70234cb-4b86-4eb3-afad-138c804d9c45?fbclid=IwAR1ByZsmb0m3k6wydCm4V8HLOD1VqGtgB6UdhRuOgU_3D1vSVSL8xxSlvo)

<sup>187</sup> „Navê wî munafiqî Bekir bû, Belkî ji Bulûqiya betir bû“, *Mem û Zîna Xanî*, Weşanên Nûbihar sal, 2013, malika 1134.

<sup>188</sup> Dêhxudâ, „‘Ewan“ *Lu’xetname*.

### 1.6.5.5. Sitî

Sitî di ferhengên Erebi da tê bi wateya banû û xanim, hesin û pola. Herwisin tê bi wateya wê jina Hindû, ya ku dema mêrê wê dimire û cenazê mêrê wê dişewitînin, ew jî xwe bi mêrê xwe ra dişewitîne.<sup>189</sup>

Lê Şêzad Tayîfî û Muhsinê Rehîmî, her duk di gotarekê da dinivîsin: “Di ferhengên Ordû û Farsî da li ser navê Sitîyê weha hatîye: “Sitî peyvek e ku di zimanên Hindî û Ordû da hem sifet û hem jî navdêr e û tê bi wateya jina pakij û dawênpak.”<sup>190</sup>

Ew her du dinivîsin: “ Mirov dikare şûnpîyê Sitîyê di istûreyên Hind û Îranî da bibîne. Di istûreyên Hind û Îranî da Satî hevsera Şîva û qîza Rêkşa (Dakşa) ye. Bavê wê di merasimeke qurbanîyê da ji bilî Şîwa yê zavayê xwe gelek kesan vedixwîne. Satî li ber vî karê bavê xwe li ber xwe dikeve û şermezar dibe û li kerban xwe dişewitîne. Ew agirê ku Satî xwe tê da dişewitîne, di beyta Mem û Zînê da bi destê mêrê Sitîyê ji bona rizgarkirina Memê û Zînê hil dibe û mala Sitîyê û kurê wê tê da dişewitin...Ew îzedbanûya zemawend û zewac û bextewerîyê ye jî”<sup>191</sup>

Em di beyta Mem û Zîn da dibînin ku Sitî jî ji bo bi hevdugehandina Memê û Zînê xudan neqş e. Dema ku Mem û Zîn li ser Kanîya Gulan hevdu dibînin û randevoya jivanê ji hevdu distînin, Zînê dipirse em ê li ku hevdu bibînin? Mem dibêje hêla ‘heremê di koşka Sitîyê da.

*“Zînê go: “Memo! ‘Hesenî pismam ku niha em her du ‘eşqî ji hev qetandin, ez ê te li ku bibînim?”*

*Memê go: “Bawerîya min bi ‘Hesenî bira heye, wê hêlê ‘heramê ji mi ra boş bike.*

*Wê min di koşkî Sitîyê ke.”<sup>192</sup>*

Em dibînin ku di beytê da Sitî durust weke Satîyê neqşa bi hevdu gehandina evîndaran û bextewerkirina wan dilîze.

### 1.6.5.6. ‘Alî Paşa

Di vê beytê da navê bavê Memê ‘Alî paşa ye. Ev nava ji navê ‘Elî îmamê yekem yê Şî’eyan û xelîfeyê çarem yê Sunîyan hatîye girtinê. Navê ‘Elî li cem ‘Elevîyan û ‘Elîellahîyan (Ehlê ‘Heq/Yarisanan) navekî pîroz e. ‘Elevî ewî pîroztirîn aferîdeyê Xudê dizanin û Yarisan jî pileya ‘Elî heta pileya xudêtiyê bilind dikin. Hindek ji Kurdan û Turkên ‘Elevî navê ‘Elî weke Alî û ‘Alî telefuz dikin. Di vê beytê da jî navê bavê Mem padişahê Kurdan ‘Alî û leqeb

<sup>189</sup> Mu’în, Muhammed. „Sitî“ *Ferheng-ê Fârsî*, Muessisse-yê Intişârâtê Emîr Kebîr, Tehâr 1376 hş.,

<sup>190</sup> Tâîfî-Rehîmî, *hb. r.* 64.

<sup>191</sup> Tâîfî-Rehîmî, *hb. r.* 64.

<sup>192</sup> BMZ. rê. 490-492.

yan nasnavê Mem jî ne Alan, belkû Alîyan e. Ev her du nav jî bi ‘Elewîtiyê ra peywendîdar in û em dikarin bêjin ku bêjerê beytê bi zanebûn navên Alî û Alîyan ku li bal Elewîyan pîroz e helbijartine.

#### 1.6.5.7. Zelîxa(n)

Di vê beytê da navê dayîka Mem Zelîxan/Zelîxa ye. Di mêjûyê da Zelîxa yan jî bi Erebi Zuleyxa navê jina ‘Ezîzê Misrê ye, ku dibe evîndara Yûsif pêxember. Çîroka evîna wê û serbihorîya Yûsifi yek ji serpêhatiyên Quranê ye û di Qurianê da ji wê ra E’hsenelqeses wate baştirînê çîrokan hatîye gotinê.<sup>193</sup> Her çiqas ku serbihorîya li welatê Misrê qewimîye, lê nav û deng û serpêhatîya wê derbasî nav gelên Rojhelata Navîn jî bûye û ewî navî kar li ser edebîyata Kurdî jî kirîye. Helbijartina vî navî jî ji layê beytbêjan va bi mebest bûye.

#### 1.6.6. Vegêran

Yek ji binçîne û xîmê serekî yê çîrokan vegotin û gêraneve ye. Gêraneve wate vegotin û şirovekirina bûyerên çîrokê, çi ew bûyer rast bin û çi jî ji akama hizra daner û bêjerê çîrokê serekanî girtibin.<sup>194</sup>

Goşey nîga yan navenda vegêran û vegotinê nîşandana şeweyekê ye ku nivîskar (yan jî bêjer) bi arîkarîya wê naverok û pêkhatiya çîrokê raberî xwêner (yan jî bihîster) dike. Vegotin bi rêka yek ji kesên yekem, duyem û yan jî bi rêka kesê sêyem tê raberkirinê. Nivîskar yan bêjer bi arîkarîya yek ji van kesana çîrokê vedibêje.<sup>195</sup>

Gêraneve bixwe xudanê çend cur û şeweyan e. Yek ji wan curên gêranevê gêraneveya zincîrî ye, ku pişka zor çîrokên gelêrî û beyt û mesnewî bi wê şeweyê tene vegêranê. Li gêraneveya zincîrî da hemû bûyer weke xelekên zincîrê li dû hev ra tên û di gel demê pêş da diçin.

Di vê beytê da vegêran bi arîkarîya kesê sêyem tê gotinê û herçiqas ku bêjerê beytê zanayê giştî ye, lê xwe têkelî bûyerên çîrokê nake.

#### 1.6.7. Ziman

Ziman yek ji amûrên here giring e di jîyana mirovan da. Ziman nasnameya gelan û amûra sazkirina peywendê di nîveka mirovan da ye. Mirov bi navlêkirina tiştan hebûna wan

<sup>193</sup> Qur‘ana pîroz, Sûreya Yûsif ayeta sêyem.

<sup>194</sup> *Berawirdkirîni dasitanî Şexî Sen‘anî, ‘Ettarî Nişapûrî û Feqê Teyran*, Namey duktora, Zankoy Selaheddîn, kulêjî Ziman, sal, 2008, r.110.

<sup>195</sup> Mîr Sâdiqî, Cemâl, *‘Enâsir-ê Dâstân*, Neşr-ê Soxen, 1394 hş., r.505.

radigehîne. Mirov bi zimanî xwe dide nasandin û hestên xwe, kêfxweşî û şayî û derd û azar û daxwaz û bîzên xwe bi rêka zimanî radigehîne.

Ziman neba, axftin jî nedibû, axiftin neba tore jî peyda nedibû. Neqşa zimanî û zengînî û lawazîya wî di afirandina berhemên toreyî da nayê mandel kirinê.

Di her berhemeke toreyî da lawazî û zengînîya zimanî yek ji giringtirîn pîvaneyên serratî û kêmasîyên berheman tête hejmarê. Yek ji amûrên ku dibe hegera serratîya berhemeke toreyî zengînîya zimanî ye.

Ev beyta bi zimanê Kurdî, zaraveyê Kurmancî û devoka Rihayê hatîye gotinê. Ziman di vê beytê da zengîn e û mişt e ji taybetmendîyên devoka rihayê.

### 1.6.8. Dîyalog

Dîyalog (dialogue) yan gotûbêj yek ji hêmanên çîrokan tête hejmarê. Gotûbêj kesayetî û qehremanên çîrokê dide nasandin û bandora wê di pêşdabirina naveroka çîrokê da heye.<sup>196</sup>

Di vê beytê da em li çendîn cîyan da rastî gotûbêjên nîveka qehremanan dihên, weke gotûbêjên qîzên paşayê perîyan, gotûbêja Memê û Zînê, gotûbêja Beko û Mîr û gelekên dî...

Nimûneyek ji gotûbêja nîveka qîzên padişahê perîyan:

*Gulpêrî go bi xwênga ra:*

*“Dilî min li kulê ye.*

*Werin, mêze kin ji me her sê xwêngan kîjan lîyaqê vî camêrî xelqê ye?”*

*‘Eşqebanê go:*

*“Xwêngê! ‘emelî û ixtibar nabe bi banîademî vê ‘asrê ye.”*

*‘Eşqebanê go:*

*“Xwêngê! Dilê min li yan e.*

*Were, emê rûnin li ser hewzê gulane.*

*Bi wa ra dînin şor û danişî ‘xê giran e.”<sup>197</sup>*

### 1.6.9. Mekan û Zeman /Cîh û Dem

#### 1.6.9.1. Mekan/Cîh

Yek ji hêmanên sereke di şirove û analîzekirina berhemên edebî da, mekan yan cî ye. Mekan ne tenê rewş û cîhê qehremanan nîşan dide, belkî ew nîşanderê hel u mercên civakî yên dewreyekê ye ku ew berhem yan metn tê da hatîye amadekirinê.<sup>198</sup>

<sup>196</sup> Mîr Sâdiqî, Cemâl, hb. r. 603.

<sup>197</sup> BMZ. rê. 96-101.

Yek ji hêmanên sereke yê çîrokan mekan e. Bi giştî her tiştên heyî candar û bêcan di cîyekê da dadimezre, ku ji wî cîyî ra mekan dibêjin. Çawa ku di cîhana şênber da hîç tiştek li dervayî mekanê da tune ye, wisan jî hîç çîrokek bêy mekan nikare hebe. Mekan di çîrokan da dibin çendîn cur û celebên, weke:

1. Mekanê rastîn : ku bixwe dibe du desteyan: cîhên giştî weke welat, bajar, gund, çîya, derya...Cîhên taybetî weke: navên bajarên taybetî, navê mizgeft, dêr yan mekanên taybetî weke Meke, Mexribzemîn...

2. Mekanê ne rastîn : çîyayê Qaf, Maçîn, Bajarê Cinan, welatê Qîzên paşayê Perîyan

3. Mekanê armanî (xeyalî û xwazyarî): Baxê Iremê

4. Mekanê ayînî û Bawerî: Bihîşt, dogeh,

5. Mekanê bêmekan: piştî çîyayê Qaf <sup>200</sup>

Ji bilî van parvekirinana, Nurdan Yeşilyurt mekanê weha parve dike:

Di berhemên edebî da mirov dikare mekanî li ser du desteyên mekanê rastîn û mekanê mîthîk parve bike. <sup>201</sup>

Di vê beytê da jî weke her çîrok û serpehatîyekê navê gelek cîyan hatîye. Tabloya hejmar nîşandera cîyên vê beytê ye:

**Tabloya hj. 3. Navê cîhên ku di beytê da hatine**

hj.	Celebên Mekanên	Mekan di Beytê da
1	Mekanê rastîn yên Taybetî	Bajarê Mu'xribistanê- Qesra 'Alî Paşa- Be'hra 'Umîyan- Be'hra Belek- Qesebeyî Cizîra Botan- Qesrên Memê û Zînê- Çemê Cizîrê- Gola Mar û Masîyan- Buhurê Çemê Cizîrê- Sûk û Tarîkê Bajarê Cizîrê- Qonaxa Celalîyan- Kanîya Gulan- Nêçîrgeha Cizîrê- Zindana Bajarê Cizîrê- Şam- Birca Belek- Meydana Bajarê Cizîrê- Mekanê Keçan û Bûkan- Hêla Heremê- Dîwana Mîr- Bajarê Toqatê-
2	Mekanên rastîn yên Giştî	Zozan û Yaylî - Çol û Kerbela- Çol û Berrî (Nêçîrgeh)- Qabristan- Tewelê Hespan- Sînorê 'Ecem û Muslimîn- War- Mehelle- Qapî- Etege Heft Çîyan- Merg- Kanî- Yazlix-

<sup>198</sup> Yeşilyurt, Nurdan, Ösküs Uul Destnında Mitik Mekan ve Gerçek Mekan, *Çeşm-i Cihan, Tarih Kültür ve Sanat Araştırmaları E - Dergisi* ISSN: 2149-5866 Cilt:5, Sayı:1, S. 194-211, Yaz 2018.

<sup>199</sup> Nimûneya hindêk navan ji layê me va li mijarê hatin zêdekirinê.

<sup>200</sup> Pûr Omrânî, Rûhullâh, Mehdî, *Âmûziş-ê Dâstannivîsî*, Intişarât-ê Tîrgân, 1386.hş., s. 274-275.

<sup>201</sup> Yeşilyurt, Nurdan, Hb. r. 194.

		Qonax- Mal- Erd- Xan- Dewrê Dinyayê- Gêçît- Sahra- Ode- Hewlî- Heyat-Serî Kaşan- Koşk- Welat- Xezîne- Sînorê Ecem û Muslimîn- Meqam- Tirb- Taq- Pencere- Hefê Bilind- Berbendê Asê- Camî-
3	Mekanê mîtîk	Hewza gulan- Baxçê gulan û sêvan (baxçê qîzên paşayê perîyan)-
4	Makanê ayînî û Bawerî	Qatî esmanî heftan-
5	Mekanên Xeyalî	Goleke xwînê ya birca nehan-
6	Mekanê bêmekan	

Çawa ku di vê tabloyê da dîyar dike, pişka zor ya mekanên ku di beytê da hatine mekanên rastîn in. Du mekan mîtîk û mekanek jî mekanê xeyalî ye. Ev hinda wê rastîyê nîşan dide ku fezaya rastîn li ser beytê hakim e.

#### 1.6.9.2. Zeman/Dem

Çawa ku mirov û jîyan û bûnewer û hemû hebûn di çarçoveya cîyekî da dijîn û bêy cî/mekan jîyan nabe, wisan jî bêy dem jîyan nabe. Çawa jîyan bêy dem nabe, wisan çîrok û bûyer jî bêy dem naqewime. Çîrok û her bûyereke di nava demê da diqewime. Çîrok ji nuqteyê zemanî ra dest pê dibe û di nuqteyê da jî kuta dibe. Çîrok vegêrana bûyereke ye bi livyan û pêşdaçûna demê.<sup>202</sup>

Dem yan zemanê çîrokê li ser pênc pişkan weha parve kirine:

1. Dema dîrokî (sedeya bîstim) 2. Dema salhejmêrî (havîn) 3. Dema demhejmêrî (demhejmêra pêncê êvarê) 4. Dema rêzimanî ( dema bihorî, dema niha, dema dêbê) 5. Dema Ayîn (ezelî, ebedî, roja qîyametê)<sup>203</sup>

Di tabloya hejmar 4. da dîyar dibe ka di vê beytê da kîşk ji van demana zortir hatine bikarbirinê.

#### Tabloya hj. 4. Demên ku di beytê da hatine

hj.	Navê Demên Çîrokî	Di Beytê da
1	Dema dîrokî	tuneye
2	Dema sal/rojhejmêrî (sal, demsal, meh, hefte, şev, roj,	Şev, binê şevê- şeva çûnî- nivê şevê- hîşev- 39 caran-

<sup>202</sup> Pûr Omranî, Rûhullâh, hb. s. 283-291

<sup>203</sup> Pûr Omranî, Rûhullâh, hb. s. 283-284.

	danên şev û rojê)	Meh 17 caran- Roj 20 caran sibe 17 caran- êvar 2 caran hîro 5 caran nîvro 2 caran roj 20 caran hefte 2 caran
3	Dema demjimêrî	Saet 4 caran
4	Dema rêzimanî	Hersê dem jî heye
5	Dema ayînî	Rojên eydan û erefatan- roja qamê- nimêja sibê- acel-

Em dibînin ku ji nava hemû demên ku hatine destnîşankirine, zortir dema sal/rojhejmêrî hatîye bi krabirinê. Vegêran çîrokên ji xwe zortir bi arîkarîya vê celeba demê pêş da diherike. Di dema rêzimanî da jî ji hersê demên rêzimanî wec hatîye vergirtinê, lê xîmê beytê li ser dema bihorî ava bûye. Di vegêranê da dema bihorî û di dîyalog û şiroveyan da jî dema niha hatîye bi kar birinê.

**Nimûne ji bo dema bihorî:**

*Li bajarê Mu'xribistanê sê bira hebûn, 'Alî Paşa, birayê mezin bû, mîrê meqbûl û begê meş'xûl.*

*Her sê bira korocax, warê wan wenda bûn.*

*Ku dihatin rojê 'aydan û 'arefatan.*

*Her sê biran diterikandin taxt û tacê giran.*

*Hêstir dibarandin sebê xatirî ewladan.<sup>204</sup>*

**Nimûne ji bo dema niha di şiroveyan da:**

*bajarî Mu'xribistanê bajarekî gewrî mezinî giran e.*

*Li ser sêsed û şêst û şeş me'helan e.*

*Li ser bîst û çar qapîyan e.*

*Her qapîyekî tê da runîştîye wezîrekî heft toqan e.*

*Bajarî Mu'xribistanê li ser etegê heft çîyan e.*

*Di bin ra mêrg û kanî ne, li ser ra zozan, yaylî û çîyan e.*

*Di bajarê Mu'xribistanê da tê da qasra 'Alî Paşa ne.*

*Di ser ra belekî berfê ne, di bin ra be'hrî 'Umîyan e.<sup>205</sup>*

<sup>204</sup> rê 1-5.



### **Nimûne ji bo dema niha di gotûbêjê da:**

*Zînê go bi Memê ra: “Ez Zîn im, xûşkê Mîr ‘Azdîn im, mêze ke, li sing û berê min minê xalî heft rengîn e.”<sup>206</sup>*

*Memê go: “Ez Memekî dîn im.*

*Çare û munkûnê li ‘eşqê dilan nabînim.*

*Ezê xwe şettê Cizîrê biqelibînim.*

*Ezê melhemekî ji birînê dilî xwe ra wînim”<sup>207</sup>*

### **Nimûne ji bo dema dêbê:**

*„Sibe roja îne ye, wê suwarek were ber şettî Cizîrê, gécûtan pirs ke, were Zînê zebt bike, tu here wî suwarî bixapîne.*

*Şalê te ji xwe ra birevîne.*

*Ku nebû, di goleke masîyan hilweşîne.*

*Mem ku di bajarê Cizîrê keve, qîz û bûk wê aşiqê bibin, ‘xayîret û namûs namîne.”<sup>208</sup>*

## **1.7. Beyta Mem û Zînê ji Alîyê Naverokî va**

### **1.7.1. Xelekên Beytê**

#### **1.6.1.1. Nasandina bajarê Mu’xribistanê û Desthelatên wê**

Beyt bi nasandina bajarê Mu’xribistanê û ‘Alî Paşa û her du birayên wî dest pê dike. Bajarê Mu’xribistanê bajarekî giran û zengîn e. Bajar di destê ‘Alî Paşa û her du birayê wî da ne. Di darê dinê da her tiştên wan heye, lê her sê bira jî kurdûnda, ocaxkor û warewenda ne. Her sê bira li ber vê hindê pir xemgînin. Da ku birayê biçûk şevê xewnekê dibîne. Di xewnê da Xocê Xizir dibêje: “Hûn gereke ji ‘Alî paşa ra qîzekê ji berê Qurêşîyan, ji sinsileyî hezretî Sileyman (rê. 7.) bixwazin ku ocaxa we şên bibe.

---

<sup>205</sup> rê. 9-16

<sup>206</sup> rê. 179

<sup>207</sup> rê. 279-282

<sup>208</sup> Rê. 250-253.

### **1.7.1.2. Zewaca ‘Alî Paşa û Bûyîna Memê**

Piştî xewna birayê ‘Alî Paşa, hemû giregirên bajêr berhev dibin û delalan li nav bajêr dixin û li dû malên Qureyşîyan digerin û di dawîyê da qîzeke Qureyşî bi navê Zelfîxa bi pêka rê û risma heyî ji ‘Alî paşa ra dixwazin û Xudê kurekî dide ‘Alî paşa û giregireyên bajêr top dibin û navê wî dikin Mem. Mem li ber destê murebîyan fêrî zanistê dibe û bavê wî di deh salîya wî da text û tacê xwe teslîmî wî dike.

### **1.7.1.3. Peydabûna Bozê Rewan**

Masîgir û torçiyên bajêr torên xwe davêji behrê ku masîyan bigirin, lê li dewsa masîyan canîyekî behrî dikeve tora wan da. Torçî wî canîyê didin Memê.

### **1.7.1.4. Nêçîr û Qîzên Padişahê Pêrîyan**

Rojekê heval û hevsa Memê destûrê ji day û bavê wî dixwazin ku Memê bi xwe ra bibin nêçîrê. Mem li Bozê Rewan siwar dibe û bi hezar û heştê siwarê derebegan va diçe nêçîrê. Her sê qîzên padişahê pêrîyan dikevin libsê kevokan û Mem dide dû wan. Ew Memê li dû xwe ra dibin ta ku Mem digîje baxçeyê gulên û sêvan. Qîzên padişahê pêrîyan li wir ji libsê kevokan derdikevin û dikevin nava hewza avê. Memê li wan rast tê. Qîzên padişahê pêrîyan li ser cuwanîya Memê Zendegirtî dimînin, û dibêjin kesek tune ku bibe heval û hevsera wî. Lê yek dibêje ku Zînê qîza Mîrê Cizîra Botan hê ji wî jî bedewtir e. Di dawîyê da ji bo daneberhevê biryarê digirin ku herin Zînê ji Cizîrê bînin û ewê û Memê bidin ber hev ka kî ji wan cuwantir e.

### **1.7.1.5. Dîdara Efsûnawîya Memê û Zînê**

Qîzên padişahê pêrîyan xwelîya mirîyan li ser nivînê Zînê direşînin û ewê di xew ra dikin û didin ser baskên xwe û diîn dadinên koşka Memê û li rex textê Memê û li cuwanîya herdukan temaşe dikin.

Mem bi dengê qîzên padişahê pêrîyan ra ji xewê hişyar dibe û dîna xwe didê jinek li oda wî li ser textekê razaye. Memê deng li Zînê dike û dibêje ka tu kê yî û di qonaxa min da çi dikî. Zîn jî dibêje Memê ev qonax ya min e û tu di oda min da çi dikî?

Herduk hevdu sûcdar dikin. Da ku Memê dibêje Zînê eger qonaxa te ye, gazî cêrî û kenizên xwe bike, bila di hewara te da bîn. Zîn hindî gazî dike kes bersiva wê nade. Lê Mem dengê gazî dike, koleyên wî bersiva wî didin. Zîn dipejirîne ku qonax ne ya wê ye. Ew û Mem bi hevdu ra dikevin galegal û axiftinê. Li dû ra Mem û Zîn pêkve radikevin û Memê

şûrê xwe dadine nîveka xwe û Zînê û herdu wisan di xew ra diçin. Her sê qîzên padişahê perîyan tên gustîlên wan li hevdu diguherin û dîsan Zînê radikin û dibin Cizîrê.

#### **1.7.1.6. Hişyarîya ji Xewa Evînê**

Sibêdê dema ku Mem ji xewê radibe, mêvana xwe nabîne. Mem terka text û tacan dike û diçe tewlexanê ku Bozê Rewan derxe û lê siwar bibe, destebirayê wî pê dihese û hewarîyê dide day û bavê wî. Day û bavê wî her çî dikin nikarin berayîka wî bigirin. Mem xurca zêran davêje terkîya Bozê Rewan û berê xwe dide rêyeke nadîyar.

#### **1.7.1.7. Zîn, Beko û Qîza Beko**

Piştî dîdara Mem û Zînê ya efsûnawî çun tiştê ji destê Zînê nayê, ew reş girê dide. Dema ku Beko dibîne ku Zîn ketîye reşîkê, ji qîza xwe ku keniza Zînê ye dipirse ka xanima te çima ketîye reşîkê. Qîza wî dibêjê eva şeş meh in ku rewşa wê wisan e û ew sirra xwe ji kesî ra nabêje. Beko remlê davêje û pê dihese ku Zîn û Mem bûne evîndarên hev û roja îniyê Memê were ber şetê Cizîrê. Ew qîza xwe şîret dike û dişîne pêşîya Memê ku Memê bixapîne. Lê Memê wêya nas dike û naxape. Mem bi arîkarîya Xocê Xizir ji buhurê şetê Cizîrê derbas dibe.

#### **1.7.1.8. Mem digêje Cizîra Botan**

Dema ku Mem digêje Cizîra Botan, her kesê ku wî dibîne, daxwazê jê dike ku bibe mêvanê wan. Beko jî xwe bi Mem ra digehîne û dibêjê ez jî apê te me, were bibe mêvanê min, lê Mem xwe ji wan rizgar dike û di dawîyê da diçe dibe mêvanê her sê birayên Celalî, Hesên, Çeko û Qeretacîn.

#### **1.7.1.9. Dîdara Duyem ya Evîndaran**

Dema ku Mem digêje Cizîrê, dizêwire dilê Zînê û dilê wê ava kanîya Gulan dixwaze. Cêrîya wê diçe ku avê biîne, bi hatina Memê dihese û Zînê pê agadar dike. Zîn fermanê dide qîz û bûkên bajêr ku pêkve derkevin ser kanîya Gulan seyrane. Dema ku Zîn diçe ser kanîyê Memê ji pencerê ra ewê dibîne. Mem bi arîkarîya mazûvanên xwe li Bozê Rewan siwar dibe û tê ser kanîyê bal Zînê. Ew û Zînê li wir hevdu nas dikin û birayarê digirin ku li koşka Sitîyê da hevdu bibînin.

#### **1.7.1.10. Fesadîya Beko**

Beko pê dihesa ku Memê û Zînê li ser kanîya Gulan hevdu dîtine, dikeve peyê pîlan û fesadîyê û diçe bal Mîr li dijî Memê û mazûvanên wî diaxive û dixwaze wana li ber çavên Mîr reş bike û Mîr han dide ku Mem û mazûvanên wî di gel xwe bibe nêçîrê.

#### **1.7.1.11. Nêçîr û Nêçîrgeh**

Bi fermana Mîr ra hemû mêrên bajêr diçin nêçîrê. Mem jî bi neçarî di gel wan diçe. Lê Mem di rê da bi qelemteraşê zenda xwe birîndar dike û bi wê berhaneyê dizivire malê û diçe koşka Mîr û ew û Zîn li wir pêkve dimînin.

Dema ku Beko dibîne Mem nehatîye nêçîrê, Mîr han dide ku dev ji nêçîrê berde û bizivire malê. Hindî mazûvanên Memê bertekan didin gotinên Beko, lê Mîr dest ji nêçîre dikişîne û ber bi koşka xwe dizivire. Hesen her du birayên xwe Çeko û Qeretajdîn pêş da dişîne ku Mem û Zînê bi hatina Mîr agadar bikin. Ta çeko û Qeretajdîn xwe digehînin koşka Mîr, Mîr jî digîje koşkê. Memê bi neçarî Zînê di bin kurkê xwe da vedişêre. Mîr û Beko û Hesen bi giregiran va têne koşkê. Mem nikare li ber Mîr va rabe pîyan. Hesen bi îşare jê dipirse, Memê serê herdu kezîyên Zînê li bin kurk ra nîşanî Hesen dide.

#### **1.7.1.12. Fedakarîya Hesen**

Dema ku Hesen bi wê rewşê dihesa, xwe li dîntîyê dadine û şûrê xwe hildide û duwanzdeh hespan dukuje û agirî berdide mala xwe û zaroka xwe ya heft rojî davêje nava wî agirî. Sitî hewarîyê bi Mîr û meclisa wî dadixe. Mîr bi meclisa xwe va diçe hewarîyê Sitîyê. Dema ku hemû ji koşkê derdikvin, Zînê jî ji bin kurkê Memê derdikeve û diçe alîye heremserayê.

#### **1.7.1.13. Kişikanê û Nexşe û Pîlana Beko**

Mîr bi nexşeya Beko bi Memê ra kişikanê dileyze. Lê gava ku Beko dibîne Mîr bi Memê nikare, diçe Zînê dixapîne û dişîne ber pencerê ku li leyza Memê û Mîr binêre. Dema ku bi pîlana Beko Mîr û Mem cîyên xwe bi hevdu diguren û çavê Memê bi zînê dikeve, Mem derdide û Mîr wî davêje zindanê.

#### **1.7.1.14. Her sê birayên Celalî dixeyîdin**

Dema ku Mîr Memê davêje zindanê, hersê birayên Celalî mala xwe ji cem Mîr bar dikin û diçin şamê. Piştî midehehê ku pirsgirêkek ji Mîr ra çê dibe, Mîr nîyazmendî arîkarîya her sê birayan dibe, peyakekê dişîne dû wan û dibêje, bila werin ez ê Zînê bidim Mem.

#### **1.7.1.15. Mirina Memê bi Henarên jehrîkirî û xwekujîya Zînê**

Dema ku Beko pê dihesê Mîr şandîye dû her sê birayên Celalî û bi hatina wana ra Memê ji zindanê azad bibe, bi arîkarîya qîza xwe henrên jehrîkirî ji Memê ra dişîne û Mem bi wan henarana dimire û Zîn jî qelemteraşê li dilê xwe dide û xwe dikuje.

#### **1.7.1.16. Kuştina Beko û Dawîya Bûyerê**

Bi mirina Mem û Zînê ra Mîr jî Beko dikuje û bûyer bi mirian wan her sêkan kuta dibe.

### **1.7.2. Huzûra bêjer yan danerê berhemê di metna berhemê da**

Di mesnewîyê da bêjer yan nivîserê mesnewîyê gelek çar hebûna xwe radigehîne û weke bêjerekî xwe têkelî qewimînan dike û dibêje, min filan pişka çîrokê got û ez ê niha ji we ra li ser filan pişkê bêjim, yan we li ser filankesê bihîst, niha jî em ê li ser filan bûyerê biaxivin. Lê ev hinda di beytê da li ber çavan nakeve. Em hebûna beytbêjî di beytê da seh hankin. Beyt bixwe bi şiroveya bûyeran bihîster yan xwîner li dû xwe ra radikêşe, lê di mesnewîyê da nivîskar bûyerê diîne bîra xwîner yan bihîsteran.

#### **1.7.3. Hêmanên Mîtolojîkî û Dînî di Beyta Mem û Zînê da**

Di vê beytê da ji bilî hindêk motîvên dînê Îslamê, zortir em rastî motîvên dînê Zerdeştî û bawerîya Mîtraîzmê tînin. Fezaya ayînî û dîndarîya Îslamî di vê beytê da kêr û bêreng e. Tenê di despêka beytê da em rastî çend motîvên Îslamî tînin, yê wekî: rojên ‘aydan û ‘arefatan. Yan Mem ‘hifz dîke ‘ilmî rebbil-‘alemîn, xetîm dîke sî cuzû Qurane...

Lê berewajî wê fezayeke îstûreyî di beytê da serdest e.

Di seranserî beytê da em du hêzên dijber, hêza xerab û hêza qenc li himberî hevdu da dibînin. Beko, Mîr û qîza Beko nûnerên hêza xerab û Hesên/Tajdîn jî nûnerê hêza qenc e ku li himber hevdu da rawestane. Di seranserî beytê da şerr û pevçûn di nîveka du hêzên dijber da dîyar dikin.

Hêmin Mukrîyanî (1921-1986) di destpêka pirtûka *Tuhfey Muzefferîye* da li ser beyta Mem û Zînê weha dinivîse:

“Bi bawerîya min Mem û Zîn gelekî kewn e. Gelekî ji wê hindê kewntir e ku em lê dihizirin. Beyt bere bere li dirêjaya mêjûyê da hatîye nûjenkirinê. Di gel wê hindê ku gelek caran hatîye nûjenkirin û tezekirinê, lê dîsan jî nîşaneyên ayînê Zerdeştî pêva dîyar in. Ev hinda jî serbelgeya kewnbûna wê beytê ye. Li seranserî beyta Mem û Zînê da şer û pevçûn û milmilanê di nîveka xudawendê xêr û xudawendê şerr da heye. Pevçûneke tund û aşitînexwaz. Eger Bekirê Mergewerî Bekirê fesad û xeberbizîn û bedfer nûnerê xudawendê şerrî dixwaze Mem û Zînê van her du kur û kiçên Kurd yê pakij rezil û ruswa bike, li himber wî da Qere Tajdîn<sup>209</sup> mezintirîn cuwamêrî û fedakarîyê dike û ji bo parastina abirûya Mem û Zînê mala xwe agirdadayî dike<sup>210</sup>

Herwisan di beytê da em rastî motîvên efsaneyî û rêça ayînen Îranî yê kewn tên. Navê her sê qîzên padişahê perîyan ( di gel li ber çav girtina celebên beytê yê dî) hersê makeyên bawerîya Mîtraîzmê; tav, hîv û istêrê dînin bîra mirovî. Ev her sê ne ku dibin hegera evîndarîya Mem û Zînê.

Herwisan di beytê da em dibînin ku qîza Beko ku navê wê jî Zîn e, xwe dike libsê Zîna Zêdan û tê li ser bihurê şettê Cizîrê, da ku bi pîlanên bavê xwe Beko, Memê bixapîne û xwe weke Zîna Zêdan bi Memê bide pejirandinê û nehêle Mem here Cizîra Botan û Zînê bibîne. Eger nekarî jî Memê bixapîne û wî di gola mar û masîyan da wer bike. Ev hatina Zîna qîza Beko û bihurê şettê Cizîrê durust weke mijara pira çînwetê ya dîne Zerdeştîyan e. Bi pêka nivîsîna pişporên dîne Zerdeştî, dema ku kesek dimire, piştî sê rojan canê/ruhê wî diçe ber dadigaha Îzedê Mêhr, li dû ra ew ber bi pira çînwetê rê dikeve. Eger ew kesekî/e xudanxêr û qencekar be, li ser pira çînwetê keçîkek xweşik tê pêşewazîya wî/ê û ewî/ê ber bi bihîştê rênimûnî dike. Lê eger ew kesekî neqenc û bedkar be, pîrejîneke pintî û kirêt tê pêrgî wî û ewî di pira çînwetê ra davêje nava dojhê. <sup>211</sup>

Em dikarin hatina Zîna qîza Beko di libsê Zîna Zêdan û buhurê şettê Cizîrê biwekînin pira çînwet û firiştaya rênimûnker. Zîna qîza Beko pêş da xwe weke Zîna Zêdan (keça xweşik) dide nasandinê. Lê paşê rûçkê wê yê rastîn eşkere dibe (pîrejîna pintî) û Memê wê nas dike. Çun Mem mirovekî pak û xudanxêr bûye, hezretî Xizir tê hewara wî û buhurê şettê Cizîrê nîşan wî dide û ewî ber bi bihîştê wî ku Cizîra Botan e dişîne.

<sup>209</sup> Di vê varyantê da Hesên neqşa Qere Tajdîn dileyze, ji her sê birayên Celalî ew birayê mezin e.

<sup>210</sup> Mukrîyanî, Hêmin, *Tu'hfey Muzefferîye*, Intişarati Seyîdîyan, Mehabad 2011, r. 70

<sup>211</sup> Hinnells, John R. *Persian Mythology*, wer. Âmûzgâr, Jâle- Tefezzulî, Ehmed, Neşr-ê Çêşme, Tehran, 1386 hş., rr. 98-99.

Em dizanin ku xwekujî di dînê Îslamê da heram e, lê di dawîya vê beytê da dema ku Mem bi jehrîya henarên Beko dimire, Zînê jî xwe dike. Ev mijara xwekujîyê jî yek ji wan motîvan e ku di Îslamê da tune ye.

Di beytê da li ser merasima kefn û defn û şuştina cenazeyan tiştek nehatîye gotinê.

## **1.8. Danasîna Dariştenasî (Morphology) ya V.Propp**

Dariştenasî zanistekê di qada lêkolîna edebî da ku cara yekem zimannas, folkloras, lêvkol û antropologê Rûs Vladîmîr Propp ( 1895- 1970) ew ji bo lêkolîna li ser efsaneyan helxist. Ev peyva îdyomeke bûnewernasîyê ye û li ser zanista darêjk, saxtuman û wêneyên rûveyî yên bûnewerên zindî, çi gîyah û çi canliber diaxive.<sup>212</sup>

Vladîmîr Propp li ser dariştenasîya sed çîrok û efsaneyên Rûsî xebitîye û encama karê xwe sala 1928an weke pirtûk weşandîye. Pirtûka wî destpêka lêkolîn û veçirandina efsaneyan û serrastkirin û formdana dariştenasîya efsaneyan dihête hejmarê. Ewî di vî karê xwe da nîşan daye; di gel wê hindê ku hejmara efsaneyan li bara qehremanan û nav û cur û celebên xwe yên rûveyî da, gelek in, lê efsane hemû di gelek xalan da hevpar û hevpişk in. Ew di dawîya karê xwe da giheştîye wê encamê ku di hemû efsaneyan da sî û yek karkirdên hevpişk hene ku ji layê heft kesayetîyên bingehîn wate qehremanên serekî di efsaneyan da têne kirinê.

### **1.8.1. Beyta Mem û Zînê bi pêka Dariştenasî (Morphology) ya V.Propp**

Li dû V. Propp ra gelek kesan li ser vê mijarê lêkolîn kirine. Lê çunkû V. Propp yekemîn kes e ku ev mijara helxistîye, herwisan ji ber ku karê me sînordar e, em nikarin bîr û hizr û teorîya dîtir kesan li vir helxin, em ê di vê pişka xebata xwe da tenê bi pîvaneya V. Propp Beyta Mem û Zînê bipîvin û bibînin kanê ji wan sî û yek xalana û heft kesayetîyana çend xal û çend kesayetî di vê Beytê da hene.

V. Propp wan heft kesayetîyana weha dide rêzê:

1. Qehreman
2. Tawankar/Kesayetîyê şerûd
3. Bexşîner
4. Yarîder
5. Kiçemîr/ dotmîr yan kesa ku mebesta lêgeryanê ye
6. Berêker/şander

---

<sup>212</sup>Propp, Vladimir, *Masalin Biçimbilimi*, çevirenler Rifat, Mehmet- Rifat, Sema, 1985 İstanbul, r. 9; Enverî, Hesên, *Ferheng-ê Bozorg-ê Soxen*, cild-ê heftom, r. 7474 ; Pervînî, Xelîl- Nâzîmîyâan, Hûmen, Olgû-yê Sâxtârgerâyî Vlâdimîr Propp ve Kârbord-hâyê Ân der Rivâyetşonâsî, *Do Feslnâme-yê 'İlmî- pijûhişî* „ *‘pijûhiş-ê Zebân ve Edebîyât-ê Fârsî*“ şomâre-yê yâzdehom, pâyîz ve zemistân-ê 1387. hş.

7. Qehremanê/a saxte/ zirpehlewan<sup>213</sup>

Em dikarin van heft kesayetîyan di Beyta Mem û Zînê da weha destnîşam bikin:

**Tabloya hj. 5. Heft Kesayetîyên beytê û karkirdên wan.** <sup>214</sup>

hj.	Kesayetî	Navê Kesayetîyên di Beytê da	Karkirda kesayetîyên Beytê
1	Qeheremna	Mem	Mem qehremanê serekî ye û ew di rêka bi desthanîna Zînê da dibe gorî. Em dikarin Zînê jî qehremaneke di bidin nasandinê ku di beytê da neqşa wê jî ji ya Memê kêmtir nîne.
2	Tawankar	Beko, Mîr Azdîn	Beko û Mîr dijî pêkgehîştian Mem û Zînê kiryar û tevgeran dikan. (qîza Beko jî li mijara xapandina Memê û dana henarên jehrîkirî bo Memê sûcdar û tawanbar dihête hejmarê, lê ew zortir di libsê qehremana saxte da dîyar dibe.)
3	Bexşîner	Hesen, Çeko, Qeretajdîn, Sitî	Ev her çaran jî bo pêkgehîştina herdu evîndaran gelekî fedakarî û bexşînkariyê dikan
4	Yarîder	Xocê Xizir	Xocê Xizir sê caran arîkariya Memê û malbata wî dike. Ew diçe xewna birayê ‘Alî paşa û dibe arîkar ku ew bizewice û kurdûnda nemîne. Du caran jî dibe arîkarê Memê bixwe.
5	Kiçemîr/ kesa ku lê digerin	Zîna Zêdan	Zîn xûşka Mîrê Cizîrê û evîndara Mem e. Memê li dû peydakirina wê ji Mu’xribistanê ber bi Cizîra Botan dikeve rê. Çun di beytê da Zîn jî di gel Mem qehremaneke serekî dihête hejmarê, mirov dikare neqşa Qehremtîyê bide Zînê jî.
6	Berêker/şander	Hersê qîzên padişahê perîyan	Hersê qîzên padişahê perîyan Zînê diînin bal Memê û ji bo ku Mem bikaribe li dû Zînê ra here, gustîlên wî û Zînê li hevdu diguhere
7	Qehremana/ê saxte	Zîna qîza Beko	Qîza Beko xwe dixwe libsê Zînê û tê ser rîya Memê û dixwaze Memê bixapîne û xwe li cihê Zîna Zêdan bi Memê dide nasandinê. Lê dema ku li ser nakeve buhurîyê şaş nîşanî Memê dide û dixwaze Memê di gola mar û masîyan da bixeniqîne...

<sup>213</sup> Propp, Vladimir, *hb.* r.80-81

<sup>214</sup> Propp, Vladimir, *hb.* r.32-66



### 1.8.2. Karkirdên Qehremanên Beytê bi pêka Darištenasîya V.Propp

Gava ku em karkird û kiryarên van heft qehreman û kesayetîyên serekîyê Beyta Mem û Zînê bi pîvaneya V.Propp dipîvin, em dibînin hemû kardkirdên ku V.Propp destnîşan kirine, di naveroka vê beytê da hene. Ev karkirdana her çiqas ku bi pêka hejmara rêzebenda Propp nebin jî, û hindê ji wan pêş yan li dû yê dî ra jî hatibin, lê ew karkirdên ku Propp destnîşan kirine, hema hema hemû jî di vê beytê da li ber çavan dikevin. Tabloya hejmar 4. karkirdên qehremanên vê beytê bi pêka teorîya Propp destnîşan dike.

**Tabloya hj. 6. Darištenasîya Beyta Mem û Zînê bi pêka teorîya V. Propp<sup>215</sup>**

hj.	Nîşan e	Sernavê karkirdan	Karkird bi pêka darištenasîya V. Propp	Nimûne di Beyta Memû Zînê da
1	β	Dûrketin	Kesek jî malbatê, terka malbatê dike, yan dimire.	Memê terka malbatê dike û jî Mu'xribistanê ber bi Cizîra Botan diçe û li wir jî dimire.
2	γ	Berben dî/Hošdarîpêdan	Kirina karekî ji qehreman ra berbend dibe, yan fermanek ji bo kirin û cî be cî kirina karekî jê ra tê.	Dema ku Memê dixwaze Bozê Rewan siwar bibe û here Cizîra Botan, dê û bavê wî daxwazê jê dikin ku nere wê seferê û terka evîna Zînê bike.
3	δ	Nehêlana Berben dî yê	Berbendî nayê pejirandinê. Qehreman guhê xwe nade ferman yan hoşdarîyan.	Hindî day û bavê Memê li ber digerin ku terka wan neke û neçe seferê, ew bi xebera wan nake û berê xwe dide oxira bêveger.
4	ε	Pirsyar û komkiri na agadarîyan	Kesayetîyê şerûd li dû berhevkirina agadarîyan dikeve.	Dema ku Beko dibîne Zîn di reşikê da ye, ji qîza xwe dipirse, ka Zînê çima reş girê daye. Lê qîza wî dibêjê Zîn sira xwe nade der.
5	ξ	Topkiri na agadarîyan	Kesayetîyê şerûd agadarîyan li bara qehremanî va bi dest xwe ve diînit.	Beko remlê davêje û bi rêka remlê dizane ku Mem û Zîn bûne evîndarên hev û roja îniyê Memê dê bête ber şetê Cizîrê
6	η	Fêlbazî û xapandin	Kesayetîyê/a şerûd dixwaze qehremanî bixapîne û agadarîyan jê bistîne, yan dest dane	Dema ku Mem tê ber şetê Cizîrê Beko qîza xwe dişîne pêşîyê da ku wî bixapîne. Herwisan dem ku Mem digîje bajarê Cizîra Botan, Beko bi

<sup>215</sup> Ji bo amadekirina vê tabloyê min ji van jêder û çavkanîyana wec vergirt: Îbrahîmî, Mezher, „Darištenasî Beytî Mem û Zîn û Berawirdkirdinî Hêmane Giringekanî le Gel Çîrokî Efsûnawîyî Kurdî da“, *Pijûhişname-yê Edebîyat-ê Kurdî*, Dewre-yê çehârom; Şomâre 6, Pâyiz û Zemistân 1397 hş., s. 187-215; Propp, Vladimir, *Masalin Biçimbilimi*, r. 32-66

			ser mal û hebûna wî/ê	dizgîna Bozê Rewan ra digire û bi derew dibêje ez apê te me, were bibe mêvanê min.
7	θ	Qehrem an dixape	Qehreman dixape û bêy wê hindê ku bizanibe, yan jî ne ji dil arîkarîya dujminê xwe dike.	Em vê mijarê bi du celebên di vê beytê da dibînin. Cara yekem ku Mem tê ber çemê Cizîrê, qîza Beko wî dixapîne û agadrîyan jê distîne. Ew xwe bi qîza Beko dide nasandin. Cara duyem dema ku Mem û Mîr kişikanê dikin, Mîr wî dixapîne û sira evîna wî ser vedike û ew dibêje ez evîndarê Zînê me. Herwisan Eger em Zînê jî qehremana duyem ya beytê bizanin, ew jî dixape. Zînê di vê Beytê da du caran tê xapandinê. Cara yekem Beko diçe dibêjê Mîr gotîye bila were ber pencerê li leyza min û Memê binêre û Zîn bi gotina Beko dixape û dibe hegera derdana Memê ya kişikan. Cara duyem jî qîza Beko wêya dixapîne û hinarê jehrîkirî didê û dibe hegera kuştian Memê.
8 A	A	bedxwa zî	Kesayetîyê/a şerûd zîyanê digehîne endamekî malbata qehreman	Me got ku ji bilî Beko û Mîr qîza Beko jî dikeve nav kategorîya kesayetîyên şerûd da. Beko Qîza xwe dişîne ser rêka Memê ku zedeyê bigehîne Memê û ewî di gola mar û masîyan da bixendiqîne.
8 B	a	kêmasî	Kesek ji malbatê nîyazmendî tiştekî ye, yan jî li dû tiştekî digerre	Dema ku Mem digîje bajarê Cizîra Botan, dilê Zînê ava kanîya Gulan dixwaze û keniza xwe dişîne avê û ev nîyaza Zînê dibe heger ku bi rêka keniza xwe bi hatina Memê agahdar bibe.
9	B	Daxwa za arîkarîyê û destûra çûna qehreman	Kêmasî yan bextreşî eşkere dibe. Fermanek yan jî daxwazek ji bo qehreman tê ragehandinê. Destûra çûnê bi qehreman tête dayîn, yan jî qehreman li dû karekî ra tê fermanberî kirinê.	Dema ku Zînê bi heval û hogiran ra tê ser kanîya Gulan, Memê li pencera mala Hesen ra Zînê dibîne û sirra evîna wî li bal mazûvanên wî eşkere dibe. Ew destûrê ji her sê birayên Celalî dixwaze ku here ser kanîyê û bi Zînê ra xeber bide. Her sê birayên Celalî destûra wî didin û bixwe jî pê ra diçin ser kanîyê
10	C	Biryra qehreman/ama debûna qehreman	Qehreman biryarê digire ku bi neyarê xwe ra rû be rû bibe	Mem biryarê digire ku bi Mîr ra rûberû bibe û bi wî ra bikeve şerê kişikanê. Li dû kişikanê ra li ser wî şer dikeve nîveka mazûvanên wî û Mîr da

11	↑	çûn	Qehreman terka malê dike	Mem ji Mu'xribistanê diçe Cizîra Botan↑
12	D	Dîdara di gel bexşîne r û kiryara bexşîne r	Qehreman tê azimandinê yan jêpîrsînê yan jî hêrişkirinê û ji bo destvehanîna serketinê cadû yan yarîder amade dibe.	Bexşîner di vê Beytê da her sê birayên Celalî û Sitîya jina Hesên e. Dema ku Memê dibe mêvanê her sê birayên Celalî, Hesên dibêje birayên xwe pencera qonaxê vekin, bila Mem li pencerê ra dîna xwe bide qîz û bûkên ku diçin ser kanîyê, da ku em bizanin ka evîndarê kê ye. (wate wî diazimînin.) Memê di dîdara yekem da dema ku ji pencerê ra Zînê dibîne, sira wî li bal birayên Celalî eşkere dibe. Hesên dibêje eger Memê evîndarê Sitîyê be jî, ez ê Sitîyê bidemê. Çeko dibêj na ew evîndarê Zînê destgirtîya min e, min ew bixîşande wî. Vêca ew bixwe Memê dibin ser kanîya Gulan û wî û Zînê rû be rûyî hevdu dikan.
13	E	Bertekê n Qehreman	Qehreman bertekan nîşanî kiryarên yarîder û bexşînkâr dide. Yan jî di azimûnê da ser dikeve.	Dema ku Mem pê dihesê birayên Celalî bi sira wî agadar bûne, dibêje wan ez li bal we şermê dikan, werin destê min girê din û min bikujin, bila ez li ber vê şermê derkevim.
14	F	Bidestxistina amûra cadûyî	Qehreman amûra cadûyê bi dest dixê û dikare ji amûra cadûyî wecê wergire/ bexşîner amûra cadûyê dide qehreman	Herçiqas ku em di vê beytê da rasterast amûra cadûyî nabînin, lê em dikarin Bozê Rewan weke amûreke esraramêz û derasayî bihejmêrin ku hem dibe heger ku Mem cara yekem li baxçeyê Gulan û Sêvan da rastî her sê qîzên paşayê perîyan bê, hem jî li ser piştê wî rêka şeş mehan bikudîne û bi wî xwe bi bajarê Zînê ra bigehîne.
15	G	Giheştina bi cîyê amanckirî	Qehreman digîje cîhê ku li dû tişt yan daxwazekê ye, yan tê birin, yan jî rênimûnîkirin	Mem digîje qonaxa Zînê û ew û Zîn di koşka Mîr da digîjin hevdu.
16	H	pevçûn	Şer û pevçûn li nîveka kesayetîyê/ya şerûd û qehreman da derdikeve	Em dikarin leyza kişikanê weke şer bihejmêrin ku bi pîlana kesayetîyê şerûd ye derece yekem di nîveka Memê û Mîr da derdikeve û li encama wê leyzê da şer dikeve nîveka her sê birayên Celalî û Mîr û Beko û nobedarên Mîr da.
17	I	Nîşankirin	Qehreman (ji bo nasandinê) nîşankirinê	Dema ku Mem û Zîn di qonaxa Memê da bo cara yekem hevdu dibînin û li dû ra di xew ra diçin, qîzên padişahê perîyan gustîlkên wan bi hevdu ra

				diguherin, da ku bi wê hindê bêne nîşankirinê û bi wê rêkê hevdu nas bikin.
18	J	Serkeftin	Kesayetîyê/ya şerûd tûşî şikestê dibe	Dema ku qîza Beko dihête ber çemê Cizîrê ku Memê bixapîne, Memê wê ya nas dike û bi ser hîleyên wê dikeve. Yan jî em dibînin ku Beko bixwe li evîna Zînê da û ji holêrakiran Memê da tûşî şikestê dibe û canê xwe di wê rêkê da ji dest dide.
19	K	Dûrkirina şer û bêtarê	Bextreşî yan kêmasîya destpêkê ji holê radibe yan jî kêma dibe	Dema ku serê Mîr dikeve bêtaran û nîyazmendî arîkarîya her sê birayên Celalî dibe, peyayekê dişîne dû wan û dibêje ez dixwazim Memê azad bikim û Zînê bidemê wî. Werin em zemawenda Mem û Zînê li dar xin.
20	↓	veger	Qehreman vedigere	Di vê beytê da qehreman na, lê her sê birayên Celalî ku yarîder û bexşînerê Memê ne, ji Şamê vedigerin Cizîrê, da ku zemawenda Memê û Zînê bikin.
21	Pr	Şopandin	Li dû şopa qehreman dikevin	Beko hem qîza xwe dişîne pêşîya Memê û hem jî bixwe li bajarê Cizîrê da rêka Memê çav ra dike û dema ku Mem dikeve nava bajaêr, bi dizgîna Bozê Rewan ra digire û dixwaze wî bibe mala xwe.
22	Rs	arîkarî	Qehreman bi arîkarîya yarîder ji şera şopgera rizgar dibe	Qîza Beko li ber şetê Cizîrê dixwaze Memê bixapîne û di gola mar û masîyan da wer bike, lê Xocê Xizir wek yarîder lê derdikeve û buhurê rast nîşanî wî dide û ewî ji mirinê rizgar dike. Em dikarin vê hindê bi mijara kişikanê va jî girê bidin. Dema ku Memê kişikanê derdide û sira evîna wî eşkere dibe, Mîr fermana kuştina wî die, lê her sê birayên Celalî arîkarîya wî dikin û ewî ji kuştinê rizgar dikin.
23	O	Gehîştina bi curekî nenaskirî	Qehreman bi curekî nenaskirî diçe mal yan welatekî dî	(Eger em Zînê jî qehremaneke sereke bihejmêrin) Zîn bi curekî nenaskirî ji layê qîzên padişahê perîyan va ji Cizîra Botan bo Mu'xribistanê dihête anîn.
24	L	Qehremanê saxte idiyên nedurust dike	Qehremanê saxte dest bi idiyên nedurust dike	Em di vê beytê da du caran rastî van idiyayan tên. Carekê qîza Beko idiyaya evîndarîya bi Memê ra dike û dixwaze Memê bixapîne û dibêje ez Zîna Zêdan im. Carekê jî gava ku Mem digîje bajarê Cizîra Botan, Beko dibêje ez apê te me. Herwisa Beko li bal

				Mîr idia dike ku Hesên dixwaze Mîratîyê ji destê wî derîne.
25	M	Karekî dijwar	Qedandin û kirina karekî dijwar ji qehreman tê xwastinê	Em dikarin leyza kişikanê weke azimûnekê bipejirînin, ku bi pîlanên Beko ji layê Mîr va bi Mem tê kirinê. Herwisan jê pirsîna navê evîndara wî û eşkerebûna evîna wî jî bixwe azimûneke.
26	N	qedandi na karê dijwar	Qehreman karê dijwar diqedîne	Hindik dimîne ku Memê di ezmûna kişikanê da bi ser bikeve, lê bi pîlanên Beko û hatina Zînê û cîguhorîna Mem û Mîr, Mem ji wê ezmûnê dernakeve.
27	Q	Nasîn	Qehreman tête nasînê	Mem di sê merheleyan da ji layê dijqehreman û bexşîneran va tê nasînê. Cara yekem ji layê qîza Beko va li ber şetê Cizîrê, cara duyem ji layê Beko va gava ku taze digîje Cizîrê û cara sêyem jî ji layê her sê birayên Celalî va sira evîna wî eşkere dibe.
28	Ex	servekir in	Sirra qehremanê saxte yan kesayetîyê/ya derewîn ser vedibe û ew tê ruswa kirinê	Sira qîza Beko li ber şetê Cizîrê eşkere dibe û ew ruswa dibe. Herwisan derew û pîlanên Beko li bal Mîr eşkere dibin û dibin hegra kuştina wî.
29	T	Tebdîl qîyafe	Qehremanê saxte dikeve libsekî dî	Qîza Beko bi cilên ku ji Zînê istandîye (û li xwe kirîye) hatîye ber şetê Cizîrê û ji Memê ra dibêje ez Zîna Zêdan im û dixwaze Memê bixapîne.
30	U	sizadan	Kesayetîyê/ya saxte tê sizadanê	Qîza Beko li ber şetê Cizîrê ji layê Memê va tê naskirinê û Memê bi nepejirandina daxwaza wê wêya ruswa diek. Her wisan Beko kesayetîyê şerûdê beytê ji layê Mîr va tê kuştinê û digîje sizaya xwe.
31	W	zema end	Qehreman zemawendê dike û dibe padişah	Dema ku Mîr ji kiryarên xwe poşman dibe, her sê birayên Celalî ji Şamê dizivirin û dixwazin karê zemawenda Memê û Zînê bikin. Zîn cil û bergên xwe yê xweşik li xwe dike û karê dîtin û azdakirîna Memê dike. Eva destpêka karê zemawendê ye. Lê bi xwarina henarên jehrîkirî, şahîya wan dibe şîn.

Di nava kesayetîyên vê beytê da Zîna Zêdan û Zîna qîza Beko her yek dikarin rola du kesayetîyan bileyzin. Zîn ku yek ji qehreman û kesayetîya sereke ya beytê ye, hem dikare neqşa kiçemîrê bileyze û hem jî di kesayetîya qehreman da hevpar e. Qîza Beko jî hem kesayetîya şerûd e û hem jî qehremana saxte ye.

Em dibînin ku di Beyta Mem û Zînê da hemû 31 xalên ku V.Propp destnîşan kirine, bi kêm û zêdeyî dîyar in.

## 1.9. Numad û Numadnasîya Hejmaran

### 1.9.1. Numad û Hejmarên Numadîn di vê Beyta da

Di vê beytê da hebûna hejmarên taybetî ku heryek numada bîr û bawerîyekê ne, ber bi çav in. Bi giştî pitir ji dused û deh caran hejmar di vê beytê da hatine, ku pişka zor hejmarên numadî ne.

Numad yan Symbol ji her nîşaneyekê ra ku wateyeke taybetî bide, tê gotinê.<sup>216</sup>

Di pişka zor ya çand û ferhengên mêjîn da hejmar bûne numad û sembola gelek çemkan. Ferheng/çanda îranî jî ji vê yekê cuda nîne.<sup>217</sup>

Gava ku em dîna xwe didin vê beytê, em dibînin ku di nav hemû hejmaran da hejmarên; 1, 2, 3, û 7 ji hemû hejmarên dî zêdetir hatine bi kar birinê. Ev her çar hejmar jî hejmarên numadîn in.

„Hejmara „yek“ di dînên Ilahî da hejmareke pîroz e û remza ilahîyet û yekbûnê hatîye hejmarê. Hejmara „du“ dikeve hemberî yekê û lewra nîşaneya dijayetî, li hemberderketin, yan jî aramişa demkî ya hêzan û nîşaneya bihorîna demê ye. Hejmara „du“ li hemû ayînên sirrî da bedyûm hatîye nasandinê û nîşaneya sîyê/sîberê ye. Hejmara „sê“ jî ji wan hejmaran e ku di efsaneyên Îranî da ji hemû hejmarên dî geletir tê bi karbirinê. Hejmara „sê“ li bal Îranîyên mêjîn remza dîn û cadûyê bû.“<sup>218</sup>

Di vê beytê da hejmara „1“ bi terkîbên xwe va nod carî, hejmara „2“ sî û şeş carî, hejmara „3“ sî û pênc carî û hejmara „7“ diwanzde carî hatîye. Mirov dibîne ku danerê beytê bi zanetî û bi li ber çavgiirtina pîrozî û neqşa hejmaran beyt li ser hejmaran ava kirîye.

Herçiqas ku hejmara yek nod carî di vê beytê da hatîye, lê bi tena serê xwe tenê şeş caran hatîye û heştê û çar caran di terkîban da hatîye. Ew jî li ber darêjka rêzimanî û peyvسازیya Kurdî ye ku wisan zortir weke terkîb di gel navên kesan û tiştan hatîye. Weke: „*Qasreke sipî, birceke belek e, qabeke bilind e, odake tûncîn e, hewlîyake bole fireh li ser bîst û çar qeyinterman e.*“ (bnr. BMZ.rê.17)

<sup>216</sup> Dêhxudâ, „Numad“ *Luxetnâme*.

<sup>217</sup> Ehmedî, Leylâ, „Neqşê E'idâd der Âyînha-yê Guzerê Îranî“, *Mecelle-yê Mutâlî 'ât-ê Îranî*, Dânişkede-yê Edebîyât ve 'Ulûm-ê Islâmî, Dânişgâh-ê Şehîd Bâhuner-ê Kirmân, sâl 14. Şomâre-yê 28, pâyiz ve Zimistân-ê 1394 hş., s.2.

<sup>218</sup> Zebîhnîyâ 'Umrân, Âsiye- Qeyyûmîzâde, Ferîbâ, „Berresî-yê Kârburd-ê E'idâd-ê Yek tâ Penc der Efsâne hâ-yê Mektûbê Îranî“, *Feslnâme-yê Pijûhişhâ-yê Edebî ve Belâ'î*, sâl-ê Pencom Şomâre-yê 18, Behâr-ê 1396 hş., s. 24.

Li ber vê hindê ew hejmara hind bala mirovî li ser xwe da nakêşe. Lê di nav van hemû hejmaran da karbirda hejmara sê ji hemûyên di balkêştir e. Mirov dikare avabûna beytê li ser vê hejmarê û giringîya wê li bal beytbêjî bi pîrozîya wê hejmarê di bîr û bawerîyên Mîtraîsm û Zerdeştîyê va girê bide. Gava mirov avirekî dide beytê mirov dibîne xîmê beytê li ser hejmara sê ava bûye:

Bavê Memê û apên wî sê bira ne.

Qîzên paşayê perîyan sê xûşk in.

‘Hesen, Qere Tajlîn û Çeko sê bira ne.

Zîn û Sitî û Qîza Beko sê jinên sereke ne ku di vê beytê da neqşa wan ber bi çav e.

Xocê Xizir sê caran di vê Beytê da eşkere dibe.

Hejmara delalan hem li bajarê Cizîrê da û hem jî li bajarê Mu’xribistanê da sê ne.

Hejmara gewherên dîwanxana ‘Alî paşa sê kevir in.

Reşma Bozê Rewan avêtine serî sê tewlîyane.

Zîn dergistîya Çeko ya sê salan e.

Mîr û Mem bi hevra sê oyînan dilîzin.

Di celebên beytê yên di da sê dar li ser gorên Mem û Zînê diruskin. Selvîyek, senewberek û dareke dirîyê.

Hejmara sê 35 caran di vê beytê da hatîye:

1. *Li bajarê Mu’xribistanê sê bira hebûn, (rê.1.)*
2. *Her sê bira korocax, warê wan wenda bûn. (rê. 2.)*
3. *Her sê biran diterikandin text û tacê giran. (rê. 4.)*
4. *Wê Xudê bi wê de ewladekî pê şên bibe ocaxê her sê biran. (rê. 8.)*
5. *Tê da sê kevirê maqbûldaşî ne, cewher e... (rê. 20.)*
6. *Sibe da berdane bajarî Mu’xribistanê sê delalane. (rê. 21.)*
7. *Rebbî ‘alemê dide Zelîxê ewladekî pê şên dibe, ocaxî her sê birane. (rê. 33.)*
8. *Mem mezin dibe, salê Memê dikeve salane. pê dike sisîyane. (rê. 37-38.)*
9. *Bira bişewite mala her sê qîzê padişayî pêrîyane. (rê. 67.)*
10. *Dadixîne baxçeyî gulan û sêvana, baxçeyî her sê qîzê padişayê pêrîyane (rê. 75.)*
11. *Memê di li wî baxçeyî sê qîz dikevîne hewzî gulane. (rê. 77.)*
12. *Werin, mêze kin ji me her sê xwêngan kîjan lîyaqê vî camêrî xelqê ye? (rê. 97.)*
13. *Ber dide bajarî Cizîrê sê dellalane. (rê. 124.)*
14. *Kew kete sibê, her sê qîzê padişayê pêrîyan bi der ketine navî qabristanê û merzelane. (rê. 129.)*

15. *Şeva li ya sisîyane. Dikine qîrînî li ser bask û perane. (rê. 134-135.)*
16. *Sa'at li sisîyan, peya dibin li ser qesr û qona'xa Zîna Zêdane. (rê. 137.)*
17. *Her sê qîzê padişayî pêrîyan peya bûn li ser taxt û tacane. (rê. 147.)*
18. *Sa'at li sisîyan rakirin xelqê nazilî, dişidandin li ser qanad û baskane. (rê. 148.)*
19. *Her sê qîzê padişayî pêrîyan helkişîyan teqan û pencerane. (rê. 151.)*
20. *Her sê diketine mehakimeke girane. (rê. 153.)*
21. *Bira bişewite mala her sê qîzê padişayê pêrîyane! (rê. 187.)*
22. *pirs ke qona'xê 'Hesen, Çeko, Qeretaclîn, her sê Celalîyan e. (rê. 321.)*
23. *Bavê te 'Alî Paşa, sê bira ne. (rê. 326.)*
24. *Wî xerîbî girt bi dizgîna Bozê Rewane. Kişande qesrê qona'xa her sê Celalîyane. (rê. 360-361)*
25. *Reşma Boz avêtine serî sê tewlîyane. (rê. 362.)*
26. *'Hesen û Çeko û Qeretaclîn her sê bira ne. (rê. 363.)*
27. *Zîn dergistîya min e sê salan e. (rê. 429.)*
28. *Di serê min û te ra sekînî(sekinîne) Celalîyê bajarê Cizîrê, sê peya ne. (rê. 477.)*
29. *'Hesen û Çako û Qarataclîn, sê peya ne (bira ne). (rê. 478.)*
30. *Zîn ne carîyak e, va sê sal in xwasteka birayî tê, ezê çito baxşîşe mîvanê te kim. (rê. 515.)*
31. *Sê oyîna bi Memê ra qewl û qeraran dînin. (rê. 584.)*
32. *Sê oyun şert kirin bi Memê ra. (rê. 587.)*
33. *Oyîne sisîya lîstin... (rê. 589.)*
34. *Suwar bûn û çûn welatê Şamê. Man semtê sê salan. (rê. 599.)*
35. *Beko şeş henar anîn, zikî henaran sisîyan ji ja'rê tijî kir. (rê. 605.)*

Gelo danerê beytê ev hejmara sê weha 35 caran bi vê rêk û pêkîyê hema wisan bi helkewt danîye, yan ew remz û numadeke istûreyî, dînî û efsaneyî ye? Ji bo bersiva vê pirsê emê serî li çend jêderan bidin.

Teymûrê Malmîr di gotarekê da dinivîse: „Darêjka binêşeyî ya çîrokên Îranî û Îslamî sêyîne ye, ku sê tişt yan sê qehreman tê da hene. Darêjka sêyîne di binêşa xwe da ji istûreya afirandinê hatîye vergirtin. Çîroka afirandinê di celeba xwe ya Samî da ji sê kesayetîyan pêk tê: Adem, Hewa û Iblîs. Ev sêyîne di ferheng û şaristanîyeta Îslamî da weke: Aşiq û Meişûq û Dadokê xwe nîşan didin. Helqeya binêşeyî ya vê sêyîneyê kesa/ê sêyem e, ku dibe hegera



pêkgehîştian aşiq û meîşûqê û jîyaneke nû diafirîne. Iblîs di biwarên nerînî da dikeve neqşa dadokê û di biwarên erênî da jî dibe navgîn û celebeke dî ya Cebrail e. ...“<sup>219</sup>

H. Mem li ser pîrozîya hejmara sê weha dinivîse: “ Hejmara razî (sirî)

ya sisê ya di tesewufê da, sêyîneya di çanda olî ya ariyan da Ahûra Mezda, Hurmiz, Ehrîman û sêyîneya di xirîstanîyê da Xweda, Îsa û Ruhê Pîroz, zaniyarîyên pîvekî (krîterî) yên çanda bawerîyê ne. Ev ên hanê ku xwedî zemîneke dîn û ramanê ne, di sondxwarinê, qewildanên şahidî û peymanan da, sîstema pîvanê ne, ku bi piranî tên bi karanîn.”<sup>220</sup>

Hejmara sê li bal Zerdeştîyan hejmareke pîroz e û ew helgirê sê gotinên Zerdeşt in, yên ku xîmê bîr û bawerîya Zerdeştîyan li ser wan ava bûye, ku jê ra sê bext/buxt wate sê rizgarîker gotine: gotara baş, ingara baş, kiryara baş.<sup>221</sup>

Navê sê qîzên paşayê perîyan (di celebên dî yên Beyta Mem û Zîn da ) beranber e di gel sê numadên pîroz yê Mîtarîsmê, wate Tav, Hîv û Istêr.

Hejmara sê li bal Kurdan hejmareke taybet e. Weke sê sondê qesemê (wellahî, billahî, tellahî.) sê telaqê jinberdanê, sê dest leystin, sê kab leystin, sê caran gazîkirin (di istiranana da) hersê rojê felekê...

Mu'xên ku istêrka 'Îsa pêxember dîtin û çûne dîtina wî sê kes bûn.<sup>222</sup>

Sê li bal hindûyan jî hejmarek pîroz e û peydabûna zatê heq e: Berehma,

Wîşno û Şîwa.<sup>223</sup>

Sê numada demê ye, dem li ser sê paran hatîye parvekirinê: dema

bihorî, dema niha û dema nehatî.

Sê hejmareke binyadîn e û xîmê hebûnê bi wê ava dibe. Day û bav û zarrok.

Bi van agahdarîyan ra em dibînin ku danerê beytê di gel li ber çavgirtina giringî û pîrozîya hejmara sê , ew weha di beytê da bi kar birîye û rengê pîrozî û mezhebî û istûreyê daye beytê.

Hejmara 2 di vê beytê da 36 caran hatîye:

1. *Şev dikeve, şevê duduyane.* (rê. 24. )

2. *canîkî du salin, dêle li kabane.* (rê.53. )

3. *Her du xwyîngan li xwe kirin post û perane.* (rê.78. )

4. *Di ser xwe ra ban kire her du xweyîngane.* (rê.81. )

<sup>219</sup> Mâlmîr, Teymûr, „Câ be CÂYî-hâyê ‘Ededî-yê Ustûre-yê Âferîniş-ê Nimûne-yê Nexustîn Insân“ *Mecelle-yê Dânişkede-yê Edebîyât ve ‘Ulûm-ê Insânî-yê Meşhed*, Şomâre-yê 160. Sâl 1387 hş., s. 285.

<sup>220</sup> Mem, H, hb. r. 48.

<sup>221</sup> Tewfîqî, Huseyn, *Âşînâyî bâ Ediyân-ê Bozorg*, Nâşir, Merkez-ê Cehânî-yê ‘Ulûm-ê Islâmî, sâl 1385 hş., r. 39.

<sup>222</sup> Ehmedî, Leylâ, hb, r. 5.

<sup>223</sup> Me’sûmî, Xulâmrezâ, „Berehmen, Wîşno, Şîwâ“, *Dâiretu’l-me’arif -ê Esâtîr ve Âyîn hâ-yê Bâstânî-yê Cehân*, nş. Dewre-yê Mêhr, sâl 1394 hş., s. 142.

5. *Di ser me ra rebbî 'alamê du husne û cemaî dane.* (rê.85. )
6. *Birceke belek, di bin ra dimeşe şettê bi du filqan e. (firqane)* (rê.87. )
7. *Ku şev ketê şevê dudîyane, 'ayan bû li canê Zîna Zêdane.* (rê.117. )
8. *Şev dikeve, şeva dudîyane.* (rê.133. )
9. *Bavêne şettê Cizîrê bi du firqan e.* (rê.177. )
10. *Her du ketine xewa şevane.* (rê.186. )
11. *Mabênê her du bajara qona 'xê şeş mehan e.* (rê.192. )
12. *Werin, em biguherin her du gustilê pêçîyane.* (rê.193. )
13. *Ji mi ra dîyê kûr, bavî ixtîyar, her du apê korocax biwesînin.* (rê.213. )
14. *Ji Memê ra ... her du apê korocax diwesînin.* (rê.215. )
15. *...her du apê warwenda bêlî li berî qapîyan û camîyano!* (rê.221. )
16. *Ez merîkî xerîb im, nas nakim gêçûtê şettê bi du firqan e.* (rê.261.)
17. *Mêze dikim, Bozê Rewan, ji bîst û çar bizmaran du bizmar bi niga da nemane.*  
(rê.275.)
18. *Gêçûtî bajarî me nêzik e, derbas ke şettê bi du firqane.* (rê.285.)
19. *Berî xwe bide bavî xweyî ixtîyar e, derbas ke şettê bi du firqane.* (rê.294.)
20. *Hîro hatîye acil û va 'da me her duyane."* (rê.303.)
21. *Tu îş û gûcî min tune, bi mabênê her du ixtîyarane.* (rê.343.)
22. *'Hesen î bi aqil e, mêze kir li Memê Alîyane, ban kire her du birane.* (rê.367.)
23. *Bira bi mi da risqatê heftêkê û dudîyane.* (rê.377.)
24. *Heta biqedînim mirazî her du 'eşqîyane.* (rê.378.)
25. *Bira li canê min 'heram be, mi bexşîş kir Memî 'xerîb, mivanê meyî du şevan e.*  
(rê.430.)
26. *Were mêze ke li îş û karî her du 'eşqîyane!"* (rê.431.)
27. *Dikim bi hev gihînim her du derdlîyane."* (rê.435.)
28. *...her du biran xwe avêtine zenguyan.* (rê.452.)
29. *Mêze dikine li me her du 'eşqîyane.* (rê.461.)
30. *...her du apê warwenda li berî qapîyane.* (rê.463.)
31. *'Hesenî pismam ku niha em her du 'eşqî ji hev qetandin,* (rê.490.)
32. *Mem û bi Zîne va man her du di oda Mîr 'Azdîn da.* (rê.555.)
33. *Zibûnê Zîne û 'herema Mîr her du rengêk bû.* (rê.577.)
34. *Memê du oyun ji Mîr vexwarin; oyunê sisîya lîstin.* (rê.589.)
35. *...her du oyunê Memê Mîr jê vexwarin.* (rê.596.)
36. *Beko li ortê her du cenazan çû, hat, kenîya.* (rê.642.)

Hejmara du, li pêş her tiştî da numada dualîzmê ye ku xîmê Mîtraîsm û Zerdeştîyê li ser ava bûye. Du numada dijayetîya nîveka du kes, yan du tişt û du rewşên dijî hevbûnê ye. Nîşana gef û pîlangêrîyê ye. Du numada xaliq û mexlûq, reş û sipî, şev û roj, nêr û mê, made û can, mirin û jîn, çep û rast, erênî û nerênîyê ye.<sup>224</sup>

Di ferheng/çanda Îranîyan da hatîye ku; hejmara du xudanê van numadan e: şev û roj, jêr û jor, jîyan ku xudanê du derîyan engaşte bûye, derekî ra mirov tê û derê dî ra diçe (dimire), endamên leşê mirovî ku pişka zor e wan cot in.<sup>225</sup>

Lê di bîr û bawerîya gelêrî da du numada du kesan û du evîndaran û numada pêkgehîştinê ye. Kurd dema nifiran li kesekî/ê dikin dibêjin: „Xudê yeka te neke duyan.“

Di beyta Memê alîyan da her carê ku hejmara du hatîye bi karanînê, weke numada bihvîhandin û pêşketin û yekbûnê ye.

Şeva duduyan qîzên paşayê perîyan biryarê digirin ku Memê û Zînê bigehînin hev. (bnr. BMZ.rê.133.)

Bozê Rewan canîkî du salî ye. Ev canîyê du salî dê bibe wesîla pêkgehandina Memê û Zînê. (bnr. BMZ.rê.53.)

Şetê cizîrê bi du firqan e. Herçiqaş ku di beytê da nehatîye, lê bi kontêkstê mirov dibîne ku Mem di wî cîhê ku şet bûye du firqan ra derbas dibe ku here bigîje bajarê Cizîra Botan. (bnr. BMZ.rê.286.)

Dema ku Mem dixwaze here ser Kanîya Gulan û Zînê bibîne, her du bira xwe davêjin zengîya wî û arîkarîya wî dikin, ku here ser Kanîyê. (bnr. BMZ.rê.452.)

Ji bilî hejmara du peyv û çemka cot jî di vê beytê da berzeq û xûya ye, cot jî dîsa numada cotbûn û pêkgeheştinê ye di vê beytê da.

Peyva cot du caran hatîye bi kar birine: *“Cotê ipegan bişuxlînim.”* (bnr. BMZ.rê.444.)

*Zînê tas kire destê xwe, ber da îçî kanîyê, destî xwe avête cotî memikan.”* (bnr. BMZ.rê.482.)

Lê ji bilî vê peyvê em di beytê bixwe da jî rastî çemka cot tî: Mem û Zîn- Mem û Bengîn- Sitî û Zîn- Beko û Mîr- evanan du bi du bi hevdu ra cotekê çê dikin. Dema ku Mîr dixwaze here nêçîrê, Beko dibêje: *“Mîr, bira werg ban neke, bira bibêje: “sekman bi tîfangê xwe va, seyyadî bi tajîyê xwe va, her kes bi mîvanê xwe va werin, em herine seydê”* (bnr. BMZ.rê.518.)

Hejmara dî ku hejmareke istûreyî ye, hejmara heft e ku di vê beytê da 12 caran hatîye:

<sup>224</sup> Zebîhnîyâ - Qeyyûmîzâde, „Berresî-yê Kârburd-ê E'îdâd-ê Yêk tâ Penc der Efsâne hâ-yê Mektûbê Îranî“, s. 24- 36.

<sup>225</sup> Chevalier, Jean - Gheerbrant, Alain, *Ferheng-ê Numâdhâ*, Tercume ve Tehqîq, Fezâyilî, Sûdâbe, Intişârât-ê Ceyhûn, Tehran 1379 hş., s. 258.

1. *Her qapîyekî tê da runîştîye wezîrekî heft toqan e.* (bnr. BMZ.rê.12.)
2. *Bajarî Mu'xribistanê li ser etegê heft çîyan e.* (bnr. BMZ.rê.13.)
3. *Rebb il 'alamîn damlakê dinûqutîne qursa'xê Zelîxê ji azmanê heftane.* (bnr. BMZ.rê.23.)
4. *Salê Memê pê dike şeşan û heftan e.* (bnr. BMZ.rê.40.)
5. *Perwaz dikin li qatî ezmanî heftane.* (bnr. BMZ.rê.71.)
6. *Wê herîyê tirbê kuştîyan bireşînin bi ser heft mehelane.* (bnr. BMZ.rê.110.)
7. *Mêze kirin, nûrekî dîrek kete ji ezmanê heftane.* (bnr. BMZ.rê.130.)
8. *Wê herîyê tirbê kuştîyan direşînin bi ser heft mahallane. (mi'hellane)* (bnr. BMZ.rê.142.)
9. *„Ez Zîn im, xuşkê Mîr Êzdîn im, mêze ke, li sing û berê min mîne xalî heft rengîn e.* (bnr. BMZ.rê.179.)
10. *Belkî Memê dîye Sitî helala min e heft salan e.* (bnr. BMZ.rê.379.)
11. *'Heseno! 'eşqê dilî Memê, derdê canî Memê, ne Sitî ye, helala te heft salan e.* (bnr. BMZ.rê.428.)
12. *Lawkî heft rokî ji pêşîyê min radike dişewitîne.* (bnr. BMZ.rê.570.)

Hejmara heft hejmareke ku wateya kutabûn û tekûzbênê dide.<sup>226</sup> Heft rengê bûka baranê, heft rojên heftê, heft tebekên erdê, heft qatên asimanan, heft istêrkên asimanî, heft merheleyên kemalê, heftemîn roja hefteyê ku roja bêhnvedan û ceşnê ye, heft vadîyê êşq, heft caran tewafa Ke'beyê, bi heft qeleman xemilandin, heftxwanê Rostemê Zal...

Di bîr û bawerî û folklorê Kurdî da hebûna heft kuran nîşana bextewerîyê ye.

Hejmara 366 di vê beytê da 2 caran hatîye:

*Bajarê Mu'xribistanê bajarekî gewrî mezinî giran e. Li ser sêsed û şêst û şeş me'helan e.* (bnr. BMZ.rê.9-10.)

*Qasreke sipî, birceke belek e, qabeke bilind e, odayê tûncîn e, hewlîyake bole fireh li ser bîst û çar qeyinterman e. Sêsed û şêst û şeş odan e.* (bnr. BMZ.rê.17-18.)

Hejmara mihelên bajarê Mu'xribistanê û odayên qesra 'Alî paşa beranber in di gel hejmara rojên salê û ceşna sersala Êzdîyan ku Êzdî di wê rojê da 366 moman vêdixin.

Hejmarên di di vê beytê da:

4 (6 caran)

5. (carekê)

<sup>226</sup> Hesenzade, Âmine, „Câygâh-ê E'dâd der Ferhengê Merdomê Îrân“ *Feslnâme-yê Ferheng-ê Merdom-ê Îrân*, Şomare-yê 10, pâyîz-ê 1386 hş., rr. 168-169.

6 (8 caran)  
9 û 10 (3 caran)  
12 (du caran)  
16 (carekê)  
22 (carekê)  
24 (du caran)  
30 (carekê)  
32 (carekê)  
40 (carekê)  
72 (carekê)  
1800 (2 caran)

### 1.10. Erdnigarî û Cêderka Beyta Mem û Zînê

Ta niha bi dehan kesî Mem û Zîn bi şêweyên cuda, cuda weke beyt, istiran û çîrokan vegotine. Ev serpêhatîya li dirêjaya mêjûya xwe da ji nifşekê bo nifşa dî hatîye guhestinê û her nifşekê jî gorekî ferheng/çanda serdest ya gûna xwe hindêk şax û pelg jê birîne û şax û pelgên nû lê zêde kirine û her kesî ta radeyekê ew serpêhatîya nêzîkî devok, bîr û hizr û bawerî û ferhenga xwe kirîye, lê kakilê çîrokê nehatîye guhorînê.

Gava ku mirov li ser şêweya vegotina Mem û Zînê û devokên ku Mem û Zîn pê hatine gotinê radiweste, mirov digîje wê encamê û dikare piştrast bike û bêje; herêma ku Mem û Zîn tê da hatîye afirandinê, navçe û bajarên rojavaya Kurdistanê ji Rihayê bigire ta Efrînê ye. Wate Mem û Zîn berhema şênîyên navçeyên dewr û berên Furat ta çîyayên Kurmênc e.

Debê ev deverana navenda gotin û vegotina Mem û Zînê ya sereke be, lewra di vê beytê da rêzimana vê navçeyê ji rêzimana dîtir devokên Kurmancî serdesttir e. Herwisan ew dengbêjên ku di van navçe û bajarên da jîyane û xelkê wan bajarana bûne, ji dîtir dengbêjan baştir û rêk û pêktir û tekûztir Mem û Zîn gotine û dibêjin. Beytên ku van dengbêjana gotine li bara naverok û darêjka beytê û bi hevdu va girêdana helqeyên beytê û destpêk û dawîya çîrokê ji yên ku dengbêjên dîtir navçeyan gotine, tekûztir e.<sup>227</sup>

Li bal dengbêjên dervayî van navçana, hem selîqa vegotina beytê tê guhorînê û hem jî peyvên naveroka beytê destvedayî dibin. Durust e ku her dengbêjek xudanê sitîlek taybetî ye, lê dengbêjên dervayî wan navçên ku me destnîşan kirin, nikarin beytê bi ser û ber bêjin. Beyt

---

<sup>227</sup> Bo nimûne beytên ku Bavê Selah, Baqî Xudo, Cemîl Horo, Haşim Tokdemir dibêjin, ji yên ku Zahiro, Şakiro, Reso, Kawus Mîlanî û Metîn Barlik û dîtir dengbêjên serhedî dibêjin, tekûztir û rêk û pêktir in.

li bal wan nivîşkan e. Hem jî li bal gelekê ji wana selîqa vegotina beytê ku debê bi dengê nerm û melûl bête gotinê, tê guhorînê û selîqa gotina beytê weke selîqa istiranê lê tê. Bo nimûne gava ku mirov metna vê beyta ku em li ser dixebitin, di gel beytên ku birayanê Celîl<sup>228</sup> yan jî Hecîyê Cindî û Emînê Evdal<sup>229</sup> berhev kirine, dide ber hev, ev rastîya eşkere dibe.

Yek ji taybetmendiyên devokên hewzeya Furat bi karbirina nîşaneyên zayenda navdêrên nêr ji bo navdêrên mê ye. Weke çawa di vê beytê da hatîye. Li cîhê peyva qîza Beko da, „qîzî Beko“ li cîhê peyva xanima te da „ xanimê te“ li cîhê peyva ava kanîya Gulan „*avê Kanîyê Gulan*“ hatîye û çendîn nimûneyên dî.<sup>230</sup>

### 1.11. Mu'xribistan/Mexribzemîn

Ta niha bi curekî vebir nehatîye dîyar kirinê ka ev bajarê Mu'xribistan yan Me'xribzemînê ketîye kîjan nuqteya vê cîhanê? Gelo bajarek bi vî navî hebûye yan beytbêjan ew nav li ber xwe da deranîne.

Lê li dû lêkolînan ra em agahdar bûn ku gel ji du cîyên kewnareyên Kurdistanê ra Me'xribzemîn dibêjin. Yek kewnarê bajarekî ye ku ketîye navçeya Dambata Borelanê ser bi bajarê Makûyê li rojhelata Kurdistanê û ya dî jî dîsan dewsa bajarekî kewn e li bakûrê Kurdistanê li rojavaya bajarê Mêrdînê ku dikeve serê rêya Mêrdîn- Amedê û gundên Axresk û Xursê. Ev her du cîyana jî hê ji layê arkeologan va nehatine tesbît kirinê ka şûnewarên çî serdemê ne. Tenê gel ji wan cîyana ra Mexribzemîn dibêjin û di hafizeya gel da wisan maye. Lê bi pêka ragehandina beytbêjan bajarê Mu'xribistanê rêya şeş mehan dûrî Cizîra Botan e.<sup>231</sup> Yanê eger em metna Beyta Mem û Zînê weke serpelge bipejirînin, ev her du cî jî nêzîkî Cizîrê ne û nikarin bibin ew Mu'xribistana ku di beytê da hatîye.

M. Emînê Osman, ku sala 1990 *Mem û Zîna* Xanî şirove kirîye, di destpêka wê pirtûkê da dinivîse: Bajarek Me'xribzemînê heman bajarê مأرب Meiribê ye, ku yek ji kewintirîn bajarê Yemenê ye. Ew bajara gelek salan di destê Eyûbîyan da bûye. Sala (1186ê mî) dema ku Mîr Tuxtekînê Eyûbî ji zîyareta Hecê dizivire ji bo veçirandina nakokîyên di nîveka karbidestên Eyûbî yê bajarê Meiribê diçe wî bajarî.<sup>232</sup>

Wate bi dîtina Emînê Osman Mexribzemîn heman Meirib e, ku di vegotinê da weke Me'xrib hatîye bi lêv kirinê.

<sup>228</sup> Celîl, Ordîxan, Celîl, Celîl, *Zargotian Kurda I*, weşanên Aram, çapa Sêyem, Diyarbekir 2013, rr. 28-103.

<sup>229</sup> Cindî, Hecî - Evdal, Emîn, *Folklor Kurmanca*, Avesta, çapa yekem 2008, rr.305- 359.

<sup>230</sup> BMZ. rê. 247, 263 û 386: „Va şeş mehan e, halê „*xatûnê*“ min va ya, „*sirê*“ xwe nade kesekî.“ – „Qîzê“ Beko go: “Memo! Dilê min xan e. Go: “Werin, şeş mehe ne, mi heram kir „*avê Kanîyê*“ Gulane.

<sup>231</sup> Mabênê her du bajara qona'xê şeş mehan e. rê. 192.

<sup>232</sup> Osman, M. Emîn, *Mem û Zîn*, vekolîn û şirovekirin, çapa êkê, Bexdad, sala 1990, r. 4-5

Di metna Beyta Mem û Zînê varyanta Oskar Mann da jî beytbêj carekê li dewsa Mu'xribistan yan Me'xribzemînê ji wî bajarî ra bajarê Mu'xribê dibêje.<sup>233</sup>

Bi pêka nivîsîna dîroknivîsan li serdema Eyûbîyan da (1171-1250ê mî.) ji bakûra Afrîqayê bigire ta Yemenê û ji wir jî ta Hisinkehfê (Heskîfê) li jêr destê Eyûbîyan da bûye.

234

Di wê serdemê da Kurd bi salan li wan welatên navborî da jîyane. Hindek zivirîne Kurdistanê û hindek jî weke kurdên Misrê û Sûdanê he li wan derana mane û herçiqas ku navê wan mabe jî, lê di nav gelên wan welatana da pişifîn e û ji bîr çûne.

Şerefxanê Bitlîsî ((1543-1603)) di *Şerefname*yê da li ser Eyûbîyan weha dinivîse:

“Sala 612ê hq/ 1215ê mî. Melêk Adilê Eyûbî bû padişahê Yemenê... Li dû mirina wî ra panzde kur li şûna wî man...”<sup>235</sup>

Bi van agahdarîyên ku em ji dîrokê werdigirin, hizrek xwe di serê mirovî da cî dike. Gelo ev Mu'xribistan yan Me'xribzemîn heman welatê Me'xribê/ Marakoyê nîne, ku dengbêj navê wî û Yemenê ku her du jî di yek serdemê da li jêr desthilatdarîya kurdan da bûne, bi hevdu ra dînin û her duyan weke welatekî dihejmêrin? Gelo dibe ku navê welatê Me'xribê ku li ser be'hra sipî ye, ji beytbêjan ra bûbe mijar û li ber hukumdariya Kurdan ya li ser Yemenê ta Me'xribê, navê Me'xribê û Yemenê weke welatekî bi hevdu ra hatibin girêdanê?

Di beyta Mem û Zînê varyanta ku em li ser dixebitin (Memê Alîyan) da carekê li cîhê be'hra ‘Umiyan navê Be'hra Belek tê.<sup>236</sup> Ma nabe ku mebest ji Be'hra Belek, heman Be'hra sipî be?

Bi kurtî dîr nîne ku ev Me'xribzemîna ku di Beyta Mem û Zînê da hatîye yan navê welatê Me'xrib/Marako/Merkêş be, yan jî çawa ku Emînê Osman nivîsîye heman Meirib مَرب be, ku di axiftian gel da bûbe Me'xrib. Lê ji ber nebûna serpelgeyên zanistî yê tîr û tijî hê jî em nikarin van herdu boçûnana piştrast bikin.

## 1.12. Rastîya Bûyerê

Herçiqas ku gelek kesan li ser vê beytê lêkolîn kirine, lê hê jî dîyar nebûye kanê serpehatîya Mem û Zînê bûyereke rast e, yan beytbêjan ew li ber xwe da derxistine?

Gava ku mirov li naveroka Beyta Mem û Zînê û versiyonên wê yê cur be cur û navên wekî Yemen, Me'xribzemîn, Be'hra ‘Ummîyan, Be'hra Belek, Cizîra Botan, Mîr Êzdîn hûr

<sup>233</sup> BMZ. rê. 239. Sibe da Mem bi der ket ji bajarê Mu'xribê,

<sup>234</sup> Bidlîsî, Şerefxân. *Şerefnâme*, Petersburg, sâl 1860, rr.55-82.

<sup>235</sup> Bidlîsî, *Şerefnâme*, r.73.

<sup>236</sup> *Rojekî torçî darine ber Be'hrî Belek, digerine li seyde masfyane*. BMZ.rê. 50

dibe, herçend ku ev beyta bi motîvên efsane û bîr û bawerîyên kewn hatibe vehûnanê jî, hindek bîr û hizr dikevîne serê mirovî, da kû mirov bikaribe bawerîyê bi rastîya bûyerê biîne.

Di vê beytê û celebên wê yên dî da Memê kurê şahê kurdê Yemenê ye.<sup>237</sup> Ew kurê şahê Kurdan e û bixwe jî li deh salîya<sup>238</sup> xwe da bûye şah. Navê bajarê wî Mu'xribistan yan Me'xribzemîn e, ku ketîye rex be'hra 'Umîyan/'Ummanê, yan jî rex be'hra Belek.<sup>239</sup> Bajar di destê Kurdan da ye. Bajarekî ser bixwe ye û xudanê sêsid û şêst û şeş mihellan e. Bajarekî pîrî giran e û Kurd wî bajarî bi rêve dibin.<sup>240</sup>

Ji bilî Mu'xribistanê, em di nav edebîyata nivîskî û gelêrî ya Kurdî da gelek caran rastî navê Yemenê û bajarên wê tên. Bo nimûne: Şêxê Senian di berhema Feqîyê Teyran da xelkê Yemenê ye.<sup>241</sup> Di beyta Mem û Zîna Soranî da Memê kurê Îbrahîm paşayê Yemenê ye.<sup>242</sup> Navê Yemenê di çend berhemên folklorîkê Kurdî yên dî da jî tên:

Genc Xelîl diçe bajarê Le'hsayê (kawile L'hsa yê) ku bajarekî Yemenê bûye û li wir di şerî da tê kuştinê û Hefseta destgirtîya wî beyt û istiranana li ser dibêje.<sup>243</sup>

Çûkele Siwar dildarê 'Ayişe Gulê jî li kawile Le'hsayê da tê kuştinê.<sup>244</sup>

Gelo çima Yemen di nav edebîyata Kurdî da wisan xwe berceste dike?

Bersiva vê pirsyarê em dikarin ji dîrokê vergirin.

Em dizanin ku gora Mem û Zînê li bajarê Cizîra Botan da ye û dîroka ser kêla wan sala 854ê hq. beranberî 1450/51ê mîladî nîşan dide.<sup>245</sup> Gelo hebûna gorrekê dikare bibe serpelgeyê zanistî ji bo piştrastkirina vê bûyerê weke bûyereke rastîn û dîrokî? Bersiva vê pirsê jî nerînî ye, lewra di Kurdistanê da gelek gor bi hindek navan hatine nasandinê ku cîhê gumanê ne.<sup>246</sup>

<sup>237</sup> Mann, *Tu'hfey Muzefferîye*, r. 222-223

<sup>238</sup> *Salê Memê dikeve dehane... 'Alî Paşa dide Memê taxt û tacê girane. Mem digêrîne 'hukm û 'hukmata bajarê Mu'xribistanê girane*, BMZ. rê. 46-49

<sup>239</sup> BMZ.rê. 14 û 53.

<sup>240</sup> BMZ.rê.23- 32.

<sup>241</sup> "Mecnûn kirim 'acgerdenê, Ew ef'îya ji rengê xenê, Gestim li erdê Yemenê...Ew 'enber û wê gerdenê, Bar ke li sîng û gerdenê, pê dîn ke Şêxê yemenê..." Dêreşî, Seîd, *Dîwana Feqîyê Teyran*, hb. r. 378 û 434

<sup>242</sup> Mann, *Tu'hfey Muzefferîye*, r.222.

<sup>243</sup> Sabat û Sawên „Rolî Afret le Gotinewey Beyte Folklorîyekan da“ *Kovara internetî sabat û Sawên*. [www.rojikurd.net/sabatusawen/2017/05/18/](http://www.rojikurd.net/sabatusawen/2017/05/18/) - „Genc Xelîl“, *Intişarati Sellahedîni Eyûbî, Kovara Sirwe*, Hejmar 6. Ûrmîye, 1365, hş., rr.34-35.

<sup>244</sup> „Beytî Siwaro“, *Kovara Sirwe*, Hejmar 2, Ûrmîye, 1364 hş., r. 41 (Nîşe: navê berhevkar yan bêjerê beytê nehatîye)

<sup>245</sup> Yaşın, Abdullah, *Tarih Kültür ve Cizre, Kuloğlu Matbaacılık, Ankara 2007*, r. 128.

<sup>246</sup> Bo nimûne em dizanin ku Weyselqerenî mirovekî tenê bûye û çend kes nebûye, lê roja îro gorra Weyselqerenî li çendîn cîhên cuda da heye. Ta niha li ser gorra Weyselqerenî ev cîhana hatine destnîşankirinê: 1. Gundekî Qezvînê, 2. Kirmanşah 3.Reqqa 4. Bitlîs 5. Boka, jêder:

<https://fa.wikipedia.org/wiki/>



Ji bo vê rastîyê debê em dîsan serekî li dîroka Kurdistanê bidin. Navê bavê Memê di hindek celebên da Alan paşa, di hinekan da ‘Alî Paşa /Elî Beg,<sup>247</sup> di hindekan da jî Îbrahîm paşa<sup>248</sup> hatîye. Zîn jî qîza mîrê Cizîra Botan Mîr Avdel û xûşka Mîr Zînedîn e.<sup>249</sup>

Em di dîroka nivîskî da hê rastî navê bavê Memê nehatine, lê hebûna navê Mîr Avdel, yan Mîr Ebdal û Mîr ‘Izeddîn ku mîrên cizîra Botanê ne û mêjûya jîyana wan pîrr nêzîkî dîroka ser kêla Mem û Zînê ye, serinca mirovî li ser xwe da radikêşe.

Şerefxanê Bidlîsî (1543-1603) di *Şerefnameyê* da di pişka Mîrên Cizîrê da di zincîreya malbata ‘Ezîzan da navê du mîr ‘Izeddînan û sê Mîr Ebdalan diîne. Mîr Ebdalê yekem bavê Mîr ‘Izeddînê yekem e. Ev Mîr ‘Izeddînê kurê Mîr Ebdal sala 796ê hq/ 1393ê mî. diçe pêşwazîya Emîr Teymûrê Gorekanî.<sup>250</sup>

Gava ku mirov dîna xwe dide dîroka li ser kêla Mem û Zînê û ewê dîrokê di gel dîroka hukumdarîya Eyûbîyan û Mîrê Cizîrê yên bi navê Mîr Izeddînê kurê Mîr Ebdal dide ber hev hindek rastî derdikevin holê. Eger em bipejirînin ku ev mîr Izeddîna yan jî mîr Izeddînê düyem birayê Zînê ye, em dikarin weha bigehen vê encamê:

Dîroka destpêka hukumdarîya Kurdan li Yemenê (612 hq.) û dîroka jîyana Mîr Ebdal û Mîr ‘Izeddînê yekem (796 hq.) û dîroka li ser kêla Mem û Zînê (854 hq.) diakrin vê bûyerê nêzîkî rastîyê bikin. Lê bi curekî vebirr têrê nake û hê jî lêkolînên berfireh pê divên, ku em bi vebirrî van dîrokana bi hev va girêbidin.

Herçiqas ev serpehatîya serpehatîyeke nêzîkî rastîyê be jî, lê em dibînin ku kakilê beytê bi bîr û bawerîyên kewin hatîye dariştinê. Mirov dikare bêje ku beytbêjan ev kirasa li ber bejna bûyereke rastîn kirine. Wate ihtimala hebûna bûyereke bi vî rengî ne dûrî bawerîyê ye, lê beytbêjan ew bûyer bi bîr û bawerîyên cuda cuda û motîvên istûreyî xemilandine.

---

<sup>247</sup> Lescot, R. *Mem û Zîn*, r. 73.

<sup>248</sup> Mann, *Tu ‘hfey Muzefferîye*, r. 143.

<sup>249</sup> Di Memê Aliyan da Zîn qîza mîr Zînedîn û xûşka mîr ‘Azdîn e. Lê di celebên dî da navê birayê Zînê, Zînedîn/Zêndîn e.

<sup>250</sup> Bidlîsî, *Şerefnâme*, r. 119.

## PIŞKA DUYEM

### 2. MEM û ZÎNA HEWRAMÎ

#### 2.1. Zaraveyê Goranî û Cayigeha wî di nav Zimanê Kurdî da

Zimanê Kurdî ji desteya zimanên Hind- Awropî û ji şaxa zimanên bakûrrojavya Îranê têtê hejmarê.

Zimanê Kurdî li ser çendîn zaraveyan û her zaraveyek jî li ser çendîn devokan par ve dibe. Yekemîn kesê ku li ser şaxên zimanê Kurdî nivîsîye û nivîsa wî giheştîye destê me, Şerefxanê Bitlîsî (1543-1603) xudanê pirtûka *Şerefnameyê* ye. Şerefxan kurdan bi pêka zaraveyên wan weha parve dike û dinivîse ku Kurd dibin çar şaxan: 1. Kurmanc 2. Lor 3. Kelhur 4. Goran<sup>251</sup>

Li dû Şerefxan ra gelek kesan li ser ziman û zaraveyên cur be curên zimanê Kurdî lêkolîn kirine.

Bi pêka nivîsîna M. Xeznedar, Tewfîq Wehbî zimanê Kurdî li ser sê desteyan weha parve dike:

1. Kurmancî 2. Lorî 3. Goranî<sup>252</sup>

Sedîq Borekeyî (Sefîzade) li pitûka *Mêjûy Wêjey Kurdî*<sup>253</sup> da herwisan li pêşgotina Ferhenga xwe ya bi navê *Ferheng-ê Mad*<sup>254</sup> da, zaraveyên zimanê Kurdî li ser pênc pişkan parve dike: 1. Kurmancîyî Bakûrî 2. Kurmancîyî Başûrî 3. Goranî yan Hewramî 4. Lekî 5. Lorî

Lê li dû lêkolînên meydanî û pirtûkxaneyê ra em giheştine wê encamê ku, parvekirina Şerefxanî ji ya hemûyên din durusttir e. Bi pêka wê parvekirinê em dikarin zimanê Kurdî bi giştî li ser 4 desteyan weha parve bikin.

1. **Kurmancî** ku bixwe dibe du desteyên: Kurmancîya jorîn û Kurmancîya jêrîn, ku heryek ji wan xudanê çendîn devokan in. Ji Kurmancîya jêrîn ra bi giştî Soranî jî dibêjin.

2. **Goranî- Zazkî** ku ew jî dibin du desteyan û her desteyek jî xudanê çend devokan in.

3. **Kelhurî** ku jê ra Kurdîya jêrîn jî dibêjin, ji komeke devokên nêzîkî hev yên weke Lekî, Îlamî, Feylî û...pêk têt. Ji ber ku hejmara devokên vê pişka zimanê Kurdî gelek in, gelek caran ew zaraveya bi navê hindê devokên wê hatine nasandinê, weke Kirmanşahî, Lekî, Feylî, Kelhurî û...

<sup>251</sup> Bidlîsî, Şerefxan, *Şerefname*, r. 13.

<sup>252</sup> Xeznedar, Marîf, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, r.49.

<sup>253</sup> Borekeyî, Sefîzade, Sedîq, *mêjûy wêjey Kurdî*, r. 26-27.

<sup>254</sup> Borekeyî, Sefîzade, Sedîq, *Ferheng-ê Mâd*, cild-ê Evvel, 1361 hş., r. 24-25.

4. **Lorî** ku ew jî ji çendîn devokên weke: Bextiyarî, Memesenî, Sûsengirdî û... pêk tê.

Ev her çar desteyên zimanê Kurdî li ber helkefta erdnigarîya Kurdistanê û nebûna navendeke hevpar, roj bi roj ji hevdu dûr dikevin.

Mesnewîya Mem û Zînê ya Mîrza ku yek ji xîmên vê xebata me ye, bi zaraveyê Goranî û devoka Hewramî hatîye nivîsînê. Herçiqaş ku devoka sereke Goranî be jî, lê ji ber ku gelek berhem bi devoka Hewramî hatine nivîsînê, bi giştî ji vê desteya zimanê Kurdî ra Hewramî jî dibêjin.

Oskar Mann (1867-1917) ku li ser zaraveyê Goranî xebitîye, dinivîse ku zaraveyê Goranî xudanê van devokan e: Kendoleyî, Awramanî (Hewramî), Bacelanî, Bîwenîcî, Gehwareyî, Rêjabî, Seyîdî, Zerdeyî.<sup>255</sup>

Mensûrê Selîmî ku pirtûkek li ser wî zaraveyî nivîsîye, zaraveyê Hewramî sereke digire û ewî zaraveyî weke zimanekî dide nasandinê û devokên wî weha parve dike:

1. Zaza 2. Ewramanê Lehon 3. Ewramanê Text 4. Jawerûdî 5. Paweyî 6. Goranî 7. Gehwareyî 8. Kûrecûyî 9. Bîwenîcî 10. Qela'î 11. Kendoleyî<sup>256</sup>

Di nava hemû zaraveyên zimannê Kurdî da, zaraveyê Goranî/Hewramî li sedeya dehema mîladî ra<sup>257</sup> ta roja îro zaraveyê toreyî yê pişkeke mezin ji Kurdan bûye. Ji hîngava ta roja îro bi dehan kesî bi vî zaraveyî berhemên pir balkêş di pile û payeyeke bilind da afirandine. Gava ku mirov dîna xwe died mêjûya wêjeya Kurdî, mirov dibîne ku pişka here zor ji edebîyata Kurdî ya klasîk bi zaraveyê Goranî hatîye nivîsînê. Zaraveyê Goranî zaraveyê dînî yê Yarisan yan Ehliheq e û pirtûkên ayînî yên Yarisan weke Serencamê bi vî zaraveyî hatine nivîsînê. Ev zaraveya mîdehekî dûr û dirêj zaraveyê derbara mîrên Erdelan û Baban bûye.

Marif Xeznedar dinivîse: Edeba ayînê Yarisan kevirê xîmê balaxaneyê edebîyata Kurdî ya rengîn tete hejmarê.<sup>258</sup>

Roja îro ji bilî Zazayan ku li bara erdnigarîyê da ji Hewramanê dûr ketine, kesên ku xwe Goranî dizanin û bi vî zaraveyî diaxivin, li welatên Îran û Êraqê da li bajarên: Merîwan, Pawe, Kirmanşah, Senendec, Helebçe û bi şeweyeke berbelaw li bajarên: Silêmanîye, Bexda, Hewlêr, Kerkûk, Hemedan, Qurwe û çendîn bajarên dî da dijîn.

Li nav helbestkarên Kurd yên ku bi vî zaraveyî nivîsîne, em rastî gelek navan tên ku ev navana yên herî naskirî ne:

---

<sup>255</sup> Hadank, Karl, *Kurdisch-Persische Forschungen* Fortgeführt von Karl Hadank, Berlin 1930 Verlag der Preussischen Akademie der Wissenschaften, r. 85.

<sup>256</sup> Selîmî, Mensûr, *Berresî ve Tewsîf-ê Zebân-ê Hewrâmî ve Goyîş-ê Pâweyî*, Intişârât-ê Êhsân, 1392 hş., rr. 12-13.

<sup>257</sup> Xeznedar, Marif, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, r.249.

<sup>258</sup> Xeznedar, hb. r, 249.

Pîrê Şaliyar, Mela Perîşanê Dînewerî, Seyîdîyê Hewraî, Mewlewîyê Tawegozî, Elmas Xanê Kendoleyî, Mîrza Qadirê Paweyî, Xanayê Qubadî, Ehmed Begî Komasi, Xulamriza Erekwazî, Seyîd Yaqûb Mahîdeştî, Şamî Kirmaşanî, Mîrza Şeffî'ê Kuliwayî, Mîrza Şeffî'ê Paweyî, Bêsarani, Seyî Sadiq Mahîdeştî, Mîrza Ehmed Dêhbanişî, Seyîd Tahirê Haşimî, Elî Eşref Nobetî, Temkînê Kirmaşanî û bi dehan navên dî. <sup>259</sup>

Edebîyata Hewramî di sedeyên 17-20 bi afirandina bi dehan menzûmeyên dirêj û pir naverok, giheştîye asta xwe ya here bilind. Menzûmeyên wekî:

Şîrîn û Xosrew, Leylî û Mecnûn, Xurşîd û Xawer, Şêxê Seni'an, Mem û Zîn, Şîrîn û Ferhad, Bîjen û Menîje, Wereqe û Gulşah ... û çendîn Şahnme û Rostemnameyan...

Gelek berhemên pir giranbuha bi vî zaraveyî hatine nivîsînê ku muxabin wekî vê menzûmeya Mem û Zînê xudan û danerên wan dîyar nînin, wekî menzûmeyên: Rostemname, Birzname, Mem û Zîn, Sorawname, Leylî û Mecnûn, Şêxê Senian...

Tiştê balkêş ew e ku giştî vê edebîyatê - çend nimûneyên biçûk jê der- li ser kêşa kîteyî hatine nivîsînê û pişka zora wan jî deh- yanzdeh kîteyî ne.

## 2.2. Mesnewîyên Mem û Zînê bi Goranî/Hewramî

Ta niha destxetên du mesnewîyan bi navê Mem û Zînê bi zaraveyê Goranî/Hewramî hatine dîtinê. Yek ev mesnewîya Mem û Zînê ya Mîrza ye ku em li ser dixebitin. Yek jî mesnewîyeke nivîşkan e ku ta niha du caran hatîye weşandinê. Cara pêşîn Keyûmersê Nîkreftar sala 2013 ew di keşkolekê da ji layê Enistîtûtî Kelepûrî Kurd- Silêmanî, daye weşandinê. Cara duyem jî Namiq Hewramî sala 2020 ew li Tehranê ji layê Neşri Cengel va daye weşandinê. <sup>260</sup> Ev Mem û Zîna ser û binê wê ketien û tenê 482 malik jê mane.

Mesnewî bi van malikana dest pê dibe:

*Yek mehremiş bê, Bengîne namê*

*Refîqi mûnis dewrê eyamê*

*Dayim meş 'xûl bê be zewq û bazî*

*Çenî Mem tamam be dilnewazî*

û bi van malikana jî kuta dibe:

*'Xusilş dan be ab golabê 'ebîr*

<sup>259</sup> Emîniyê Pawe, Muhammed Reşîd, Keşkolî Şa'irani Hewraman, Intişarati Kurdistan, Senendec 2017.

; Xeznedar, Marif, hb. ; Borekeyî, Sedîq, hb.

<sup>260</sup> bnr. Pêvekê hejmar 9-10

*Niyaşan kefen zerbafe herîr  
Kerdin nemaziş berdin pey mezar,  
Teslîmşan kerd be sed ahê zar,  
Bekiri Mergewer...*

Ne helbestkarê vê mesnewîyê dîyar e û ne jî dîroka nivîsîna wê heye. Cudatîya vê mesnewîyê û ya Mîrza gelek in. Ev mesnewîya bi zimanekî gelekî sade hatîye nivîsînê. Mesnewîya Mîrza li himber wê da di pileyeke bilind da ye.

Di vê mesnewîyê da berewajî mesnewîya Mîrza li dewsa du kebûteran sê perî Zînê ji bo Memê dihênin. Cudatîya navê qehremanan jî heye. Navê jina Qere Tacdîn li dewsa Sitîyê xatûn Yas e. Navê qîza Beko Melek Reyahîn e. Navê keniza Zînê Yasemen e. Nasnavê Bekir, Bekirê Mergewer e. Bi van serpelgeyana em dibînin ku ev mesnewîya nivîşkan mesnewîyeke ser bixwe ye û ne nusxe yan nusxebedela mesnewîya Mîrza ye.<sup>261</sup>

### **2.3.Danasîna Destnivîsa Mem û Zîna Hewramî**

Destnivîsa Mem û Zîna Goranî/Hewramî di nav arşîva pirtûkxana giştî ya bajarê Berlînê (SBB) da hatîye parastinê. Sala 2016an ev destnivîsa di gel çend destnivîsên dî ji layê Enstituya Kurdî ya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê va hatibû kirîn û ji bo îstîfadekirinên lêkoleran li ber destan bû.

Ev destnivîsa di gel *Menîqu ‘t- Teyr* a ‘Ettarê Nîşapûrî û babeteke fêrkirina matematîkê di yek keşkûlê da hatîye pêçanê.

Li ser bergê wê keşkûlê bi Erebi weha hatîye nivîsînê:

منطق الطير و غيره نظم على لغة الاكراد ٤٢ 262

Li ser rûberga wê li layê kaxezê yê rastê li jêrê jî ev hejmara Romî CCCLVI (356) hatîye nivîsînê û li jêr wê hejmara Romî da jî hejmara 90 hatîye nivîsînê. Herwisan mohrek jî li ser serberga wê ye ku baş nayê xwandinê. <sup>263</sup> Evana nav û hejmarên ragirtina wê ya arşîvê ne.

Lê li cîhê *Menîqu ‘t- Teyrê* da pêş da menzûmeya Mem û Zînê bi Hewramî<sup>264</sup> hatîye. Li dû Mem û Zînê ra babeta fêrkarîya matematîkê hatîye nivîsînê. Li dû vê babetê ra *Menîqu ‘t- Teyr* a ‘Ettarê Nîşapûrî (1146- 1221) tê.

<sup>261</sup> Metna Mem û Zîna nivîşkan ya tayp kirî di arşîva pirtûkxana me da heye û me ji bo amadekirina vê pişkê sûd ji wê metnê vergirt.

<sup>262</sup> Wate: Mentiqtteyr û nezmên dî bi zimanê Kurdan.

<sup>263</sup> bnr. pêveka jimare 1.

<sup>264</sup> Ev nava li ser destnivîsê nehatîye. Me ev nava bi pêka deqa destnivîsê lê kirîye.

Ev menzûmeya Hewramî di vê keşkûlê da bê nav û nîşan e û hîç şirove û pênaseyek li ser nav û naverok û danerê wê nehatîye nivîsînê û rasterast bi ‘ibareta “Bismillahi Re’hmani Re’hîm,” ê dest pê dibe.

Ev destnivîsa bi xetekî xweşik û bi cohera reş hatîye nivîsînê. Curê xetê wê xetê neste’lîq e, ku bi navê xetê Farsî jî hatîye nasandinê. Ev xeta li rojhelata Kurdistanê da baw û bi rewak e.

Menzûme di 70 rûpelan da hatîye nivîsînê. Di rûpela yekem da 13 malik û di rûpelên dî da li her rûpelê da 14 malik hatine nivîsînê. Di rûpela dawîyê da ku menzûme bi dawî tê, 10 malik hatine. Bi giştî ev menzûmeya 975 malik in.<sup>265</sup> Di dawîya hemû rûpelên kit da peyva destpêka rûpela cot hatîye nivîsînê. Bo nimûne di dawîya rûpela yekem da ev peyva „ğerq“ ku peyva destpêka rûpela duyem e hatîye.

Berê nasixan hejmar ji bo rûpelan danedinîn. Ca ji bo ku nezma rûpelan bizanin û rûpelan li hevdu nexin, di dawîya her rûpelê da peyva destpêka rûpela dî dinivîsîn. Bi vê nivîsê ra dîyar dibû ka kîjan rûpel li dû kîjan rûpelê debê bête danîn. Di vê destnivîsê da jî ew tradîsiyona hatîye raçav kirinê. Bi gotineke dî peyva te’qîbê di dawîya rûpelan da heye.

Me li tîpguhêzîyê da ew peyvên ku neqşa hejmaran dileystin, veneguhstin.

Herçiqas ku nusxe bi xetekî xwana û xweşik hatîye nivîsînê jî, lê çun di xetê neste’lîqê da ser û ber û jêr wate herekeyên tîpan nayêne danînê, durustxwandina hindêk peyvan dijwar e û tenê kesên Hewramîzan û yan jî pisporên xetê neste’lîq û pisporên edebîyata klasîk dikarin van cure metnana bê hele û çewtî bixûnin û li bin barê wan derkevin.

Dijwarîya dî ya xwandina vê nusxeyê nebûna nîşaneyekê ye ji bo tîpa “گ گ”. Di vê nusxeyê da hemû tîpên “گ گ” weke tîpa “ك ك” hatine nivîsînê, mirov tenê dikare bi rêka kontekstê û peyvnasîyê wana jêk cuda bike.<sup>266</sup>

Di vê destxetê da tişta ku bala mirovî dikişîne ew e ku;

Mîrza yan jî nasixê vê nusxeyê gelek peyvên Erebi bi rabêja/telefuza Kurdî nivîsîne.

Peyvên wekî:

ظریف، ظرایف، بساط، ذره، غم، اطاق، مشاطه، طمطراق، غلطان، صحراء،

Weha nivîsîy:

زریف، زرایف، بسات/بساط، زره، خم، اتاق، مشاته، تمتراق، خلطان، سحراء،

<sup>265</sup> Malika dawîyê ya Farsî di gelek menzûmeyên Hewramî yên dî da jî hatine, wekî: *Xawernameya Elmas Xanê Kenoleyî, Şîrîn û Xosrewa Xanay Qubadî, Xurşîd û Xawera Mula Nûrullahê Kendoleyî*. Ev malika Farsî ya *Gerşasibnameya Esedîyê Tûsî* (ss. 5.hq.) ye, ku ji layê helbestkarên Kurd va weke du’ayekê di dawîya menevîyan da dihête anîn. Yanê ev beyta ne ya Mîrza ye. bnr.Pêvekên hejmar 3, 4, 5.

<sup>266</sup> bnr. pêveka hejmar 2.

Li dawîya nusxeyê da weke ixtitamîye ev nivîsa bi Farsî hatîye:<sup>267</sup>

هزاران درود و هزاران سلام، ز ما بر محمد علیه السلام

از جهت فرزندی ارجمندی نور چشم فقه معروف پسر عزیزالچود(عزیزالوجود)<sup>268</sup> کاکه امین پسر خالوی لرم  
خضر آغا به اتمام رسید که به خیریت آن را ابتدا و باتمام برساند. ختم در سنه هزار و دو صد و شصت و شش (1266)  
هجری است در شهر صفر

Wate: “ Hezaran silav û hezaran dirûd, ji me li ser Muhemmed be. Ji bona kurkê hêja, ronahîya çavan, feqe Me’rûfê kurê xoşewîstê kake Emîn kurxalê min yê lor, Xizir Axa bi dawî hat. Ku bi xêr û xoşî dest pê bike û wê ya tewaw bike. Dawî bû di sala hezar û du sed û şêst û şeşê hicrî, meha Seferê.”

Mirov di metna nusxeyê da pê dihese ku mustensix di dema istinsaxê de hin beyt nenivîsîne. Di çend cîyan da ew kurtkirin li metna nusxeyê da li ber çavan dikevin. Bo nimûne di destpêkê da bêy şirove û destpêka çîrok ê, hema raste rast dibêje du kevok bi fermana Xudê hatin û li eywana Memê danîn.<sup>269</sup>

Li dû ra di dawîya çîrokê da jî ev kurtkirina li ber çavan dikeve. Dema ku Memê dimire û xelkê Cizîrê li ser cenazê wî şînê dadinên, Tajdîn ku bi pîlanên Bekirî çûbû nava êl û ‘eşîrê bacê berhev bike, hê nehatîye. Lê di nusxeyê da hatina komeke suwarên ku ji seferê dizivirin dîyar dibe, êdî navê Tajdînî nayê û mirov li wan bendana da jî agahdar dibe ku nusxe hatîye kurtkirinê û ew benda li ser hatina Tajdînî ye, lê şirove tune. <sup>270</sup>

Weke ku nasix bixwe jî dinivîse, ev nusxeya ji bo xwendekarekî hatîye amade kirinê. Reng e ku nasix ev menzûmeya xulase kiribe.

Li gor dîtina me, ev nusxeya nusxeyeke kurtkirî ji nusxeyeke berfirehtir e. Lê ta ku nusxeyeke di nekeve destê me, em nikarin bi vebirî vê ‘idiyê piştrast bikin.

#### 2.4. Agahdarî li Ser Jîyana Danerê Mem û Zîna Hewramî

Di gelek mesnewîyan da danerê mesnewîyê li ser xwe, li ser dema jîyana xwe, dîroka nivîsîna mesnewîyê û hegera nivîsîna wê da agahdarîyan dide. Lê di vê mesnewîyê da em rastî hîç agahdarîyekê li ser daner û helbestkarê wê û dema nivîsîna wê nayên. Tenê di dawîya nusxeyê da di malika 973 yan da em rastî peyva Mîrza tèn ku debê nav yan jî mexlesa danerê vê Mesnewîyê be:

*Ya reb be ‘izzet bibexşî Mîrza*

<sup>267</sup> bnr. pêveka hejmar 3

<sup>268</sup> Nivîsên di nava cot kewanan da ji layê me ve hatine danan

<sup>269</sup> bnr. Li malika 17ê li deqa menzûmeyê

<sup>270</sup> bnr. Li malikên 859- 863 *Nagah peyda bi çendê ce suwar, Pêşan bê çend rext çend tac û tomar...*

*Ce yewmulme 'hşer ce weqti ceza*

*Gunehbarenan bibexşî guam*

*Be Taha û Yasîn be sûrey Kelam* <sup>271</sup>

Li bara helbestkarê vê mesnewîyê da tenê ev agahdarîya me heye. Em gelekî li ser vî navî xebitîn, lê çi pêzanîn li bara wî da bi destê me va nehat. Em nizanin ev Mîrza ya kê ye? Li ku jîyaye? Xelkê kêderê bûye? Li bara vî navî da me li gel çendîn kesên pisporên zarave û edebîyata Hewramî yên wekî hêjayan: Sedîq Babayî, Namiq Hewramî û 'Ednan Muradî jî xeber da. Lê muxabin haya kesî ji vî helbestkarî tunebû. Kesî nizanî ka ev Mîrzaya kê ye?

Em dizanin ku li rojhelata Kurdistanê peyvên Mella/Mulla û Mîrza du 'unwanên karî bûne. Mella zanayê ayînî bûn. Ev 'unwana hê jî heye. Lê 'unwana Mîrza êdî weke berê nemaye.

Peyva Mîrza di rojhelata Kurdistanê û di Îranê da jî ji bilî navê kesan, navnîşaneke karî wate 'unwanek jî bûye. Mîrza ji wan kesana ra dihate gotinê ku di karê xwendin û nivîsînê da kirarî û zana bûn. Ji kesekî ra digotin Mîrza ku pisporê edebîyatê ba û bikarîba di pileyeke bilind da nameyên dîwanî bi xetekî xweşik binivîsîya û bikarîba nameyên resmî bixwanda û şirove bikira. Mîrza dihat bi wateya edîb û katib û xoşnivîs û rewşenbîr, ew pileyeke dîwanî jî bû.

Ji xwendebêj/dersbêjan ra jî Mîrza digotin.

Li bara peyvnasîyê da Mîrza wate mîrzade, zade û berma û nifşa Mîran. <sup>272</sup>

Em nizanin ka ev peyva Mîrza ku di dawîya vê menzûmeyê da hatîye, navê xudan û danerê menzûma Mem û Zînê ye, yan nasnavê wî yê karî ye. Lê weke dîyar debê nasnavê wî yê karî, wate 'unwana wî be.

Di edebîyata Hewramî da em rastî gelek navên Mîrzayan tên. Ev mîrzayana hemû jî xudanê berhemên edebî ne. Yên wekî:

Mîrza Ehmedê Remmal Ceffar (1208-1282 hq./ 1793-1865.)

Mîrza Aqa (970-1065 hq./1562- 1654)

Mîrza Şefî'ê Yekem, Paweyî (1184- 1252 hq./1770- 1835)

Mîrza Şefî'ê Dûyem. Kuliyayî (1240- 1309 hq./1824-1891)

Mîrza 'Ebdulqadir (1237- 1326 hq./1821-1908 )

Mîrza 'Ebdullah (1235- 1310 hq./1819-1892 )

Mîrza Fet'hullah (1215-? hq./1800)

Mîrza Qadir (1200-1272 hq. /1785-1855)

<sup>271</sup> bnr.pêveka hejmar 4

<sup>272</sup> Dêhxudâ, „Mîrza“, *Luxetnâme*



Mîrza Muhemed Kerîm(1210- 1285 hq. /1795-1868)

Mîrza Me'sûm (1200- ? hq. /1785) ...<sup>273</sup> û gelek Mîrzayên dî.

Muxabin em nizanin ka Mîrzayê me kîjk ji van Mîrzayan e?

Bi pêka dîroka ku li dawîya vê nusxeyê da hatîye, sala hezar û du sed û şêst û şeşê hicrî, <sup>274</sup> meha Seferê, em dikarin bêjin ku danerê vê menzûmeyê yek ji helbestkarên Kurd e ku berî sala 1266 hq. jîyaye. Lê kîjan sal û kîjan sedsalê da jîyaye, dîyar nîne.

## 2.5. Rêbaza Transkripsiyona Mem û Zîna Hewramî

Ji bo transkripsiyona vê berhemê me ji wê rêbaza ku li gelek zanistgehên cîhanê da û ji wan jî zanistgehên Turkîyê û bi taybetî zanistgeha Artûklû, pişka Kurdî da baw e, wec wergirtîye.

### • Peyvên Muşeddad

Di vê rênivîsê da ew peyvên Erebi yên muşeddad, du carkî hatien nivîsîn: şeker, muzeyyen. شكر، مزین Ew peyvên Erebi yên ku di gel nîşaneyê navên dîyar yên Erebi wate “EL” tên û tîpa piştî “EL” ê ji Tîpên Şemsî bin, ew tîp ducarkî tene nivîsînê, wate çawa tene rabêj kirinê, wisan jî tên nivîsînê: Taceddîn: تاج الدين

### • Tîpên “L” û “R” yên Qelew

Di zaraveyên Soranî û Hewramî da her du tîpên “L” û “R” xudanê du dengan in. “L” ya asayî û “L” ya qelew, “R” ya asayî û “R” ya qelew. Di Kurmancî da jî “R” ya qelew heye. Di vê berhemê da “L” ya qelew bi vê tîpê hatîye nîşandaê: “l” wekî: dil, gul, qelew...“R” ya qelew jî weha hatîye nivîsînê: “r” weke: zêfîn...

### • Qertafa Zayendê û Tewanka Kurdî/Kesreya izafe

Me di vê rênivîsê da qertafa zayendê û tewankê ji navdêran cuda nekir.

Lewra di rênivîsa Kurdî da qertaf cuda ji navdêran nayên nivîsînê. Bo nimûne hindê kes di transkripsiyona deqên klasîk da qertafa (i) ji peyvê cuda dikan. Li cîhê ku binivîsin: Xatûni nazdar, dinivîsin: Xatûn-i nazdar. Lê ev (i) qertaf e û di rênivîsa Kurdî da qertaf ji navdêrî venaqete. Me ew qertafa ji navdêrî cuda nekir û me weha nivîsî: *Be nami bêçûn, texti pêşanî, be nûri qudret, Xatûni duşber, ew zali werîn...*

<sup>273</sup> Murâdî, ‘Ednân-Mu’âzî, Heyder, *Meşâhîr-ê Pâwe*, Nâşîr Âras, çap-ê evvel, Merkerz-ê pexş, Senendec 1396 hş., rr. 281-466.

<sup>274</sup> bnr. pêveka hejmar 5.

## Tabloya hj. 7. Berawirdî ya Tîpên Erebi û Transkirîpsîyona wan

erebî	latînî	erebî	latînî
ء	’	ث	Ş ş
ص	Ş ş	ط	Ṭ ṭ
ض	Ẓẓ	ظ	Zẓ
ع	‘	ل	Ļ
غ	Ġ ġ	ر	ř
ح	Ĥ ĥ	ذ	Ẓ ẓ

## 2.6. Metna Mesnewî ya Mem û Zînê ya (Hewramî)

### 2.6.1. Wergêran û Şirove ya Mem û Zîna Hewramî bi Kurmancî

#### I.

#### Besmele û Tehmîdiye<sup>275</sup>

بسم الله الرحمن الرحيم

Bi navê Xudayê dilovan û bexşînkar

#### 1. Be nami bêçûn benay lamekan Nigehdarendey zemîn û zeman

Bi navê Xudayê dilovan û bexşînkar, bi navê wî ku çî tişt wekî wî nîne û bê hempa û bê hemta ye. Bixwe binêşedanerê cîhanê ye, lê çî cîh û mekanê wî tune ye. Ew ragirter û xudankerê erdê û esmanî û aferîndeyê zemîn û zemanî ye.

Di vê malikê da Mîrza amajeyî mijareke felsefî dike, ew jî peywenda nîveka zeman û zemînî ye. Ev pirs di felsefê da heye, kanê Xudê berê zeman afirand, yan zemîn? Bersiva wê ev e: Xudê pêş da zemîn afirand û bi gerra zemînî ra zeman afirî. Lewra zeman bi serê xwe tune ye û ew bi gerra madeyê ra peyda dibe. Li ber wê ye ku Mîrza pêş da peyva zemînê anîye û li dû ra peyva zemanî. Xudê pêş da zemîn afirand û li dû ra li ber gerra zemînî zeman afirand.

<sup>275</sup> Ev serenavên pişkên mesnevîyê ji layê me va hatine danan. Di mesnevîyê da hiç serenavek nehatîye nivîsînê û pişkên wê jî nehatine destnîşankirinê.

**2. Waḥid û eḥed, ferd û feryadres  
Raḥim û reḥîm pey bêkesan kes**

Ew Xudayê tek û tenê û bê heval û hevta ye û di gazî û hewarîya her kesî da diçe. Ew dilovan û bexşînkare û ji bo mirovên bêkes û kar, kes û kar û pişt û penah e.

**3. Padişay qeyyom waḥid û muṭleq  
Nigehdarendeş çerxi mu' eleş**

Ew padişahê bê heval û bê hevta, bê nîyaz û bê şert û merc e. Li ser xwe û bikar û şîya ye. Ewê ku ev asimana wekî şerxekê li ser erdê daliqandîye (û ewî asimanî radigire.)

**4. Riziqdehender weşî û mûr û mar  
Padişay bê 'eyb waḥidulqehhar**

**5. Be ğeyr ez ew şa kes nîyen şahan  
Şah her ew şahen ne herdû cehan**

Ew xudayê ku risq û xwarina mar, mûr, de'ba û dirrinde û hov û mirovan dide, ew padişahêkî bêxewş û bêkêmasî û tek û tenê û qehrekar û bi'kar e.<sup>276</sup>

Ji bilî wî şahî çî kes hêjayî şahtîyê nîne, ji bilî wî şahî çî şahek nîne. Hertenê ew şahê her du cîhanan e. (Mebest ji her du cîhanan, cîhan û axiret e.)

**6. Zahir û baṭîn lamekan mawan  
Şun' iş bê şêwen, zatiş firawan**

**7. Er weşî zatiş mekerû izhar  
Temam nimebo ne şerḥî tomar**

Xudê hem zahir e, hem batin e, hem dîyar e, hem nadîyar e, cîh û warê wî tune ye, bê cîh û war e (lê li her cih û warî heye.) Huner û afirandîyên wî bê wêne û bê heval in, ew tiştên ku ewî afirandine, kes nikare biafirîne. Zate wî pîrr berfireh û mişe û gelek û mezin û bê payan e.

Eger ez pesnê zate wî bidim û çawanîya wî şirove bikim, ew şirove di tûmaran da jî bi dawî nayê.

**8. Umêdim êden padişay e' zem!  
Be elṭafi wêt bidarîm we çem**

---

<sup>276</sup> Melayê Bateyî jî di Mewlûda Nebî da vê terkîbê bi kar dibe: „Raziqê bêdest û pa û mar û mûr, 'Alimê sirra negotî der sudûr“ bnr. Sadînî, Xalid, Melayê Bateyî, Jiyan, Berhem û Helbestên wî (Mewlûda Nebî), Nûbihar, Istenbol, 2010, r. 175.

**9. Ew ro restaxêz axirzeman bo  
Mexlûqat temam ne eleman bo**

**10. Bebexşîm be naz Muştefay Mursel  
Nîyazim êden benay lemyezel**

Hêvîya min ew e ku tu ey padişahê herî mezin, min bi dilovanîya xwe raçav bikî û çavê te li min be.

Hêvîdar im di wê roja qîyamet û dawîya cîhanê da, ku hemû bûnewer penah û emanê ji te dixwazin, tu ey Xudayê binêşedanerê hebûnê seb xatirê xoşewîstî û nazdarîya pêxemberê xwe yî helbijartî û şandîyê xwe gunehê min bibexşînî.

**11. Ger çî kerdinan siteman ber xwêş  
Bûyer ce kirdar î bendey dijrêş**

**12. Çun endêşem hen ce deryay cûdit  
Duļbenden be an neqşî ‘uhûdit**

(Ey Xudayê bexşînkâr!) herçiqas ku min (bi kirina gunehan) gelekî sitem li xwe kirine, tu bi dilovanîya xwe ji gunehên min evî bendeyê dilbikul bibihore.

Xudêyo ez li deryaya dilovanî û bexşînkârîya te dihizirim û dilê min li wan peymanên ku te dane me (ku tu dê ji gunehên gunehkaran biborî) xweş e.

**13. Be meħzi luţfit umêdewarim  
Wêt fermûdenî amorzegarim**

**14. Ğerq ce qebaħat mutehîm ce zenb  
Iğfer lî Iğfer ya ğafiruzzenb**

Ez bi dilovanîya te ya resen û taybetî hêvîdar im. Te bixwe fermayîş kirîye ku tu lêborînkâr û bexşînde yî û tu dê gunehê gunehkaran bibexşînî.

Xudêyo ez di nava guneh û sûcan da xeniqî me û bersûc im. Tu bexşînkâr û lêborînkâr î, tu gunehên min bibexşîne.

**II  
Seraxazê Dastan**

**Hatina du kebûteran û venîştina wan li ser sivandeka eywana Mem û  
mendehoşmana wan ji ciwanîya Memê**

**15. Ewsa dumay medihi yektay yegane  
Goş der we destan dewri zemanê**

Vêca li dû pesin û sipasa Xudayê tekî tenê, bêhval û bêhempa ra, were guhdarîya vê çîroka dîrokî bike!

**16. Beçal nimebo niwîştêy teqdîr  
Teqdîr ‘ilaciş nîyen be tegbîr**

Sernivîsa mirovan betal nabe (Xudê çî li enîya mirovî nivîsî be, dê bête serê mirivan.)  
Sernivîşt bi tegbîr û rêçareyan nayê guhorîn û çareser kirinê.

**17. Be emri bêçûn benay bani ser  
Perwaz ne aşîyan kerd dû kebûter**

**18. Çend ne rûy sema perwazişan kerd  
Çendê kohsaran, Dicleşan pey kerd**

**19. Axir serencam ne eywani Mem  
Herdû ne pasar niştin xaîr cem**

Bi fermana Xudayê binêşedanerê asimanî, du kevok ji hêlûnên xwe derketin û firrîn. Wan her du kevokana parwazî asimanan kirin û ji ser çendîn çîya û çeman ra derbas bûn û ji çemê Dicleyî bihorîn û li dawîya dawîyê da herdû bi aramî li goşê sivandeka eywangeha Memê venîştin.

**20. Dîşan ke şay Mem niştin we demağ  
Şuley cemîniş çûn şuley çirağ**

**21. Balaş çûn ‘er‘ er saway zêriston  
Gonaş miderewşo wêney laley kon**

**22. Wusten çend ferşan kari Xorasan  
Mutteka û baîşt ne hezar rengan**

**23. Essasê bey tewr razan rêzîyan  
Ferşani weheşt ce laş bê zîyan**

**24. Goşaman ce laş dest we bani dest  
Iqamet kerdin ce baļa û pest**

Dîtin ku Mem Şah di eywangeha xwe da bi kêfxweşî rûniştîye. Yekî wisan xweşik e ku nûr ji rûyê wî dibare. Ronahîya cênîk û enîya wî, weke çirayekê diteyîse. Bejn û bala wî weke bejna darselwîyke nûgîhayî terr û teze ye û tu dibêjî qey ji zêrrî hatîye dariştinê. Dêmên wî weke halhalên çîya diteyîsin û sor û xoşreng in. Di eywana wî da mafûrên destkarê Xorestanê raxistine. Bi hezar rengî balîf û berpişt û piştekan danîne. Pergaleke wisan rêk û pêk û xweşik û li hevhatî ye, ku ferş û mafûrên biheştê li bal wan bêtune û bêhûde ne, û eger mirov van mafûrana û mafûrên biheştê bide ber hev, mafûrên bihaştê dê zerere biken. Xulam û xizmetkarên wî li jêr û jor li her alî dest li ser destan li xizmeta wî da rawestane.

**25. Peřendan bey tewr çun dîşan we çem  
Essasê bey tewr nadirey rûy Mem**

**26. Yekêşan derdem ama we goftar  
Bidîye çêşîş kerd çerxi kecreftar**

**27. Watiş ey yawer rûy çerxi exzer  
Wêney î cewan piř hoşn û dulber**

**28. Nedîyeniim we çem ne rûy rozigar  
Qesem we bêçûn daray cehandar**

**29. Binazûn be sun'î qadiri wehhab  
Bey tewr sazinan ce yek qeşre ab**

Dema ku balindeyan ew pergala û ew xweşikîya bêwêne ya rûyê Memê bi çavên xwe dîtîn, di gavê da yekê ji wan dest bi gotinê kir û gote hevala xwe: “Dîna xwe bidê ka feleka xayîn û xwarrewîşt çi dike ha! Ez sond dixwem bi Xudayê ku gerînde û xudanê vê cîhanê ye, min bixwe li seranserî cîhanê da li jêr asimanê şîn da bi van çavan di darê duniyayê da kesek wekî vî gencî xweşik û dilrevîn nedîfiye. Ez şanazîyê bi aferînişa Xudayê şîya û kara û bexşînkar dikim, ku ji dilopeke av ev bedewî û ev ‘husn u cemala afirandîye.”

**30. Wat yekî henî ama be ciwab  
Watiş ey yawer baçûn pey şewab**

**31. Ne Cizîr û Bot Xatû Zîn namê  
Teřik û zêrayif şîrînkêlamê**

**32. Baļa tûli ney zeřeston xamê  
Dû çeşman sîyeh sîyah badamê**

**33. Perîzadeyê perîmeqamê  
Zuļeyxa warê ne gol endamê**

**34. Şîrîni Xosrew Humeyla kamê  
Leyla şîfetê ‘emberîn camê**

**35. Başi nazdaran piř hoşi famê  
Qemertel'etê mahê tamamê**

**36. Meryemeasa bulend endamê  
Şekkerîn razê şawûsxeramê**

**37. Doxti Mîr Awdel ne perdey 'ismet  
Başi nazdaran Tetaran û beş**

**38. Hamşîrey Emîr Zîndîn muwanan**  
**‘Eceb merdêwen ne dewri cehan**

**39. Şahan ce sewdaş reha dan ‘inan**  
**Ce meşqi Mecnûn cunûn muwanan**

**40. Cufti î piser Zînen be ewşaf**  
**Werne nayaben ce Qaf ta be Qaf**

Kevoka dî bersiva wê da û got: “Hevalê ez ê ji xêra Xudê ra ya rast û durust bêjim. Li Cizîra Botan qîzek heye, navê wê Xatûn Zîn e. Keçeke nazik û nazenîn, terrik û şilik, nerm û nol, zimanqend û zarşîrîn, bejna wê weke bejna şêneya saza şekerê nazik û bilind e. Ew yeke zêrrînleş e. Herdû çavên wê yên reş weke cotek behîvên reş dilkeş in. Ew perîzadeya li pile û payeya ‘hûrî û perîyan da ye. Weke Zuleyxayê ye. Yeke gulendam e. Weke Şîrîna Xosrew û Humeylayê xweşik û bînanî Leylayê bedew e. Surahîya gerdena wê weke şûşeyek ‘emberîn u bêhnxeş e. Tefeşa wê wekî hîva çardê ye û pîrr zana û hoşmend û serdara xoşewîst û nazdaran e. Bejna wê weke bejna Meryemê bilind, zarê wê şîrîn û rewta wê rewta tawûsê ye. Ew qîza Mîr Awdel e, ku li pişt perdeyan da tê xudankirinê û pir bi şerm û heya û dawênpak e. Ew seroka askên Tatarî û serdara qaz û werdekan e. Ew xûşka Mîr Zînedîn e, ku mêrekî xurt û ‘ecêb e. Gelek şahên cîhanê ji bona evîn û sewdaya Zîne dizgîna hiş û hedaman ji dest berdane û wekî Mecnûnî xwandeya şêti û şeydayîyê divêhîzin û di evîna wê da fêrî cunûbûna evînê dibin. Tu seranserî cîhanê ji Qaf ta bi Qaf bigerî, ji bilî wê tu kesekê heval û hevta ji Memê ra peyda nakî. Tenê Zîn dikare bibe cot û hevala Memê. ,,

**41. Ama be goftar ewweļ kebûter**  
**Wat be kebûter duwem ey yawer**

**42. Bo ta berdariş bidew î cewan**  
**Biberîş we lay Xatûni zeman**

**43. Ciwabiş dawe watiş ey ‘ezîz**  
**Mer neşineftenîş ce ehli temîz**

**44. Ce ewweļ zeman ney çerxi keçzen**  
**Zen aman pey merd, merd naman pey zen**

Kevoka yekem dest bi axiftinê kir û ji kevoka duyem ra got: “Were em bi lez evî genci hildin û biherrin cem Xatû Zîne, Xatûna hemû cîhanê.,,

Kevoka duyem bersiva wê da û gotê: “Xoşdivîya min ma te ji mirovên zana û têgiheştî nebihîstîye, ku dibêjin, ji berê ber da li ser rê û resma vê feleka xil û xwar û derewîn û fêlbaz,

jin ji bo mêran hatine û mêt ji bo jinan nehatine.<sup>277</sup> (bi pêka rê û risam vê feleka keçreftar he ji berê ber da jin çûne xwazginîyê mêran û mêt neçûne xwazginîyê jinan.)

### III.

#### Her du kebûter Zînê ji Cizîra Botan diînin qonaxa Memê

**45. Qonat şendişan herdû be firîn  
Yawan be otaqi maway Xatû Zîn**

**46. Dîşan ha ne werm dû dîdey mestiş  
Ne, ne dû nergis xumar peywestiş**

**47. Boyi 'etr û bixûr meyo ne mawaş  
Hûbabî waresên dû lîmoy sawaş**

**48. Er zeîrê new boy meqami Xatûn  
Beyo we demaği medhûşani dûn**

**49. Qesem be dawer sazende sema  
Ne goş û mezar gişt meban ehiya**

Herdu kevokan baskên xwe weşandin û bû firîna wan û li asimanan ketin û çûn gehîştin oda Xatûn Zînê. Dîna xwe danê, her du çavên wê yên mest di xewê da nin û nêgizên wê yên xumar miçiyayî ne û bi ser hevda hatine. Bêhna gulav û bixûrê ji oda wê tê. Herdu lîmoyên wê yên kal û virrînî weke peqoşkên li ser avê hulû û saf û şefaf in. Sond bi dawerê cihanê û sazindeyê erd û asimanan eger tozqalek ji wê bêhna oda Zînê bigehîştta ber difîna mendehoşên mirî û ketî, hemûyê dê serê xwe ji gorê rakirana û zindî bibana.

**50. Beraman be war ew herdû leîf  
Wanaşan ewweļ bismiļah şerîf**

**51. Be naz û ê' izaz berdaştin Xatûn  
Şeqqe dan ne baļ we çerxi gerdûn**

**52. Be endek weqtê yawinan bew ca  
Ham cuftişan kerd zuhre çenî mah**

Ew her du kevokên xweşik jorda hatin xwarê û navê Xudê anîn û Xatûn Zîn bi xoşewîstî û bi rêzdarî hildan û baskên xwe li hev dan û li asimanan ketin. Di demeke kurt da ew bi cîh û mekanê (Memê) ra gîhandin û istêrka zuhreyê di gel hîvê kirin cot.

---

<sup>277</sup> Di Beyta Mem û Zîna Soranî da jî ev mijara hatîye, bnr. pişka dîyem, benda 2.5.2.1. „Xûşkî çikole gutî be xûşkane...”



#### IV.

#### Dîdara yaran, yekemîn dîdara Mem û Zînê ya efsûnawî

53. Îmcar bişnewe to ce Zîn xeber  
Ce xwabi mestî ser awerd we ber

54. Wêş dî ne axûş cewanê zerîf  
Cewanê şîrîn nazik û leîf

55. Serasîme bî Xatûn ce î kar  
‘Ecayib bimand ney kar û bazar

56. Awaz da we Mem Xatûni dulber  
Watiş ey cewan ce hal bêxeber

57. Mer hêddit çêşen darî ser ce çend ?  
Amay bey otaq hîç namay ne wend

58. Er Emîr dano qesem be dadar  
E‘zay saîlimit mirezo be dar

Vê carê ji Xatûn Zînê bibihîze ka çi kir. Dema ku serê xwe ji xewa giran rakir, xwe di himêza gencekî xweşik û nazik u cuwan û şîrîn da dît. Serasîme bû û pir tirsîya û ji vî karî û vê bazarê zendegirtî ma. Ewê xatûna dilrevîn û dilber deng li Memê kir û gotê: “Hey gencê nezan û neagadar, heddê te çî ye û tu xudanê xwe û çend serîya yî ku tu weha bê tirs û minnet, bêy ku mal û malbatê agadar bikî, dizîva hatîyî vê odayê? Eger Mîr bi te bihese, bi Xudayê dadiger dê goştê leş û endamên te yê durust bi zora daran biwerîne.” (Yê goştê leşê te bi daran rake.)

59. Mem çun bêdar bî new neğmey Dawûd  
Ne demağış da ber ama çûn dûd

60. Dîş yek perîten çûn mînay bêgerd  
Nişten ne pehlûş tak û teniya û ferd

61. Mem hem ‘eceb mand ce kari gerdûn  
Ne gerdişi çerx kari kun fe yekûn

62. Watiş ey nazdar bînayî çeman  
Firiştay şerîf nadirey dewran

63. Mayey heyatim roş û rewanim  
Quwweti zemîr cesed û canim

**64. Henî hey ke' bey qiblegay dînîm  
Guşadey xaîr xari xemînîm**

**65. Min ne cagey wêm neşyemîm we ber  
Xaş nigah biker bawer we menzer**

Dema ku Mem bi wî dengê Dawûdî ji xewê hişyar bû, dûkel ji qafê wî quloz bû. Dîna xwe dayê ku perîtenek weke şûşa bilorê şefaf û çilvilok û nazik û xweşik û bêgerd û şûştîmûştî, tik û tenê li kêleka wî rûniştîye. Mem jî ji karê çerxa felekê û gera gerdûnê û kirê kirdigarî 'ecêbgirtî ma. Mem gotê: Hey nazdarê, hey bînahîya çavan, hey sermîyana jîyanê, hey firişteya şerîf û bêwêneya dewr û zemanê, hey hêz û şîyana dil û canê min, hey ke'be û rûgeha dînê min, hey hegera vebûna dilê û derbûna dirrika kul û xeman, ca baş dîna xwe bidê û bîne ber çavên xwe, ka ev cîhê kê ye? Ez ji nav cîhê xwe derneketime der.

**66. Watiş nişaney otaqit çêşen  
Penem waçe rast diş we endêşen**

**67. Wat otaqi min dayim piş sazên  
Piş ce baleban, şahîn û bazên**

**68. Tewîlexanan pişên ce espan  
Necdî û Mincolî, polengîpoşan**

**69. Tazîmerkeban rawî, şikarî  
Razîyan we rext rêzey mirwarî**

**70. Seqfî eywanîm yawan be gerdûn  
Girew berdenan ne çerxi gerdûn**

**71. Nimez nişaney yagey to çêşen  
Awaz ker biwên er kesê têşen**

(Zînê) gotê: nişaneyên oda te çi ne? Ji min ra ya rast bêje! Ez nîgeran im.

(Memê) gotê: Oda (seraya) min herdem tijî saz û awaz e. Tijî balindeyên nêçîrê yên wekî: baleban, şahîn û baz in. Tewlexaneyên seraya min tijî hespên Erebi û Mingolî û Pilengîpoş in. Rextên hespên min yên Erebi û yên nêçîrê bi rêzên mirwarîdan hatine xemilandinê. Banê eywangeha min digîje ber perê asimanan û ji banê gerdûnê jî bilindtir e. Ez nîzanim ka nişaneyên seraya te çi ne? Gazî ke eger kesek tê da heye bila bîn.

- 72. Watiş nişaney yagey min êden  
Rûy şanişîniş ne beŕ û bêden**
- 73. Çend perdey ‘ismet zerbafti aļa  
Temam saçağdar ‘ecayib kaļa**
- 74. Kêşîyan we rûş pey resmi ‘izzet  
Piŕ ce kenîzan gişt şahib ħurmet**
- 75. Ne pêşwazişen bağê çûn Irem  
Xilafiş nîyen bê zîyad û kem**
- 76. Serwan ser kêşan tamam be ‘uyûq  
Şaxiş serawêz çun zulfi me‘ işûq**
- 77. Serawiş wêney kewşer memano  
Ne dewriş duŕac qumrî miwano**
- 78. Direxti bêdan çınaran aļa  
Minimanan be ‘erş zeŕistûn haļa**
- 79. Bulbul miwano ne hezar destan  
Goļan cem besten ne şehni bostan**
- 80. Şed hezar morgân new baği berîn  
Temam han ne zikr cehanaferîn**
- 81. Şaxi dirextan encîr û enar  
Ermot û şîlaf mêwey xoşgewar**
- 82. Herkesê bew bağ bikero guzer  
Rewzey rizvaniş meşo ne xaŕer<sup>278</sup>**

(Zînê) gotê: nîşaneyên seraya min ev in: Berê şaneşîna seraya min ketîye ber bi deşt û çol û çîmenan. Di şaneşîna min da çendîn perdeyên ji pakijîyê, perdeyên armûşîn û zêrvehûn û bi rişî ji cinsê here baş ji bo giranî û ‘hurmetê hatine darda kirinê. Seraya min tijî kenizên xudan ‘hurmet in. Pêşberî seraya min ba’xek durust wekî ba’xê Iremê heyê. Darên wê yên serwî çûne ber perê asimanan û serî li istêrkan disûn. Çiq û şaxên wan darana wekî biskên dildaran jorda li ser bejna wan da daliqyane. Avsark û birkên wî ba’xî wekî ava kewserê ne. Li dora wan birkana kew û qumrî dixwînin. Darên wî yên bî û çinarê lev aliyane û wekî istûnên ji zêr dariştî ber bi asimanan bilind bûne. Di ba’xê min da bilibil bi hezar miqam û

<sup>278</sup> Mirov dikare vê malikê bi du cureyî şirove bike: 1. Her kê li nav wî ba’xî ra derbas bibe, ba’xê bihiştê dê bête hizra wî. 2. Her kê li nav wî ba’xî ra derbas bibe, dê ba’xê bihiştê ji bî bike.

awayan dixwînin. Li naverasta wî ba'xî da her alî gulên rengrengî hene. Bi sedhezaran cure cure teyr û tû li ba'xê seraya min da xerîkî zikrê Xudayê cîhanaferîn in. Di ba'xê min da darên hejîr û hirmî û hinaran, di gel yê zerdele û meyweyên xoşgewra hene. Her kê li nav wî ba'xî bigere, ba'xê bihiştê ji bîr ve dike. (kê li nav ba'xê min da bigerre, yan li nav wî ba'xî ra derbas bibe, ba'xê bihiştê dê bikeve bîrê...)

**83. Watiş awaz ker kenîzani wêt  
Eger êd rasten ciwab bidan pê**

Memê gotê: „De eger wisan be, gazî kenizên xwe bike, eger tu rast dibêjî, bila bersiva te bidin.“

**84. Xatûn çun ce Mem şineft î soxen  
Şekerfeşan kerd ce dorci dehen**

**85. Herçend awaz kerd kenîzani wêş  
Kes nama we deng hîç neyawa pêş**

Gava ku Xatûnê ev gotina ji devê Memê bihişt, devê xwe yê wekî sendoqa cewahiran vekir û bi axiftinên xwe yê şîrîn şeker reşandin û gazî kenizên xwe kir. Herçiqasî gazî kir, kesê bersiva wê neda û kes nehate bal.

**86. E' ceb mend Xatûn sersam bî ce sam  
'Erz kerd we xidmet emîrî enam**

**87. Watiş awaz ker goşamani wêt  
Biwînûn çî kes ciwab medan pê**

Xatûn ji vê sosretê zendegirtî ma û ji ber vê sosretê sersemî bû û ji tirsê serê wê êsîya û berê xwe li ser Memê da kir û gotê: „De ka tu gazî xulam û xizmetkarên xwe bike, ka kes bersiva te dide?“

**88. Bengîney dilêr fermanberdar bê  
Ta şub paseban hem 'eseswar bê**

**89. Awaz kerd Bengîn! Şay wefadaran  
Fewqi nîknaman nîknamî yaran**

**90. Ciwab da derdem Bengîni piş zât  
Beleş çêş maçî serim ha ne rat**

Bengîne dilêr û biwêr fermanhelgirê Memê bû. Ew ji êvarê ta sibêde weke pasewan û nobedaran li ber dergehê oda Memê rawestayî bû.

Memê gazî kir: “Hey Bengîn, şahê emekdarn û serokê durustkaran û yaran!”

Bengînê biwêr û pakijnehad di gavê da bersiv da: “Fermo, tu çi dibêjî? Serê min di rîya te da ye!”

**91. Emîr wat ehsent yari wefadar  
Pesendey şahan nîkûy nikûkar**

**92. Emrê wê m nîyen ne cat sakin ber  
Bidare we çem sitarey seher**

**93. Muqeyyed biber tamam ba xeber  
Nek ce fesadan biwînim zerer**

Emîr (Memê) gotê: “Aferîn hey dostê emekdar, hey durustkarê şahpesend, emrekî min nîne. Ta serdana sitêrka sibêdê li cîhe xwe be. Miqat be, ne ku ez ji fasid û dilnexwazan zererekê bibînim.”

**94. Ciwab da Bengîn wêney şekergul  
Canfedatenmî be gîyan û be dul**

**95. Her ta ten ce text can girten qerar  
Fermanberdarim ce leyl û nehar**

Bengînê bi zimanekî şîrîn û gulşekerî bersiv da: “Ez ji can û dil canfedayê te me. Ez benî hindî canê min li textê bedena min da mabe, bi şev û roj di xizmeta te da me!”

## V.

**Dildarî û evîndarîya yaran û lêkguhoriya gustîlan ji bo nasîn û nîşanan**

**96. Emcar bişnewe ce Xatûn û Mem  
Dest kirdin balîn dem we bani dem**

**97. Têgî zehraîud ce nafe be war<sup>279</sup>  
Qerar da Emîr pey def i bedkar**

**98. Her dem her sa'et razan mekerdîn  
Ce goşey leban şerbet mewerdin**

Vêca bibihên ka Xatû Zîn û Memê çi kirin. Herdukan dest avêtin nava hevdu û devê xwe kirin nav devê hevdu da. Memê ji bo bergirîya karên nebaş, şûrê xwe yê bi jehrê avdayî, ji navkê berjêrtir danî nîveka xwe û Zînê. Herdûyan dest bi kêf û henekan kirin û derdê dilan ji hevdu ra dane bêrî û ji goşeyên lêvên hevdu şerbet vexwarin.

<sup>279</sup> Xanî (1650/1-1707) jî di Mem û Zînê da dibêje: 'Hubba di dilan ji 'heddê der bû, Ser'heddê zerafetan kemer bû. bnr. *Mem û Zîna Xanî*, şiroveya P. Cîhanî, Istanbul 2010. Malika 1574.

**99. Axerelencam Xatû Zîn biwêş**  
**‘Erz kerd we xidmet emîri dilrêş**

**100. Biwêem mezanûn çerxi piş sitem**  
**Axir mekero herdûman ce hem**

**101. Êd xaşen nigîn red bedel kerîm**  
**Neba ce nagah ce yek bûyerîm**

**102. Herdû nigînan red bedel kerdin**  
**Ne camey raşet ser we xwab berdîn**

Di dawîyê da Zînê gote Memê: “Ez dizanim ev çerxa feleka pir sitemkar, dê di dawîyê da me ji hevdu biqetîne. Ya baş ew e ku em qaş û gustîlên xwe bi hevra biguherrin, ne ku em nişkava ji hevdu biqetin.”

Herdukan qaş û gustîlên xwe li hevdu guherrîn û di nav cî û nivîn û pîcameyên rihet da di xew ra çûn.

## **VI.**

**Feraqa yaran, jêkqetiyana her du dildaran**

**103. Bidye we î çerx cewri sitemkar**  
**Çe qehrê daro ce yarani yar**

**104. Qîyamet ewsa mebo aşîkar**  
**‘Aşîq bê me’ şûq bigîro qerar**

**105. Î donyay fanî her pase kerdin**  
**Mayeş renc û gem feraq û derden**

Dîna xwe bidenê ka kîna vê çerxa zordar û sitemkar di gel evîndarên rast çeqas e. Eger ‘aşîq bêy me’îşûqa xwe aramê bigire û vehebe, hînga qîyametê rabe. Lê evê cîhana nemanê her wisa kirîye. Destvehata ji cîhanê her derd û êş û azar û cudatî û dûrî ye.

**106. Be emri qudret benay bani ser**  
**Peyda bîn derdem ew dû kebûter**

**107. Hordaştin Xatûn hem we bê endêş**  
**Berden we otaq cage û maway wêş**

Bi fermana Xudayê binêşedanerê asimanan, (gava ku Mem û Zîn di xewra çûn,) ew her du kevok di gavê da peyda bûn û bêy tirs û endêşe Xatû Zîn hildan û careke dinê birin danîn sera û cayigeha wê.

**108. Paseşan watin bizorgani dîn**  
**Razişan mendin ne rûy serzemîn**

**109. Herkesê dû kes bikero ce hem  
Bêşik yageşen maway cehennem**

**110. Er kesê kesê we yek şad kero  
Cennetilmawa pey wêş mebero**

**111. Mibo we hamraz hûrani cenan  
Serazad mibo be emri Subhan**

Zanayên ayînî yên mezin ku gotinên wan li cîhanê da hê jî mane, wisan gotine:

“Her kesê ku du kesan ji hevdu cuda bike, bêguman cîhê wan cehennem e. Lê eger kesek du kesan bi hevdu ra şad bike, bihiştê ji xwe ra bi dest ve diîne. Ew kes dibin heval û hevdemên hûrîyên cinnetê û bi feraman Xudê ji gunehan rizgar dibin.”

## VII.

**Hişyarîya Zînê ji xewa evînê**

**112. Bişnew ce Xatûn weqti şub seher  
Ce xwabi mestî ser awerd we ber**

**113. Herçend nîgeh kerd kes nedî we çem  
Diş da we toş dam ne xumxaney xem**

**114. Nîgeh kerd nigîn şunasa ce dest  
Ahi serd kêşa peyapey peywest**

Niha ji Xatû Zînê bibihên: Sibêdeyê zû dema ku serî ji wê xewa mestane hilanî, herçiqasî ku li dora xwe nihêrî, kesek li ber çavên wê neket. Dilê wê kete di nava tora derd û xumxaneya xeman da. Dîna xwe da destê xwe û gustîla Memê di tilîya xwe da dît û nas kir û li ser hev keserên sar û kûr rahêlan.

**115. Watiş xudaya gunehkarênem  
‘Aşî şermesar dûr ce yarênem**

**116. Bibexşî be haş cestey giřanim  
Ten suftey zûxaş hem natewanim**

Got “Xudêyo ez gunekar im û ji dûrîya dildarê xwe da asî û şermesar im.

Xudêyo tu gunehên min bibexşînî û dilovanîyê li min bikî û min bidî bonetî vê rewşa leşê min î girrgirtî û dilê min î wekî rejûyê sotî û nekar û neşî.

**117. Îmşew çi şew bê min kerd giriftar  
Sopend asayîm wust ne kûrey nar**

**118. Derêga derêg îmşew memirdim  
Damani kefen we xak mebirdim**

**119. Nawa bey destûr mehrûm û mehcûr  
Dûr ce yawer bom yawer dûr ce dûr**

Xudêyo îşev çî şevêk bû ku ez weha gîrodar kirim û ez kirim weke ispenda di nava tifika agirî da. Muxabin û sed muxabin ku ez nemirim û min dava cangê xwe negehande axa gorê. Eger ez bimrama weha tûşî vê dûrî û bêparî û mehrûmîyetê nedihatim û ji dildarê xwe weha dûr nedibûm.

**120. Umêdim êden Heyyî rebbanî  
Ferdî feryadres heqî subhanî**

**121. Ya barî henî şad bûn we Emîr  
Berdarî ne pam î bend û zencîr**

**122. Ya rohim bistan ce ten bêqerar  
Bêzarim ce gîyan mederim azar**

Lê hêvîya min ji Xudayê pak û mezin û tik û tenê û yarîdeder heye, ku evê zincîrê ji pîyê min hilîne û careke din min bi dîdara Emîr şad bike. Xudêyo yan canê min ji cesteyê min yê nearam û vêzar derîne û (yan jî min bi Memê bigehîne.) Ez êdî ji vî leşê xweyî azardar û derdemend vêzar bûme.”

**123. Bêxud bî derdem medhûş bî ce xak  
Nergisan we esir xûnî kerd nemnak**

**124. Bey destûr Xatûn giroftari gem  
Emcar biwaçîn exbarati Mem**

Xatû Zînê bi van gotinanan hêsir ji çavên xwe yê nêrgizasa barandin û weha bû gîrodara derd û xeman û ji xwe va çû û nehiş kete ser axê. Bi vî cureyî Zîn bû gîrodara derd û xeman. Vêca em herin nûçeyên li ser Memê ragehînin û bibînin kanê çî hate serê wî.

**VIII.**

**Rabûna Memê ji bo nivêja sibêdê û dîtian gustîla Zînê di tilîya xwe da û  
jixwevaçûna wî**

**125. Supay xawerî çun serda eşer  
Daş ne qelbi leyl şikest da leşker**

**126. Duholjendekan ce qapî şahî  
Jendişan newbet şahî mubahî**



**127. Kebkani kosar qehqêşan cem kerd  
Perwanan ce xewf supay seyl rem kerd**

**128. Hoşyar bîn ce xaw morğan (û) mahî  
Xurûs bena kerd ‘ Elîelahî (‘ Ela Elaşî)**

**129. Bêdar bî ce xaw Emîri dîlco  
Endûh bariş bî ko be ko, ko ko**

Dema ku leşkerê rojhelatê hêriş bire ser navend û dilê leşkerê şevê û şikist dane wî leşkerî, duholjenan li ber derbara şah bi serferazî û şanzî dest bi kutana duholê û lêdana newbeta şahîyê kirin. Bi lêdana duhola newbetê ra kewên çîya ji qebeqebê ketin û bêdeng bûn û perperok ji tirsê lêmiştê leşkerê rojê revîn û xw veşartin. Masî û balinde ji xewê hişyar bûn û kelokên sibêdeyê dest bi bangdanê kirin û dengê Ellahûekbera wan bilind bû. Emîrê dildar (Mem) ji xewê hişyar bû. Lê barê kul û derdan wekî rêzeçîyayan li ser hev da kom komî bûn û bûn barê milên wî.

**130. Awaz kerd Bengîn ew we nîm nefes  
Be wêney morgê ne dam û qefes**

**131. Aftab û legan hâzîr ker ce lam  
Eda kerûn ferz Heyyi layenam**

(Mem) Bi nîvnefesî û bêhnçikyayî, wekî balindeya li nava rike û davikê nîvecanî gazî Bengînî kir: “Ji min ra mesîne û legenê bîne, da ku destnimêjê bigirm û ji Xudayê hertim zindî û nexewar ra nimêjê bikim.”

**132. Bengîn çun ejnî awazi Emîr  
Berama ne xwab çun şîrani şîr**

**133. Aftab û legan berdaşt (û) awerd  
Yawa be xidmet ew şêrî neberd**

**134. Wustiş canemaz ne rûy qiblegah  
Girt we dest aftab saxitey tēja**

**135. Qîrar da legan ew ne rûyi zemîn  
Ta Emîr abdest bigîro yeqîn**

**136. Êhram zerdûziş alûdeyê zeř  
Peywest ne zanûy Mîri xařirteř**

**137. Fewqi bismîlah awerd be zeban  
Abiş rêzina Bengîne heman**

Dema ku Bengîn dengê Emîrî bihîst, wekî şêrekî ji xewê rabû û aftabe û legen hilda û weke şêrê meydana xebatê giheşte xizmeta Emîrî. Çarika nimêjê berbi rugehê raxist û aftawe û legenê ji zêrr dariştî hilda anî û li ber Memê danî, da ku Mem destnimêja xwe bigire. Hawlîya zêrvehûn û zêrdirûyî avête ser ejnûyên Emîrê dilter û evîndar. Memê navê Xudê anî û Bengîn av li destê wî da kir.

**138. Fîrozey nigîn enguşt dî eþmer  
So mida weneþ exzerî exzer**

**139. Emîr wat Bengîn piþ mêhr û temkîn  
Pey çêþ sorx bîyen fîrozey nigîn**

**140. Daþ ne rûy þu' a' i nezer kerd menzûr  
Derdem þunasaþ hekkakan destûr**

**141. Sebþey nigîniþ kenîya bê be Zîn  
Xatûni donîya firdewsi berîn**

**142. Muzeyyen be Zîn berkenden ostad  
Mem çun dîþ we çem dest kerd we firyad**

**143. Ahê ce nehad berawerd we ber  
Medhoþ bî medhoþ çûn zamanxeþer**

Di wê demê da çavên Mem li gustîla wî ketin. Dît ku qaþa gustîla wî ya pîrozeyî, sor bûye û bi keskî va dihingêve û diteyîse.

Emîrî berê xwe li ser Bengînî da kir û jê pirsî: Ji ber çi qaþa gustîla min ya pîrozeyî sor bûye? Qaþa gustîlê da ber tîrêjên rojê û hûrik hûrik lê mêze kir. Di gavê da nivîsa 'hekkakan li ser qaþa wê da dît û pê hesîya ku qaþa gustîlê bi navê Zînê Xatûna cîhanê û bihîþta berîn hatîye hilkolane. Hostayî qaþa gustîlê bi navê Zînê neqîþandibû. Dema ku çavên Memê bi wî navî ketin, hewar û gazîyên wî quloz bû. Keserek kûr ji naxa cîgerê hilkeþa û wekî birîndarekî birînkûr nalîya û nehiþ ket.

## **IX.**

**Hewarîya Bengînî ji bo day û bavê Memê û þîna li ser Memê**

**144. Bengîne çun dîþ bey tewr macera  
Emîr sernigûn ne xaki sîya**

**145. Watiþ mezanûn ye kari dêwen  
Emîr bey destûr þaliþ peþêwen**

**146. Dest kerd we xwandin ayati şerîf  
Awerd be zuban cismani leîf**

**147. Do' ay bêpayan ayati kubbar  
Hem Zatuşşefa çenî Heft Hesar**

**148. Peyapey miwend dem mekerd ne roş  
Emîr dem be dem ce hoş meşî hoş**

**149. Herçend se'î kerd pêş nama şefa  
Şexşê rewan kerd ta be dergay şa**

Dema ku Bengînî dît, ku Mem deverro kete ser axa reş, got ez dizanim ev kara karê dêwan e, ku Emîr weha şepirze bûye. Bengînî dest pê kir ayatên şerîf xwandin û navê Xudê anî û du'ayên cur be cur yê wêkî Zatuşşefa û Heft 'Hesarê li ser Memê da xwandin. Bengînî li dû hev ra ayat dixwandin û pufî Memê dikir, lê rewşa Memê xerab û xerabtir dibû. Bengînî her çi kir û çi xwand, Mem nehate ser hemdê xwe. Wî mirovek şande dergaha şahî, da ku hewarîyê bide wan.

**150. Ce muqeddemat her çe dî we çem  
'Erz kerd we xidmet padişay e' zem**

**151. Padişa şineft be bê pa û ser  
Be tawi te' cîl berama we ber**

Peyakî ji destpêkê da çi bi çav dîtibû, hemû ji padişahê mezin ra şirove kir. Dema ku şahî ew bûyera bihîst, dest û piyên xwe wenda kirin û bi lez û bez û bi taw hate ser (Memê).

**152. Herçend emîran xaşşey şehriyar  
Senceqnişînan, guzîdey namdar**

**153. Zenan kûdekan qewman û xwêşan  
Re' aya û miskîn çenî derwêşan**

**154. Şefaşef cem bîn perê temaşa  
Zelzele û zarî yawa be sema**

Emîrên padişahî yê taybetî, berdevk û ustandarên wî yê bijare û navidar hemû, jin û zar û xizm û kes û kar, gundî û bajarî, dara û nedar, giştî xelkê bajêr rêz rêzî dane dû hev û hatin bibînin ka çi qewimîye. Li ber dengê girîn û zarezarê te digot qey bûvelerze çê bûye, dengê aporeyê diçû ber perê asimanan.

**155. Bizorgan tamam çenî goşaman  
Dest kerden we şîn eman eleman**

**156.Padişa taciş hewa da ne ser  
Wêş kêşa ne gil çenî xakister**

**157.Miwat ey ferzend nûri çemanim  
Quwweti zanû têgi zuwanim**

**158.Esperî ‘ edû hem duşmenanim  
Nişatfrozî dewri cehanim**

**159.Herçend esasim ne rûy donya we  
Ne boney towen midran be pa we**

**160.Ye çe xeyrit bî nûri dîdey dîn  
Çe fasid çeşmê wenet bî qerîn**

Mezin û biçûkan tevda dest bi şîn û girînê kirin. Şahî taca xwe ji serê xwe hilda û havête hawa û xwe li ax û herrî û arîyê verda. Şah digirîya û digot: “Hey lawo, ronahîya çavan, hêza ejnûyan, şûrê zimanê min, siperê ber dujmin û neyaran, şahîhilkerê cîhan û jîyana min, min çi li darê dunyayê da heye, binêşa wana hemûyê bi hebûna te va girêdayî ne. Ey ronahîya çavên min, çavê kîjan çavxerabî li te ket. Kê tu çavînî kirî?”

**161.Newcewan Bengîn wêş kerd qelaxî  
Qelax çe qelax sîyah qelaxî**

**162.Têgî zehraîûd girte bê be dest  
Idî‘ aş êd bê wêş bikero qeşt**

**163.Çend ce hamseran girtişan Bengîn  
Sendin ce destiş elması rengîn**

**164.Nimez çêş waçû nimebo tamam  
Şerhi matemî Emîrî enam**

Bengînê nûcewan weke qelereşkê xwe reş û heş kiribû. Şûrê xwe yê bi jehrê avdayî dabû destê xwe û dixwast ku xwe bikuje. Çend kes ji heval û hogirên wî ew girtin û şurê wî yê weke elmasa rengîn ji destê wî derxistin û jê istandin. Ez nizanim ka ezê çi û çawa şîna li ser Memê şirove bikim, ew tamam nabe.

## **X.**

**Mem piştî sê rojên nehişîyê tê ser hişê xwe**

**165. Sê şeb û sê rûz zarî bê ne goş  
Be‘ dez roy sêhem Mîr ama be hoş**

**166. Çun ama be hoş Emîrî enam  
Şa birdiş secdey Hëyyî layenam**

**167. Çend ce heywanat bizîne û eğnam  
Kerdin teşeddoq emîrî enam**

**168. Bendîyan ce bend girdîn bîn reha  
Kerdişan do' a perê pûri şa**

Sê şev û sê rojan dengê ah û zarîyê dihat. Piştî roja sêyem Emîr hate ser hişê xwe. Dema ku Mem hate ser hişê xwe, şahî ji Xudayê mezin û bêxewar ra secde bir. Gelek pez û bizin ser jê kirin û kirin qurban û tesedduqa serê Memê. Zindani hemû ji bend û zindanan azad bûn û ji kurê şahî ra du'a kirin.

**169. Çend hezar mohtac deryûzani der  
Mun' im bîn tamam ce genc û gewher**

**170. Şukrane goyan tamam bizorgan  
Sakin bîn merdim ce şûr û foğan**

Gelek nedar û nîyazmend û parsek ji genc û gewheran da zengîn bûn. Mezinan hemûyê sipasane û bexşiş bela kirin. Êdî dengê ah û zarî û girîn û hewaran nedihat û xelk bêdeng û aram bûn.

**171. Bejê şay Emîr sersami sam bê  
Şed ca mubtela we gîr û dam bê**

**172. Ne aramiş bê ne şebr û ne xwab  
Ne bed mezana ne xeyr û şewab**

**173. Dayim ne soday xwabi dûşîn bê  
Ce cur'ey mestî mudam nûşîn bê**

Lê Memê ew şahê giştî mirovan hê jî li ber sawê sersemî bû. Ew ji sed cîyan va pêve bibû û ketibu gîr û davika evînê. Ne bêhna wî dihate ber, ne jî vedihebîya. Wî ne xew hebû, ne jî xwarin. Hê jî hişê wî di serî da nibû, hê jî ferqa qencî û xerabîyê nizanî. Herdem di sewda û evîna şevîna şîrîn da mest û gêj bû. Hê jî ji vexwarina gulpek ji meya şîrîna evînê serxweş bû.

**174. Rastişan waten yarani duldar  
Giriftari ' eşq hîç nedaro çar**

**175. Herkes giriftar ' eşqi yarenan  
Dil pîr pejare û endûhbarenan**

**176. Herkes ne cayê dilgiriftaren  
Reng zerd û za'îf her lêw we baren**

Çi rast gotine ew yarên dildar: kesê ku bibe gîrodarê evînê, çi derman û çare jê ra tune. Herkê bibe gîrodarê evîna yar û dildaran, dilê wî tijî pejare û tawûtêl û derd û kul dibe. Herkesê ku tûşî gîrodarîya evînê bibe, rengê wî zer û zerhimî û lêvên wî dibizmirin.

## XI.

**Bavê Memê giregirên bajarê xwe berhev dike da ku bizanin ka derdê Memê çi ye?**

**177. Teleb kerd paşa e' iyanan tamam  
Ce xord û bizorg ce ehli se lam**

**178. De' wet kerdişan pey ekli te' am  
Coq coq û şef şef tertîb da we kam**

**179. Çend hezar xwanan ne' meti elwan  
Piş ce mişki bîd morgani biryan**

**180. Wardişan tamam ce ser ta we pa  
Do' aşan wana e' ila ta edna**

Padişahî hemû giregire yê xwe, ji mezin û biçûkan bigre ta kesên xudanê silav û kilavê deste deste, rêz bi rêz bi rêk û pêkî ji bo xwarinê vexwende dîwanxane ya xwe. Çend hezar sifrikên xwarinê yê tijî biryan û bîdmişk hatin raxistinê. Gel xwarina xwe xwarin û ji biçûkan ta mezinan ji paşayî ra du'a kirin.

**181. Merdoman liwan e' iyanan ca mend  
Wardişan qehwe û şekkerab û qend**

**182. Padişa rû kerd ne e' iyan û mîr  
Nemez çêş kerûn bikeran tedbîr**

**183. Ye çe ha lêwen, yawan we Emîr  
' Ilaciş çêşen waçin bê teqşîr**

Xelk çûn û giregire man. Qehwe û qend û şekerav xwarin û vexwarin. Li dawîyê da paşayî berê xwe li ser giregire û mîr û wezîran da kir û got: Ez nizanim ka emê çi bikin? Hûn tevbîrekê bikin. Ev çi bêtar bû hate serê Memê? Ji kerema xwe bêjin ka derman û çareya vî derdê Memê çi ye?

**184. Bizourgan aman yekser be goftar  
Axirelencam aman be exbar**

**185. Yekê wat e lbet ye kari dêwen  
Dêwan hemîşe karişan rêwen**

**186.Yekê wat cunûn eşer dan ne raş  
Yekê wat sewdan nemekero faş**

**187.Yekê wat şefraş eglebe kerden  
Cew bone ce xawb xorden wîyerden**

Giregirên dîwanê dest bi axiftinê kirin û her yekê tişteke got. Yekê got ev kara karê dêwan e. Karê dêwan herdemî xapandin û xerabî ye. Yekê got: cinûbûnê kar li Memê kirîye. Yê dî got: sewdaserî bûye, lê sewdaya xwe eşkere nake. Yekê got: na sefraya wî bilind bûye, lewra ji xew û xwarinê ketîye.

**188.Herkes be rengê aman ne goftar  
Metbû'î teb'îş nebî şehriyar**

**189.Wat ey hekîman nadirey sajan  
Cey kare pê m den yekser ehwajan**

Herkesî tişteke digot, lê gotinên wana nekete serê şehriyarî û bi dilê wî nebû. Lewra vê carê berê xwe li ser 'hekîman da kir û ji wan ra got: Ey 'hekîmên bêwêne û kê mheval, hûn ji mi ra bêjin, ka ev çi bêtar e, hatîye serê Memê?

**190.Ĥekîman aman yekser be goftar  
'Erz kerdin we şah key walatebar**

**191.Supay 'eşq nihan ce ser cem kerden  
Cew bone raĥet aramiş berden**

**192.Her 'eşqen xorak, xwab ĥeram kero  
'Eşqen yaney fam we tarac dero**

'Ĥekîman ji şahê bilindnejad ra gotin: Nişaneyên nexweşîya Memê evîn e. Evînê xwe di serê wî da veşartîye, lewra aramiş û tebata wî tune ye. Evîn e ku xew û xwarekê ji mirovî diherrimîne. Evîn e ku hiş û hedamên mirovî talan û tarac dike.

**193.Paşa ba wezîr emîrani pêş  
Şî we lay ferzend nûri dîdey wêş**

**194.Watiş ey ferzend nûri çemanim  
Mayey ĥeyatim roĥ û rewanim**

**195.Ye çe sewdanan yawanit we ser  
Penem waçe rast xeber seranser**

Padişah bi wezîrên xwe yên pêş û payebilind va çû bal kurê xwe, ku ronahiya çavên wî bû. Gotê: Ey kurê min, hey ronahiya çavên min, hey sermîyanê jîyana min, hey ruh û canê min, ev çi sewdayeke ku ketîye serê te da? Were ya rast û durust ji me ra bêje!

## XII.

**Mem derdê evîna xwe bi nivîskî ji bavê xwe ra dinivîse, izhara evînê ji Mem û inkara wê ji layê bavê va**

**196.Girêwa Emîr pey yari mûnis  
Newêş bolend kerd ne cemi‘ meclis**

**197.Watiş ey pider taci seri min  
Ĝaret şî we bext bedexteri min**

**198.Derdim karêwen nedaro derman  
Er dewam kero sedhezar Luqman**

Memê ji bona dildara xwe girîya û dengê zarezara wî li ser meclisê ket. Memê gote bavê xwe: “Bavo ey taca serê min, tu jî bi vî bextê min û istêrka min ya bedyûm û şûm ra talan bûy. Dêrdê min derdekî giran û bêderman e. Eger sedhezar Loqman jî berhev bibin, nikarin ji derdê mi ra dermanekê peyda bikin.”

**199.Ama be goftar wat ey nûri çem  
Girêwa be zar be dîdey piř nem**

**200.Beşqi Xudawend waçe pê m tamam  
Kê sendin bey tewr wenet ‘ eqil û fam**

Şahî gotê: “Tu bi evîna Xudê key, tu û Xudê û evîna, ya rast ji min ra bêje, kanê kê wisan hiş û hedamê te ji te istandîye?”

**201.Ciwab da Emîr key şahî sermed  
Nimetaw waçû mesoço cesed**

**202.Er barû namiş aro be zuban  
Bêşik mesozo rêzey istuxwan**

**203.Çunke bey destûr hacet mekey lêm  
Qelem dewatê baweran perêm**

Memê bersiv da û got: “Ey şahê sermedî, ez nikarim bêjim. Eger ez îro navê wê biînim ser zimanê xwe, can û cesedê min, hestîyê leşê min dê bişewitin. Lê çun tu hinde huccetê dikî, qelem û dewatekê ji min ra biînin, ez bûyerê ji we ra binivîsim.”

**204.Awerdîn kağez qelem û dewat  
Teħrîr kerd derdem şerhi waqi‘ at**



**205.Daş we desti şah wana seranser  
Ahîr wust ne cergi padişâ û leşker**

**206.Padişâ çun hal derûniş zana  
Rû kerd we qapî qeyyomi dana**

**207.Do‘ a kerd ya reb î sewday bañil  
Be endek weqtê berdariş ne diñ**

Ji Memê ra ka'xez û qelem û dewat anîn. Memê bûyer nivîskî şirove kir û da destê şahî. Dema ku şahî ew bûyera xwand, agir li dilê wî û leşkerên wî ket. Dema ku şah ji derdê dilê kurê xwe agadar bû, berê xwe li ser dergahê Xudayê zana û şîya da kir û weha du'a ji Xudê xwast: "Xudêyo tu evê sewdaya bêşûd û evîna pûç û bêhûde di demeke kurt da ji dilê wî derînî."

**208.Baz wat ey ferzend nûri çemanim  
Nadirey dewran ne rûy cehanim**

**209.Be qewli merdûd şeytani řecîm  
Diñ û derûnit piř kerdên ce bîm**

**210.Le‘ net biker lêş meker î xeyal  
Xeyali fasid ce diñ ker beñal**

**211.Ye fikri xamen arezût kerdên  
Serencam nîyen ta we roy merden**

**212.Text û taci wêt bermeder ce dest  
We çengi doşmen ne xak mebî pest**

**213.Ne der babi ton î herzekarî  
Ey sewday bêşûd ray nadîyarî**

**214.Er rast miwaçî ‘ eşqit ha ne ser  
Keylen ce gulzar pey to deşt û der**

**215.Ne her şebustan şahî miwazî  
Perêt bawerûn yekê diñwazî**

**216.Her ce xaki Rûm, ‘ Erebi ta ‘ Ecem  
Perdenişînan bizorgani Cem**

**217.Meylit we herkes cagîr mebo ca  
We mañi donya we zori supa**

**218.We endek zeman bawerûn perêt  
Sakin ber enbar to ne cagey wêt**

Şahî dîsan berê xwe li ser kurê xwe da kir û gotê: “Ey kurê min, ey ronahîya her du çavên min, ey delalê bêwêne, şeytanê recîm dil û hinavê te tijî saw û tirs kirîye. Le’netê lê bike û evê hizra pûç û evî xeyalê xav û bêtune ji serê xwe derxe. Dilê xwe ji wê xeyala pûç vala bike. Ew hizreke pûç e ketîye dil û hinavên te da. Dawîya wê ta roja mirinê jî tune. Terka text û tacê xwe neke. Dena tu dê li destê dujminan da bibî êxsîr û belengaz. Ev herzekarî û kiryarên bêtune û sewdaya bêşûd ne hêjayî te ne. Eger tu rast dibêjî, evîndarî ketîye serê te, gul di gulzar û deşt û deran pir in. Tu gula gulzar û heremseraya kîjan padişahî dibêjî û qîza kîjan şahî dixwazî, ji welatên Rom û Erebb û ‘Eceman keçên heremserayên kîjan padişahî dibêjî bi malê dunyayê yan jî bi zora leşkerî dê ji te ra di demeke kurt da biînim. Tenê tu di cîhê xwe da aram be.”

**219.Emîr çun ejnî soxenan temam  
Zarîş bolend kerd ne rûy xaşş û ‘am**

**220.Watiş ey pider taci serweran  
Ba xeber ce sir dewrani cehan**

**221.Diş pey dulberê aram gêro  
Be weşligeyrê key kam gêro**

**222.Eger sedhezâr mehbûb baweran  
Ne rewzey Irem meşateş keran**

**223. Ğeyr ce Xatû Zîn zulfan çun zencîr  
Meyl nîyen we doxt padişâ û wezîr**

**224.Xamoş ber henî cey herf û kelam  
Ide‘ am êden baqî wesselam**

Dema ku Memê ev gotinana ji bavê xwe bihîstin, dengê zarîn û girîna wî li nava xas û nasan da bilind û belaw bû. Bi girî gote bavê xwe: ”Ey bavo, ey taca serê hemû serweran, ey agadarê ji sir û razên dewran û zemanan, dil bi dilberê ra di’hewe û aram dibe, dil bi pêgehîştin û zewaca yeke nenas û bêhanî ra çawa di’hewe? Eger hûn sedhezâr dilberên ku di biheştê da hatibin xemilandinê jî ji min ra biînin, ji bilî Zîna ku biskên wê weke zincîrê ye, ez kesî jî naxwazim. Qet ji mi ra qîzên şah û wezîran nede rêzê û xeberên wisan nebêje. Daxwaza min ev bû min got, wesselam û êdî hew.”

### **XIII.**

**Dilsarîya bavê ji amojgarîyê û geryana li dû çareserîyê**

**225.Padişâ zana hiç nedaro çar  
Fariğ bî ce qewl, razan û goftar**

**226.Ziwêr û melaļ, ğemġîni diļrêş  
Liwa we otaq sakin bî pey wêş**

**227.Ew şo we ser berd we sed nedamet  
Eşer da weneş hezar qîyamet**

**228.Şub seher be weqt şoļey şewqi nûr  
Yaran teļeb kerd dîsan be zerûr**

**229.Ama we goftar rû kerd ne supa  
Dermaniş çêşen bikeran dewa**

**230.‘Ilacê keran pey rezayi Xuda  
Ber bişoş ne diļ î şor û ġewġa**

Padişahî zanî ku hîç çare û derman ji vî derdî ra tune, bi neçarî dev ji gotinê berda. Bi dilekî pir derd û kul, xemgîn û dilteng zivirî oda xwe û bêdeng ma. Wê şevê bi sed derd û kul û peşewî û poşmanîyê derbas kir û hezar derd û kul li dilê wî da tev rabûn. Sibêdê zû dema ku şemala ronahîyê şewq veda, (tavê lê da) padşahî dîsan gazî heval û hogir û wezîr û serleşkerên xwe kir. Vê carê berê xwe li ser serleşkeran da kir û got: “Hûn bêjin ka dermanê wî çîye? Hûn ewî derman bikin. Ji bo rizaya Xudê rêçareyekê peyda bikin, belke ew hêvirze û derd û kulên ku ketine dilê wî da, jê derbikevin.”

#### **XIV.**

##### **Pîlana serleşkeran ji bo xapandina Memê**

**231.Aman we soxen bizorgani kar  
Er be qewļiman to mekerî kar**

**232.Tedbîriş êden, êd meyo we kar  
Werne ġeyr ez î hîç nedaro çar**

**233.Çend ce emîran xaşey şehriyar  
Te‘yîn ker çenî dehhezar suwar**

**234.Rahî bo rewan ew we bêqerar  
Penc qonaġ bişan çenîş bê medar**

**235.Ne her menzilê dûhezar suwar  
Bigêlanewe mexfî new dîyar**

**236.Ta pencem qonaġ wêş mimano wêş  
Wêş hem megêļo ziwêr û diļrêş**

**237.Nadem memano ce kerdey î kar  
Dest bermedaro cey kar û bazar**

**238.Kerdişan we hem î ‘ ehd û peyman  
Temam şîn we lay Emîri zeman**

Serleşkerên wî gotin: „Eger tu bi ya me bikî, me jê ra çareyek peyda kirîye. Tenê çara wî ev e, wekî din hîç çare û dermanê wî tune. Çend kes ji serleşker û emîrên xwe yê taybetî bi dehhezâr leşkerî va amade bike. Bila ev leşkera bi wî ra pênc êwiran herrin. Bila li her êwirê duhezâr leşker xwe jê bidizin û bi dizî bizivirin werin vir. Di êwira pêncan da, ewê tik û tenê bimîne û hînga ewê jî ji vê kirina xwe poşman bibe û dest ji wî karî bikişîne û bizivire. Şah û serleşker û wezîran di nav hevdu da ev peymana danîn û hemû pêkve çûne bal Memê.

**239.Şay biwat peneş ferzendi azad  
Mebere gemgîn xaşir biker şad**

**240.Seher zû be emr benay layenam  
Çend ce serhengan ‘ alîca meqam**

**241.Çenî deh hezar suwarey namdar  
Rahî ban çenit bişan bew dîyar**

**242.Çend şendûqi piş ce le’l û mirwar  
Çend parçey ‘ ecîb ce metay Bolğar**

**243.Çend espani xaş tazî zeñigar  
Çendê ce ecnas herbi cewherdar**

**244.Çenî çend pêşkeş safi dilpesend  
Biber pey Emîr merdi hunermend**

Şahî gote Memê: „Ey kurê min î azad, qet dilê xwe neke û qet xemgîn û dilteng nebe û dilê xwe xweş bike. Bi destûra Xudayê mezin sibê zû di gel çend serleşkerên bilinpaye bi deh hezar suwar va berê xwe bide wî welatî. Çend sendoqan tijî le’l û mirwarîd bike! Çend top parçeyên Bol’xarî û cinsê baş, bi çend ser hespên Erebi yê ku zîn û pûsadên wan bi zêr hatine nitilandinê, bi amûrên şerî yê cewherdar û pêşkêş û dîyarîyên babet bi xwe ra ji bo Mîr, ji bo wî mêrê jêhatî û hunurdar bibe.“

**245.Ewwel be mobet be mêhrebani  
Duwem we leşker we cengerani**

**246.Be her new‘ karit mebo muyesser  
Serencamiş de zû bergerd we ber**

„pêş da bi zimanekî nerm û bi dilovanî di gel biaxive, te zanî serwext nebû, bi şer û bi leşkerkêşîyê karê xwe pêş bibe. Bi kurtî karê te bi çî şêweyê pêş da çû wisan bike û zû vegere malê.”

**247.Emîr çun şineft ce şah î xeber  
Zerê hoşî fam beramaş we ber**

**248.Supahi hebeş şor engêzina  
We fewqi kafûr ‘ember rêzina**

**249.Hindî û hebeşî poşan sîya û dêz  
Şikest dan kafûr watin dest merêz**

**250.‘Ember rêziyan ew taqan û der  
Şîn we xwabi xoş ‘alem seraser**

Dema ku Memê ev gotina ji şahî bihîst, hindekê hişê wî hate serê wî. Gava ku leşkerên reş û ‘Hebeşîyên şevê şoriş kirin û ‘embera reş li ser serê kafûrê reşandin û Hindî û ‘Hebeşîyên reş û reşpoş şikest dane leşkerê kafûrê û (ji xwe ra) gotin destên we neêşin û ‘embera reş li ser xanûmanan da reşandin, her kes ketin xewa şîrîn. (Gava ku şevê zora rojê bir û tarîfî li ser ronahîyêda zal bû, xelk hemû ketin xeweka xweş.)

## **XV.**

**Memê bi deh hezar leşkerî va ber bi Cizîra Botan rê dikeve û di her qonaxê da du**

**hezr siwar xwe jê didizin**

**251.Supah ebyezi we endek zeman  
Berama we ber çun şeri jîyan**

**252.Be sed temteraq peşey ‘elem şend  
Qişşasi dûşîn ce şay hebeş send**

**253. Roşinî xêza ne rûy ser besağ  
Bêdar bîn ce xaw heyat û memat**

**254.Çawûşan car dan yane be yane  
Suwaran cem bîn ne her terane**

**255.‘Elemdar ama we paş kerd ‘elem  
Deh hezar suwar daşan ne qeşem**

**256.Dan ne kosi herb keřena jenîya  
Leşker ce şehri Yemenşar kenîya**

Di demeke kurt da (ser)leşkerê sipîpoş weke şêrekî tûre helhat û bi sed şan û şkohî goşeya alaya xwe hejand û tola şeva bihorî ji şahê ‘Hebeşî istand. Ronahî li ser rûyê erdê belaw bû û mirî û zindî ji xewê rabûn. Çawûşan mal bi mal car kişandin. Suwar ji her alî berev bûn. Alahelgir hat û ala li dar xist û navê deh hezar suwarî li qelemê da. Duholjenan li duhola şerrî û şahborrîyê dan û leşker ji cî leqîya û ji bajarê/welatê Yemenê derket.

**257. Temam pêşkêşan rahî bîn rahî  
Ne‘ reyî espan nişt ne gaw (ta) mahî <sup>280</sup>**

**258. Gerdi pay sitûr poşa serzemîn  
Xurşîd tarîk bî sema matemîn**

**259. Ewro feţre dan ta weqti êwar  
Êwar ne cayê girtîşan qerar**

Pêşkêş û dîyarî hemû li rê ketin. Norrîna hespan erd û asiman dagîr kir. Norrenorr û hîrrehîra hespan ji erdê ta ber perê asimanan bilind bû. Toza li ber pîyên hespan rûyê erdê dapoşî. Xor reş û tarî bû û asimanî reş girt. Wê rojê bêhna xwe istandin û naweyek dane bajêr û êvarê li cîyekê êwirîn.

**260. Pasê ce şew şî dû hezar suwar  
Hezîmet kerdin be feţr û be ğar**

**261. Ne hîç dîyarê negirtin qerar  
Weqti şob seher daxil bîn we şar**

**262. Ta menzil we cay pencemîn berdîn  
Her şo dû hezar hezîmet kerdin**

**263. Xulaşe beğeyr ce Mîr û Bengîn  
Suwarê nemend ne rûy xaney zîn**

Demek ji şevê bihorî bû, ku du hezar suwar ji leşkerî cuda bûn, bi ‘xar û bi lez revîn û li hîç cîyî ranewestan, ta ku xwe bi şar ra gîhandin. Ta êwira pêncem her şev du hezar suwar ji

---

<sup>280</sup> Ne‘ reyî espan nişt ne gaw (ta) mahî: wate dengê hespan ji gayî ta masîyê çû, ji gayî gihîşt heta masîyê. Ga û masî dikarin du wateya bidin. Ga û masî navê du burcên asimanî ne. Burca gay an conega ku burca felekî ya duyem e. Masî yan hût ku burca felekî ya danzdehem e. Lê eger em berewajî wê bihizirin û bêjin ku mebesta Mîrza ji erdê ta asimanî bûye, dîsan mirov dikare bi du cureyan şirove bike. Dengê hespan ji gayî ta masîyê çû. Bi pêka bîr û bawerîya gelêrî ya pêşîyan, erd li ser şaxê gamasî ye û gamasî erdê digêrîne. Hînga mebesta Mîrzayî ew e ku deng ji gamasî ta burca hût ku li esmanî ye çû. Lê berewajî wê jî di burca ga ku li esmana ye ta masî ku di golan û deriyayan da ye, deng çû.

leşkerî veqetîyan û revîn. Bi kurtî wisan lê hat ku ji bilî Memê û Bengînî kesek li ser piştâ hespan, li mala zînî da neman.

## XVI.

### Tenêmana Memê û Bengîn li serê rê û dirban

**264. Bengîn wat we Mem mîri ‘ alîcah  
Suwar û supah tamam bîn tebah**

**265. Eļbet î degeļ ce babot bîyen  
Werne ce supâ î degeļ nîyen**

**266. Bo ta bergerdîm sûdê pêt nîyen  
Hayem pey meqsed bêca key şîyen**

**267. Dû nefer suwar çêş meyo ce dest  
Neşo pey î kar mawerî şikest**

Bengînî gote Memê ey Emîrê bilindpaye, suwar û sipahên me hemû têkçûn, lê bizane ha ev de’xeliya ya bavê te bû, dena leşkeran nikarîn ev de’xeliya li me bikirana. Were em jî bizivirin, çi sûdek di vê seferê da ji te ra tuneye. Mirov kengê û çawa li dû meqsedeke nadîyar ra diçe? Çi ji destên du suwarên tekî tenê têt? Were li dû vî karî nekeve, tu dê tûşî şikestê bibî.

**268. Ama be ciwab Emîrî enam  
Watiş Bengîney sahib ‘ eqļ û fam**

**269. Ğeyretit êden ce dehri donya  
Bey tewr miwaçî herfani bêca**

**270. Qesem be dawer daray cehandar  
Be xemm û be pêç ebruwani yar<sup>281</sup>**

**271. Mer weqtê gêļûn emin cey mekan  
Tenim bêser bo nemande bom gîyan**

**272. Er toş we liwan zerûren karit  
Horgêļ ew doma Xuda bo yarit**

Memê der vebû û weha bersiva Bengînî da: “Hey Bengînê zana û hoşmend, hema xîreta te di darê duniyayê da ev bû? Tu çawa van gotinên ne di rê da dibêjî? Ez sond dixwem bi Xudanê vê cîhanê, sond bi xwar û pêçên birûyên (bisk û kezîyên) yarê, ez dê hînga jî vî cîyî bizivirim, ku leşê min bê serî be û can di cesedê min da nemabe. Tu jî eger dilê te zivirîne dixwaze, kerm ke bizivire, Xudê di gel te be!

---

<sup>281</sup> Bi dîtina me debê li cîhê „ebruwani yar“ da gîswanê yar bête nivîsînê, çunku gîsû bi pêç û xem cuwan e, ne ebrû, belke jî şaşî ya nasixan be.

**273. Bengîn çun şineft girêwa be zar  
Rêza be çem da esrînan hezar**

**274. Watiş ey Emîr rohim bo fedat  
Herca meyli ton serim ha ne rat**

**275. Her ta cesedim ne rûy besaţen  
Serim xaki som cehanpeymaten**

**276. Istidi‘ am êden ce dergay dawer  
Bibexşî gunay kemîney kemter**

Dema ku Bengînî ev gotinane ji Memê bihîstin, bi zarî girîya û hezaran hêsir ji çavên wî rijîyan û got: “Ey Emîr, canê min bi gorîyî te be! Her cîyê ku dilê te dixwaze, kerem ke, serê min di oxira te da ye. Hindî ez li ser rûyê vî erdî heme, serê min axa bin pîyê hespê te yî cîhanpeyma ye. Hêvîya min ji dergaha Xudayê dadwer ew e, ku tu dê ji gunehên min bibihorî.”

**277. Suwar bîn we esp ‘inan sost kerdin  
Çendî behr û beř bêdê tey kerdin**

**278. Êware weqtê yawan we cayê  
We çesmey şîrîn sebze gîyayê**

**279. Guşnegî lêşan tamam da eşer  
Gêlan pey şîkar ne ew deşt û der**

Li hespan suwar bîn û dizgînên wan sist kirin û berr û be’hr û deşt û der dane ber xwe. Demeke êvarê giheştin cîyekî ku kanî û gîya û şînkatiya wî hebû. Birsîbûnê li wan kar kir. Rabûn li wan deşt û derana li nêçîrê gerîyan.

**280. Nagah ahûyi ama ne guzer  
Emîr cewlan kerd pey ahûy dulber**

**281. Ğerbê daweneş xeltan bî ne xak  
Serîş cîya kerd be emri bêbak**

**282. Awerdî derdem kerdin we kebab  
Wardişan kebab be bê nan û ab**

**283. Ta sipêdedem girtişan aram  
Seher zû we emri benay layenam**

Nişkava xezalek li wir ra derbas dibû, Memê hespê xwe bezand û li dû xezalê ket. Derbek li xezalê da û xezal li erdê girêl bû. Bi destûra Xudayê netirs serê xezalê ji leşê wê cuda kirin.



Hanîn û ji xwe ra kirin kebab û kebabên xwe bêy nan û xoyê xwarin. Ta sibêdê vehebîyan. Sibêdê zû bi fermana Xudayê bêxewar ji xewê rabûn.

## XVII.

### **Rasthatina Memê û Bengînî li cotkarê Zînê û rênimûnîyên cotkarî**

**284.Suwar bîn derdem ranaşan sitûr  
Şeb ta ro meşîn herdû bey destûr**

**285.Menziļ we menziļ qet‘i meraħil  
Espîş meřana ew řahi ‘adiļ**

**286.Meřanan we tab mediran be źerûr  
Emîr dîş we çem coftarê ce dûr**

**287.Siday ho be hoy birbiriş meyo  
Awazey dengîş meşo ko be ko**

**288.Emîr wat Bengîn wadey řeļaten  
Nimez ane coft kamîn weļaten**

**289.Bişo bizane eħwaļ (û) xeber  
Bawere perêm xeber seranser**

Suwar bûn û hesp hajotin. Wan herdûyan řev û ro hesp hajotin û êwir bi êwir rêka xwe qedandin. Hesp dikudandin û tenê ji bo pêdivîyan radiwestan. Da ku çavê Memê ji dûr va li cotkarekî ket. Dengê ho hoya wî dikete çîya û ispêne vedida. Emir (Memê) gote Bengînî, êdî dema nivêjê ye. Tu here bizane ka ew cotê han yê kîşk welatî ye. Zû here bipirse û ji min ra xeberekê biîne.

**290.Cewlan da we esp Bengîn bêqerar  
Ta yawa we lay ew merdi coftar**

**291.Siļam kerd weneş ‘eleyk da ciwab  
Mandenebîş kerd pey xeyr û řewab**

**292.Porsa ey fellaħ dewri cehanî  
Kenendey meğar ğari nehanî**

**293.Ane cofti kon biwaçe xeber  
Pey kê mekaļî to î deşt û der**

Bengînî bi bêtabî hesp hajot û ta ku gihîşte wî mêrkê cotkar. Silav dayê û mandînebûnî gotê. Cotkarî silava wî vergirt û bersva silava wî dayê. Bengîn jê pirsî: “Ey cotkarê dewra cîhanê, ey hilkolerê şikeftên dîyar û nadîyar, ca bêje ka tu ji kê ra van deşt û derana dikêlî?”

**294.Coftiyar watiş mudde‘ ay koten?**

**Ey cofte cofti Cizîr û Boten**

**295.Xaşşey Xatû Zîn hemşîrey Emîr**

**Başi nazdaran şoxi bênezîr**

Cotkarî jê pirsî: “Tu dê kuda herî? Ev cota cotê Cizîra Botan e. Ev cota cotê taybetî yê Xatûn Zînê ye. Xatûn Zîna xûşka Mîr, serdara hemû nazenîn û xweşikên bêheval.”

**296.Watiş rast waçe be ‘ eşqi dawer**

**Ce rûy rasitî ixtilat meker**

**297.Qesem ew yad kerd coftari feqîr**

**Yaray ixtilat nedarûn Emîr <sup>282</sup>**

Bengînî gotê: “Tu bi evîna Xudayî kî, tu rast bêje! Bi rastî xeber bide.” Cotkarê feqîr sond xwar, ku ya rast gotîye.

**298.Derdem gêlawe Bengîn baz ne ra(h)**

**Ama be xidmet Emîri heyca**

**299.Watiş mizganî ey şahî ‘ adil**

**Muradi xeyrit ce ser bî haşîl**

**300.Cofti Botinan bizane yeqîn**

**Be merdi coftar hezar aferîn**

Bengîn di gavê da ji rêka xwe zivirrî û hate bal Emîrê xwe yê hêja û gotê: “Mizgînîya min bide. Mirazê te hasil bû. Ev cota cotê Cizîra Botan e. Hezar silav li mêrkê cotkar be.”

**301.Emîr êd ejnî xeylê bî weşal**

**Şokriş kerd be zat benay bêzewal**

**302.Suwar bî derdem emîri namdar**

**Rû kerd ew canib coftari hejar**

**303.Dûbare Emîr porsa exbarat**

**Wat cofti Zînen ey şêri piş zat**

Geva ku Emîr ev xebera bihîst, gelekî xoş’hal bû û ji zatê Xudayê bêzewal ra du’a û sipas kir. Di gavê da suwar bû û berê xwe da cotkarê nedar. Emîr dîsa bixwe ji cotkarî pirsî. Cotkarî got: “Ey şêrê biwêr, ev cota yê Zînê ye.”

---

<sup>282</sup> Ev nîvmalika wateyeke binecî nade. Wergera wê ya peyv bi peyv weha ye: Emîr ez nikarim xeber bidin, yan jî: Ez nikarim biaxivim Emîr! Dibe ku mebest jê we be ku, ez derewan nakem. Ez newêrim derewan bikim.

**304.Emîr wat Bengîn şoxi duławer  
Berawer ne ceyb dû sê çenge zeř**

**305.Bikero nisar merdi rîşşifîd  
Çûnke bey tewre dadiman newîd**

**306.Berawerd sê çeng ce zeř û ce sîm  
Kerdiş ew nisar coftari qedîm**

**307.Coftiyar çun dîş do‘ay xêr wana  
Hemd Xudawendi mecîd kîyana**

Emîrî ji Bengînî ra got: “Du sê çepal zêrr ji berîka xwe derxe û bide vî kalemêrê rîsipî, çunku ewî ev mizgînîya mezin û xweş daye me.”

Bengînî sê çeng zêrr û zîv deranî û da wî cotkarê temendar. Cotkar ji wan ra du’aya xêrê kir û ji Xudê ra jî sipas şand.

**308.Emîr wat ey pîri dûrîney dewran  
Herfê muwaçûn rast waçe ‘eyan**

**309.Er min daxîl bûn we şehri Botan  
Ce kamîn yane bibûnan mêhman**

Emîrî gotê: „ey pîrê cihandîtî, ez ê gotinekê ji te bipirsim, ya rast ji mi ra bêje. Eger em ketin hundurê bajarê Cizîra Botan, em li kîjan malê bibin mêvan?”

**310.Ama we ciwab ew pîri kamiļ  
Watiş ey cewan ferzane û ‘aqiļ**

**311.Er xwahiş darî karit bo meyser  
Ce xaney Bekir pa furûd awer**

**312.Merdi huşiyari sahibzubanen  
Her karûbarê ce laş asanen**

**313.Er peşt û quwwet maçî Tacdînen  
Damadi eĥbab Emîr Zîndînen**

Ew pîrê kamil, weha bersiva Memê da: „Ey gencê zana û têgehîştî, eger tu dixwazî karê te serrast bibe, li mala Bekir peya be. Ew mirovekî hişyar û bi dev û ziman e. Her kar û bar li bal wî asan e. Lê eger tu pişt û penah û hêzê dixwazî, bibe mêvanê Tajdînî. Ew zava û dostê Mîr Zînedîn e.”

**314.Emîr çun ce pîr şineft î xeber  
Çenî Bengîne rakeş girt ne wer**

**315.Fersexê espan ranan we zerûr  
Şehri Botîyan dîyar da ce dûr**

**316.Emîr diyadîş şemaļey şebgîr  
Medo ne demağ ga ga boy ‘ ebîr**

**317.Rayihey weşboy biladi yariş  
Sawa ne demağ berşî azariş**

Dema ku Memê ev xeberana ji cotkarî bihîstin, di gel Bengînî rêya xwe dane ber xwe û bi rê ketin. Memê û Bengîn fersexekê hesp hajotin, bajarê Cizîra Botan dûr va bi wan va hate xûyanê. Bayê sibêdeyê yê hênîk li Memê tesel kir û dem be dem bêhna ‘ebîrê dihate ber difîna wî. Bêhna xweş ya dîyarê yarê giheşte ber difîna wî û êş û azar ji leşê wî derketin.

### **XVIII.**

**Hatina Melek Reyhana qîza Beko li ser rîya Memê bi berhaneya kirasşoyê û şandina wan bi bal bavê xwe**

**318.Melek Reyhan nam mekhar û ‘eyyar  
Şostuşoş mekerd ce paîni şar**

**319.Doxti Bekir bê xeylê cadûkar  
Cewiş miřana ew ne rûy dîwar**

**320.Dîş ke dû suwar çun bedri munîr  
Pîr hoşn û cemaļ tamam bê nezîr**

**321.Çun dîşan we çem cewêş bî teba(h)  
Serî raşan girt qeļaşî donya**

**322.Porsa ce îşan ‘ezmi ko darîd  
Rezatan we kon reh we ko darîd**

**323.Dîyare bizorg ‘ezîmuşşanîd  
Penem biwaçan eger mêhmanîd**

Qîza Beko, ku navê wê Melek Rey’han bû û qîzeke pir bi mekr û efsûnkar bû, li bintara bajêr û li ser dîwarê şetê Cizîrê kirasşo danîbû. Dema ku wê ew her du suwarên ku weke hîva çardeşevî bedew û xweşik bûn, dîtin, kirasşoya xwe betal kir û hate serê rîya wan û ji wan pirsî: “We dîyar e ku hûn mirovmezî in û mêvan in jî, hûn ê ku da herrin? Meqseda we ku ye? Eger hûn mêvan in ji mi ra jî bêjin.”

**324.Ama be ciwab Bengîne der ھاڭ  
Watiş ey xatûn şahiş zolî û xal**

**325.Mehamî darûn ce şehri Cizîr  
Emin gôlamim î cewan emîr**

**326.Eger neşîb bo herdû mēhmanîm  
Mēhmani Bekir Melek Reyhanîm**

Bengînî bersiva wê da û gotê: “Ey xanima xudan zulf û xal, karekî me yî giring li bajarê Cizîra Botan heye, ez xulam im û ev genca jî emîrê min e. Eger bibe nesîb em her du jî mêvanê Bekir û Melek Rey’hanê ne.”

**327.Melek çun şenift ber bişî ce hoş  
Wat minim Reyhan weş amanan weş<sup>283</sup>**

**328.Bişan be yane pîya ban ce zîn  
Ejbet mîyawûn peytan min qerîn**

Dema ku Melek Rey’hanê ev gotina bihîst, hişê xwe derda û got:  
“ Hûn gelekî bi xêr û xweşî hatine, Melek Rey’han ez im. Kerm ken herrin malê, ez ê jî li dû we ra bêm.”

**329.Kenîzê derdem pey rehnumayî  
Kîyast çenîşan pey ‘uzrixwahî**

**330.Yawan we qonağ Bekir bêmîdar  
Ce yane nebê Bekiri mirdar**

**331.Mudetê midran her dû be suwar  
Kes nedîn we çem ew herdû namdar**

**332.Pêçaşan ‘inan herdû hemqerîn  
Ta şîn we xaney Qere Tacedîn**

Melek Rey’hanê kenizek ji bo rênimûnî û lêbihorîn xwazîyê bi wan ra şand.  
Ew herdû gehîştin qonaxa Bekirî. Lê Bekirê mirdar li malê nibû. Herdu suwar demekê li ser piştê hespan rawestayî man, lê ewana çî kes nedîtin. Bi neçarî dizgîna hespên xwe badan û ber bi mala Qere Tajdîn rê ketin û li der mala wî peya bûn.

---

<sup>283</sup> Li vir her du peyvên weş û hoş weke serwa li hevdu nagirin. Debê em peyva weş weke „woş“ bi lêv bikin, ku di gel peyva „hoş“ bibe hevserwa, yan jî peyva hoş weke heş di kurmancî da bi lêv bikin, ku serwa serrast bibe. Lê me dest lê werneda.

## XIX.

**Memê û Bengîn dibin mêvanê Qere Tacedîn û birayên wî**

**333.Pa firûd awerd ber aman ce zîn  
Gôlaman bedew aman ne kemîn**

**334.Espişan berdîn we yextexane  
Aman we pêşwaz xwêş û bêgane**

**335.Kerdişan mobet ‘ izzet nimanan  
Be resm û adab şahani cehan**

**336.Xêramayîş kerd Tacdîni duşdar  
Feřitan awerd be xêr hezar bar**

**337.Weqti şam ama te‘ am awerdin  
Be sed iltizaz noşî can kerdin**

Xulam û xizmetkarên mala Qere Tajdînî ji şargeyên xwe derketin û hatin serê hespan ra girtin û hesp kişandin yextirmexaneyan. Nas û nenas hatin pêşwazîya wan û li ser deb û resma padişahan pêşwazîya wan kirin. Tajdîn bixwe hat û serçavanî da wan û got:

“We ji me ra pîrozmendî anî, we em serferaz kirin. Hûn hezar carî bi xêr û xweşî hatine.”

Bû dema şîvê û ji wan ra şîv anîn. Şîva xwe bi xweşî û lezzet noşî can kirin.

## XX.

**Vegeryana Melek Reyhanê ji kirassoyê û nedîtina mêvanan û daxwaza arîkarîyê ji  
dadoka xwe**

**338.Yekdem ce îşan nekerîm goftar  
Ce amay Reyhan soxen keyn izhar**

**339.Yawa be xane Melek be dewan  
Nişanê nedî new herdû cewan**

**340.Yek dayaniş bê ‘ ecûzey dewran  
Fitney şerengêz ne herdû cehan**

**341.Porsa exbarat Bengîn û Emîr  
Be te‘ cîl û tab ce ew zaşî pîr**

Em demekê jî ji wan xeber nedin û herin ji Melek Rey’hanê biaxivin. Dema ku Melek Rey’han bi gef û gurr giheşte malê, nîşanek ji wan her du gencana nedît. Dayeneke wê hebû, pîrejineke fitneker û şerrhelkir û şerûda herdû cîhanan bû. Melek Rey’hanê bi lez û bez ji wê pîra porrsipî nûçeya Bengîn û Emîrî pirsî.

**342.Watiş ey ferzend hûri rizvanî  
Aman suwaran Yûsifi şanî**

**343.Her dû sa'etê midran be suwar  
Deyyarê nebê pêşan do exbar**

**344.Ce yane nebê Bekir aĝay pider  
Herdûşan derdem berbişîn we ber**

**345.Ce seray Tacedîn pîya bîn ce zîn  
Mêhman be ewin dû merdi piş kîn**

Pîrê gotê:

„Ey keça mina bedewa weke hûrîyên bihêştê, du suwarên weke Yûsifi xweşik hatin derê malê. Herdûk sa'etekê li ser piştê hespan man. Lê kesî hay ji wan nebû. Bavê te Bekir axa jî li mal nibû. Kesî silav li wan nekir, wan jî berê hespên xwe guhestin û çûn li mala Qere Tajdînî peya bûn. Ew her du suwarên bi kerb u kîn, niha mêvanê Qere Tajdîn in“

**346.Melek çun ejnî dest kerd we firyad  
Firyadi bêşo wawelay bêdad**

**347.Xeylê ew we bexti Bekir nifrîn kerd  
Peyapey kêşa dem dem ahi serd**

**348.Faîdeş nebê xamoş bî pey wêş  
Sakin bî ne cewr ziwêr û dijîrêş**

Dema ku Melek Rey'hanê ev yeka bihîst, dest bi dad û hawarên bêhejmar kir. Gelekî li bextê Bekir nifir kir û li ser hev keserên kûr rahêlan. Lê çun zanî ku girîn û dad u bêdad bêhûde ne, bi dilekî pir kul û derd bêdeng ma.

## **XXI.**

**Mazûvanên Mem ji ber xatirê wî naçin dîwanxana Mîr**

**349.Înbar bişnewe Emîrî namdar  
Ce seray Tacdîn çun girtiş qerar**

**350.Sê şeban û roz meclis bê ne kar  
Jendin perêşan saz û mûsîqar**

**351.Tacedîn sê şew neşî be dîwan  
Hem 'Efo, Çekoy merdi pehewan**

Vê ca ji Emîrê navidar (Memê) bibihê, dema ku di seraya Tajdînî da aram girt. Sê şev û sê rojan ji bona wî meclis gerandin. Ji wan ra li saz û mûsîqayê dan. Tajdîn û birayên xwe 'Efo û Çeko ew pehlevanên navidar sê şevan neçûn dîwana Mîr.

**352.Şexsê kîyana Emîr be dewan  
Sê şewen Tacdîn naman be dîwan**

**353.Mani‘ îş çêşen çêşiş dan eşer  
Bikîyano ciwab ce xeyr û ce şer**

Mîr qasidek bi lez şande mala Tajdînî, gotê:

“Here bêjê Tajdînî ka heger çî ye eva sê şev in, hûn nayêne dîwanxanê? Zû ji min ra bi qencî û xerabî xeberekê bişîne.”

**354.Ciwab da Tacdîn waçe we Emîr  
Mêhmanim aman ba nebo dilgîr**

**355.Ama ew doma firistadey rah  
‘Erz kerd we cenab Emîri hêca**

**356.Mîr Zîndîn ce no kîyana pêgam  
Wêş û mêhmaniş bîyan weqti şam**

Tajdînî bersiv şand û got: “Bêje Mîrî, bila li kêmasîya me nenêrre, bila dilê xwe neke, mêvanê min hene.”

Qasid bi lez zivirî û bersiva Tajdînî gîhande Mîrî. Mîr Zînedînî dîsa ji Tajdînî ra peyam şand û got:

“Bêje Tajdînî bila ew û mêvanên xwe dema şîvê bên dîwanxanê.”

## **XXII.**

**Melek Reyhan dibihê ku Mem dê bibe Mêvanê Mîr, dayena xwe dişîne bal Memê ku  
dijî Zînê biaxive**

**357.Çun yawa be goş Reyhan î xeber  
Diş û derûniş pêş ama we der**

**358.Şî we lay daye ‘ecûzey dewran  
Watiş ey daye fikrê ker pêman**

**359.Îmşo Mîr Zîndîn Tacdîn û mêhman  
De‘wet kerdenan perê werdey nan**

**360.Taqî mezanûn Emîrî guzîn  
Midero penes îmşew Xatû Zîn**

**361.Pey min dûd û dağ mimano we ca  
Eger ‘umrim bo ney zêd û mawa**

**362.Bo ta emin û to peywendê kerîm  
Karê we tedbîr pesendê kerîm**



Dema ku ev xebera li ber guhê Melek Rey'hanê ket, dil û hinavê wê di devê wê ra hatin. Çû bal dadoka xwe ew pîra zemanê û gotê:

“Dayê zû ji mi ra tevbîrekê bike! Îşev Mîr Zînedînî Tajdîn û mêvanên wî ji bo şîvê vexwendine dîwanxanê. Ez dizanim ku dê îşev Xatû Zînê bidene Memê û eger temenekî min bimîne jî, dê ji min ra derd û kul û da'x û keserê bimîne. Were em peymanekê danên û karekî qenc bikin, da ku ev kara li ser negire û negîje encamê!”

**363. Wat daye ferzend ye çê foğanen  
Be destim î kar xeylê asanen**

**364. Dam û tezwîrê bikerûn ew pa  
Herdûşan ce hem bikerûn cuda**

Dayenê gotê: “Kiça min ew çî dad û hewara te ye, ew kara di destê min da gelekî asan e. Ezê dek û dolaban bigerînim û wana ji hevdu biqetînim.”

**365. Derdem horêza ew zali werîn  
Liwa we yaney Qere Taceddîn**

**366. Nîgeh kerd ce dûr Qere Taceddîn  
Çenî Mem we pa îstaden qerîn**

**367. Ladê şî welaş derûn piş ce gem  
‘Erz kerdiş we Mem razani dujem**

**368. Watiş ey ferzend nûri dîdey dîn  
Er şît be dîwan Emîr Zînedîn**

**369. Biwêm mizanûn taqî xwaheriş  
Midero penet meşo ne weriş**

**370. Xwaherê daro ne metbex keften  
Girs û gendîde hem lar û çeften**

**371. Benaşen be mekr be fenn û funûn  
Cewanê çun to kero sernigûn**

**372. Ce rakey şewab min watim perêt  
Baqî ixtiyar be wêten be wêt**

**373. Emîr çun şîneft qewli zaî pîr  
Diş perê dişdar bend kerd be zencîr**

Ew pîra dewrê berê di gavê da rabû û çû mala Qere Taceddînî. Dûrva dîna xwe dayê ku Qere Tajdîn wa ye li gel Memê li rex hev rawestane. Di demeke kurt da bi dilekî pir derd û kul xwe gihande Memê û hindek xeberên tund ji Memê ra gotin û şîrove kir ku:

“Ez dizanim ku Mîr dixwaze xûşka xwe bidete te. Neçe cem wan. Xûşkeke wî ya girs û bi gevde û xwar û xîç û ginixî heye, ku şev û roj ji aşxanê dernakeve. Dixwazin bi dek û dolaban ewê bi serê te va ken û gencekî wekî te sernixûn bikin. Min ev gotinane ji bo qencîya te ji te ra gotin, bi min çî, tu bixwe qencî û xerabîya xwe dizanî.”

Dema ku Memê ev gotinên pîrê bihîstin, dilê xwe bi zincîrekê ji dildara xwe girêda.

### XXIII.

#### Mîr Mem û Bengîn û mazûvanên wî vedixwîne dîwanê

**374. Weqti şam yawa warid bîn we hem  
Yawan ew seray emîrani Cem**

**375. Be resm û adab şerî edeb kerd  
Meşrûti Zîndîn Mîr be ca award**

**376. Zîndîn hem bosa herdû gonay Mem  
Nişand ce pehlûş niştin çenî hem**

**377. Watiş weş amay hezar bar we xeyr  
Qudûmit awerd bey mekan û deyr**

**378. Emîr hem ce new tewazî' iş kerd  
Mobet mobetan ce ray hedd wîyerd**

Dema şîvê hemû giheştin hev û çûne mala Mîrî. Memê bi pêka deb û rismên heyî şertê edebê ji Mîr ra bi cî anî. Mîr jî her du hinarkên rûyê Memê ramûsa û ew li rex xwe da rûniştandinê û her du li rex hev rûniştin.

Mîr gote Memê:

“Tu gelekî bi xêr û xweşî hatîyî. Tu hezar carî bi xêr hatî, ku te pêngavên xwe avêtin vî mekanî.”

Memê jî careke dî ji Mîr ra kurnoş kir. Rêz û muhebetên wan ji hevdu ra ji radeyê derket.

**379. Weqti şam ama awerdin te' am  
Morğani biriyan enwa' i te' am<sup>284</sup>**

**380. Ber û peşt xwan tamam ze'âlûd  
Exzerî û eḡmer, esperî û kebûd**

**381. Te' am piř alet filfil û bazbaz  
Nîyaşan ne xwan çenî pêşendaz**

<sup>284</sup> Di her du nîvmalikan da peyva „te'am“ weke serwa hatîye, ku şaş e.

Dema şîvê hat, xwarek anîn. Cure cure xwarinên rengareng û mirîşkên sorkirî. Sifreyek ku ber û piştê wê bi ava zêr û bi rengên kesk û sor û zer û kew neqîşandibûn raxistin. Xwarekên pir tewaş û bi edvîye û bîber û reng bi reng bi pêşgîr û bermal danîn ser sifreyê.

**382. Bizorgan yekser wardîşan te' am  
Ce nuql û nebat, ce meğzi badam**

**383. Hordaştin sifre do' aşan wana  
Niştin be şadî e' ila ta edna**

**384. Ce qehwe û qeliyan herçi bê tamam  
Wardin bizorgan ce xass û 'ewam**

**385. Motriban aman jenden saz û rûd  
Soçaşan we şad çend micmereyi 'ûd**

Mirovmezinan xwareka xwe xwarin. Li dû ra çerezên wekî noql û nebat û kakilê behîvan hat. Li dû xwarin û vexwarinê ra du'a xwandin û sifre berhev kirin. Paşê qehwe û qelîyan ji xas û nasan ra hat. Vêca sazband û şayer hatin û dest bi jenîna amûrên sazbandîyê kirin û bi xweşî û gulşayî di micmeran da 'ûd şewitandin.

**386. 'Eyşê kerd ewşew perê Mem Emîr  
Nemeyo şerhiş ne weşf û tehrîr**

**387. Çend ro bey destûr 'işret bî ne kar  
Dişêran sermest serasîme war**

**388. Her şew bey destûr 'işret ne kar bê  
Tulû' i qemer wadey şikar bê**

**389. Şikar mekerdîn ta weqti êwar  
Ce kebk û xergoş mawerdîn hezar**

Mîr wê şevê ji emîr (Memê) ra şîv û şahîyek wisan li dar xist ku şiroveya wê nayê nivîsîn û pesindanê. Ew şahî û xweşî çend rojan wisan berdewam bû. Mêrên dilêr sermest û xoş bûn. Herşev wisan ew şahî berdewam dibû. Di gel helhatina heyvê ra dibû dema nêçîrê. Mîr bi mêvanan ra diçûne nêçîra kew û kergoşkan û ta êvarê wisan li nêçîrê da bûn.

#### XXIV.

**Mîr Memê dike mîrşîkar û Beko kîna Memê û mazûvanên wî dike dilê xwe**

**390.Beļê Mem ce fen şîkar dana bê  
Hem çabuk û çust çûn ejdeha bê**

**391.Her seyde ne ca mexêza we ber  
Ce dest şayi Mem nemeşî we der**

**392.Emîr cew dem da rû kerd we Tacdîn  
‘Eceb cewanê î merdi paktîn**

**393.Meşlihet êden bibo we serraw  
Layiq be ewen serrawî serraw**

**394.Emîr Zînedîn xel‘et da derdem  
Kerdiş we serraw xaşîr kerdin cem**

Mem li karê nêçîrê da hosta bû. Ew weke ejdehayekî jîr û jêhatî û çust û çabûk bû. Her nêçîra ku li ber Memê radibû, ji destê wî rizgar nedibû. Dema ku Mîr weha dît, berê xwe li ser Tajdînî da kiri û gotê:

“Ev xortê paktîn çî cewanekî jêhatî ye. Ya qenc ew e ku em ewî bikin mîrşîkar. Her ew hêjayî serrawî û mîrşîkarîyê ye.”

Mîr Zînedînî di wê demê da Mem xelat kir û kire serrawê serrawan û bêhna xwe fireh kir.

**395.Beļê Bekir aĝa ce qari Tacdîn  
Diļ piř ‘edawet piř ce qar û qîn**

**396.Dayim xerîk bê merdi nabîkar  
Bekir<sup>285</sup> we Emîr binmano îzrar**

**397.Furşet medoza şewan ta we ro  
Fitne pey Emîr eber pa kero**

Lê Bekir a’xa ji qehra Tajdînî da dilê wî tijî kîn û kerb û qehr û dujminatî bibû. Herdem xerîk bû ku Tajdînî/ Memê li pêş çavê Emîrî reş bike. Şev û roj li derfendan digerîya ku fitneyekê li djî Tajdîn/Mem li dar bixe.

---

<sup>285</sup> Bi dîtina me li vir şaşîyek heye, li cîhê navê Bekir da debîya navê Mem/Tacdîn bihata.

**XXV.**

**Pîlanên Zînê ji bo çûna ser kanîyê bi mebesta dîtina Memê**

**398. Her ro Mem çenî Emîri piř fam  
Setrenciř mekerd daimolmedam**

**399. Îmcare biřnew řemmê ce Xatûn  
Pey dîdenî Mem dest kerd we efsûn**

**400. Her çastê we rûy meclis meberdin  
Piř ce seng û rîg hîç nemewerdin**

Mem her ro û her car bi Mîr ra kiřikanê dikir.

Vê carê hindekê ji Zînê bibihîze, ka ji bo dîtina Memê çi dek û dolab û efsûn gerandin.  
Her xwareka ku biřanda meclisê, tijî ber û xîz dikir.

**401. Royê Mîr Zîndîn watiř be xwaher  
Ane çe nanen mekîyanî be wer**

**402. Piř ce seng û rîg werdeniř nîyen  
Emîrê çun Mem mêhmanim bîyen**

Rojekê Mîr Zînedînî gotê:

„Erê xûşkê ev çi xwareke ku tu diřînî meclisê? Wisan tijî ber û xîz e ku nayê xwarinê.  
Emîrekî wekî Memê mêvanê min e, ma řerm nîne?“

**403. Ciwab da Xatûn be řerř û edeb  
Gunahim nîyen ey ‘ alîneseb**

**404. Kenîzan te‘ am maweran be kar  
Eļbet xilelê lêř mebo izhar**

**405. Nemeřûn we ab min ce xewfi Mîr  
Pewse te‘ aman bîyen naguzîr**

Zînê bi řerm û edeb bersiv da: „Ey mîrê bilindpaye, gunahê min nîne, keniz nanî amade dikin, helbet kêmasî yê tê da habe. Ez ji tirsî Mîr nikarim herim avê, lewra xwarek wisna bi kêmasî amade dibe.“

**406. Meizûn da Emîr Xatûni dulber  
Minbe‘ id reha ber ne rûy deřt û der**

**407. Her te‘ amê hen wêt durust biker  
Qebûl nedarûn xilel do eřer**

**408. Xatûn wat beļê mîri temîzim  
Ce kenîzekan kemter kenîzim**

Mîr destûra Zînê da û gotê: „Ji virha şûn da tu serbestî herî ser avê û der u deştan li hev bidî. Virha her xwareka ku tê meclisê tu bixwe amade bike. Ez êdî napejirînim kêmasî di xwarekê da hebe.“

Zînê got: „Ser seran Mîrê minî ezîz, ez keniza te me û ji te ra ji kenizan jî kêmtir im.“

## XXVI.

**Zînê diçe ser kanîyê û Memê wê dibîne û bi dîtina wê mendehoş dibe**

**409.Bişnew dasitan ‘ ecayib diğîr  
Nişte bê Emîr matem û ziwîr**

**410.Rû kerd we ‘ Efo, Çekoy berader  
Îmro koy geman wenem dan eşer**

**411.Ew text û nerde bawer be diğwaz  
Bişanîm nerdê ney çerxi keçbaz**

Vêca niha çîrrokek xweş guhdarî bike! Rojekê Emîr (Memê) bi xemgînî û diltengî rûniştibû. Di wê rewşê da berê xwe li ser ‘Efo û Çeko da kir û gote wan: “Îro tu dibêjî qey çîyayê derd û xeman li ser min da jor da hatine, bêhna min pir teng e. Ewî textenerdî biñin, em demekê texteyekê di gel vê çerxa felekê bileyzin.”

**412.Awerdin niştin hersê be razî  
Nîyaşan benay kari nerdbazî**

**413.Çend oyîn ce beyn hersêşan wîyerd  
Ce nagah be emr taki teniyay ferd**

**414.Xatûni şîrîn cemîn bogolab  
Ama çûn xurşîd be serçeşmey ab**

**415.Ser ta pa libas alay zerwereq  
Xurşîd ce nûriş horgirtin rewneq**

Textenerd anîn û hersêk pêkve rûniştin û dest bi leyza textenerdê kirin. Çend destan lîstin, ku nişkav da bi fermana Xudayê tekî tenê Xatû Zîna enî gulavîn, weke tirîşka tavê hate ser kanîyê. Serdanpê kincên armûşîn yê zêrvehûn li xwe kiribû. Tavê ji nûra wê rewneq verdigirt.

**416.Naziki nazdar perîzadeyê  
Ce nesli perî pak uftadeyê**

**417.Bağabolendê, ‘er‘ erendamê  
Qemerruxsarê, mahê tamamê**

**418.Dû çeşman sîya ‘emberîn mûyê  
Lûlwerde heyyan ef’ îgîsûyê**

**419.Afeti dewran, kemanabrûyê  
Wey kerî wey baz wey we her sûyê**

**420.Xûnxwar û bêrehm Xudanetirsê  
Meğrûr û medhoş eħwañnepirsê**

**421.Meker pey qital werînan mestî  
Tîri ğemze û naz dayim ne şestî**

**422.Ser ta pa be nûri qudret sireşten  
Baļa wêney hûr baği weheşten**

**423.Şewqîş wêney mah dû heftemînen  
Rewîley rimkêş nazdari Çînen**

Ew nazika nazdar, ew perîzadeya perînejad, bi bejna xwe ya bilind wekî darselwîyê, tefeş wek hîva çardê, bi du çavên reş û belek, biskên ‘emberîn û badayî û xelek, kezîyên vehûnayî weke marên reş, birûyê kewanî, bêtara dewr û zemanî, belaya ruh û canî, fitne û şerengîz û belafiroşa asimanî, xûnxwar û bêrehm û Xudênetirs, qude û mendehoş û pozquloz, ku bi sermestîya xwe û tîrê avirran weke rimkêşên nazdarên Çînî mêrkujî dikir, bi meş hate ser kanîyê. Te digot qey ji serî ta pîyan bi nûra qudretê hatîye histirîne. Bejna wê weke bejna hûrîyên biheştê, tefeşa wê weke hîva du heftîyan şewqavêj bû.

**424.Korpe hey tañan sîyah şu‘ ibanî  
Kerdin serawêz texti pêşanî**

**425.Ca girten ne pay ‘ereqçînewe  
Cewahirnişan behay Çînewe**

**426.Pey bêdarî zulf sîyay çîn çîniş  
Pey pey mebosan le‘ li maçîniş**

**427.Ebrû çun kemani gorigîr Behram  
Yan bedri hilal yekşewey tamam**

**428.Neqqaşi qudret dû ‘eyn kerdin meşq  
Bîyen we sermeşqi ‘aşiqani ‘eşq**

Porikên li ser enîyê weke têjemarkan ji bin araqçîne wê ra rijyabûn ser meydana enîya kevera ku mihellê cewahiratan bû. Biskên wê yên marasa çîn çîn û badayî serî berdabûn ser lêv û lamên le’lîn û ramûsanxwaz. Birûyên wê weke kewanê Behramê gûrgîr, weke heyva

yekşevî, te digot qey wênekêşê qudretê her du biskên wê yên weke tîpa ‘eynê bi dest kêşaye û ji evîndaran ra kirîye sermeşqa hevîzana ‘eşq û evînê.

**429.Ahûyi Tetaranî xoş çerîde  
Weledey ceyrani sa perwerîde**

**430.Dem durci yaqût keylen ce gewher  
Perwerden be naz çûn şehd û şekker**

**431.Dû destey keşaf miqrazî kerdên  
We bani gonaş çîn çîn çîn werden**

**432.Bew tewrnakin weqti ‘ibaret  
Le‘li Bedexşan medo be ğaret**

Weke karxezaleke deşta Tataristanê xweşçeriyayî û di jêr sîberê da perwerdebûyî, dev wekî sendoqa yaqûtan ya tijî gewher, bi nazên wek şehd û şekkerê hatî perwerandinê, bi biskên weke du kelefên nûmeqeskirî, çîn çîn û deste desteyî qurûşk û badayî xwe berdane ser hinarkê rûya, dema ku diaxift, bi le‘lên her du lêvan, le‘lên Bedexşanê talan dikirin.

**433.Şu‘ ay zeneqdan mederewşo ce dûr  
Maçî koy bilûr, ya xo deriyay nûr**

**434.Gerden şuraşî çûn mînayı bêgerd  
Dîyaren we ban çali tînî zerd**

**435.Pîr ce mawî xal fîrozey xalên  
Dořen mercanen dehani rumman**

**436.Meman şekkersêb ya lîmoy kaşên  
Ya xo şemmamey zerdi bêxaşên**

Şewqa çena wê wekî elmasên kûhê nûr û deryayê nûr ji dûr va diteyîsî. Gerdena wê weke surahîyekê nûranî û şefaf bû û kortika qirrikê bi zerî dihingavt. Dora hinarên wê pêda bi xalên şîn û pîrozeyî xemilbûn. Memkên wê weke henar û şekersêvên xal xalî û lîmonên kal, yan jî weke şemamokên zerên bêxal bûn.

**437.Wey wey ce heyyan xem werden we hem  
Bîyen we seywan sîne û xal û mem**

**438.Başa çun newtûl nemami ‘er‘er  
Nayaben ce laş sewlî senewber**

**439.Bey terkîb endam şoxi şengewe  
Bey sermestî naz medhoş rengewe**



**440.Ama we ser ab xaw xaw xeraman  
Çun weşî bêbak ew mahi taban**

Way li wan marên ku lev alîyane û bûne sîvanka wan sîng û ber û xal û meman. Bejin weke şitla selwîyê nermik û terik û şil û mil û bêwêne bû. Ew bejna selwîya şox û şeng bi mestî û mendehoşî, bi naz û eda hûrik hûrik weke karxezaleke kûvî û bêbak weke hîveke tavan bi meş meş hate ser avê.

**441.Emîr çun çemiş gina be ew nûr  
Wat selê ‘ela cey azade hûr**

**442.Yekê bo bey tewr mehbûbi dulber  
Kê bo çun xurşîd şewqîş da eşer**

Dema ku çavên Emîrî bi wê nûrê ket, selewat kişand û got: „Gelo ev hûrîya serbest û biste, dilber û dildara kê ye? Ew dildara kê be, we bizane ku tava rojê li serê wî daye û ew bi wê şewqê bextewer bûye.“

**443.Ciwab dan derdem herdû berader  
Waten nûri çem gemzedey gemwer**

**444.Ya kişreti gem famit kem kerdên  
Ya cur‘ey ne cam sermestît werden**

**445.Ya yaney derûn wêt kerdên wêran  
Neşunasî meger doxti emîran**

**446.Hoşit cem kere er zeřey pêten  
Me‘lûm bo ce lat ke yari wêten**

Herdû birayan di gavê da bersiv dan: „Ey ronahîya çavan, ey derdedarê xemxwer û xemlêketî, yan lêmişta derd û xeman fam û têgehîştina te kê m kirîye, yan jî te ji cama sermestîyê gulpek vexwarîye. Yan jî mala dilê te wêran bûye. Ma tu qîza mîran nanasî? Ca hişê xwe berevî serê xwe bike, eger pirtîya hişî di serê te da mabe. Baş bizane ew dildara te bixw ye.“

**XXVII.**

**Memê destûrê ji mazûvanên xwe dixwaze ku here ser kanîyê û di gel Zînê biaxive**

**447.Emîr çun ejnî î goftar û raz  
Çûn weşî morgê ama ne perwaz**

**448.Wat beraderan razim meken faş  
Er reza daron min mişo we raş**

**449.Ser we xaki pay sayeş meweûn  
Istid‘ ayim hen ‘erziş mekerûn**

Dema ku Emîrî ev gotina bihîst, mîna balindeyekî hov û kûvî hate perwazê û got:  
“Gelî birayan sira min eşkere nekin. Eger destûra we hebe, ez ê herim serê rîya  
wê. Ez ê herim serê xwe danêm ber sîya pîyên wê û erezekî min heye, ez ê jê ra bêjim.”

**450.Ama be ciwab ‘Efoy berader  
Watiş nûri çem ey yari yawer**

**451.Çarsû meqamen her sûyi guzer  
Piř ce gemmazan î rûy deşt û der**

**452.Nek bişî we raş gemmazani kar  
Ce lay Mîr Zîndîn bikeran izhar**

**453.Şadiqî û xidmet pêt mebo teba  
Meşo ne rakeş sakin ber ne ca**

‘Efoyê bira bersiva wî da:

“Ey ronahîya çavan, ey yar û hogirê me, ma tu nabînî her alî xebergerîn û şûfar li ser rê û  
dirban tên û diçin? Nekû tu herî pêşîya wê. Xebergerîn ê biçin bêjin Mîr û dê sira te li bal Mîr  
eşkere bikin, hînga durustkarî û xizmetên te hemû dê bêtuen û bêhûde herin badîhewayê. Li  
cîhê xwe raweste û neçe ser rîya wê.”

**454.Emîr wat donya yek firûkeşen  
Dilwazî çenî emîran weşen**

**455.Çeko wat ‘Efo çe karit pêşen  
Ba bişo ne raş ke yari wêşen**

**456.Wêney rawîyan mikerî tedbîr  
Karit pêş nebo ba nebo dilgîr**

**457.Wat ey berader ke yari wêten  
Bişo biwaçe her soxen pêten**

**458.Her nîyazit hen biwaçe perêş  
Xewfit hîç nebo mekere endêş**

Emîrî got:

“Dunya demek e, (çi dibe bila bibie.) lê dildarî di gel dotmîran xweş e.”

Çeko gote ‘Efoyî:

“Çi karê te pê ketîye, bihêle bila here ser rîya wê. Wekî çirokbêjan tevbîran neke, karê te  
pê neketîye, bihêle bila here, dilê wî nehêle. Ê berê xwe li ser Emîrî da kir û gotê:

„Bira ew dildara te ye, here çi gotinên te hebe, jê ra bêje. Dilê te çi xwast jê ra bêje, qet fikaran neke.”

## XXVIII.

**Dîdara Mem û Zînê li ser kanîyê û vegirtina randevoyê**

**459.Horêza we pa Emîri namdar  
Rû kerd we canib Xatûni nazdar**

**460.Yawa we xidmet sewlî nazperwer  
Sîlam daweneş çûn şehd û şekker**

**461.‘ Eleyk da ciwab Xatûn we hicab  
Mandenebîş kerd pey xeyr û şewab**

Emîrê navidar (Mem) ji cî rabû û berê xwe da Xatûna nazdar. Giheşte xizmeta wê selwîya nazperwerde û silaveke weke şehd û şekkerê pêşkêşî wê kir. Xatûnê bi şerm û edeb bersiva wî da û ji bo xêr û qencîyan mandînebûnî gotê.

**462.Dû sê deqîqe midrane dîyar  
Menzûriş mikerd bew perîruxsar**

**463.Axir serencam Xatûni nazdar  
Watiş we Emîr gemzedey gembar**

**464.Er ‘ ezmit wuzûn bawer we encam  
Er ab minoşî binoşe we cam**

**465.Dêren weqti dêr rahî ber ne rat  
Ta min bişorûn î qab û hacat**

Memê du sê xulekan rawesta û hema wisan li wê perîrûyê nihêrî. Li dawîyê da Xatûna nazdar gote Emîrê xemgîn û xembar:

“Eger dixwazî destnimêja xwe bigrî, fermo bigre, yan dixwazî avê vexoy, fermo ji te ra cam, ava xwe vexwe. Karê xwe bike û here, li min dereng e, ez debê van aman û qabana bişom.”

**466.Ama be ciwab Emîri dulcû  
Toşnem nîyenan sendenim wuzû**

**467.Ema ‘ erzeyê darûn er danî  
Penet biwaçûn ne ray nihanî**

Emîrî bersiva Xatûnê weha da:

“Ez tînî nînim û min destnimêja xwe jî girtîye. Lê eger destûra te hebe, ‘erzekî min î biçûk heye, dixwazim dizîva ji te ra bêjim.”

**468.Xatûn wat we Mem mer hoşit nîyen**  
**‘Eceb hey ‘ eceb min key tom dîyen**

**469.Ama be ciwab Emîri dijrêş**  
**Rastişan waten ‘ aqilani pêş**

**470.Razişan meqbûl ew nikûkaran**  
**Zen û esp û şîr wefa nedaran**

Xatûnê gote Memê:

“Ma te hişê xwe derdaye, tu çi xeberên sosret dibêjî. Min kînga tu dîtîyî û ez te li ku nas dikim?”

Emîrê dilbirîn gotê:

“Pêşîyên me yên zana çi baş gotine, gotinên wan durustkarana çi di cî da ye. Wefaya jin û hesp û şûran tune ye.”

**471.Baz ama we raz Xatûn we zêrûr**  
**Min key tom dîyen maçî bey destûr**

**472.Ama we soxen Mîri xoşkelam**  
**Watiş we Xatûn ey mahi tamam**

**473.Ew rom şunasay ey nazikbeden**  
**Ne Cizîr amay we şehri Yemen**

**474.Be hukmi îzed lamekani ferd**  
**Ne agûş minit qerardade kerd**

**475.Be xwabi raşet ser we hem berdîm**  
**Serî ita‘et we hem soperdîm**

**476.Herdû nişanan be yek soperdîm**  
**Herdû ce nagah ce hem wiyerdîm**

**477.Minit wust ne dam hem ne kûrey nar**  
**Îste miwaçî nedarûn exbar**

Xatûnê dîsan bersiv da:

“Min kengê tu dîtîyî? Tu çima wisan diaxivî?”

Emîrê xeberxoş dîsan bersiv dayê:

“Dema ku tu bi fermana Xudayê tekî tenê, ji bajarê Cizîra Botan hatî şehre Yemenê û tu danane himêza min da, hînga min tu nas kirî, ey nazikbedenê! Ez û tu em pêkve razan û me serî li ber hev danî û me nişan û yadigarî dane hev û li dû ra em di xew ra çûn û nişkava ji hevdu qetîyan. Te ez kirim nav davika evîna xwe, te ez kirim di tifika evînê da, niha jî tu dibêjî ku haya te jê nîne.”

**478.Xatûn çun ejnî î qewl û goftar  
Rêza be çem da esrînan hezar**

**479.Wat be fedat bo gîyani şîrînim  
Dat be awi da renci werînim**

**480.Nezanam tonî nûri dîde û gîyan  
Min ce goftey wêm ha bîm peşîman**

**481.Umêd hen ce lay zîşewket û şan  
Me'izûr bidarîm cey herfi nadan**

Dema ku Xatûnê ev gotinên Memê bihîstin, bi hezaran hêsir ji çavan barandin û gote Memê:

“Hey canê minî şîrîn bi gorîyî te be, te hemû zehmetên min dane bayê. Ey ronahîya çavan, hey ruh û canê min, min nizanî tu yî, ez ji gotinên xwe poşman im. Hêvîdar im ji te xudanê şan û şikohan ku tu li min û van xeberên nezanane bibihorî.”

**482.Ama be ciwab Emîri nazdar  
Herfi me'zûrît ba bo berkenar**

**483.Ne cayê xelwet binîşîn we hem  
Aşîkar kerîn girdîn derd û gem**

**484.Ama we goftar şay perîendam  
'Erz kerd we xidmet Emîrî enam**

**485.Beğeyr ce otaq wêm cageyê ko  
Her weqtê be xêr teşrîfit meyo**

**486.Qedem rencan ker gîyanim bo fedat  
Wêney kenîzan serim ha ne rat**

**487.Zerîne bazin kêşa ne rûy dest  
Daş we destî Mem ne beğel peywest**

**488.Herdû ce menzûr sêr bî dîdeşan  
Girtîşan ce hem nişan pey nişan**

**489.Cuda bîn ce hem zuhre û muşterî  
Be emri ferman Heyyi dawerî**

Memê gotê:

“Dev ji wan gotinane berde, ka em li kêderê li cîhekî xelwe dikarin pêkve rûnên û derd û kulên xwe ji hevdu ra bêjin.”

Ew şehriyara perîendam 'erzî xizmeta Memê kir û gotê:

“Ji bilî oda min, cîyekî min yê dinê tune. Tu her kînga hatî, pîyên te li ser ser û ser çavên min. Fermo were seraya min, ku ez canê xwe ji te ra gorî bikim û weke keniz û kulfetan di xizmeta te da bim. Serê min di oxira te da ye.”

Zînê dest avîtê, bazinê xwe yî zêrr ji zenda xwe derxist û weke dîyarî û nîşan pêşkêşî Memê kir û xwe gîhande rex wî. Herdûyan têr li hevdu mêze kirin û nîşan û yadigarî dane hevdu.

Bi ferman û xwasta Xudê her du istêrkên Zuhre û Muşterîyê ji hevdu cuda bûn.

## **XXIX.**

### **Sernegitina dîdarê û vegirtina randevoya duyem**

**490.Emîr lêş bişîya aram û qerar  
Soperd erwaşîş ne pey hicri yar**

**491.Supahi hebeş wust ne dûşîş bar  
Endoş bolend bî çûn berzî kosar**

**492.Xwab û xorakiş ne diş kerd bişîn  
Fikr û xeyalîş sewday Xatû Zîn**

**493.Zewq û şadîyeş bî ew şew matem  
Qeşa qeşaş kerd sulţanani gem**

**494.Xurûs berawerd şewti şub seher  
Muezzin wanaş Elahû Ekber**

**495.Rewşin bî we nûr şeşra û deşt û der  
Ewqat nemazan ber aman we ber**

**496.Emîr horêza diş ce gem perwer  
Eda kerdiş ferz Heyyi tewanger**

**497.Ateşi derûn weneş da eşer  
Horêza ce tab ta ama bi wer**

**498.Ew ca ke wa' id pêş dabê nişan  
Şî be ew dîyar we endek zeman**

Aramîş û vehebiyanê mala xwe ji dilê Memê bar kir û hindik mabû Memê ji ber dûrîya dildarê can bida.

Leşkerê ‘Hebeşî (şevê) barek danî ser milê wî û derd û xemên wî hindî çîyayekê bilind bûn. Xew û xwarek ji xwe heram kirin, hizr û fikra wî herdem evîna Xatûnê bû. Wê şevê xweşî û zewqa wî bû xem û matem. Sulatanên xeman di hundurê wî da carê kelayek ava dikir û yek dihirşand. Dema ku kelokê sibêdê bang da û dengê bangbêjî bi Ellahû Ekberê bilind bû,

ronahîyê deşt û der û çol û bîyaban da ber xwe û bû dema nimêjê, ew Emîrê xemperwerde ji xewê rabû û nivêja sibêdê kir. Lê agirê evînê dil û hundurrê wî dagîr kiribû. Ew bi taw û lez rabû û çû cêjivanê. Cîhê jivana ku ewî û Zînê bi hevdu ra nîşan kiirbûn, bi lez di demeke kurt da xwe gîhande wê derê.

**499.Xatûn kenîzê derdem kerd rewan  
Bişo biwîne er kesê midran**

**500.Be taw û te' cîl ciwab bawer pê  
Ta ke dîdariş biwînûn biwêm**

**501.Kenîzek ama bê sebr û aram  
Yawa we cayê mewa' id meqam**

**502.Dîş ke ciwanê midran ne ew ca  
Wêney Yûsifen be hoşn û sîma**

**503.We bêroş midran be bêdeng û dîn  
Çiman wende bîn ne çaresê efsûn**

Xatûnê jî kenizek şande dû wî û gote kenizê zû here filan cîyî, ka keseke li wir rawestayê, zû ji min ra peyamê biîne, da ku ez wî bibînim.

Keniz bê sebr û aram hat û gihîşte wî cîhê ku Xatûnê gotibû. Dît ku cewanekî wekî Yûsifi xweşik û cuwan li wir rawestayê. Dema ku çavên kenizê bi wî ketin, ji xwe va çû û deng û seda jê dernekt, te digot qey efsûn û cadû lê hatibû xwandinê.

**504.Çeşmi intîzar Xatûn girt ne der  
Ta ke key mido kenîzek eşer**

**505.Sa'etê wîyerd bêzar bî ce gîyan  
Ne cewab ezû yaft ne nam (û) nişan**

**506.Yekê henîş kerd ne 'eqeb rewan  
Ewîş nadim bî bê nam û nişan**

**507.'Eceb mend Xatûn ce namay êşan  
Ama we bîrûn xatirperêşan**

Çavên Xatûnê li derî man û li derî dinihêrrî ka kînga kenizê bê. Lê saetek derbas bû, çî nav û nîşanek ji kenizê peyda nebû. Xatûn ji çavniherîyê vêzar bû û kenizeke dî li dû wê ra şand. Ew jî çû û çî deng û seda ji wê jî nehat. Xatûn zendegirtî ma û vê carê bi dilekî perîşan bixwe rabû û çû cêjivanê.

**508.Dîş ke şay Emîr midran çûn lûlak  
Kenîzan herdû medhoşen ce xak**

**509.Rû kerd we Emîr Xatûni zeman  
Weş amay we ban bînayî çeman**

**510.Dîyênim xawê ey salari cem  
Meger ce meşser bîyawîn we hem**

Dît ku Memê wekî qelqeleçekê li wir rawestayê û her du keniz jî bêhiş li erdê mane. Xatûnê berê xwe li ser Emîr da kir û gotê:

“Tu gelekî bi xêr û xoşî hatî, li ser ser û ser bînaya çavên min ra hatîyî. Ey salarê Cem min xewnek dîtîye, ku em ê negehene hevdu, meger li roja ‘heşrê.’”

**511.Der ciwab ama Emîri dewran  
Baş nazdaran Xatûni zeman**

**512.Her serniwêştê ce zati subhan  
Biniwîso mebo biwînûn ‘eyan**

**513.Beşê istid‘ am êden er danî  
Nek hem cuda biwîn ney donyay fanî**

**514.Xelwet min û to ce seray Zîndîn  
Ladê we hamdem we hem binîşîm**

Emîr li bersiva Xatûnê da got:

“Ey xatûna zemanê, ey seroka nazdaran, her sernivîsa ku Xudayê sub’han ji me ra nivîsîbe, dê bibe û biqewime. Lê daxwaz û hêvîya min ji Xudê ew e ku em di vê cîhanê da bigehin hevdu û em ji hevdu cuda nebin.”

(Zîne got:) “Bila xelweta min û te di seraya Mîr Zînedînê da be, emê li wir hevdu bibînin û demekê li wir bi hevdu ra rûnên.”

**515.Enguşti qebûl nîya we dîde  
Key arami can rohi remîde**

**516.Her weqt furset bo minnet barenan  
Fîşter min ce to cûyay yarenan**

**517.Watiş ey nazdar ey kemanebro  
Wademan herdû seray Zîndîn bo**

**518.Horgêla liwa emîri namdar  
Şî be cagey wêş Xatûni nazdar**

**519.Du‘ aş kerd Emîr be endûhi dil  
Ya reb rehetê ce ser key nazil**



Memê destê xwe danî ser çavên xwe û gotê: “Ey aramişa canê min î ji leş reviyayî, herdema ku derfend çê bû, ez gellekî minnetdar im. Ez ji te gelectir tasedar û tamarzû me. Ey nazdara birûkewan, bila be, bila cêjivana me herdûyan seraya Mîr Zînedîn be.”

Emîrê navidar zivirî û çû cîhê xwe, Xatûn jî vegerîya çû serayê.

Emîr ji dil û can jê ra du'a kir.

Xudêyo tu rehmetekê li ser wan da nazil bikî.

### XXX.

**Mîr Zînedîn fermana nêçîrê derdixe, her kes diçe nêçîrê, lê Memê xwe nexweşî  
davêje û di bajêr da dimîne û li dû nêçîra xwe diçe**

**520. Bejê pey def'î cûdi gubar bo  
Demagi şîkar Emîr îzhar bo**

**521. Be emri ferman lamekani ferd  
Meqrûn ce hedef icabet wîyerd**

**522. Ewşew baranê nizûl kerd cebbar  
Muzeyyen kerdiş deşt û kohisar**

**523. Şeher Emîr wat be yarani yar  
Caş den we şar da mişon we şîkar**

Ji bona labirina toz û gemara derd û kul û xeman ji rûpela dilî, dilê Mîrî nêçîrek xwast.

Bi fermana Xudayê bê cî û war, tîra daxwazê li nêzîkî armancê ket. Xudayê mezin wê şevê baranek jorda şand û der û deşt û çil û çîya xemiland. Sibêdê Emîrî gote hevalên nêzîk bila çarçî li carrê bidin û bêjin, emê herrin nêçîrê.

**524. Çawûşan caş dan yane be yane  
Ce ehli Cizîr xwêş û bêgane**

**525. Hâzîr ban tamam ce ehli şîkar  
Hîçkes ce yane negêro qerar**

**526. Dan ne teplî baz kocîha bendin  
Kilawe ce ferqî şahînan sendin**

Çawûşan car kişandin û mal bi malê xelkê Cizîrê ji nas û nenasan, ji xizman û bîhanîyan gerîyan û gotin: “Bila nêçîrvan hemû amade bin û çî kes di mal da nemînin!” (Mîr diçe nêçîrê.)

Çawûşan li duhola hewarê dan û kolan hemû girêdan û suwar bi rê ketin. Nêçîrvanan kumik ji serê şahîna rakirin (û ber bi nêçîrgehê çûn.)

**527.Mem ke serraw bê neyama be wer  
Mîr porsa ce Mem çêş ama be ser**

**528.Taceddîn watiş Mîri bê nezîr  
Mem azardaren ‘aciz û ziwîr**

**529.Nimetawey beyo îmro we şîkar  
Matemen dilgîr zayîf û zîgar**

Memê ku mîrşîkar bû, neçû nêçîrê.

Mîr pirsî: “Çi ji Memê hatîye ku nehatîye rave?”

Tajdînî bersiva Mîrî da û got:

“Ey Mîrê bêheval Mem îro pir ‘aciz û nexweş û xemgîn û dilgîr bû, lewra nikarî bihata nêçîrê.”

**530.Emîr çun şîneft wat awaz keran  
Bîyan ew doma tamam nokeran**

**531.Nimeşûn bê Mem îmro we şîkar  
Bigêlanew pes pîyade û suwar**

**532.Ama we goftar Taceddîn ce no  
Watiş dewletit yar bo ro be ro**

**533.Wapes negerdan suwarani raw  
Ce tenxway Emîr Bengîn bo serraw**

**534.Her weqt ke Emîr şîfa yawa pêş  
Ejbet be şîkar mîyawo pey wêş**

**535.Qebûl kerd goftar Taceddîn heman  
Leşker tamamî rewan bî rewan**

Dema ku Mîr bihîst ku Memê nexweş e, gote carçîyan gazî bikin, bila xulam û xizmetkar û suwar û peyayên nêçîrê paş da bizivirrin, em îro naçin nêçîrê.

Tajdîn gotê: “Mîrê min Xudê dewleta te roj bo rojê zêde û zêdetir bike, xweşbextî û serferazî bibe para te. Suwarên nêçîrê paş da nezivirîne. Li dewsa Memê Bengîn bila bibe serraw. Her dema ku Memê qenc be, helbete dê bixwe bête nêçîrê.”

Mîr gotinên Tajdînî di gavê da pejirand û leşker bi giştî ber bi nêçîrgehê rê ketin.

### **XXXI.**

**Mem û Zîn di seraya Mîr da digîjine hevdu**

**536.Înbar cew dem da Xatûni guzîn  
Ama we bîrûn çûn mah û perwîn**

**537.Yawa be xidmet Emîri dulber  
Niştin çenî hem çûn şehd û şekker**

**538.Şîn ne rûy doşek lihafî zeřîn  
Kerdişan razan wîyerdey werîn**

**539.Perêşan kerdin sunbul çenî gul  
Buļbuļ minqar jend ne rûy peřey gul**

**540.Çehçehey huzar dem we peřey gul  
‘Endelîb maço murad bî hasil**

**541.‘Eyšê sazinan dû ‘aşiqî zar  
Qend çenî şekker we leb kerdin bar**

Vêca em ji Xatûna bijare biaxivin. Ew di wê demê da weke hîv û pêr û mêzînê derkete derva û giheşte xizmeta Mîrê dildar û evîndar. Ew her duk wekî şîr û şekerî pêkve rûniştin û çûne ser doşek û li’hêfên zêrrîn û derd û kulên xwe yên berê dane bayê û derd û kulên xwe ji hevdu ra gotin. Gul û sunbul hatin şêwandinê û bilbilî perikên gulê da ber nikilan û bi hezar awa û miqam û dasitanan li ber gulê dest bi xwandinê kir. Bû çîve çîva’endelîbî, da gazî û hawaran û got, miraz hasil bû. Ew her du evîndarên dilkizirî ‘eyşek danîn û keyfek saz kirin û qend û şeker ji lêvên hevdu revandin û hingivên lêvên hevdu mêştin.

**542.Er kesê mişî new ra rahguzar  
Nebat çenî qend mebîş we nişar**

**543.Têgî zehraîud ce nafe be war  
Qirar da ne beyn dû yar dû duļdar**

**544.Nemez çêş waçûn serencami kar  
Herdû şîn ne xwab rařet bê qerar**

**545.Leb we bani leb we hem peywesten  
Nem ne serçêşmey heyewan besten**

(Jivana wan hind xweş bû), eger kesek bi rêbwarî ji wir ra derbas biba, bêgotin ji ber xweşîya wê jivanê qend û nebatê li ser wan da bibarîya. Memê şûrê xwe yê jehravî li navkê berjêrtir danî nîveka xwe û zînê. Ez nizanim ka dê êdî çi bibêjim, ka dawîya wan dê çi jê bê. Herdu evîndar û dildarên dilketî di wê rewşê da ku lêvên xwe danîbûn ser lêvên hevdu û ji kanîya jînê nem nem ava heyatê noş dikirin, di himêza hevdu da ketin xeweke şîrîn.

## **XXXII.**

**Di nêçîrgehê da Beko bi nehatina Memê agadar dibe û Mîr han dide ku dest ji nêçîrê bikêşe**

**546. Hala ce êşan nekerîn goftar  
Biderîm exbar Emîrî salar**

**547. Çun şîn bew mekan şikarî yaran  
Wela bîn ne deşt tamam suwaran**

**548. ‘Aciz bî Emîr ewro ce şikar  
Watiş we Bekir Emîri namdar**

**549. Lezzetê nedîm îmro cey şikar  
Geyrez ‘acizî û endûhî, zigar**

**550. Bê Emîri Mem heramen î raw  
Azarişan werd suwarani daw**

Niha em ji wan xeber nedin û herin ji Mîrê mezin hindek agadarîyan bidin. Dema ku Mîr bi suwarên nêçîrê va giheştin nêçîrgehê û suwar li deşt û deran da belaw bûn, Mîr îro ji nêçîrê ‘aciz bû û berê xwe li ser Bekirî da kir û gotê:

“Min îro ji vê nêçîrê ji bilî xem û xusse û diltengîyê çî lezzet û xweşîyek nedît. Rastî jî bêy Memê ev nêçîra ji me ra heram bû û suwarên nêçîrê bêtune xwe êşandin.”

**551. Ama be ciwab Bekir bêqerar  
‘Erz kerd we xidmet Emîrî namdar**

**552. Amam weqti şubh biderûn exbar  
Mem azardaren meşo we şikar**

**553. Cew direnge da bend bî zuwanim  
Çenî to nebî deng û duwanim**

**554. Werne şehzadey be wêney Emîr  
Azardar, ginêw, gerîb û ziwîr**

**555. Ew çe minasib ber şî we şikar  
Ce lay bizorgan êd minimano ‘ar**

Bekirî ‘erzî xizmeta Mîr kir û di bersiva wî da weha got: “Min vê sibê xwast ku ez ji te ra bêjim ku Memê nexweş e, neçe nêçîrê, lê li hember te da zimanê min bend bû, min nikarî ez xeber bidim. Axftin bi min nebû. Dena şehzadeyekî wekî Memê xerîb û bêkes, nexweş bikeve û bikeve nava nivînan, mirov çawa wî di nav nivînan da dihêle û dihê nêçîr û ravê? Ev nêçîra gelekî bêbabet bû. Ev hinda li bal mezinmirovana şerm û fihêtîyeke mezin tete jimarê.”

**556. Emîr çûn şineft aferîn wana  
Watiş çawûşan bikeran hana**

**557.Suwaran cem ban, beçalên şîkar  
Bipêçan ‘inan ta mişîn we şar**

Dema ku Mîr ev gotinana ji Bekirî bihîstin, aferîn dayê û got: “Bila çawûş gazî bikin û bêjin, bila suwar hemû berev bibin û nêçîrê betal bikin. Dizgînê hespan badin, em ê ber bi bajêr bizivirrin.”

**XXXIII.**

**Mem û Zîn di xewa evînê da nin û Mîr û leşker li ser da peya dibin**

**558.Taceddîn awaz kerd we Bengîne  
Ey yari duşdar karê biwîne**

**559.Biwê mizanûn Mem çenî yawer  
Ne seray Emîr niştên bêxeber**

**560.Hîç famîş nîyen ce sewday duşdar  
Xeberdarîş ker wer ce karûzar**

Dema ku Tajdînî ev gotinên Mîrî bihîstin, berê xwe li ser Bengînî da kir û gotê: “Ey hevalê canî canî, zû bike çareyekê peyda ke! Ez bi wê hindê dizanim ku Memê li seraya Mîr da bi dildara xwe va rûniştîye. Ew li ber evîna Zînê hay ji bayê felekê nîne. Zû here û berî ku bûyereke diltezîn biqewime, ewî bi hatina Mîr bihesîne!”

**561.Bengîn çun ejnî berama we taw  
Cuda bî ce qelb suwarani raw**

**562.Xeylê teixîr kerd be emri Qedîr  
Daxîl bî Bengîn wasîl bî Emîr**

Gava ku Bengînî ev yeka bihîst, bi taw ji dilê leşkerî derket û berê xwe da bajêr. Lê bi fermana Xudê di rê da gelekî giro bû. Heta Bengîn kete hundurr serayê, Mîr jî pê ra gihîşt.

**563.Ama we sera Bengîn we şîtab  
Dîş ke sermestî herdûşan ne xwab**

**564.Watiş ey Emîr xoftey bêxeber  
Berxwah ke afaq ahir girt ne wer**

**565.Emîr Zînedîn yawa be heşar  
Peya bî ce zîn ama bêqerar**

**566.Şîn we yextexan tamam semendan  
Jenden otrağan baz û baleban**

**567.Şahîn û seqir kerdin kilawe  
Ha weqten Emîr biyo ce lawe**

**568.Zar zar girêwa Bengîn be zebûn  
Esrînê ama rast we rûy Xatûn**

**569.Ce tebi germî esrîni Bengîn  
Xatûn bêdar bî ce xawi şîrîn**

**570.Awaz kerd we Mem Xatûn bê saman  
Horêze bidîye çêş pêman aman**

**571.Çawûşi Emîr niştên ce laman  
Namûsiman şî ta axirzeman**

Bengîn bi lez kete hundur û dîna xwe dayê ku her du dildar ketine xewa sermestîyê û hay ji bayê felekê nînin. Bengînî gazî kir:

“Hey Emîrê neagadar, ey razayê nehişyar, zû rabe, agir bi cîhanê ket. Zû rabe! Mîr Zînedîn bi leşkerî va geheştin nava ‘hesarê û ji hespî peya bû jî û wa ye ber bi serayê tê. Suwaran hesp kişandin yextirmexaneyan û kumik kişandin serê şahîn û seqran. Hema va ye Mîr hindik maye bikeve hundur.”

Lê Memê ji xewa sermestîyê ranebû. Bengîn bi gazîkirina xwe ra dest bi girînê kir. Hêsiyek ji çavê Bengînî kete ser rûmetê Zînê. Zîn ji germîya wê hêsiyê ji xewa şîrîn vciniqî û deng li Memê kir:

“Memê! Memê! Ji xewê rabe! rabe mêze ke ka çi hate serê me! Rabe çawûşê Mîr va ye li ser serê me ra rawestayê. Namûs û heyaya me çû, em heta hetayî bê averû bûn.”

**572.Mem çun guşad kerd nergisi şehla  
Dîş ke Bengînen îstaden we pa**

**573.Feruxi Emîr ce amay ew yar  
Axir serencam ama ne goftar**

**574.Wat nîyen çawûşi Emîr ey nazdar  
Bengîn goşamen yari wefadar**

**575.Watiş ey Emîr nîyen cay guzer  
Xatû Zîn ce peşt wêt pinhan biker**

**576.Herweqt Mîr ama mexêze we pa  
Azardarinî nedarî gunah**

Memê çavên xwe yên nêrgizîn û belek ji wê xewa şîrîn vekirin û dîna xwe dayê ku Bengîn wa ye li ser serê wan ra rawesta ye. Emîrê bextewer ji hatina wî dostê xwe yî canî canî

(şad bû) û gote Zînê: “Hey nazdarê netirse, ew ne çawûşê Mîr e, ew Bengîn e. Bengîn xulamê me yî emekdar e.”

Bengîn gotê: “Memê êdî rêya derbasbûn û revê nema. Zînê li pişt xwe da veşêre û dema ku Mîr hat, ji cî ranebe. Tu nexweşî û nerabûna te ji te ra nabe sûc û tawan.”

#### XXXIV.

**Zînê di bin kurkê Memê da ye û Mîr û giregire li ser da peya dibin**

**577.Wust ne rûy qefa Xatûni zulfdêz  
Poşa we balaş kurki qaqumbêz**

**578.Nagah çawûşan aman be eywan  
Dûrbaş dûrbaşîş yawa be keywan**

**579.Peya bî ce esp Emîr der zeman  
Pa nîya we ferşi oday dîwexan**

**580.Seşam kerd û Mem ‘eleyk da ciwab  
Nexêza we pa xeylê kerd ‘etab**

**581.Porsa ce azar Emîrî hêca  
Çagî durustî elhemduflah?**

**582.Ama we goftar şahî nîkibext  
Watiş be şadî bimanî we text**

**583.Xeylê naçağim sexten azarim  
Ce sextî azar nîyen qerarim**

**584.Do‘ a kerd Emîr be şidq û wefa  
Umêd hen Xuda pêt dero şefa**

**585.Mem watiş çirağ şahî giran bo  
Têgî ce ferqî doşmen bîran bo**

Memê Zînê ew xatûna porreş li pişt xwe da veşart û kurkê xwe yê semûrî avîte ser xwe û Zînê.

Nişkava çawûş hatin eywangehê û dengê dûrkeve dûrkeveya wan giheşte ber perrê asimanî. Emîr di gavê da ji hespê peya bû û pê danî ser mafûrên odayên dîwanxanê. Mîr silav kir û Memê bersiva wî da, lê ji cî ranebû û gelekî lome li xwe kirin. Mîrê hêja ji rewşa wî pirsî û gotê: “Gelo tu baş î, tendurust î?”

Memê di bersiva Mîrî da got: “Ey şahê xoşbext, tu her bi şadimanî li ser text bimînî. Ez gelekî nexweş im, derdê min giran e. Li ber vî derdî hedûra min tune.”

Mîr bi dilekî pak û durust jê ra du'a kir û gotê: "Hêvîdar im Xudê yê şifayê bide te."

Memê gotê: "Hêvîdar im ku çiraya dewlet û şahtîya te dê herdem ronahî be û şûrê te dê li ser serê neyaran herdem tûj û birran be."

**586.Îke çun de'wat Emîr bî tamam  
Inbar Taceddîn ama ne kelam**

**587.Be îşar û remz ama ne goftar  
Îşaretîş kerd we Mem nehanwar**

**588.Mîr seলামîş kerd nexêzay we pa  
Bênamûsît kerd ne herdû donya**

**589.We xebbî zuban 'erz kerd we Tacdîn  
Xeberdariş kerd ce haļati Zîn**

**590.Çun dana Tacdîn waqif bî ne kar  
Xatûn nişan daş dû gîsûy nazdar <sup>286</sup>**

**591.Îşaretîş kerd we 'Efo û Çeko  
Bişo we xane bidewani do**

**592.Waçe we Estî tîfli gehware  
Bawero we ber we bê medare**

**593.Ateş bidero sera û dîwexan  
Xatûn ce qefay Memen ce dîwan**

**594.Be Bengîne wat bedîye ne dîyar  
Herweqt zahir bî wenet nûri nar**

**595.Hana bawere pey Mîri guzîn  
Waçe soçîya xaney Taceddîn**

Li vir dema ku du'ayên Mîrî qedîyan, vêca Tajdîn dest bi axiftinê kir û bi hejyare û amaje û bi penîve gote Memê: "Mîr ji der da hat û silav kir, tu çima ji ber va ranebûy? Te bêtoretîyeke mezin kir."

Memê jî bi zimanê amaje û hejyareyan Tajdîn ji rewşa Zînê agadar kir û serê her du kezîyên Zînê dizîva nişanî Tajdînî dan. Dema ku Tajdînê zana ji rewşê agadar bû, amajeyî Çeko û 'Efoyî kir û gote wan: "Zû bi rev herin malê, bêjin Sitîyê bila dergûşê ji mal derxe û agirî berdîn malê. Bêjinê Zîn di rewşeke xerab da ye."

<sup>286</sup> Ev nîvmalika debîya weha ba: „Nişan daş dû gîsûy xatûni nazdar“ lê di destnivîsê da wisan hatibû, me jî dest tê werneda.



Gote Bengînî jî: “dîna xwe bidê, te ku ronahîy agirî dît zû were hewariyê bide Mîr û bêjê agir berbû mala Tajdînî. ”

**XXXV.**

**Tajdîn ji bo rizgariya Mem û Zînê mala xwe agirdadayî dike**

**596.Înbar bişnewe ce ‘Efo û Çeko  
Yawan we xane şêrani şiko**

**597.Warid bîn we ca her dû be rastî  
Mudde‘ a watin we Xatûn Estî**

**598.Bidîye çêşîş kerd xatûni dulber  
New dem gehwareş berawerd we ber**

**599.Ne çehar canib xane seranser  
Ahir da ahir seqf û bam û der**

**600.Şêraşey ahir bew tewr kerd eşer  
Goşey nar yawa we çerxi exzer**

**601.Weneş me‘ lûm bî Bengîn goşey nar  
Hanaş kerd hana ew we bê qerar**

**602.Watiş ey mîran supahansalar  
Seranser cehan girtin goşey nar**

**603.Eger Mîr biwêş neşo bê midar  
Xaney Taceddîn soça çenî şar**

Vêca ji ‘Efo û Çeko bibihên. Dema ku ew şêrên bi heybet gehîştin malê, daxwaza Tajdînî ji Sitîyê ra gotin. Sitîyê zû dergûşa xwe hilda û ji malê derket. Çeko û ‘Efo agir berdane malê. Agirî ji çar alîyê xanîyî ra gurî veda û pêtiyên agirî çûn ber perê asimanî. Dema ku Bengînî pêtiyên agirî dît: Da gazî û hewaran û got:

“Hey gelî serdar û serleşkeran, ay hawar e agir berbû mala Tajdînî. Eger Mîr bixwe neyê, mala Tajdînî ku şewitî hêç, agirê ber be bajêr jî.”

**604.Emîr êd şineft horêza we pa  
Temam îhzarat rahî bîn ne rah**

**605.Dîşan goşey nar yawan be gerdûn  
Rûy şêraş kerdin we zûlmatî tûn**

**606.Carçî caîş da bêldaran tamam  
Merduman yawan we seqfi ser bam**

**607.Muezzin wanaş Elehû Ekber  
Berz bî goşey nar çûn narusseqer**

**608.Çend hezar goze û cildani piş ab  
Rêzinan ne rûy şeraşey piştab**

**609.Ta ke derengê koşîş bî ne kar  
Axir serencam kuşîya kûrey nar**

**610.Belê ne otaq Taceddîn ne ca  
Esbabê nemend tamam soçîya**

**611.Ne rext ne eşîya ne ez hubûbat  
Temam bî we gerd ne rûy ser besat**

Dema ku Mîr ew hewarîya bihîst, rabû ser xwe. Amadebûyên dîwanxanê hemû bi Mîrî ra derketin derva û hewarîya mala Tajdînî da çûn. Dîna xwe danê agir wisan bi malê ketîye ku pêtiyên wî diçin ber balê gerdûnê. Li ber dükela wî agirî rûyê erd û asimanî reş û heş bûye.

Carçîyan car kişandin, girse ber bi mala Tajdînî çû. Bêldaran belê xwe hildan û hatin bo vemirandina agirî. Bangbêjan banga Ellahû Ekberê ser dan. Girseya gel bi hezaran kûzik û pêstikên avê li ser derûbanên mala Tajdînî da rijandin. Ta derengê şevê gel bi agirî da ketin. Li dawîya dawîyê agir vemirandin, lê çî tişt ji Tajdînî ra nema. Ne ode ma, ne xanî, ne nivîn û ne xwarek, ne dexl û ne dan, hemû bûn toz û li ber bayê ketin.

### **XXXVI.**

**Bi ferman Mîr barebûyê ji Tajdînî ra berhev dîkin, lê Beko barebûyê nade û sira  
Mem û Zînê û agirpêketina mala Tajdînî ji Mîr ra ser ve dike.**

**612.Emîr bifermaş we gişt serweran  
E'ila ta edna karsazîkeran**

**613.Xaney Taceddîn yekser bî we dûd  
Mibo bikerîş cumle barûbûd**

**614.Ce fermay Emîr herkes ce layê  
Maşdar û bêmaş her ta gedayê**

**615.Kerdin barûbûd Qere Taceddîn  
Ko ko zeş û sîm ko bî ne zemîn**

**616.Dû sê çendane maşîşan cem kerd  
İltifati Mîr ce hesab wîyerd**

Mîr gote hemû serwer û karisazan, ji mezinan heta biçûkan, ji dara û nedaran, mala Tajdînî şewitî, yekser bû dûkel û li ber bayê ket, hûn debê yarmetî û barebûyê ji Tajdînî ra berhev bikin.

Bi fermana Mîrî ra , herkesî, ji dara û nedaran, maldar û bêmal û heta parsekan barebûya Tajdînî kirin. Di demekê da komên zêr û zîvan weke çîya li erdê kom bûn. Du sê carî mal û hebûna Tadînî jê ra barebû berhev bû. Mîr bixwe jî hemîn dilovanî û berêxwedana wî sînor bezandî.

**617.Goş bider we Mem çenî Xatû Zîn  
Ce seray Emîr ce yek coda bîn**

**618.Desmaļê ce Zîn be ca mend new ca  
Bekir penhan bê ... ne ew qeha <sup>287</sup>**

**619.Derdem h azir b  horiř girt desmaļ  
Wat midoř we dest M iri berziqbal**

Guhdarî bike ka dema ku Mem û Zîn di seraya Mîr da ji hevdu cuda bûn,(çi qewimî) wê demê desmaleke Zînê li dewsa wan ma. Bekir ku xwe li goşeyeke dîwanxanê da veşartibû, banz da ew desmala Zînê hilda û got, ez ê vê desmalê bideme Mîrê bextewer.

**620.Ih zari meclis gird b  per san  
Herkes  liwan we cagey w san**

**621.Em r hem ama we ca girt qerar  
Teļeb kerd Bekir merd di mirdar**

**622.R  kerd we Bekir ane yan   eř  
E   la ta edna misk n   derw ř**

**623.Ama we hanay yaney Tacedd n  
To namay bew ca rast wa e yeq n**

**624.Qeyd  nedaro namat berkenar  
Dara   nedar muflis   maļdar**

**625.Herkes we pay w ř k řa  eramet  
Ne eramet day ne k řay zehmet**

Amadeb y n d wan  hem  belaw b n. Herkes  une mal n xwe. M r j  hat   li c y  xwe da r niřt   gazi Bekir  merd di mirdar kir. M r ber  xwe li ser Bekir da kir   got :

---

<sup>287</sup> Ev n vmalika di destniv s  da weha hat ye, d yar e ku niv řkan   b wate ye. Me dest t  wer neda.

“Eva yanê çi? Mezin û biçûk, dara û nedarên bajêr di hewarîya mala Tajdînî da hatin, ya rast bêje ka tu çira nehatî? Hê nehatina te qet, em dikarin ewê danên layekî, lê xelkê bajêr ji dara û nedar û maldar û bêmalan herkesî bi pêka karîna xwe bêşa mala Tajdînî kişandin û barebûya xwe dan, te ne barebû da, ne jî zehmet kişand, çima?”

**626.Rû kerd we Emîri emîrani pêş  
Ama we goftar ew merdi bedkêş**

**627.Kesê xaney wêş bisoço be wêş  
Min pey çêş midon geramet perêş**

**628.Emîr ce razani Bekir bî sersam  
Watiş rast waçe halî bûn tamam**

**629.Bekir ‘erziş kerd temenna û waço  
Î soxen ce lay şahê wêney to**

**630.Watiş biwaçe Belê muxteşer  
Ne rûy rasitî be bê derdîser**

Bekir ew mêrkê bedmezheb berê xwe li ser Mîrê mîran da kir û gotê:

“Kesê ku mala xwe bi destê xwe bişewitîne, ez ê çirra bêşa wî bikişînim?”

Mîr ji gotinên Bekirî sersam û gêj bû û gotê:

“Ka ya rast bêje, min halî bike ka tu çi dibêjî?”

Bekir daxwaza lêbihorînê ji Mîrî kir û got:

“Ez ê bêjim lê ev gotina min bila li bal te bimîne.”

Mîrî gotê:

“ Bêje , lê bi kurtî bêje ka tu dê çi bibêjî?”

**631.Ama we goftar Bekir bêqerar  
Wat ewro Emîr berşî we şikar**

**632.Behaneş saza Mem girteş aram  
Nama we şikar Emîrî enam**

**633.Wêş wust we azar zwîr û matem  
Pey êd kerd çenî Zîn yawan we hem**

**634.Ewro şay Emîr ama ce şikar  
Zîn ce poştî Mem girte bê qerar**

**635.Cew bone ce amat nexêza we pa  
Herdû hazir bîn ne dîwani şah**

**636.We efsûngerî herdûşan yeqîn  
Halî kerdişan Qere Taceddîn**

**637.Cew pey ateş da yane û dîwexan  
Ta necat yaban ne cagey dîwan**

**638.Er be herfi min nedarî beqa  
Ye desmaşi Zîn mende bê be ca**

Bekirê nevehbyayî got:

“Îro dema ku Mîr çûbû nêçîrê, Memê derewda xwe li nexweşîyê avîtîbû. Wisan kir ku li malê da bimîne û here cem Zînê û ew û Zîn bigîjin hevdu. Dema ku Mîr ji nêçîrê zivirî û hate dîwanxanê, Zînê xwe li pişt Memê da veşartîbû, lewra dema ku Mîr hate hundur, Mem li ber va ranebû. Îro Mem û Zîn her du jî li dîwana Mîr da bûn. Herdukan bi amaje û efsûnkarî Qere Tajdîn ji rewşa xwe agadar kirin. Tajdîn bona rizgarîya wan agir berda mala xwe. Eger Mîr bi gotinê min bawer nake, kerem ke eva jî desmala Zînê ye ku li dewsa wan mabû.”

**639.Emîr ce Bekir şineft î xeber  
Doşnam daweneş wat ey bedguher**

**640.Nayab ber ne çem rûsîyay bedgo  
Mem ce ko bîyen Xatû Zîn ce ko**

**641.Royê sed desmaş Xatûni ‘ezîz  
Mido we xeşqan we ehli kenîz**

**642.Er carî henî maçî î goftar  
Qesem we bêçûn daray cehandar**

**643.Sezayêt midon we sezay zehmet  
Biwaçanewe ta roy qîyamet**

Dema ku Mîr ev gotinane ji devê Bekirî bihîstin, dujîn danê û gotê:

“Here rûreşê bedbêj û bedgewher, careke din van gotinane nebêje. Zîn li ku, Mem li ku? Xatû Zîn rojê sed desmalên wisa dide keniz û kulfetan. Eger careke dî ez van gotinane ji devê te bibihêm, sond bi wî Xudayê xudanê cehanê, ez ê sizayeke wisan bideme te, ku ta roja qîyametê bête gotinê.”

**644.Be qar xêzîya Bekiri bedkar  
Şî wat we tiflan pey faşî î kar**

**645.Midon penetan çend xurmay şîrîn  
Waçe Mem dîman çenî Xatû Zîn**

**646. Ne her ca tiplê ke mida dîyar  
Miyawa we laş Bekir bêqerar**

**647. Xurma mida pêş te' ilîmiş mekerd  
Ta girdîn tiplani Cizîr tamam kerd**

Bekir bi qehr ji cî rabû û ji bo eşkerekirina vê razê çû li nav bajarê Cizîrê çend zarû li dora xwe berhev kirin û gote wan:

“Ez ê her yekê we çend xurmayên şîrîn bidime we, hûn bêjin me li seraya Mîr da Mem û Zîn bi hevra dîtine.”

Li her kê derê ku wî zarrokek bidîta, dihate cem wan û xurama didane wan û ew fêr dikirn ku bêjin me Mem û Zîn di gel hev dîtine. Bi wî cureyî Bekir zarokên Cizîrê hemû fêr kirin.

### XXXVII.

**Beko bi rêka zarokan sira Memê û Zînê li nav bajêr da bilaw dike û Mîr pê dihesê û  
rêçareyê ji Beko dixwaze**

**648. Royê suwar bî Emîr pey şîkar  
Dîş tiplan maçan ne kûçe û bazar**

**649. Ne seray dîwani emîrani Cem  
Mem û Zîman dîyenan we hem**

**650. Emîr êd şîneft ber pêça 'inan  
Nereft ew şîkar ama we dîwan**

**651. Teleb kerd Bekir watiş ey merdûd  
Ey kare ce herfi to bîyen mewcûd**

**652. Encamiş yawan be xerab î kar  
Fikrê lêş kere bikereş teyar**

**653. Hem mibo me' ilûm bidarî yeqîn  
Goftarani wêt watey Xatû Zîn**

Rojekê ku Mîr diçû nêçîrê, bihîst ku zarrû li kûçe û kolanên bajêr da dibêjin. Me li seraya Mîr da Mem û Zîn bi hevdu ra dîtîn. Dema ku Mîr ev gotinane ji devê zarokan bihîst, dizgîna hespê xwe bada û neçû nêçîrê û zivirî hate dîwanê û Bekir xwaste dîwanê.

Mîr gote Bekirî:

“Ey merdûdê bedkar, ev gotinane hemû karê te ne, te ev gotin belaw kirine. Zû hizrekê ji vî karî ra bike! Dîyar e evana hemû gotinêne te ne, ku li ser Xatû Zînê têne gotinê.”

**654.‘Erz kerd we xidmet Emîrî enam  
Tedbîriş êden bizane tamam**

**655.De‘ wet bikere yaran çenî Mem  
Be‘ dez nanwerden nerd bawer we cem**

**656.Ne weqti oyîn germey nerdbazî  
Mibo teswîrê ne diş bisazî**

**657.Dû sê ferd waçe we Mem û yariş  
Ne rûy istihza bido azariş**

**658.Cew dem bişnew we istihzay dulber  
Agehdar nîyen ce xeyr û ce şer**

**659.Ejebet herfê bed miyoş be zuban  
Be nami Xatûn ew ne rûyi dîwan**

**660.Herweqt me‘ ilûm bî ce Mîr û e‘ iyan  
Heramzadenan ce qapîy şahan**

**661.Cew dem biferma daş ne rûyi têg  
Ladê ce koştîş mekere derêg**

**662.Ĥerfê nedaron padişâ û geda  
Razişan nîyen ce herfi bedrah**

Bekirî got:

“Çara vî karî ew e ku tu Memê û hevalên wî vexwînê dîwanê û piştî nanxwarinê bi Memê ra nerdekê bileyzî. Di germegerma lîstina nerdê da, wêneyekê di dilê xwe da bikêşe û du sê xeberên tund ji Memê û yara wî ra bêje û bi tirane wî biêşîne. Eger di wê demê da tu tiraneyê xwe bi dildara wî bikî, ew di wê demê da hay ji xwe namîne û dê xwe şaş bike û gotinên ne li rê bêje û navê Xatû Zînê biîne ser zar û zimanê xwe. Dema ku ewî navê Xatû Zînê anî, hemû giregire dê bizanin û bibînin ku ew heramzade ye û bi çavekî xerab li Zînê dinêre, hînga tu çi biînî serê Memê, kesek lomeyan li te nake. Dema ku ew navê dildara xwe biîne û ji dîwanîyan ra eşkere be, ku ew mirovekî xerab e, hînga wî bide kuştinê. Êdî kes nikare li dijî wî karê te derkeve jî.”

### **XXXVIII.**

**Mîr bi pîlanên Bekir Memê vedixwîne leyza kişikanê û pevçûna Mîr û mazûvanên**

**Mem û rizgarbûna Mem ji kuştinê**

**663.Emîr çun şineft de‘ wet kerd yaran  
Be emri qudret yawan be dîwan**

**664. Weqti şam ama sofre awerden  
Şehd û met' ûmat tenawol kerdn**

**665. Ne weqti amay qeliyan û qawe  
Mîr Zîndîn demê dîya we lawe**

**666. Fermûd text û nerd baweran we cem  
Arezûm nerden aro çenî Mem**

**667. Awerden texte nîyan we zemîn  
Daşan qerar dan ne xaney rengîn**

**668. Dû sê meratib şanan daşi nerd  
Emîr wat we Mem biwaçe yek ferd**

Dema ku Mîr gotinên Bekirî bihîstin, Memê bi hevalên wî va vexwende dîwanê. Bi fermana Mîr ew hatin dîwanxanê. Dema şîvê hat, sufre raxistin. Xwarekên xweş xwarin. Li dû ra dema qeliyan û qehweyê hat. Mîr Zînedîn ferman da û got: Ji me ra textenerdî biînîn, îro dilê min dixwaze ku ez bi Memê ra texteyekê bileyzim.

Bi fermana Mîr textenerd anîn û danîn ber Mîr û berikên wî li xaneyên wî yên rengîn da serrast kirin. Du sê caran zar avêtin. Mîr berê xwe li ser Memê da kir û gotê:

“Memê ca tişteke bêje kanê?”

**669. Wat nimezanûn çêş waço Emîr  
Bûyer ce gunam bê 'uzr û teqşîr**

**670. Emîr wat îmro dînan yari Mem  
Wêney 'ecûzan başaş bîyen xem**

**671. Goşîş wêney mûş sûraxi dîwar  
Kerîhulmenzer gëlîz û mirdar**

Memê got:

“Mîrê min, li min bibore, ez ji mebista te tenegehîştim.”

Mîr got:

“Min îro dildara Memê dît, yeke mîna pîrejînan pişthoçik e. Guhê wê wekî guhê mişkên dîwaran bi pirç û pir zişt û kirêt e. Yeke qelew û pîs û pintî û hilhopanî ye.”

**672. Cew dem Xatû Zîn migêla şerab  
Mem çun Xatûn dî cergiş bî kebab**

**673. Rû kerd we Emîr be sed qar û qîn  
Watiş ey Emîr nadîrey guzîn**

**674. Yarim Xatû Zîn doxti emîran  
Emîr Awdeli guzîdey şîran**



**675.Hemşîrey Emîr Zîndîn miwanan  
Ûesretmendişen şahani cehan**

Di wê demê da Zînê di dîwanê da meygêrî dikir. Dema ku Mîr wisan got, çavê Memê li Zînê ket, agir berbû dil û cigera wî. Bi kerb û kîn bersiva Mîrî da û got:

“Yara min Xatû Zîn e, qîza şêrê bijare Mîr Avdel û xûşka Mîr Zînedîn e. Hemû şahên cîhanê ‘hesretmendên wê ne.”

**676.Taceddîn ejnî rû kerd we Emîr  
Watiş mewaçe herfi naguzîr**

**677.Ye çêş miwaçî mer hoşit nîyen  
Hoş û fikr û fam ce lat berşîyen**

Gava ku Tajdînê ev gotina ji Memê bihîst, xwe lê tûre kir û gotê:

“Xeberên nepîvayî nebêje! Tu çi diaxivî, ma te hişê xwe derdaye?”

**678.Ama be zuban Emîrî enam  
Zuwanim gelet awerd î kelam**

**679.Amam biwaçûn we Melek Reyhan  
Ya Xatûn Estî ne şay perîyan**

**680.Leng bî zuban mendim bê zeban  
Awerdim ismi Xatûni zeman**

Memê got:

“Bibore, min xwast ku ez bêjim yara min Melek Reyhan e, yan Sitî xanima seroka hûrî û perîyan e, lê zimanê min xelîtî û leng bû, min ev gotina got û min navê Zînê anî.”

**681.Emîr çun şîneft ferma bêqerar  
Der sat ce dîwan bikuşîş be zar**

**682.Taceddîn xêza dest da we xencer  
Qesem bo be zat padişay ekber**

**683.Herkes berxêzo ce qesri camrêz  
Xelaşîş nîyen ce eļmasi têt**

**684.‘Efo berama tundî kerd ne kar  
Girtebê be dest têtî abidar**

**685.Herkes arezûy kuştay Mem kero  
Bîlah be destim siza mawero**

**686.Çeko beğurîan ama ce dîwan  
Girtebê we dest têtî bê eman**

**687. Herkesê ‘ ezmiş kuştay Emîren  
Bey têgi elmas laşes esîren**

**688. Bengîne derdem ahir giŕa lêş  
Destiş da we têg bê xewf (û) endêş**

**689. Rû kerd we Emîr yari wefadar  
Qesem we bêcûn padişay muxtar**

**690. Herkes ne cakeş berxêzo we qar  
Mipêkûn we têg şeh û şehriyar**

**691. Derdem horgirtin Emîr bêqerar  
Ta şîn we yane negirtin qerar**

Dema ku Mîr ew gotina ji devê Memê bihîst, ferman da û got:

“Zû evî bêtoze bikujin.”

Tajdîn ji cî rabû û dest avête tetika xencerê û got:

“Sond bi zatê Xudayê mezin, herkesê di vê dîwana şûşebednkirî da ji cîyê xwe rabe, rizgarîya wî ji vê xencera elmasîn û tûj tune.”

‘Efo dest avêt şûrê xwe yê bi jehrê avdayî û gef xwar û got:

“Sond bi Xudê, her kesê qesta kuştina Memê bike, ez ê a li vir sizaya wî bidemê da.”

Çeko şûrê xwe kişand û li dîwanê nîrrand û got:

“Her kesê ku qesda Memê bike, laşê wî dê bi vî şûrê elmasî let letî bibe.”

Agir bi Bengînî ketibû. Ewî jî dest havête şûrê xwe û xwe da rex Memê û got:

“Sond bi Xudayê muxtar, her kê bi kîn ji cîyê xwe rabe, ez ê Mîr bi vî şûrê bihingêvim.”

Her çaran di gavê da Memê dane nav hev û ew hilgirtin û ji dîwanê derxistin û birin malê.

### **XXXIX.**

**Pîlana Bekir ji bo dîrxistina hevalan ji Memê**

**692. Ewşew Mîr Zîndîn hiç nekerdi xwab  
Ce xewfi yaran şîrani piŕtab**

**693. Seher zû Bekir teşeb kerd emîr  
Bidîye çêşit kerd merdûdi bêpîr**

**694. Tedbîr bikere ta çûn mibo çûn  
Werne we têgê merêzinût hûn**

**695.Ce no sazina funûn bê midar  
Rû kerd we Emîr wat ey şehriyar**

**696.Tedbîriş êden awaz ker yaran  
Bidere we Mem Xatûn ser zuban**

**697.Celeban û pûş ba dermalane  
Bider we Tacdîn perê behane**

**698.Herweqt rewan bî Taceddîn rahî  
Bikere we Mem herçi wêt xwahî**

Wê şevê ji tirsî wan şêrên bihêz û zoremend da xew nekete çavên Mîr Zînedînî. Sibêde zû gazî Bekirî kir û gotê:

“Ey merdûde bêpîr, dîna xwe bidê, ka te çi kir! Zû tevbîrekê bike, tu tevbîrekê nekî, ez ê bi vî şûrî xûna te birijînim.”

Bekir ser ji nû tevbîreke dî saz kir û berê xwe da Mîr û gotê:

“Tevbîr ew e ku tu hevalên Memê vexwîni û serzarkî bêjî wan ku min Zîne da Memê. Ê bi qestî ji Tajdînî ra jî bêje, min baca celebane, pûsane û dermanlaneyê jî da te, here ji xwe ra berhev bike! Hînga Tajdînî bişîne bila bi birayên xwe va here bacê berhev bike. Mem jî mêvan e, bila li vir bimîne. Dema ku ew çûn, Memê tenê li vir dimîne. Hînga dilê te çi xwast tu dikarî bi Memê bikî.”

**699.Qebûl kerd tedbîri Bekir çun Emîr  
Teleb kerd aman yarani dişîr**

**700.Wat we Taceddîn xaşirit bo cem  
Xatû Zîn bexşam yekbare we Mem**

**701.Taceddîn ejnî ce Emîr kelam  
Damanîş bosa be sed îhtiram**

**702.Rû kerd we Taceddîn emîri namdar  
Ferda rahî ber megîre qerar**

**703.Qanûni îlat ba dermaşane  
Ha bexşam we to pey wêt bistane**

**704.Çun Mem mêhmanen bimano ney ca  
Hazar bo ce lam ce gah û bigah**

**705.Ta be xeyrîyet bazigeşt mibûn  
Esbabi şadî durust mikerûn**

Mîr gotinên Bekirî pejirandin. Li ser tevbîra Bekirî Tajdîn û birayên wî vexwande dîwanê û gote Tajdînî:

“Bila dilê te hêsayî be, çî xeman mexwe, min seb xatirê te Zîn da Memê”.

Gava ku Tajdînî ev gotina ji devê Mîrî bihîst, ji cî rabû û ji bo rêzlêgirtinê koşa ‘ebayê Mîrî ramûsa.

Mîr berê xwe li ser Tajdînî da kir û gotê:

“Ez baca îsal ya ‘eşîretan ji bo mesrefa zemawendê dibexîşime te. Sibê rê bikeve û here nav ‘eşîr û êlatê baca salane ji xwe ra berhev bike. Memê jî mêvan e, bila li vir bimîne û car û bar bête bal min ta ku tu bi xêr û xweşî zivirî û te karê zemawendê kir.”

**706.Ce new Taceddîn horêza we pa  
Ce rûy bendegî bosa desti şa(h)**

**707.Mubarekbadê xêza ce meclis  
Xatîr cem kerdin yarani mûnis**

**708.Sakin bîn ewşo be xatîr guşad  
Àem û xeyalên tamam dan we bad**

**709.New dem ke çulû‘ ro bî aşîkar  
Taceddîn we espi tazî bî suwar**

**710.‘Efo ba Çeko şîrani şîkar  
Birdiş çenî wêş Bengîni namdar**

**711.Himmetxwayîş kerd ce şahî Emîr  
Wat xaney wêten bê ‘uzr û teqşîr**

**712.Herçi wêt xwahî fa‘il ber muxtar  
Herçi ‘ezmiten bawere ne kar**

**713.Mem wat ihtîyac bey herf nedarû  
Girditan be zat Xuda mesparû**

**714.Rewan bîn derdem pey ‘ezmi bîrûn  
Bidîye çêşîş kerd çerxi piř funûn**

Tajdîn dîsa ji cî rabû û çû destê Mîrî maç kir û benîtiya xwe ragehand.

Dengê pîrozbayîyê ji dîwanê bilind bû. Tajdîn bi birayan va kêfxweş bûn û bêhna wan hate ber wan.

Hemûyê ew şeva bi bêhneka fireh derbas kirin û xem û xeyalên xwe dane bayê.

Taze tav hildihat ku Tajdîn li hespê Erebi suwar bû, Çeko, ‘Efo û Bengîn jî pê ra suwar bûn. Tajdînî gote Memê:

“Bi xatirê re. Ji me ra du’ayê xêrê bixwaze. Em diçin, mal mala te bixweye. Çi ji te ra pêdivî be, bike û bistîne, tu bi dilê xwe yî.”

Memê gotê:

“Pêdivî bi wê gotinê nîne, ez we hemûyê dispêrim zatê Xudayê mezin. Xudê di gel we be!”

Tajdîn bi hevalan va ji bajêr derketin. Em dîna xwe bidenê ka çerxa feleka pir dek û dolab dê çi bike û çawa bizivirre.

## XL.

**Dîsan pîlana Bekir û kişikanêya Mîr û Mem û xapiyana Zînê û hatina wê li ber pencerê û derdana Memê**

**715.Çend rozê guzeşt ne mabeyni kar  
Ce no sazina seharî û bedkar**

**716.Zîndîn zîyafet durust kerd pey Mîr  
De<sup>c</sup> wet kerd ew ro Mîri bênezîr**

**717.Liwa we xidmet Emîr çun şay Mem  
Niştin beraber herdûşan we hem**

**718.Weqti şam ama sofrê awerdin  
Elwan te<sup>c</sup> aman noşi can kerdin**

**719.Qeliyan (û) qawe ama ne dîwan  
<sup>c</sup>Ezmi nerdbazî ama ne meydan**

**720.Nerdişan awerd aman be dişwaz  
Mem çenî Zîndîn oyîn kerdin saz**

**721.Mem wat we Emîr dişwaz bo we hem  
Zîndîn wat beşê bo we bani çem**

**722.Dû sê mertebe kerdişan oyîn  
Mîr eglebiş kerd ce Emîr Zîndîn**

Çend roj li vê maweyê derbas bûn. Mîr û Bekir ser ji nû dest bi sazkirina sê’hrbazî û bedkarîyê kirin. Mîr Zînedînî mêvandarîyek danî û Mem vexwande dîwanxanê. Memê çû xizmeta Mîr. Herdu li himber hev rûniştin. Dema şîvê hat. Sufre raxistin. Xwerinên rengareng noşi can kirin. Qeliyan û qawe hate dîwanê. Li dû ra daxwza nerdbazîyê hate helêxistinê. Textenerd anîn, Mem û Mîr li himber hev rûniştin û dest bi leyzê kirin. Memê gote Mîrî, em ê şayîndilxwaz bileyzin. Mîrî got: Bila be li ser çavên min. du sê destan leyistin. Lê hercar Memê ji Mîr dibir.

**723. Bekir cew dem da fikrê kerd ne kar  
Şî we enderûn nekerdiş midar**

**724. Wat be Xatû Zîn ne rûy behane  
Mîr ferman beyo we dîwanxane**

**725. Ne rûy pencere menzûr bidero  
Çenî Mem dişwaz setrenc mikero**

**726. Derdem berama Xatûn wêney mah  
Ne rûy pencere mikerdiş nigh**

**727. Ewro şay Emîr xeylê bî galib  
Şah we yek oyîn hîç nebî talib**

**728. Ce amay Xatûn waqif nebî Mem  
Ce qeşaşewe menzûr dabê çem**

**729. Rû kerd we Bekir çêş aman biwêm  
Îmro hîç nerdê nimeyo perêm**

**730. Ama be ciwab Bekir serencam  
Wat tebdîl keran herdûtan meqam**

Di wê demê da Bekirî hizrek kir. Çû heremserayê û derew da gote Zînê: Mîr fermoye ku were li pencera dîwanxanê ra li leyza min û Memê binêre.

Xatû Zîn di gavê da hat û weke hîvekê li ber pencerê rûnişt û li leyza Mîr û

Memê temaşe kir. Wê rojê Memê çendîn caraî ji Mîr bir. Mîr qet destekê jî ji Memê nebiribû. Memê hay ji hatina Zînê nebû. Zînê li pişt wî ra dîna xwe dida leyza wan. Mîr berê xwe li ser Bekirî da kir û gotê:

“Çi ji min hatîye lo, îro ez qet nikarim bilîzim.,,

Bekirî bersiva Mîrî da û got:

“Hûn her du debê cîyên xwe li hevdu biguhorin.,,

**731. Iqametiş kerd Mîr Zîndîn derdem  
Mîr we cay Emîr, Emîr we cay Mem**

**732. Niştin herdûşan beraber ne ca  
Emîr boşend kerd dû çêşmi şehla**

**733. Dîş we çem Xatûn ne rûy pencere  
Erwaşîş liwa ce ten yeksere**

**734. Çêşmiş mu' eleq derûniş piş renc  
Nemedîş we çem xanani setrenc**

**735.Nimezanaş daş ferz û kol kamen  
Rox û şah ce kam caşan meqamen**

**736.Daşani setrenc meşana yekser  
Emma ce derûn hîç nebêş xeber**

**737.Çend oyîn ce beyn herdûşan wîyerd  
Axirelencam Zîndîn girew berd**

**738.Rû kerdiş we Mem Emîr we razî  
Watiş nesendim daw destibazî?**

**739.Ama be ciwab Emîri gembar  
Haşayîm nîyen ce liway î kar**

**740.Her idi' at hen biwaze we kam  
Ixtiyar darî baqî wesselam**

Mîr Zînedîn di gavê da ji cî rabû. Mem hate dewsa Mîrî û Mîr çû li dewsa Memoyî da rûnişt. Herdu li himber hevdu da rûniştin. Memê çawa serê xwe bilind kir û çavên xwe yên belek vekirin, Xatû Zîn dît ku li pencerê rûniştîye û li wan mêze dike. Canê wî yeksere ji leşê wî derket. Çavên wî belloq man û dilê wî tijî derd û êş bû. Êdî xaneyên kişkikanê ji hevdu nenasîn. Êdî nizanî ka ferz kîjan e û peyak li ku ye û cîhê rex û şah li hevdu nenasî. Kevirên xwe yek ji dû yekê derdan. Lê hay ji bayê felekê nibû. Piştî çend destên leyzê Mîr Zînedînî girav jê bir. Mîr bi qudetî li Memê nihêrî û gotê:

“Ma min leyz ji te nebir?”

Memê gotê:

„Ez mandel nakim, min derda. Her daxwazeke te hebe kerem bike bêje, ez li xizmeta te da me.“

## **XLI.**

**Bi fermana Mîr, Zîne destê Memê kelepçe dike û Memê davêjine zindanê**

**741.Ferma we Xatûn bo we enderûn  
Dû destiş bibend be bê çend û çûn**

**742.Ĥicab kerd Xatûn wist ne cagey wêş  
Goşa be goşan emîrani pêş**

**743.Rewan kerd Xatûn esri mirwarî  
Perê Mem kerdiş xeylê zigarî**

**744.Şî we enderûn bestiş desti Mem  
Wat şale bê to 'umrim bîya kem**

**745. Hukmi hakimen hîc nedarû çar  
Çêş kero ce dest cefay rozigar**

Mîr got:

„Gazî Zînê bikin, bila were her du destên wî bêy çend û çûn girê bide.“

Xatûnê şerm kir û xwe ragirt. Mîr li ser da gurand. Zînê hêsirên weke mirwarîdê jorda barandin û ji bona Memê gelekî dilgîr û xemgîn bû. Zînê bi neçarî destên Memê girê dan û got:

„Xudê bêy te temenê min kurt ke! Fermana fermandarî ye. Çi çareya min tune ye. Ji dest cefaya rojigarê çî ji destên min nayê.“

**746.Sipord we yaran emîri zindan  
Berdin we zindan xaşir perêşan**

**747.Ser ta paş pîçan birûqi zincîr  
Wustin be zindan zigar û ziwîr**

**748.Wêney xamoşan qîrar girt ne ca  
Istid' a kerdiş be dergay Xuda**

**749.Rû kerd ne baļa wat ey Xudawend  
Necat der ce bend bendîyani bend**

**750.Feriyadresîdey gişt bêçaregan  
Rehakonendey yarani zindan**

**751.Er zeřê luřfit pêm henden eşer  
Be zûdî ney qeyd necatim bider**

**752.Awatewazim be dîni duļber  
Er bidîyam henî ruxsari yawer**

**753.Bêzar bîm bêzar cey zindeganî  
Do' am qebûl ker ferd û subhanî**

**754.Be sozi derûn du' aş kerd Emîr  
Do' aş qebûl kerd Hëyyi bênezîr**

Mem destgirêdayî sipartin berpîrsê zindanê û ew bi dilekî perîşan ber bi zindanê birin. Ji serî ta pîyan bi zincîran girêdan û jar u belengaz avêtin binê zindanê. Mem weke mirovên kerr û lal di binê zindanê da ma û serê xwe bilind kir û ji dergahê Xudê du'a xwast û got:

„Xudêyo tu hemû girtîyan azad bikî, min jî tevayî wan. Ey Xudayê hanaderê belengazan, ey rizgarîkerê derbend û girtîyan, eger pirtîkek dilovanîya te li ser min da hebe, tu dê min ji vê



qeyd û bendê rizgar bikî. Ez ji dergahê te daxwazê dikim ku dîtina rûyê dildara min bikî nesîbê min. Xudêyo tu dengê min bibihêy, ez êdî ji vê jîyanê vêzar bûm, ey Xudayê sub'hanî, ey Xudayê tekî tenê tu di gazî û hewara min da bêy.“

Çunku Memê bi dilekî şewat gazî Xudê kir, Xudê daxwaza wî pejirand.

## **XLII.**

**Mem di zindanê da ye, Zîn penîve xwarekê jê ra dişîne, Bekir pê dihese û nahêle ew xwareka ji Memê ra here**

**755.Inbar ce şay Mem nekerîn goftar  
Tecdîd biderûn destanî exbar**

**756.Emîr çun wistiş ne rûy zindan Mem  
Nişt we xatîrşad dişad bî ce gem**

**757.Şew ama Xatûn dest kerd be zarî  
Zarî çe zarî, zarî zigarî**

**758.Rû kerd ne dergay Hëyyi Cebbarî  
Watiş Xudaya toy sebebkarî**

**759.Ya imşew derdim bikerî karî  
Ya Mem cey zindan necat bidarî**

**760.Çunke do' aş kerd be endûhi di  
Do' aş be hedef yawa muqabil**

**761.Durust kerd be' zê ce te' ami nan  
Nê' imeti elwan morgani biriyan**

**762.Daş we yek kenîz ne ray nihanî  
Kîyastiş perê yari zindanî**

**763.Ta ke muddetê kîyast we zindan  
Ce kebk û ce qaz morgani biriyan**

Vêca em ji Mem şah naaxivin, em ê çîroka xwe ser ji nû dest pê bikin.

Dema ku Mîrî Mem avête zindanê, bi dilekî geş û xweş û bêxem li ser textê xwe rûnişt.

Şev Xatû Zînê dest bi ah û zarîyan kir û li ber dergahê Xudê lavayî kir û got:

„Hey Xudayê cebbar û zordar, serê hemû sebebana tu yî. Xudêyo yan îşev canê min ji kalana leşî bîne derê, yan jî Memê ji vê zindanê rizgar bike.“

Çunku Zînê bi dilekî pir derd û kul gazî Xudê kir, du'ayê wê hate pejirandinê. Wê şevê rabû cure cure xwarinên rengareng, kew û qaz û mirîşkên sorkirî, amade kir û da destê kenizekê û dizî va ji Memê ra şande zindanê.

**764.Royê Bekir ağa ne ragey nihan  
Horêza liwa rû kerd we zindan**

**765.Dîyadîş ke Mem niştên we surûr  
Şoley ruxsariş giřantir ce nûr**

**766.Emîri zindan teşeb kerd we ber  
Porsa exbarati werdenîş yekser**

Rojekê Bekir a'xa rabû dizîva çû zindanê û dîna xwe dayê ku wa ye Mem bi keyfxweşî li goşa zindanê da rûniştîye û li ber keyfxweşîyê tefeşa wî weke nûr jê bibare, geş e.

Gava ku Bekirî Mem di wê rewşê da dît, gazî serokê zindanvanan kir û jê pirsî ka Mem çî dixwe û vedixwe?

**767.Ama be ciwab emîri zindan  
Ce lay Xatû Zîn perêş meyo nan**

**768.Rû kerd we emîr zindan new zeman  
Wat ey nabekar merdûdi nadan**

**769.Er Emîr dano bey kar û kirdar  
E' îzay saġimit mirêzo be dar**

**770.Kê dîyen cey wer qedîm rozigar  
Bendî bibendo be wêney perwar**

**771.Ĥala ce teqşîr gonat wîyerdim  
Ce mewday eġmas xeġařit kerdim**

**772.Beġê agat bo cey domaş we ne  
Be ġeyr ez dû nan medereş pene**

**773.Ne' em wat emîr zindan bêqerar  
Rewan bî liwa Bekir bêmidar**

**774.Munqeti' kerdin xoraki Xatûn  
Mem mudetê mend zebûn bî zebûn**

Berpirsê zindanvanan got:

„Xwarin û vexwarina wî ji layê Xatûn Zînê va tê.“

Bekir bi tûretî li zindanvanî nihêrî û gotê:

„Ey kêrnehâtîyê nezan û merdûd, eger Mîr bi vê yekê agadar bibe, dê leşê te bi daran bihecîrîne. Ka bêje ji dewrê berê ta roja îro kê dîtîye ku mirov zindanîyan weke perwerîyan kozî bike. Ez vê gavê ji gunehên te derbas dibim û te ji devê şûr diparêzim. Lê haya te jê hebe, virha şûn da tu dê rojê tenê du nanan bidî wî û hew.“

Zindanvanî ji Bekirî ra erênî kir û Bekir jî li wêdê derket û çû.

Bi fermana Bekirî xwareka ku Zînê ji Memê ra dişand hate vebirînê û Mem di binê zindanê da di rewşeke şepirze da belengaz û birsî ma.

### **XLIII.**

**Zivirîna Ceko û Efo ji berhevkirina seraneyê, agahdarbûna wan ji zindanîkirina Memê, hêrişa wan li ser Mîr û poşmanbûna Mîr û daxwazîya lêborînê**

**775.Inbar be emri benay bêhterîn  
Biwaçûn ferdê ce Qere Tacdîn**

**776.Royê nişte bê Mîr Zînedîn kar  
Awerdiş ne diş arezûy şikar**

**777.Ferma ta espiş awerdin derdem  
Rewan bî Emîr çenî xaşş û cem**

**778.Sê ro ce şikar nama Mîr Zîndîn  
Nigah ker we emri benay bêhterîn**

**779.Xatûn ne rûy koşk nişte bê gemîn  
Nagah peyda bî gerdê ce zemîn**

**780.Dîyarda ‘Efo, Çeko ba Bengîn  
Espan mitazan ne rûy serzemîn**

Vê carê bi fermana Xudayê binyankerê baştirîn, emê bendekê ji Qere Tajdîn bêjin. Rojekê Mîr Zînedîn li Eywanê rûniştibû, ku arezûya nêçîrê kete dilê wî. Ferman da ku hespê wî zîn bikin û bi çend giregire û xassên xwe va çû nêçîrê. Ew sê roj bûn ku Mîr çûbû nêçîrê. Xatû Zîn xemîn û carriz li koşkê da rûniştibû. Bi fermana Xudayê binêşedanerê baştirîn, ne ji gav da dît ku tozek ji erdê rabû. Dîna xwe dayê ku va ye, Çeko, ‘Efo û Bengîn li hespên xwe suwar bûne û didine cirîdê.

**781.Zîn ke waqif bî ce amay yaran  
Awaz kerd yaran çaboksuwaran**

**782.Pey çêş mitazîd espan ne rûy dûn  
Emîr ne zindan zebûnen zebûn**

**783.Namûsitan kem merdani serwer  
Henî pey merdî newênan kemer**

**784.Ye çendê weqten çem ne ratenan  
Roîş ne qeyran yewmelmatenan**

**785.Derêga derêg pey Zelifî Mem  
Ûesret wa Ûesret cey zûlm û sitem**

**786.Bêdad hey bêdad ce î bêrayî  
Hana sed hana cey bêxodayî**

**787.Axim perê to bêqewm û bêferd  
Daxim perê to dil mînay bêgerd**

**788.Şeddad î kare we kes nekerden  
Bêgunah şayê yawo we merden**

Dema ku Zînê ew dîtin: gazî wan kir:

“Hey suwarçakino, hûn ji bo çi wisan kêfxweş hespan dixarînin û hûn ketine cirîdê? Bila Mem di binê zindanê da jar û belengaz bimîne, hûn jî ji xwe ra cirîdanê bikin. Namûs û şeref ji we ra nema û êdî navê mêranîyê li xwe nekin. Eva çendîn roj in çavên wî li rêka we ye. Ew niha ketîye rewşa mirinê. Muxabin sed muxabin ji vê zelîlî û belengazîya Memê ra. Muxabin ji vê zulm û zorê ra. Hey dad hey bêdad ji vê bêrêtî û bêxudêtîyê ra. Hewar û hana ji destê vê sitemê. Ax ji te ra Memê bêqewm û bêkes û kar. Sed muxabin ji te mirovê pak û dilşûşe ra. Şeddadî jî bi wê zalimîya xwe zulmeke weha nekiribû. Ev padişahê bêşûc û bêguneh ketîye rewşa mirinê.”

**789.Yaran çun ejnîn tamam xîre bîn  
Furûd ce espan naman we zemîn**

**790.Dest kêşan we têg her yek ce layê  
Her yek ne meşaf çun ejdehayê**

**791.Aman we qapî Emîr bêmedar  
Watişan Emîr şîyen we şîkar**

**792.Pêçan ‘ inanan suwarani daw  
Şîn we rûy bîrûn be te‘ icil û taw**

**793.Megêlan ne rûy sehra we şetaw  
Nagah Mîr Zîndîn dîyar da ce raw**

Dema ku hevalan ev hewarî û dad û bêdada Zînê û xebera zindanîbûna Memê bihîstin, zendegirtî man. Ew ji hespan peya nebûn û dest avêtin tetikên şûran û wekî ejdehayan meydan xwastin û rast hajotin qonaxa Mîrî. Lê li wir gotine wan, ku Mîr çûye nêçîrê.

Hersêkan dizgînên hespan li ser nêçîrgehê da badan û bi gef û gurr û bi xarran ber bi nêçîrgehê kudandn. Nişkava ew li nêçîrgehê da dûr va bi Mîr Zînedînî va dîyar kirin.

**794.Emîr çun çemiş gîna we yaran  
Lerza wêney bîd çûn bêqeraran**

**795.Rû kerd we Bekir çê şiten tedbîr  
Emcare be dest yaran medîn gîr**

**796.Ama we razan Bekir cew doma  
Çareş her êden êdenan şella**

**797.Be pay pîyade, serloxt û ‘uriyan  
Bibende şemşêr çûn gerdenkeşan<sup>288</sup>**

**798.Şo ne rageşan bigêrşan ‘inan  
Ejbet ke êd dîn miban peşîman**

**799.Bew destûr Bekir meşweret kerdiş  
Emîr Zînedîn be ca awerdiş**

Gava ku çavên Mîr Zînedînî bi wana ket, dest ji hev berda û weke dara bîyê lerizî û berê xwe li ser Bekirî da kir û gotê:

“Vê carê êdî rizgarîya min ji destê vana tuneye, zû tegbîrekê bike.”

Bekirî gote Mîrî:

“Çi çare tuneye, mesli’het ew e ku tu peyatî, ser qot, şûrê xwe weke belengaz û êxsîran bavêjî ustuyê xwe û bi lavayî herrî pêşîya wan.”

Bekirî çawa mesli’het dît, Mîr Zînedînî jî durust wekî wî kir û çû pêşîya wan.

**800.Ama we goftar emîrî enam  
Watiş bûyeran ce ‘uzr û gonam**

**801. We dilwazî nerd kerdîn çenî Mem  
Amam new dem da we zuban qesem**

**802.Mebo we Xatûn bigîroş ne ca  
Hem birûn baroş ew ne qe‘ri çah**

**803.Meizûn ban bişan bawereş we ber  
Nikaş kem weneş şewli nazperwer**

Mîr berê xwe li ser wan da kir û got:

“Ji sûc û gunehê min bibihorin. Min û Memê me bi dilxwazî nerd leyst. Di wê demê da sondek hate ser zimanê min,( lewra min li ber sonda xwe ew rê kire zindanê.) Pêdivîye ku

<sup>288</sup> Bi dîtina me ev peyva debîya „gerdenkeşan“ ba ne gerdenkeşan. Gerdenkeşan li vir bêwate ye.

Xatûn here û wî ji zindanê derîne. Hûn destûrdayî ne, herin wî ji zindanê derînin û biînin, ezê hema niha Zînê li wî mare bikim.”

**804.Yaran çun ejnîn ce esp pîya bîn  
Bosan dest û pay Emîr we yeqîn**

**805.Ce new suwar bî Emîr der zeman  
Girdîn beraber rû we şar nîyan**

**806.Cew dem biferîmûd mîrane destûr  
Bişo we zindan Xatûn we zerûr**

**807.Bawero we ber Emîri gemxwar  
Zû be zû bişo negêro qerar**

Dema ku hevalan ev gotinane ji devê Mîrî bihîstin, ji hespên xwe peya bûn û bi dilekî saf dest û pîyên Mîrî maçî kiirn.

Ser ji nû li hespan suwar bûn û berê xwe dane bajêr. Dema ku giheştin bajêr, Mîrî fermanek mîrane da û gote Zînê:

“Here tu bixwe Memê ji zindanê derîne. Zû here û gîro nebe, here Memê derîne û biîne.”

#### **XLIV.**

**Zîn bi fermana Mîr diçe zindanê ku Memê azad bike, lê Mem bi dîtina Zînê can dide**

**808.Goş der we Xatûn nadirey sajan  
Wêş arayiş da bişo we zindan**

**809.Bekir hem we tab şî ne xan û man  
Watiş nûri cem ey Melek Reyhan**

**810.Mîr emriş kerdin Mem baran we ber  
Mişo we zindan Xatûni duşber**

**811.Er bişo we ser zindan Xatû Zîn  
Mem rohiş perwaz mibo çûn perwîn**

**812.Çun bêrayîm kerd min ce ragey Mem  
Bişo we balaş to we xaşir cem**

**813.Baweriş we ber new çahi piş gem  
Ba nebo teslîm we zarî û sitem**

Gava ku Zînê ev fermana ji Mîrî bihîst, dest pê kir xwe xemiland û şitawek da bejna xwe û xwe amade kir ku here zindanê.

Dema ku Bekir agadar bû ku Mîr ferman daye, Zîn bixwe here Memê ji zindanê derîne, bi lez çû mala xwe û gote qîza xwe Melek Rey'hanê:

“Qîza min, ronahîya çavê min, zû bike, xwe berî Zînê bigehîne zindanê. Eger Zîn nişkava here û mizgînîya azadîyê bide Memê, ewê bibi'ece û bimore. Min karekî qenc ji Memê ra nekir, balê tu here û berî Zînê xwe bigehîne wî, bila ew nebi'ece.”

**814.Cew pey horêza Melek bî rewan  
Heman rû awerd ew be sûy zindan**

**815.Xatûn hem new dem ama der zeman  
Dîya ke midran ew Melek Reyhan**

**816.Watiş ey doxter bê dîn û îman  
Çe karit henden ce amay zindan**

**817.Wat we kenîzan î cadûy zeman  
Be taw û te' cîl perêm bigêran**

Dema ku Melek Rey'hanê ev gotina ji bavê xwe bihîst, bi lez û bez berê xwe da zindanê. Ji vî alî Zînê jî berê xwe da zindanê. Zînê li rê da dît ku qîza Bekir, Melek Rey'han jî va ye ber bi zindanê diçe.

Zînê gazî kirê. Hey cadûkara bê dîn û îman, çi karê te li zindnê heye ku tu diçî zindanê? Zînê ferman da kenizên xwe û got:

“Zû bilezînin û eva cadûkar ji min ra bigirin.”

**818.Melek çun şineft hullîyati ser  
Perakende kerd ne rûy deşt û der**

**819.Ta kenîz we koy huli bîn qerar  
Melek gurêza ferawan ferar**

Çawa ku Melek Rey'hanê ew fermana Zînê bihîst, revî û destê xwe avîte xişrên li serê xwe û ew reşandin erdê. Kenizan dest bi berhevkirina xişran kirin û ewê jî ji derfendê wec wergirt û ji wir revî û dûr ket.

**820.Xatûn çun ama we seyrî zindan  
Awaz kerd we Mem bînayî çeman**

**821.Ce gem bûyere wadey neşaten  
Roşinî zulmat rûy ser besaten**

**822.Awaz da Emîr we nîmeawaz  
Watiş ey ‘ ezîz şoxi serferaz**

**823.Tesdî‘ it kêşan çunke amanî  
Beleş qabizî rohim mistanî**

**824.Emîr cew bonet firistadinan  
Ta ke erwaşim bistanî rewan**

Dema ku Xatûn hate seyra zindanê , gazî Memê kir:

“Hey ronahîya çavan, xem û keser bihorîn, êdî dema şadî û xweşîyê ye. Tarîfî çû, ronahî hat.”

Memê bi nîvdengekî gazî kirê:

“Ey xoşdivîya şox û serferaz, te zehmet kêşa tu hatî, te ji xwe ra derdeser çê kir. Tu hatî, lê tu canistîna min î. Tu hatîyî canê min bistînî. Mîr tu şandîyî ku tu can û rewanê min ji min bistînî.”

**825.Dû tani gêsûy reyhanî peldêz  
Ne qe‘ ri ew ça kerdiş serawêz**

**826.Ĥelqêş helqawêz wust ne helqey lûl  
Tariş barîkter ce tari meftûl**

**827.Horkêşa we ber ew şekkerîn raz  
Çun rûy Xatûn dî rohiş kerd perwaz**

**828.Bêzar bî ce ‘ eyş ce zindeganî  
Gîyan kerd we feday hûri rizvanî**

**829.Cewanîş ca aşt perê Xatû Zîn  
Rohiş aram girt ne rewzey berîn**

**830.Eger hezar saļ bimanî we kam  
‘ Aqibet mergen nedaro encam**

**831.Î donyay fanî her pase kerdin  
Kesê ce sayeş waye neberden**

Zînê du kitên kezîyên xwe yên reşe rey’hanî li çala zindanê da daliqand. Du kezîyên qurûşk û badayî ku tayên wan ji tayên meftûlan naziktir bûn. Ewê şekkerîn gotarê ew hilkişande jor. Dema ku çavên Memê bi wê ketin, canê wî ji qalibê leşî firrî û derket. Ewê ku ji jîyanê têr bibû, gîyanê xwe kire gorî yî wê hûra biheştî. Gencînîya xwe kire qurbanî Xatû Zînê û canê wî di biheştê berîn da aram girt.



Eger tu hezar salî jî di vê cîhanê da bi kama dilê xwe bijîy, dawîya wê her merg e, çî serencameke dî tune. Evê cîhana fanî û neman herdem wisa kirîye, kesî ji sîbera wê da wayî û xweşî nedîtîye.

#### XLV.

##### Şîn û kefn û defna Mem

**832. Bişnew ce Xatûn nazdari duldar  
Pare pare kerd xaşan ce ruxsar**

**833. Be pencey bilûr sedefî kirdar  
Kerdiş we beydaq zulfani şamar**

**834. Yeşey qenawêz pare kerd ce bîm  
Qirmiz kerd beyan lewîhi sadey sîm**

**835. Bali tuşey dêz gişt da we tarac  
Seyli hûn ama poşa textey ‘ac**

**836. Bo nîya we boy şay ‘alî e‘ zem  
Watiş sed şalah ‘umrim bîya kem**

**837. Herkesê toş wust ney çahi zindan  
Cergiş pare bo we têgi buşan**

**838. Her ta zinde bo ahiş weş nebo  
Kameranî zewqi donya pêş nebo**

**839. Bextiş nigûn bo serawêz ce gem  
Gerqi gëzeb bo yawer çenî gem**

Vêca ji Xatû Zîna nazdar û dildar bibihê, dema ku ew rewş dît, xalên tefeşa xwe bi pence û neynûkên xwe yên sedefî ji tefeşa xwe ya xweşik pare pareyî kirin. Zulfên xwe yên şahmaranî li ser bejna xwe da kirin ala û perîşan. Pêşîra kirasê xwe yî avrêşimî dirrand û sîngê xwe yî weke lewheya zîvîn di xûnê da qirmizand. Bisk û porikên xwe yên reşdêz rûçikandin û talan û tarac kirin. Lêmişta xûnê textê sîngê wê yê weke acê vepoşand. Tefeşa xwe danî ser tefeşa Memê û bêhna wî şahê mezin bêhn kir û gotê:

“Îşalah temenê min sed carî kê m be. ‘Emrê min nemîne ji te ra. Her kê tu kirî vê zindanê da, cergê wî bi şûrên birran pare û parçe bibe! Hindî ew zindî be, bila aha wî xweş nebe û xêrê bike wayê qet nebîne! Bila di cîhanê da qet kameran û kamedar nebe! Bila bextê wî ji xem û derdan sernixûn û di xezeba Xudê da noqim bibe! Bila heval û hevdemên wî derd û kul bin!”

**840.Ce new bolend kerd zayeley zigar  
Watiş hamseran bîyan ew dîyar**

**841.Bidîyan we gerdiş çerxi sitemkar  
Çe zûlmê pê m kerd zalimi gëddar**

**842.Î sitemkarî we kesê neşîyen  
Kê çûn min dujdari cuwanemerg dîyen**

**843.We feday cuwanît şazadey şahan  
Perê xalî min tey kerdî rahan**

**844.Kêşat ezîyyet bê saman û sûd  
Sûdit şî we bad mayet bî nabûd**

**845.Domay mergi to diş we kê derû  
Çe gone bey dehr diş weş bikerû**

**846.Şertim ew şertên kam nedîdey dewr  
Gerîbi şaran we cewr kuştêy cewr**

**847.Bişûn ew mîyan deyrîyani deyr  
Heram bo ce min zewqî şadî û seyr**

**848.Er şa bizano ce Yemenî şar  
Nîlî bikero tac çenî tomar**

**849.Fetre medero miyo bêqerar  
Hûnit mistano ce e' idayan kar**

Zînê dengê şîn û zarînê bilind kir. Gazî kir:

“Hey gelî heval û hogiran, werin dîna xwe bidenê, ka evê çerxa sitemkar û feleka bedkar û dijwar çi anî serê min!? Ev sitem û cewra ku li min hatîye kirinê li kesî nebûye. Kê wekî min dildarê xwe weha canemerg dîtîye? Hey şahzadeyê şahan, ez bi gorî wê gencînî û cewanîya te bim, te ji bona xala min ew rêya dûr û dirêj da ber xwe û tu hatî vir, te ji bona min ew hemû derd û kul kêşan, lê te çi sûd û samanek ji vê oxira xwe nedît. Sûda te ber bayê ket û mayeya te nabûd bû. Li dû mirina te ra ez ê dil bi kê bidem? Ez ê bêy te çawa dilê xwe bi vê cîhanê xweş bikim? Hey xerîbê şaran, hey kuştîyê cewr û sitemê, hey kamnedîtîyê bêmiraz, hey canemerge, şert û qîrar be, ku piştî te di vê cîhana derewîn da ez çi zewq û şadîyê nekim. Bila piştî te xweşîya cîhanê li min heram be!

Eger şah di bajarê Yemenê da bi vê bêtarê agadar bibe, dê text û tomarên xwe reş û heş bike, ranaweste û dê bê û xûna te ji van neyarana bistîne.”

**850. Bişnew ce Bengîn yari wefakêş  
Yawa we nezd ew emîrî dilrêş**

**851. Wêş kêşa we pol ce pa ta we ser  
Awaziş wîyerd ne çerxi exzer**

**852. Ewend dane wêş be têa û teber  
Derdem hûn ce fewq zamiş da eşer**

**853. Sernigûn gina wêney bêhoşan  
Bî we hamnuşîn ehli xamoşan**

Niha ji Bengînî bibihên, ew yar û dostê wefadar, giheşte ser cenazê Emîrê dilbikul. Xwelî li serê xwe kir û xwe di nav axê da gevazt. Dengê ah û zariya wî digehîşte banê gerdûnê. Ewqas xwe da ber şûr û tevrezînan ku xûnê ji birînên wî ra helavît û weke bêhoşan ser serî li erdê ket û bû havalê mirîyan.

**854. Horgirten laşey Emîr emîran  
Berdin perê şar karsaziş keran**

**855. Esasi şoriş muheyra kerdin  
Be resmi şahan tamam awerdin**

**856. Şostin laşey pak kafûrendaziş  
‘Etramêz kerdin cage û cîyaziş**

**857. Nîyan ew kefen laşey der zeman  
Wendişan çendê ayati Qurian**

**858. Hûni Sîyawexş<sup>289</sup> ce no coşawe  
Sîtûni eywani keywan kêşawe**

Cenazê Emîr hilgirtin û ber bi şarî birin û karê şûştin û canglêkirina wî kirin. Bi pêka rê û risma şahan ew şûştin û kafûr li cenaze û sindirûka wî reşandin û sindirûk û gorrina wî gulavreşîn kirin. Cenazê wî kirin nav cangî û çend ayatên Qurianê li ser da xwandin.

Xûna Sîyawexşî ser ji nû hate coşê û istûna esmanî li ber hate kêşanê û te digot qey esman li ser erdê da tep bûye.

**859. Nagah peyda bî çendê ce suwar  
Pêşan bê çend rext çend tac û tomar**

**860. Seqr û başban baz û şahînan  
Zeřîn qeşade baz û başban**

---

<sup>289</sup> Di destnivîsê da Sîyawexş hatiye, diyare nuqteya tîpa xê ketîye. Sîyawexş yan Sîyawexş kurrê Keykawûsê Keyanî ye. bnr. Mu'in Muhammed, *Ferhngê Fârsî*, „Sîyawexş“ ; Firdewsî, *Şahnâme* be Kûşîşê Se'îdiyân, Hemîd, Neşrê Qetre, çapê pencom, Tehrân 1384 hş., r. 203.

**861. Peya bîn ce zîn tamamî derdem  
Porsan exbarat werînani Mem**

**862. Bengîn nîgeh kerd çun ne ragey dûr  
Derdem şunasaş hekakan destûr**

**863. Ce new zayeley fuğan û zarî  
Xêziya ce beyni merdani karî**

**864. Temam ehli şar aman we daman  
Kerdişan şîwen zarî ferawan**

**865. Esri şîngêran zemîn kerd qirmiz  
Xûnabe xêza ce her bûm û merz**

Ne ji gav da çend suwar hatin xûyanê. Tac û tomar û rext û seqr û belaban û baz û şahînên bi xelêtkên zêrrîn bi wan ra hebûn. Ew ji hespan peya bûn û ji rewşa Memê pirsîn. Dema ku Bengîn li dûr va li wan nihêrrî ew nas kirin û ser ji nû dest bi girîn û zarîne kir. Xelkê bajêr hemû hatin bal wan û bi wan ra şîn û zarî danîn. Hêsirên şîngêrran erd ji xûnê sor kir û lêmiştî xûnaveyê der û deşt û sînor da ber xwe.

**866. Er beyan kerû fişter exbarat  
Ahir migîro tamam ser besaş**

**867. Horgirtin tabût şazadey gerîb  
Ew ca ab û gil kerdebêş neşîb**

**868. Be resm û adab be rewîyey wêşan  
Soporden we xak xaşîr perêşan**

**869. Yaran horgêlan aman ew doma  
Baz hem laşey Mem be ca mend ne ca<sup>290</sup>**

Eger ez ewê rewşê zêdetir şirove bikim, agirê li hemû cîhanê bigire. Sindirûka şahzadeyê xerîb hilgirtin, birin wî cîhê ku av û gîla wî ew xwastibû, çal bikin. Bi pêka rê û rismên xwe ew bi dilekî pir kul û derd sipartin axê.

Dost û hevalên wî li dû ra hatin, dîsan jî cenazê Memê cî da ma.

---

<sup>290</sup> Di van malikên helbestan da aloziya ragehandinê heye. Dibe ku li vir hindêk malik jê ketibin û yan jî Mîrza çîrok xulase kiribe. Ev pişka mesnevîyê zela nîne. Mîrov nizane ka ewên taze hatin kê bûn. Ji rewşa ku salix dide ra dîyar e ku debê Tajdîn be, taze ji sefera berhevkirina bac û xeracan dizivire. Lê Mîrza tiştêkî li wê barê da nabêje. Li dû ra dibêje cenazeyê Memê dîsan li erdê ma. (Malika 869.) Em nizanin ka cenazeyê Memê çima li erdê ma? Rengê hindê dide ku mesnewî li vir hatibe xulase kirinê. Yan jî ev malika 869 debîy li pêş malika 863 da bihata ku mebest hatiba pêkandin.

## XLVI.

### Bengîn hewarîya mirina Memê dibe Yemenê

870. Bişnew ce Bengîn yaweran enbar  
Bidîye çêşîş kerd yari wefadar

871. Suwaran nîlî espan hem nîlî  
Qoşan qelaxî tewleha filî

872. Beydaqê ce nîl nîlê kerd we pa  
Girew berdebê ce nîlî sema

873. Nîl ce Hindistan ama we qîmet  
Ewend nîlî kerd beydaqani bet

874. Payey qurtasan cê wetî zeřdoz  
Sîya û kebûd kerd matemî efroz

875. Himmetxawhîş kerd e'ila ta edna  
Teplî şîwen jend rahî bî ne rah

Gelî hevalan niha jî ji Bengîn bibihên ka ewî yarê wefadar çi kir. Suwarên leşkerî hemû weke qirikan reşpoş kirin û hespên wan jî şîn û tewl û gemên û hevsarên hespan jî bi rengê reşê filî da rengkirinê. Ew alayên leşkerî ku hemû bi rengê şînê nîlî bûn, bi şînatîya xwe Nîlek afirandin. Her der wisan hişin bû ku girew ji hişinaya asimanî dibirin. Heqas alayên sipî bi rengê nîlî reng kirin, ku buhayê rengê nîlî li Hindûsitanê bilind bû. Li cîhê ku dawa kirasan (dawêna zîn û pûsadan) zêrdûzî bikin, ew bi rengê reş û kew, rengên şînê û yên xemhîner dane rengizandinê. Li duhola şînê dan û rê ketin. Xelkê bajêr ji mezin û biçûkan, ji mezinmirovên ta mirovên asayî hemûyê du'a li wan kirin.

## XLVII.

### Mirina Zînê û kuştina Bekir bi destê Mîr

876. Emcar bişnewe 'eceb dasitan  
Ce rûy rasitî bikerû beyan

877. Yek şew heway tar daci deycûr bê  
Mah û sitare herdû bê nûr bê

878. Seylati baran mirêza be war  
Wêney seyli eşki 'aşiqani zar

**879.Mîr Zîndîn ama wêş girt ne pêwar  
Dîya we canib Xatûni nazdar**

**880.Ne pay supay seyl midiran bêqerar  
Dem dem migirewo perê Mem zigar**

**881.Naleş ber mişo we mah û seyyar  
Giřey derûniş giřantir ce nar**

**882.Çun dîş bey destûr Emîri nazdar  
Nadim bî ce wêş ce kerdey î kar**

**883.Be taqî zanaş nîyen mecazî  
Heqîqî ‘ eşqen ce karisazî**

**884.Peşmanîş berd ce diş berşî dûd  
Be‘ dez waqî‘ at peşman çi sûd**

**885.Midra zemanê bê deng û duwan  
Ta ke Xatû Zîn ama be eywan**

**886.Be‘ dez sa‘ etê Mîr Zîndîn biwêş  
Bişî we canib Xatûni dilrêş**

**887.Rû kerd we Xatûn nûri dîdey dîn  
Pewse bê qudret rebbul‘ alemîn**

**888.Meyûs menîşe diş meker gemgîn  
Pewse bê qudret rebbul‘ alemîn<sup>291</sup>**

Vêca dasitaneke sosret guhdarî bike, ez ê ji te ra rastîya wê beyan bikim. Şevêkê ku hewa reş û tarî bû û hîv û istêr bênûr bûn. Lêmişta baranê weke hêsirên evîndarên jar jorda dihate xwarê. Mîr Zînedîn ji koşkê hate xwarê û li alîyê seraya Zînê mêze kir. Dît ku Zîn wa ye leşkerê rondikan ji bo Memê dirijîne û digirî û ji bo Memê bêhedûr û naarm e. Nalîn û zarînên wê diçe bal sêr û pêran. Agirê dilê wê ji gurîyên agirî bi soztir in. Dema ku Mîr Zînedîn ew rewşa Zînê dît, ji kiryarên xwe poşman bû. Taze bi rastî zanî ku Zînê evîndar e û ew evîna wan jî evîneke rasiîn e. pir ji dil poşman bû, lê poşmanîya piştî bûyerê bêsûd e. Demekê bêdeng û duwan rawesta. Dengê xwe nekir, ta ku Xatû Zîn hate eywanê. Piştî saetekê Mîr Zînedîn bixwe çû bal Zîna dilbirîn. Berê xwe li ser Zînê da kir û gotê: karê Xudê bû, dilê xwe neke, xeman nexwe. Karek bû qewimî. Xudê wisn hez kir.

---

<sup>291</sup> Li vir nîvmalika 887ê dubare bûye. Dîyar e şaş hatîye rûnivîsî kirin.

**889.Ama we ciwab Xatûn ne rûy qîn  
To selamet bî ne î dehri kîn**

**890.Emma istidi‘ am êden ke ferda  
Biderîm me‘ izûr bidarîm rewa**

**891.Serkeşî gişkoy Emîr bikerûn  
Resmi te‘ zîyeş be ca bawerûn**

**892.Ruxşet da Emîr Xatûn der zeman  
Biwêş horêza rewan bî rewan**

Zînê bi kerb û kîn bersiva wî da û gotê:

“Bila canê te xweş be, bila tu di vê cîhana pir kerb û kîn da tendurust bî, tişteke nabe. Lê daxwazeke min ji te heye, bibihore, eger destûra te hebe û tu rewa bibînî, ez ê herim ser gorra Memê û rê û risama şîna wî bi cî biînim.”

Mîr destûra wê da. Xatû Zîn bi gotina Mîr ra rabû ji eywanê derket.

**893.Seher horêza cemîn wêney bet  
Kêşa we ser da burqey axiret**

**894.Çenî kenîzan rahî bîn we hem  
Ta yawan we ca mezargeyî Mem**

**895.Hêmay dûr bê dûr ke banigiş horda  
Xaki mezariş gişt kerd we ser da**

**896.Xeylê girêwa be şîn û zarî  
Xeylê awaz kerd Mem we zigarî**

**897.Nedî reng û rûş nebê nedayê  
Geyrez seng û xak neşineft sedayê**

**898.Naļa be dergay qadiri bêçûn  
Be sozi derûn naļa be gerdûn**

**899.Yareb be acefî peyxemberanit  
Be ayey kerîm ray rehberanit**

**900.Be herçend xaşşan ne rûy cehanit  
Be ayey şerîf ne rûy Qurianit**

**901.Der lehze ney ca rohim bistanî  
Xelas bon ne cewri î donyay fanî**

Siba wê êvarê ewê enîheyva meşwerdek, çarşeva axiretê kişande ser serê xwe û çend kenizên xwe bi xwe ra hildan û çû ser gorrina Memê. Hêj dûr bû, dengê nalîn û zarîna wê

quloz bû. Giheşte ser gora Memê û axa gorê li xwe wer kir. Gelekî girîya. Gelekî ji dilê xwe yî birîn gazî Memê kir. Lê muxabin ne dengê Memê bihîst, ne rengê wî dît. Tanê ax û berên Memê li himber xwe didît.

Vê carê ji kûranîya dil gazî kir û bi şewat nalîya û du'a ji Xudê xwast:

“Xudêyo tu bide seb xatirê peyxemberan, bide seb xatirê ayatên xwe û rêveberan, tu bi hemû xassên xwe, tu bi ayatên Quriana şerîf, hema a di vê demê da canê min ji min bistîne û ruhê min ji qalibî derîne û min jî bi Memê bigehîne.”

**902.Be emri qudret lamekan mawa  
Meqrûn we hedef icabet yawa**

**903.Roşîş ne peşey sîne kerd perwaz  
Ne rewzey Irem ca girt we dişwaz**

**904.Supay mewt ama rewneqi rûş berd  
E'zaş kerd we yex yexbendani serd**

**905.Be qar koçîş kerd ne cewri felek  
Bî we hamnişîni hûran û melek**

**906.Roşîş kerd be fiday cewanê şîrîn  
Liwa ne donya û fariğ bî yeqîn**

Xudê du'a û nizayên wê pejrاند. Tîra daxwaza wê armanc hingavt, canê wê ji sîngê wê perwaz kir û çû li bihîştê Iremê da venîşt. Leşkerê mergê li ser bêhna wê da peya bû û reng û rewneqa rûyê wê talan kir û leşê wê kire qeşa û qeşabendan. Ewê bi xeyid û qehr ji vê cîhanê û ji cewr û sîtema felekê koç kir û çû bû hevdem û hevnişînê hûrî û melekan. Canê xwe kire gorî ji wî gencê şîrîn ra. Ji vê cîhanê koç kir û êdî ji derd û kulan vala bû.

**907.Felek cewrit kerd cewri bê saman  
Sopordî we xak newber nemaman**

**908.Çend hezar gedrit kerden ce yaran  
Henî wesen cewr yanet bo wêran**

Hey felekê te sîtem û zoreke mezin kir, te ew şêneya nûgîhayî, ew nûbera nûbişkivî şande mala mirinê û te ew siparte axa sar. Te çend hezar zor û zulm li yaran kirine, mala te kaviil û wêran be, êdî zulm û sîtem bes e!



**909.Kenîzan zanan we mewti dulber  
Kerdişan bew roz ne yagey meşşer**

**910.Girêwan be soz zarî bêqerar  
Ce nagah Emîr ama ce şikar**

**911.Porsa exbarat î zayeley şîn  
Watişan to weş mewt bî Xatû Zîn**

Dema ku kenizan zanîn Zînê mirîye, ew der kirin me'hşergeh. Qîyamet rakirin. Bi dilên pir derd ah û zarî dikirin. Di wê demê da Mîr ji nêçîrê dizivirî, dema dengê şîn û girînê bihîst, pirsî: ew çi şîn û girîn e?

Gotinê serê te xweş, Zîn mir.

**912.Emîr çun şineft heyran bî ce kar  
Rêza be çem da esrînan hezar**

**913.Ne rûy xaney zîn ama be daman  
Çenî bizorgan mîran supahan**

**914.Horgirtin payey tabûti Xatûn  
Awerdin be şar be dîdey piş xûn**

**915.Xulaşê şustin ew nazikbeden  
Laşey şîrîniş nîyan ne kefen**

**916.Berdin we meqber mîrani salar  
Medfûniş kerdein ce pehlûyê yar**

**917.Horêzan beyan mexlûqati şar  
Sedayê ama new herdû mezar**

**918.Bekir cew dem da ama we goftar  
Coda û bê yek nêişan qerar**

Mîr çawa ku ev gotina bihîst, ji vî karî zendegirtî ma. Bi hezaran hêsir barandin û xwe ji xana zîn jorda berda û peya bû. Di gel serokleşker û supahsalaran sindirûka Zînê hilgirtin û bi çavên pîrhêsirîn birin şar. Bi kurtî cenazê wê nazikbedenê şuştin û kefen kirin û birin li rex Memê çal kirin. Dema ku xelkê bajarî ji goristanan dizivirîn, dengê bihîstin, ku ji her du goran hat.

Bekirî got: “Ew her du qet nikarin dûr ji hevdu û ji hevdu cudabûyî aramê bigirin”

**919.Emîr çun şineft xuroşa be qar  
Ferma bideran herdû rûy mezar**

**920.Bêldaran derdem daşan mezar  
Nigeh kerdişan mîran salaran**

**921.Herkes ne cay wêş şîn ne camey xwab  
Tebeq tebeq nûr mixêzo we tab**

**922.Çunke dî bey tewr gezeb kerd Emîr  
Rû kerd we Bekir merdûdi bêpîr**

**923.Herdûşan ce dehr donya berşîyen  
Hêmay ce bedî kotahît nîyen**

**924.Dest pêka we têg Emîr bêdirêg  
Pêka we mohreş ta yawa we mêg**

**925.Rohi pelîdiş şî we cehennem  
Ew xaşş fasidê ce donya bî kem**

**926.Muqeřebaniş xeberdar kerdin  
Laşey napakiş we xak soperdîn**

**927.Qetreyê ce hûni cismi bedmezheb  
Keft beyni qebri dû ‘ alîneseb**

**928.Cew dem eşer da xarê new dîyar  
Bîyen we reqîb ew herdû mezar**

**929.Îse meşhûren ne say çerxi kîn  
Tewatir maçan xarî Mem û Zîn**

**930.Yaran horgêlan aman ew doma  
Merdim sakin bî ce şor û gewğa**

Gava ku Mîr ev gotina Bekirî bihîst, li ser da xiroşa û xwe lê tûrre kir û ferman da ku ser her du goran vekin. Bêldaran serê her du goran vekirin. Supahsalar û giregiran dîna xwe danê ku heryek di cîhê xwe da weke tu bêjî di xewê da nin û tebeq tebeq nûr ji gora herdûyan quloz dibe. Dema ku Mîr wisan dît, xwe li Bekirî tûre kir û li ser ewî bêpîr û bedmezheb da çû û gotê:

“Herdu ji vê cîhanê çûne, her du jî mirine, hê jî tu dev ji wan bernadî!?”

Mîr dest avête şûrê xwe û şûrek li movka piştê Bekirî da û ew kire du letan û canê wî yê pelîd û pelişt şande dogehê û cîhan ji fesadiya wî vehesand. Kes û karên wî hatin û leşê wî yê nepak çal kirin.

Dema ku Mîr şûrek li pişta Bekirî da, dilopek ji xûna wî pekîya nîveka her du gorên Mem û Zînê. Ew dilopa xûnê bû dirikekê û li nîveka gorên her dukan da şin bû û ta niha jî ew dirika bûye gotina pêşîyan û hemû dibêjin, filankes bûye dirka Mem û Zînan.

Piştî kuştian Bekir, xelkê bajêr sakin û bêdeng bûn û ji ser gorinan zivirîn û şîn û girîn vetexirî.

#### **XLVIII.**

**Gehîştian Bengînî bo Yemenê û hatina bavê Memê bo tolhildanê,**

**931. Inbar bişnewan yawerani yar  
Çun liwa Bengîn yari wefadar**

**932. Mend we yek qonağ bîyawe we şar  
Şî ne waqî' ey şehî şehriyar**

**933. Şah çun dîş ne xwab Bengîne we zar  
Bêdar bî ce xwab bê sebr û qerar**

**934. Awaz kerd yaran mîrani salar  
‘Eceb xwawê dîm ney hengami kar**

**935. Salaran aman tamam ne goftar  
Watişan xeyr bo xeyrîyet aşar**

**936. Nagah ce teqdîri padişay cebbar  
Gerdê ne sehra dîyar da deyyar**

**937. We dûrbîn dîya şa ne rûy telar  
Watiş Bengînen miyo bêmidar**

**938. Welhasil yawan we qeraği şar  
Jenden tepî şîn be zarî û zigar**

**939. Merdimani şar aman we dîyar  
Qeļaxîpoş dîn tamamî suwar**

Hey hevalên arîkar, guhdarî ken, dema ku Bengîn ew yarê wefadar ji (Cizîrê ber bi Yemenê ) çû, hê qonaxek mabû bigîje şarê (Yemenê) çû xewna şehriyarê Yemenê. Dema ku şahî Bengîn di rewşeke nebaş û nearam da di xewna xwe da dît, gazî sipahsalar û giregirên dîwana xwe kir û gote wan ku min xewneke sosret dît.

Giregire û sipahsalaran gotinê:

“Hey xudanxêr, Xudê xewna te bi xêr bike.”

Di wê demê da bi fermana Xudê şahî dîna xwe dayê tozek ji deştê quloz bû. Ji şaneşînê bi dûrbînê dîna xwe dayê û got: Eva Bengîn e wa ye bêy rawest û bêyqerar dihêt.

Bi kurtî dema ku Bengîn gihîste qiraxa bajêrr, li duhola şînê dan û dengê şîn û girînê bilind bû. Xelkê bajêr çûne pêşîya wan û dîna xwe danê ku leşkerî hemû di şînê da nin û hemû reşpoş in.

**940.Beyan kerd Bengîn we girdîn iħzar  
Şîwen keft ce nam şîgar û kubbar**

**941.Padişah bêhoş gîna sernigûn  
Gêltan bî tamam ne rûy xaki xûn**

**942.Ce yaney paşah zayeje bî berz  
Merdiman xêzan tamam ne rûy erz**

**943.Wekîlan cur'ey matem kerdin noş  
Çawûşan dûrbaş kerdin feramoş**

**944.Deher şeban û roz şîwen bî ne kar  
Aramişan nebê şeh û şehriyar**

**945.Ferma çawûşan caş kêşo yekser  
Supa hazır ban ne bîroni der**

**946.Ferda cew dem da ke mido ekber  
Mişon pey qeşşas ferzendi dulber**

Bengîn ji hemûyê ra serûvena xwe û Memê ragehand. Şîn kete nav bajêr û mezin û biçûkan ji bo Memê reş girêdan û şîn girtin. Padişah bi bihîstina mirina Memê ra sernixûn li erdê ket û di nava ax û xûnê da nehiş ket. Dengê şîn û girînê ji mala şahî bilind bû. Xelkê bajêr hemû rijyan ber derê mala şahî. Wekîl û wezîran hemûyê reş girêdan û ketin şîn û matemê. Çawûşan gotina “dûrbikevin” û karên xwe yê rojane ji bîr kirin. Deher şev û deher rojan şîn û girîn bû. Şah û şahiyarên wî hemû bêhedûr û nearam bûn. Li dû ra padişahî ferman da û got: Bêjin carçîyan bila carrê bikêşin, da ku leşker hemû li dervayî bajêr amade bibin. Em dê sibeyî di berbanga sibê da li rê bikevin û herin tola Memê wî lawê xoşewîst.

**947.Ewro tedarok kerdişan leşker  
Siher bedewan beraman we ber**

**948.Nîlî beydaqan Nîlê kerd we pa  
Rewan bî derdem tamamî supa**

**949.Wadî be wadî qeti' menazil  
Yawan we Cizîr supa muqabil**

**950.Dewrey şehri Bot kerdin heşarî  
Nama we bîrûn eşlen deyyarî**

**951. Berzîya ce şar seday el-eman  
Ce sami heybet supay ba saman**

**952. Temam ehli şar heşarî kerdin  
Ne xumxaney xem heryek ser berdin**

**953. Ta şubhî şadiq kes neşî ne xaw  
Ce ters ce hemmi suwarani daw**

Wê rojê leşkerî karê xwe kirin. Siba wê hemû di sibêdê da amade bûn. Li ber alayên nîlî te digot qet çemê Nîlê li rê ketîye. Leşkerê rê ket û qonax be qonax rê kudandin û ta ku giheştin himberî bajarê Cizîrê. Leşkerê şahî bajarê Cizîra Botan dorpêç kirin û nehîştin kesek ji bajêr derbikeve. Li ber saw û heybeta wî leşkerî dengê elemana bajarîyan bilind bû. Giştî xelkê bajêr ketin hesar û helboqê û şepirze û xemgîn bûn. Wê şevê ta sibêda rasitîn kesek raneza.

#### **XLIX.**

**Bavê Memê bajarê Cizîra Botan dagîr diek, Mîr dikuje û Tajdînî dadine dewsa wî**

**954. Weqtê roşin bî nûri afitab  
Horêzan we pa be emri wehhab**

**955. Suwar bîn we zîn çaboksuwaran  
Şîn we enderûn rahî bîn rewan**

**956. Dira dewrişan girtin ew mîyan  
Rû kerdin we şar gird supahîyan**

**957. Zelzeley piş şor royî axirzeman  
Zahir bî ne beyn gird şar û e' iyan**

**958. Ğaret bî ebwabi Emîr û ' eyan  
Girtin we destgîr comle der zeman**

**959. Tayifey Emîr nejadi Bekir  
Ne kûçe bazar girtişan destgir**

**960. Têgi qetl û ' am na ce dileşan  
Deyyarê nemend ce nutfey êşan**

**961. Her çe e' ida bê kuşîya seranser  
Waħidê nemend deyyarulbeşer**

Dema ku ro helhat û tavê lêda leşker ji cî leqîya û hisara bajarî işkandin û suwarçakên wan ketin hundurê bajêr. Di hundur bajêr da bû axirzeman. Heyî û neyîyên Mîr talan kirin.

Hemû kes û karên wî destbiser kirin. Ji tayîfa Mîr û kes û karên Bekirî kesek di şar da neman û hemû hatin destbiser kirinê. Bi fermana şahî ew hemû bi hev ra hatin kuştinê û kesek ji nesla wan nema. Dujminê wan hemû hatin kuştin û kesekî wan nema.

**962. Teleb kerd Tacdîn şahî piş huner  
‘Efo ba Çeko şêrani serwer**

**963. Temam xel‘et kerd şay Ferîdûnfeş  
Mun‘im bîn temam ce esbab û zeş**

**964. Teleb kerd e‘iyan re‘aya û derwêş  
Rû kerd ne îhzar padişa be wêş**

**965. Bidan û agah muxbir ban ce kar  
Be xaîr cem‘î bigêran qerar**

**966. Fermanberdar ban ce leyl û nehar  
Tacdîn we Emîr ha dadim qerar**

**967. Herkes muxalif emriş bikero  
Bayed ke sezay cehennem wero**

**968. Fermanberdar ban ce bořna û pîr  
Taceddîn qebûl kerdin we emîr**

**969. Seri îta‘et we reh awerdin  
Ser û can ne hukmi Tacdîn soperdin**

Şahî gazî Tajdîn û ‘Efo û Çekoyî kir û ew hemû xelat kirin. Li dû ra mezinên bajêr vexwendin û gote wan: „ji vir ha şûn da Tajdîn Mîrê we ye. Min mîrîtîya bajêr daye wî. Hûn hemû debê ji wî ita‘et bikin. Herkesê ji fermana Tajdînê derkeve, dê bêt sizadanê.“

Ehlê Cizîrê ji mezin û biçûkan hemûyê mîrîtîya Tajdînê pejirandin û bi ser û mal di xizmeta wî da man.

**970. Be resm û adab we rewîyey şahan  
Dabi zebt û rebt weneş kerd ‘eyan**

**971. Miskînewaz ber temamî ‘adil  
Fikri ‘adilî nekerî baîl**

**972. Mew‘edi yek mah paşa girt qerar  
Horêza ama be mawa û dîyar**

Şahî bi pêka rê û risma şahan şeweya welatdarîyê û kar û barê hukûmetê nîşanî Tajdînî dan., (û gotê) gereke ew layengirê jar û belengazan be û bi şeweyeke ‘adilane îdareya welêt bike, û çî carî bêdadî û zor û sitem li xelkê neke û arîkar û dilsozê nedar û belengazan be.

Padişah bo midehê mehekê li wir ma. Paşê xatirê xwe ji wan xwast û zivirî welatê xwe.

**973.Ya reb be ‘izzet bibexşî Mîrza  
Ce yewmulmeşer ce weqti ceza**

**974.Gunehbarendan bibexşî gunam  
Be Taha û Yasîn be sûrey kelam**

**975.(Hezaran durûd û hezaran seşam<sup>292</sup>  
Zi ma ber Muhammed ‘eleyhîsselam)**

Ey Xudêyo tu bi ‘izzet û mezinaya xwe kî, tu **Mîrzayî** bibexşînî. Di roja ‘heşrê û roja cezayê da tu ji gunehên wî bibihorî. Xudaya ez gunehkar im, min bide seb xatirê Taha û Yasînî û seb xatirê kelama xwe û ji gunehê min bibihore.

Hezaran silav û hezaran durûd, ji me li ser Muhammed ‘eleyhîsselam be.

---

<sup>292</sup> Ensârî, Behmen, Website: [www.Tarikhbook.ir](http://www.Tarikhbook.ir), 1391 hş., r.455. Ev malika dawîn ya Farsî helbesta *Gerşasibnameya* Esedîyê Tûsî ye, ku di dawîya gelek mesnevîyên Hewramî yên dî da jî hatiye. bnr. pêvekên hejmar 6 û 7.

## 2.3. Danasîna Mesnewîya Mem û Zîna Mîrza ji Alîyê Ruxsarî va

### 2.3.1. Pêkhate û darêjka vê mesnewîyê

Mesnewîya Mem û Zîna Hewramî ya Mîrza ku ji 974 malikan pêk tê yek ji berhemên zengînên edebîyata klasîka Kurdî tê hejmarê. Lê li bara ruxsarî û darêjtian tewna mesnewîyê da gelek kêmasîyên wê hene. Em dibînin ku ev mesnewîya bi pêka rê û êbazên nivîsîan mesnewîyan nehatîye amadekirinê. Bi giştî bi pêka rêbaza mesnewînivîsîyê binêşeya mesnewîyan ji sê pişkên serekî pêk tê. wekî: 1.muqedeme, 2.çîrok yan serpêhatî 3.muexere Muqedeme bi giştî ji van sernavana serrast dibe: Besmele, munacat, tehmîdiyê, ne't, nasandina xwe û dema jîyan xwe, medhîye û pesnê mîr yan şahê hevdemê xwe, sebebê teilîfê kitab, saqîname û... Çîrok jî bi seraxazê dastianê dest pê dibe û di çendîn xelean da bûyer tî vegêranê. Li dû vegêran û kutakirina bûyerên çîrokê ra dîtina helbestkarî weke encam û ixtitamîye dihêt.

Lê di vê mesnewîyê da tenê 14 malikên tehmîdiyeyê tî û li dû ra bê muqedemeya dastanê û nasandina cîh û mekan û zemanê bûyerên çîrokê, çîrok bi hatina du kebûteran ku em nizanin çi ne û ji ku hatine dest pê dibe. Her çiqas ku ev mesnewîya ji 48 xelex û pişkan pêk tê, lê helbestkar hemû bûyer bi şeweyeke kurt vebirîye û per û bask nedaye bûyeran. Li cîhê ixtitamîyeyê da jî tenê du malikên helbestên tî ku di wan da helbestkar mexlesa xwe weke Mîrza diîne û ji Xudê dixwaze ku ji gunehên wî bibihore.(malikên 973-974) Bi giştî di vê mesnewîyê da gelek rêbazên mesnewînivîsîyê nehatine raçavkirinê û ev hinde ji vê mesnewîyê ra dibe kêmasîyekê.

Lê ev raçavnekirina rêbaza mesnewînivîsîyê li hemû mesnewîyên Hewramî da kêma û zêde li ber çavan dikevin.<sup>293</sup>

### 2.3.2. Kêş û Serwa<sup>294</sup>

#### A. Kêş:

Kêş yek ji serekîtîrîn pîvaneya helbestên klasîk e. Helbestên Kurdî yê klasîk bi du kêşan hatine darijtinê, hindek bi kêşa kîteyî û hindek jî bi kêşa 'erûzî. Di zaraveyê Hewramî da em

<sup>293</sup> Bo nimûne berhemên Xanayê Qubadî, Elmas Xanê Kendoleyî û yê mayîn bêy destpêkên mesnevîyê hatine nivîsîn. Yan jî destpêk bi kurtî vebirîne û bi lez dest bi vegêrana çîrokê kirine.

<sup>294</sup> Çunku me di pişka yekem da termên weke: kêş, serwa, cuwankariyên toreyî, zeman û mekan... li bara termolojîyê da şirove kirine, di vê pişkê da em wan şiroveyana dubare nakin.



kêm caran rastî berhemekê dihên ku bi kêşa ‘erûzî hatibe nivîsînê. Bi taybetî hemû mesnewîyên Hewramî bi kêşa kîteyî hatine nivîsînê.<sup>295</sup>

Ev mesnewîya jî wekî hemû mesnewîyên ku bi zaraveyê Hewramî hatine nivîsînê bi kêşa kîteyî hatîye darêjtînê. Her nîvmalikek ji vê mesnewîyê ji 10 kîteyan pêk tê. Bo nimûne:

Be + na + mi + bê + çûn + be + nay + la + me + kan = 10

Ni + geh + da + ren + dey + ze + mî + n û + ze + man = 10

Wa + hî + d û + e + hed + fer + d û + fer + yad + res = 10

Ra + hî + m û + re + hîm + pey + bê + ke + san + kes = 10<sup>296</sup>

#### **B. Serwa:**

Ji bilî kêşê serwa/qaffîye jî yek ji erkanê avakirina helbesta kilasîk e. Mîrza di vê mesnewîya xwe da di gel wê hindê ku destekî bilind di toreyê da nîşan daye, lê hind guh nade serwayê. Gelek caran yan serwaya şayigan bi kar dibe, yan jî serwayên wî dubare ne. Yan jî di çend cîyan da peyvên weke: şah, rah, mah ... bi peyvên weke: ba, da, şa ra dike serwa. Lê di van cîyan da zortir peyvên wisan di Hewramî û Soranî da jî bêy “h” jî telefuz dibin. Wate li cîhê peyvên; şah, mah, rah... da di van her du zaraveyan da weke: şa, ma, ra... têne gotin û nivîsînê. Dibe ku Mîrza ew peyvana bêy tîpa “H” nivîsîbin û serwa serrast nivîsîbe, li dû wî ra nasixan ew “H” lê zêde kiribin.

Çun Mîrza ne helbestkarekî wisan e ku haya wî ji serwayê tunebe. Bi her cureyî yan he di binî ra guhê xwe nedaye serwayê yan jî nasixan karê wî destkarî kirine.

### **2.3.3. Cuwankarîyên Toreyî**

Ev mesnewîya li bara hunerî û rewanbêjî û cuwankarîyên toreyî da di asteka bilind da ye. Di gelek malikên vê Mesnewîyê da em rastî cuwankarîyên toreyî yên balkêş dihên. Lê wesf û wênesazî, teşbîh û isti’are ji hemû babetên dî zortir bera mirovî li ser xwe da radikêşin. Em ê li vir çend nimûneyan biînin.<sup>297</sup>

#### **Tewsîf:**

Mîrza di pesin û danasandîna Zînê û cuwanîya wê da û herwisan li pesna Memê da, li pesna seraya her du evîndaran da bi hostatî tewsîfên balkêş û îmaj/wêneyên xeyalî diafirîne û bi hostatîyeke tam bi xeyalan mirovî dibe qesr û qonaxên Mîr û her du evîndaran. Em ê li vir çend nimûneyan biînin.

<sup>295</sup> Mesnevîyên weke Xosrew û Şîrîna Xanayê Qubadî, Xurşîd û Xawer/ Xurşîdi Xeraman ya mûla Nûrullahê Kendoleyî, Nadirnamey Elmas Xanê Kendoleyî, Şîrîn û Ferhada Mûla Weled Xanê Goran...

<sup>296</sup> mal. 1-2

<sup>297</sup> Di pişka yekem ya vê lêkolînê da me li ser termînolojîya babetên cuwankarîyê agadarîyên pêdivî dane, li vê pişkê da em xwe ji dubarekirian wan diparêzin.

72. *Watiş nişaney yagey min êden*<sup>298</sup>  
*Rûy şanişîniş ne beř û bêden*
73. *Çend perdey ‘ismet zerbafti aļa*  
*Temam saçağdar ‘ecayib kaļa*
74. *Kêşîyan we rûş pey resmi ‘izzet*  
*Piř ce kenîzan gişt şahib ħurmet*
75. *Ne pêşwazişen bağê çun Irem*  
*Xilafiş nîyen bê zîyad û kem*
76. *Serwan ser kêşan temam be ‘uyûq*  
*Şaxiş serawêz çun zulfi me ‘işûq*
77. *Serawiş wêney kewser mimano*  
*Ne dewriş duřac qumrî miwano*
78. *Direxti bêdan çinaran aļa*  
*Minimanan be ‘erş zerîstûn haļa*
79. *Bulbul miwano ne hezar destan*  
*Goļan cem besten ne şeĥni bostan*
80. *Şed hezar morgân new baği berîn*  
*Temam han ne Zîkr cehanaferîn*
81. *Şaxi dirextan encîr û enar*  
*Ermot û şîlaf mêwey xoşgewar*
82. *Herkesê bew bağ bikero guzer*  
*Rewzey rizvaniş mişo ne xařer*
- Yan dema ku hatina Zînê li ser kanîyê şirove dike:
414. *Xatûni şîrîn cemîn bogolab*  
*Ama çun xurşîd be serçeşmey ab*
415. *Ser ta pa libas alay zerweweq*  
*Xurşîd ce nûriş horgirtin rewneq*
416. *Naziki nazdar perîzadeyê*  
*Ce nesĥi perî pak uftadeyê*
417. *Baļabolendê, ‘er ‘erendamê*

<sup>298</sup> Hejmarên li pêş malikên helbestan hejmara rêza wan e di vê mesnevîyê da.

*Qemerruxsarê, mahê temamê*

418. *Dû çeşman sîya ‘emberîn mûyê*

*Lûlwerde heyyan ef‘îgîsûyê*

419. *Afeti dewran, kemanabrûyê*

*Wey kerî wey baz wey we her sûyê*

Di nav van malikana da di gel salixdanê li ser Zînê û ba'xê wê em rastî çendîn cuwankariyan jî tên. Di malikên 75, 76, 77, 78 û 414an da teşbîh, di malika 415an da mubalixe, di malika 417an da teşbîh, di malika 418an da dîsan teşbîh û isti'are heye.

**Mecaz:**

101. *Êd xaşen nigîn red bedel kerîm*

*Neba ce nagah ce yek bûyerîm*

102. *Herdû nigînan red bedel kerdin*

*Ne camey raşet ser we xwab berdîn*

Di malikên 101 û 102 da mecaz heye, mebest ji nigînê, gustîl bixwe ye.

**Teşbîh:**

20. *Dîşan ke şay Mem niştên we demağ*

*Şuley cemîniş çûn şuley çirağ*

21. *Balaş çûn ‘er‘er saway zêriston*

*Gonaş miderewşo wêney laşey kon*

Di malikên 20 û 21 an da teşbîh/wekandin heye.

**Isti'are:**

1. *Be nami bêçûn benay lamekan*

*Nigehdarendey zemîn û zeman*

Benay lamekan, istiare ye ji Xudê ra.

424. *Korpe hey tañan sîyah şu‘ibanî*

*Kerdin serawêz texti pêşanî*

437. *Wey wey ce heyyan xem werden we hem*

*Bîyen we seywan sîne û xaş û mem*

Korpey ‘hey, wate têjemar û ew isti'are ye ji porrikên Zînê ra. Mîrza Tarrên/tayên porrikên Zînê yên reş şubhandîya têjemaran ku rijyane ser textê enîya wê.

123. *Bêxud bê derdem medhoş bê ce xak*

*Nergisan we esir xûnî kerd nemnak*

Di vê malikê da nergis isti'are ye ji çavên cuwan,

**Îmaj/Wêneyên Xeyalî:**

125. *Supay xawerî çun serda eşer*

*Daş ne qelbi leyl şikest da leşker*

127. *Kebkani kosar qehqeşan cem kerd*

*Perwanan ce xewf supay seyl rem kerd*

248. *Supahi Hebeş şor engêzina*

*We fewqi kafûr 'ember rêzina*

249. *Hindî û Hebeşî poşan sîya û dêz*

*Şikest dan kafûr watin dest merêz*

Mîrza di van malikana da rojê diwekîne leşkerê rojhelatê û şevê jî diwekîne leşkerê Hindî û Hebeşîyan. Ew ronahî û tarîfî dişubhîne du leşkerên giran, ku hêrişî ser hevdu dikin û carê yek zora ya dî dibe. Dema ku leşkerê rojê hil tê, kew bêdeng dibin û minminîk direvin û xwe vedîşêrin. Vêca supahê 'Hebeşî û Hindîyên reş hêrîşî supahê rojê dikin û 'enbera reş dirijînin ser serê kafûra sipî ku leşkerê rojê ye û ewê bi tarîfîyê dagîr dikin.

**Telmî'h:**

33. *Perîzadeyê perîmeqamê*

*Zuleyxa warê ne gol endamê*

34. *Şîrîni Xosrew Humeyla kamê*

*Leyla şîfetê 'emberîn camê*

36. *Meryemeasa bulend endamê*

*Şekkerîn razê tawûsxeramê*

427. *Ebrû çun kemani gorîgîr Behram*

*Yan bedri hilal yekşewey tamam*

429. *Ahûyi Tetaranî xoş çerîde*

*Weledey ceyrani sa perwerîde*

432. *Bew tewrnakin weqti 'ibaret*

*Le 'li Bedexşan mido begâret*

433. *Şu 'ay zeneqdan miderewşo ce dûr*

*Maçî koy bilûr, ya xo deriyay nûr*

Di van malikan da Mîrza di gel pesinê cuwanîya Zînê, navên gelek kesên dîrokî û çîrokî yên weke: Xosrewê Sasanî, Şîrîna Ermenî, Leyla, Mecnûn, Humeyla, Meryem, Zuleyxa,

Behramê Gorgîr, Mîr Avdel û Tatar û Bedexşan û gewhera Deriyayê Nûr, çîyayê Qaf anîye.  
Di van malikana da ji bilî telmî'hê cuwankariyên teşbîh, isti'are û mubali'xeyê jî hene.

**Cinas:**

2. *Waḥid û eḫed, ferd û feryadres*

*Raḫim û reḫîm pey bêkesan kes*

129. *Bêdar bî ce xaw Emîri diḫco*

*Endûh bariş bê ko be ko, ko ko*

425. *Ca girten ne pay 'ereqçînewe*

*Cewahirnişan behay Çînewe*

426. *Pey bêdarî zulf sîyay çîn çîniş*

*Pey pey mibosan le 'li maçîniş*

431. *Dû destey keḫaf miqraḫî kerdin*

*We bani gonaş çîn çîn çîn werdin*

Di nîveka peyvên: „waḫid û eḫed, ferd û feryad, raḫim û reḫîm, ko û ko“ da cinas heye.

Herwisan peyvên: „'ereqçîn û Çîn, çîn çîn û maçîn, dikarin pêkve cinas bêne hejmarê.

**Îham:**

426. *Pey bêdarî zulf sîyay çîn çîniş*

*Pey pey mibosan le 'li maçîniş*

Peyva maçînê pêş da navê Çîn û Maçînê dihên bîra mirovî, lê mebesta Mîrza ji wê peyvê maç û ramûsan e.

**Tezad:**

24. *Ĝoḫaman ce laş dest we bani dest*

*Iqamet kerdin ce baḫa û pest*

Tezad/dijberî di nîveka peyvên bala û pest da heye.

**Tenasub:**

4. *Riziqdehendey weḫşî û mûr û mar*

*Padişay bê 'eyb waḫidulqehhar*

Mar û mûr pêkve tenasubê saz dîkin.

**Tekrîr:**

5. *Be ĝeyr ez ew şa kes nîyen şahan*

*Şah her ew şahen ne herdû cehan*

Dubarebûna peyva şah, hunera tekrîrê diafirîne.

Mirov di vê mesnewîyê da rastî bi dehan nimûne ji teşbîh, ist'are, bera'etê istihlal, telmî'h, mubalxe, cinas û gelek cuwankarîyên toreyî tê, ku destnîşankirin û şiroveya heryekê ji wan bixwe dibe mijareke serbixwe. Lewra em xwe ji zêdegavîyê diparêzin.

### 2.3.5. Qehremanên Mesnewîyê

Her berhemeke çîrokî li ser kar û kiryar û helsûkewtên qehremanan ava dibe. Çîrok li ser kar û kiryar û serpêhatîyên qehremanan pêk tê. Di vê mesnewîyê da jî em rastî gelek qehremanan dihên. Hejmara qehremanên ku di vê mesnewîyê da nav û pişeyên wan hatine û hebûna wan dibin hegerê pêşdabirin û geşepêdana rewta çîrokê 17 kes in.

Nav û pişe u karkird û neqşa her yek ji qehremanên mesnewîyê di tabloyaa jêrîn da tên:

**Tabloya hj. 9 . Nav û neqşên qehremanên mesnewîyê**

hj.	nav	Neqş û Kirên di Beytê Da
1	Kebûter evvel	↓
2	Kebûter duvom	Her du kebûter neqşa sereke ya pêkgehîştina Memê û Zînê dileyzin, ew in ku dibin hegera pêknasandin û evîndarîya Memê û Zînê.
3	Bavê Memê	Padişahê Yemenê ye ku navê wî nehatîye. Di naveroka mesnewîyê da dema ku Mem dibe evîndar bavê wî li rêçareyê digere, lê li dewsa çareyê Memê dixapîne. Di dawîya çîrokê da jî bi leşkerekî giran va tê Cizîra Botan dagîr dike û tola Memê hildigire...
4	Mem	Mem, Şay Mem. Kurê padişahê Yemenê ye. Qehremanê çîrokê yê sereke ye ku mesnewî li ser evîna wî û Zînê hatîye nivîsînê.
5	Xatû Zîn	Zîn qîza Mîr Awdel û xûşka Mîr Zînedîn mîrê Cizîra Botan û evîndara Memê ye.
6	Sitî/Estî	Xûşka Zînê ya mezin e û jina Qeretajdîn e.
7	Mîr Zînedîn	Birayê Zînê, mîrê Cizîra Botan e ku di encama fesadîya Bekir da dibe hegera mirina Mem û Zînê
8	Bengîn	Nobedar, xulam û berdestkê Memê ye. Ew ta mirinê bi Memê ra ye.
9	Qere	Zavayê Mîr û birayê Çeko û 'Efo yê mezin e. Ew yek ji

	Tacedîn/Tacdîn	mêrxasên Cizîra Botan e û gelek fedakarîyan ji bo Memê dike.
10	Çeko	Birayê Qere Tacdîn e.
11	‘Efo	birayê Qere Tacdîn e.
12	Bekir	Berdevk û şêvirmendê Mîr Zînedîn e. Ew bi fesadîya xwe nahêle Mem û Zîn bigehine hevdu û dibe hegera mirina wan. Di dawîyê da bi destê Mîr Zînedîn tê kuştinê.
13	Melek Rey’han	Qîza Bekir e. Ew jî dibe evîndara Memê û bi rêka dayena xwe dixwaze Zînê li ber çavên Memê reş bike. Lê ser nakeve.
14	Coftar	Cotkarê Zînê ye. Ew rê nîşanî Memê û Bengîn dide (Ev cotkara di mesnewîyê da neqşa Xoceyê Xizir û Pîrê rehnuma dileyze)
15	Kenizên Zînê	Navê wan nehatîye. Ew têne pêşîya Memê û dixwazin Memê bibin qonaxa Zînê, lê bi dîtina Memê ji xwe va diçin. Yan bi dizîva xwareka ku Zînê amade kirîye, ji Memê ra dibin zindanê.
16	Keniza Melek Rey’hanê	Navê wê nehatîye û ew Memê û Bengîn dibe mala Bekir, lê ji ber ku Bekir li malê nebûye, Memê û Bengîn diçin dibin mêvanê Qere Tacedîn
17	Dayena Melek Rey’hanê	Dayen yan dadoka Melek Reyhanê bi daxwaza Melek Reyhanê dixwaze Zînê li pêş çavê Memê reş bike.

### 2.3.5. Vegêran

Me di pişka yekem da nivîsî ku vegêran bixwe xudanê çend cur û şêweyan e. Yek ji wan curên vegêranê vegêrana zincîrî ye, ku pişka zor ya çîrokên gelêrî û beyt û mesnewî bi wê şêweyê têne vegêranê. Li vegêrana zincîrî da hemû bûyer weke xelekên zincîrê li dû hev ra tîn û di gel demê pêş da diçin. Di vê mesnewîyê da jî weke hemû mesnewîyên çîrokî vegêrana zincîrî heye. Mîrza çîroka mesnewîyê bi hatina du kebûteran û şiroveya eywana Memê dest pê dike û bûyerên çîrokê çawa ku li pişka xelekên mesnewîyê da li jêrê hatîye nivîsînê vedigêre. Mîrza di vegêrana çîroka mesnewîyê da ji goşe nîgaha kesê sêyem wecê verdigire.

### 2.3.6. Ziman

Zimanê vê mesnewîyê zimanê Kurdî, zaraveyê Goranî û devoka Hewramî ye. Zimanê nivîsîna vê mesnewîyê li bara edebî da di pileyêke bilind da ye. Wekî hemû mesnewîyan di vê

berhemê da jî ziman û biwêjên edebîyata klasîk serdest e. Em di metna mesnewîyê da rastî gelek hevbend/terkîb û peyvên zimanên Erebi û Farsî yên ayînî û yên ku taybetî edebîyata klasîk in, tên. Hevbend û peyvên wekî:

benay lamekan, nighdarende, wahid, ehed, ferd, feryadres, padişay qeyyom. wahidi muşleq, çerxi mu'eşleq, riziqdehede, wahidulqehhar, zahir û batin, zat, izhar, padişay e'zem, restaxêz, axirzeman, mexlûqat, amorzegar û bi dehan peyv û terkîbên dî ku karê têgehîştina ji metna mesnewîyê dijwar kirine.

Lê ev peyvana ji vê mesnewîyê ra nabin kêmasî, lewra zimanê hemû berhemên klasîkî wisan e û hebûna peyvên dijwar yên Farsî û Erebi di van mesnewîyan da ji nivîskar û helbestkaran ra serratî dihate hejmarê. Di pişka berawirdî da em ê peyvên zimanê Erebi yên ku di vê mesnewîyê da hatine destnîşan bikin.

### 2.3.7. Dîyalog

Dîyalog yan gotûbêj yek ji hêmanên çîrok û mesnewîyên çîrokî ye. Gotûbêj di nîveka qehremanên çîrokê da derbas dibe û nîşanderê rewşa derûnîya qehremanên çîrokê ye. Di vê mesnewîyê da em rastî gelek gotûbêjan dihên. Gotûbêjê nîveka her du kebûteran di gel hev, gotûbêjên Memê û Zînê, di qonaxa Memê da, gotûbêjê Memê û Zînê li ser kanîyê, gotûbêjê Beko û Mîr, gotûbêjên Memê û qîza Beko û gelek gotûbêjên dî. Nimûneyek ji gotûbêjên nîveka Memê û Zînê li ser kanîyê:

*Zîn :*

*463. Axir serencam Xatûni nazdar  
Watiş we Emîr gemzedey gembar*

*464. Er 'ezmit wuzûn bawer we encam  
Er ab minoşî binoşe we cam*

*465. Dêren weqti dêr rahî ber ne rat  
Ta min bişorûn î qab û hacat*

*Mem :*

*466. Ama be ciwab Emîri duşcû  
Toşnem nîyenan sendenim wuzû*

*467. Ema 'erzeyê darûn er danî  
Penet biwaçûn ne ray nihanî*

*Zîn :*



468. *Xatûn wat we Mem mer hoşit nîyen*  
*‘Eceb hey ‘eceb min key tom dîyen*

*Mem:*

469. *Ama be ciwab Emîri dijrêş*  
*Rastişan waten ‘aqilani pêş*

470. *Razişan meqbûl ew nikûkaran*  
*Zen û esp û şîr wefa nedaran*

*Zîn:*

471. *Baz ama we raz Xatûn we zerûr*  
*Min key tom dîyen maçî bey destûr*

*Mem:*

472. *Ama we soxen Mîri xoşkelam*  
*Watiş we Xatûn ey mahi tamam*

473. *Ew rom şunasay ey nazikbeden*  
*Ne Cizîr amay we şehri Yemen*

474. *Be hukmi îzed lamekani ferd*  
*Ne ağûş minit qerardade kerd*

475. *Be xwabi raçet ser we hem berdîm*  
*Serî ita ‘et we hem soperdîm*

476. *Herdû nişanan be yek soperdîm*  
*Herdû ce nagah ce hem wiyerdîm*

477. *Minit wust ne dam hem ne kûrey nar*  
*Îste miwaçî nedarûn exbar*

*Zîn:*

478. *Xatûn çun ejnî î qewl û goftar*  
*Rêza be çem da esrînan hezar*

479. *Wat be fedat bo gîyani şîrînim*  
*Dat be awi da renci werînim*

480. *Nezanam tonî nûri dîde û gîyan*  
*Min ce goftey wêm ha bîm peşîman*

481. *Umêd hen ce lay zîşewket û şan*  
*Me ‘izûr bidarîm cey herfî nadan*

## 2.3.8. Mekan û Zeman

### 2.3.8.1. Mekan

Bûyer û qweimînên her çîrokê di cîyekê û di dirêjaya demê da diqedin. Dem û cîh du amanên helgirtin û raberkirina bûyerên çîrok û serpêhatîyan in. Pisporên edebîyata çîrokî dem û cîhê çîrokî li ser çend pişkên cur be cur parve dikin. Bo nimûne mekan weha parve kirine:

1. Mekanê rastîn : ku bixwe dibe du desteyan:

A. Mekanên taybetî

B. Mekanên giştî

2. Mekanê ne rastîn

3. Mekanê armanî

4, Mekanê ayînî û Bawerî

5. Mekanên mîtik

Di tabloya jêrê da celebên cur be cur yên mekanî di mesnewîya Mem û zînê da ji hevdu hatine cuda kirin û destnîşankirinê.

**Tabloya hj.10. Navê mekanên/cîhên ku di mesnewîyê da hatine**

hj.	Celebên Mekan	Mekan di Mesnewîyê da
1. A.	Mekanê rastîn yên Taybetî	Cizîr û Bot- Dicle- Ke'be- Nîl- Şarî Cizîr- Tetaran- Xorasan- Yemenîşar- Çîn -Maçîn- Bedexşan- Hindûstan-
1. B.	Mekanên rastîn yên Giştî	'Xar- Aşîyan- Ba`x- Bazar -Bala- Bani ser- Bêd- Bêd û berr- Bend- Berr- Bilad- Bîrûn- Bostan -Ca- Cage- Çah- Cehan- Çeşme- Enderûn- Dam -Der û deşt- Derga -Dîwexan - Dîyar -Ecem- Ereb - Eywan – Gilko- Gorr- Gulzar- Hewa/asiman - Ko- Kosar- Kûrey nar – Mawa- Me'xar -Menzil- Meqam- Metbex - Mezar- Mezargeh- Ode/ Otaq- Payîni şar-Pesar- Pest- Qapî Şahî -Qefes- Qiblega- Qonax- Ra/ Rah- Şaneşîn- Şebustan- Sehni bostan- Sehra - Sema -Seqf- Seraw- Serzemîn- Talar- koşk- Taq û der- Terane- Tewîlexanan- Wadî- We'degah- Welat- Xak- Xaki rûm- Xane- Xumxane- Yage- Yane- Yextexane - Zemîn- Zindan-

2	Mekanê mîfîk	Irem/Rewzey Irem – Qaf- Serçeşmey Heyewan-
3	Makanê ayînî û Bawerî	Ba'xi berîn- Dehri donya- Donyay Fanî- Firdewsi berîn- Kewser- –Rewzey Rizvan – Seqer/cehennem- Weheşt/ Cennet/Cennetulmawa- 'Erş- Qapî Qeyomi Dana- Me'hşer-
4	Mekanên Xeyalî	'Xari nehanî- Lamekan mawa- Gerdûn-
5	Mekanên metaforîk	Besat/ser besat- Çerxi exzer- Çerxi kecreftar- Çerxi Mu'elleq- Perdey 'ismet- Texti can- Çerxi keçzen
7	Mekanên ne rastîn	

Em dibînin ku di nava hemû mekanan da mekanê giştî ji hemûyê zêdetir in û berewajî wê mekanên taybetî pir kêr in. Ew jî wê hindê nîşan dide ku Mîrza bi çavekî giştî li cîhanê û bûyerên çîroka Mem û Zînê dinêre. Lê çawa ku li jorê jî hate nivîsînê, mekanên metaforîk jî di vê mesnewîyê da ber bi çav in. Ev cure mekanane taybetî edebîyata klasîk in. Di wan da helbestkar di xeyalê xwe da mekanekî teşbîhî diafirînin. Bo nimûne Mîrza beden şubandîye textekî ku can li ser wî textî runiştîye. Yan heremsera şubandîye perdeyekê, lê ew perde ne perdeyeke asayî ye, belke perdeyeke ji pakdamenîyê...

### 2.3.8.21. Zeman

Zeman yan dem jî yek ji hêmanên sereke yê edebîyata çîrokî ye. Rewta çîrokê di amana demê da pêş da diç. Çawa ku hîç bûyereke bê cîhê bûyerê naqewime, wisan jî hîç bûyereke dervayî demê nabe û bûyer di dirêjaya demê da ser digire. Demê di edebîyata çîrokî da li ser gelek cur û celebên parve dikin. Çunku me li pişka yekem da li ser vê mijarê nivîsîye, li vir em ê mijarê kut vebirin û li ser çend celebên demê ku di mesnewîyê da cî girtine rawestin.

Zemanê ku di mesneîyê da hatine li tabloya jêrê da hatîye destnîşankirinê.

#### Tabloya hj.11. Dem di mesnewîyê da

hj.	Navê Demên Çîrokî	Di mesnewîyê da
1	Demên dîrokî	tuneye
2	Demên sal/rojhejmêrî (sal, demsal, meh, hefte, şev, roj, danên	Aro- Weqti şam- Sitarey seher- Dûşîn- Ro- Sal- Şebaneroj/ şeban û rûz- Seher- Şew- Sipêde dem- Sub- Tulû'I qemer- Êwar- Îmşew- Leyl - Mah - Nihar

	şev û rojê)	
3	Demên demjimêrî	Sa'et-
4	Demên rêzimanî	Hersê dem jî heye
5	Demên ayînî	Axerelencam- Axerzemna- Weqti şu'ley şewqi nûr- Xurûs bangdan- Yewmulmat- Weqti nemaz- Wadey selat- Roy merden-Roy restaxêz- Muezin bangdan- Qîyamet-
6	Demên giştî û bêpîvan	Axer- Wade- Daim- Dem- Dem be dem- Daimulmedam- Dereng- Dersat- Dewri zemanê -Dewran- Dewri cehan- Dûrîney dewran -Serencam- Rozgar- Endek weqtê- Ga ga/Gah û bêgah- Gerdişi çerx- Qedîm
7	Demên metaforîk	Sopay ebezeî- Sopay hebeş- Sopay hind- Sopay seyl- Sopay xawerî- Şay hebeş- Kafûr

Weke di vê tabloyê da dîyar dike, demên ku di mesnewîyê da hatine bikrabinê zortir demên giştî û demên ayînî ne. Ev pîvana jî dîsan berfirhbûna meydana hizra Mîrza û pêbestbûna wî ya ayînî û agadarîya wî ya li ser zanista ayînî nîşan dide. Di vê mesnewîyê da ji bo vegêran çîrokê ji dema bihorî û ji bo dîyalog û şiroveyê ji dema niha wec hatîye wergirtin. Mîrza ji bo vegirtina encam û ragehandina bîr û hizra xwe ji dema dêbê wecê verdigre.

Nimûne ji bo dema bihorî.

17. *Be emri bêçûn benay bani ser  
Perwaz ne aşîyan kerd dû kebûter*

18. *Çend ne rûy sema perwazişan kerd  
Çendê kohsaran, Dicleşan pey kerd*

19. *Axir serencam ne eywani Mem  
Herdû ne pasar niştin xaşîr cem*

Nimûne ji bo dema niha :  
72. *Watiş nişaney yagey min êden  
Rûy şanişîniş ne beş û bêden*

73. *Çend perdey 'ismet zerbafti aļa  
Temam saçağdar 'ecayib kaļa*

74. *Kêşîyan we rûş pey resmi 'izzet  
Piş ce kenîzan gişt şahiş hurmet*

75. *Ne pêşwazişen bağê çûn Irem  
Xilafîş nîyen bê zîyad û kem*

76. *Serwan ser kêşan temam be 'uyûq*

*Şaxiş serawêz çun zulfi me 'işûq*

77. *Serawiş wêney kewşer memano  
Ne dewriş duřac qumrî miwano*

78. *Direxti bêdan çinaran aľa  
Minimanan be 'erş zeřistûn haľa*

79. *Buľbul miwano ne hezar destan  
Goľan cem besten ne şeľni bostan*

80. *Şed hezar morgân new bađi berîn  
Temam han ne zikr cehanaferîn*

81. *Şaxi dirextan encîr û enar  
Ermot û şîlaf mêwey xoşgewar*

82. *Herkesê bew bađ bikero guzer  
Rewzey rizvaniş meşo ne xařer<sup>299</sup>*

Nimûne ji bo dema dêbê di mesnewîyê da:

108. *Paseşan watin bizorgani dîn  
Razişan mendin ne rûy serzemîn*

109. *Herkesê dû kes bikero ce hem  
Bêşik yageşen maway cehennem*

110. *Er kesê kesê we yek şad kero  
Cennetilmawa pey wêş mebero*

111. *Mibo we hamraz hûrani cenan  
Serazad mibo be emri Subħan*

## **2.4. Danasîna Mesnewîyê ji Alîyê Naverokî va**

### **2.4.1. Xelekên Mesnewîyê**

Ev mesnewîya bi şeweya yekparçeyî hatîye nivîsînê. Pişkên wê ji hevdu nehatine cuda kirinê. Lê me ew bi pêka qewimînên wê û agadarîyên ku Mîrza bixwe dide û dibêje, me filan bûyer got û kuta kir, em ê niha jî dest bi nivîsîn yan gotina bêhvan mijarê bikin, ji hevdu cuea

---

<sup>299</sup> Mîrov dikare vê malikê bi du cureyî şirove bike: 1. Her kê li nav wî ba'xî ra derbas bibe, ba'xê bihiştê dê bête hizra wî. 2. Her kê li nav wî ba'xî ra derbas bibe, dê ba'xê bihiştê ji bî bike.

kir û ji her pişkê ra serenavek danî. Bi pêka vê parvekirinê ev mesnewîya di gel besmele û munacatê, ji 49 xelean pêk tê, ku xelekên wê ev in:

1. Munacat
2. Seraxazê Dastan : Hatina du Kebûteran û venîştina wan li ser sivandeka eywana Mem û mendehoşmana wan ji ciwanîya Memê
3. Her du kebûter Zînê ji Cizîra Botan dînin qonaxa Memê
4. Dîdara yaran, yekemîn dîdara Mem û Zînê ya efsûnawî
5. Dildarî û evîndarîya yaran û lêkguhoriina gustîlan ji bo nasîn û nîşanan
6. Feraqa yaran, jêkqetiyana her du dildaran
7. Hişyarîya Zînê ji xewa evînê
8. Rabûna Memê ji bo nivêja sibêdê û dîtian gustîla Zînê di tilîya xwe da û jixwevaçûna wî
9. Hewarîya Bengînî ji bo day û bavê Memê û şîna li ser Memê
10. Mem piştî sê rojên nehişîyê tê ser hişê xwe
11. Bavê Memê giregirên bajarê xwe berhev dike da ku bizanin ka derdê Memê çî ye?
12. Mem derdê evîna xwe bi nivîskî ji bavê xwe ra dinivîse, izhara evînê ji Mem û inkara wê ji layê bavê va
13. Dilsarîya bavê ji amojgarîyê û geryana li dû çareyekê
14. Pîlana serleşkeran ji bo xapandina Memê
15. Memê bi deh hezar leşkerî va ber bi Cizîra Botan rê dikeve û di her qonaxê da du hezr siwar xwe jê didizin
16. Tenêmana Memê û Bengîn li serê rê û dirban
17. Rasthatina Memê û Bengînî li cotkarê Zînê û rênimûnîyên cotkarî
18. Hatina Melek Reyhana qîza Beko li ser rîya Memê bi berhaneya kirasşoyê û şandian wan bi bal bavê xwe
19. Memê û Bengîn dibin mêvanê Qere Tacedîn û birayên wî
20. Vegeryana Melek Reyhanê ji kirasşoyê û nedîtina mêvanan û daxistina hewarîyê ji bo dadoka xwe
21. Mazûvanên Mem ji ber xatirê wî naçin dîwanxana Mîr
22. Melek Reyhan dibihê ku Memê bibe Mêvanê Mîr, dayena xwe dişîne bal Memê ku dijî Zînê biaxive
23. Mîr Mem û Bengîn û mazûvanên wî mêvan dike
24. Mîr Memê dike mîrşîkar û Beko kîna Memê û mazûvanên wî dike dilê xwe
25. Pîlanên Zînê ji bo çûna ser kanîyê bi mebesta dîtina Memê

26. Zînê diçe ser kanîyê û Memê wê dibîne û bi dîtina wê mendehoş dibe
27. Memê destûrê ji mazûvanên xwe dixwaze ku here ser kanîyê û di gel Zînê biaxive
28. Dîdara Mem û Zînê li ser kanîyê û vegirtina randevoyê
29. Sernegîtina dîdarê û vegirtina randevoya duyem
30. Mîr Zînedîn fermana nêçîrê derdixe, her kes diçe nîçîrê, lê Memê xwe nexweşî davêje û di bajêr da dimîne û li dû nêçîra xwe diçe
31. Mem û Zîn di seraya Mîr da digîjine hevdu
32. Di nêçîrgehê da Beko bi nehatina Memê agadar dibe û Mîr han dide ku dest ji nêçîrê bikêşe
33. Mem û Zîn di xewa evînê da nin û Mîr û leşker li ser da peya dibin
34. Zînê di bin kurkê Memê da ye û Mîr û giregire li ser da peya dibin
35. Tajdîn ji bo rizgarîya Mem û Zînê mala xwe agirdadayî dike
36. Bi ferman Mîr barebûyê ji Tajdînî ra berhev dikan, lê Beko barebûyê nade û sira Mem û Zînê û agirpêketina mala Tajdînî ji Mîr ra ser ve dike.
37. Beko bi rêka zarokan sira Memê û Zînê li nav bajêr da bilaw dike û Mîr pê dihesê û rêçareyê ji Beko dixwaze.
38. Mîr bi pîlanên Beko Memê vedixwîne leyza kişikan û pevçûna Mîr û mazûvanên Mem û rizgarbûna Mem ji kuştinê
39. Pîlana Bekir ji bo dûrxistina hevalan ji Memê
40. Dîsan pîlana Bekir û kişikanêya Mîr û Mem û xapiyana Zînê û hatina wê li ber pencerê û derdana Memê
41. Bi fermana Mîr, Zînê destê Memê kelepçe dike û Memê davêjinê zindanê
42. Mem di zindanê da ye, Zîn penîve xwarekê jê ra dişîne, Beko pê dihesê û nahêle ew xwareka ji Memê ra here
43. Zivirîna Ceko û Erfo ji berhevkirina seraneyê, agahdarbûna wan ji zindanîkirina Memê, hêrişa wan li ser Mîr û poşmanbûna Mîr û daxwazîya lêborînê
44. Zîn bi fermana Mîr diçe zindanê ku Memê azad bike, lê Mem bi dîtina Zînê can dide
45. Şîn û kefn û defna Mem
46. Bengîn hewarîya mirina Memê dibe Yemenê
47. Mirina Zînê û kuştina Bekir bi destê Mîr
48. Gehîştian Bengînî bo Yemenê û hatina bavê Memê bo tolhildanê,
49. Bavê Memê bajarê Cizîra Botan dagîr diek, Mîr di kuje û Tajdînî dadine dewsa wî

#### 2.4.2. Huzûra bêjer yan danerê berhemê di metna berhemê da

Helbestkarê mesnewîyê gelek caran di dema vegêrana çîrokê da hebûna xwe radigehîne û weke bêjerekî xwe têkeli qewimînan dike û dibêje, min filan pişka çîrokê got û ez ê niha ji we ra li ser filan pişkê bêjim, yan we li ser filankesê bihîst, niha jî em ê li ser filan bûyerê biaxivin. Bi gotineke dî em di menevîyê da gelek caran hebûna helbestkarî weke zanayê kul dibînin. Ev şêweya herçiqas ku ji edebîyata çîrokî ra kemasî be jî, lê di edebîyata klasîk da di gelek berheman da li ber çav dikeve. Yanê ev xwetêkelkirina helbestkarî nikare bibe kêmasîyekê ji helbestkarê mesnewîyê ra.

#### 2.4.3. Hêmanên Mîtolojîkû Dînî di Mem û Zîna Hewramî da

Di gelek varyantên beyta Mem û Zînê da sê qîzên padişahê perîyan, yan jî sê perî rola serekî û pêkgehîştin û rûberûkirina Memê û Zînê dileyzin. Lê di mesnewîyê da herçiqas ku Mîrza xwastîye xwe ji bûyerên neasayî û qewimînen xeyalî û bîr û bawerîyên efsaneyî dîr bêxe, neçar maye ku li dewsa sê qîzên padişahê perîyan da ku xwe xistine kirasê kevokan, du kevokên rastîn biîne ser sivandeka eywana Memê û neqşa qîzên padişahê perîyan bide wan her du kevokana. Lê Mîrza bi neçarî têdikoşe ku wê mijarê asayî nîşan bide û peydabûna wan kevokana jî bi emrê Xudê va girê dide da ku mijarê ji bo xwêner û bihîsteran asayî nîşan bide. Tiştê balkêş ku evê pişka mesnewîyê bi mijara mîtolojîyê va girê dide, axiftinên her du kevokan e. Kevok gava ku Memê dibînin, li ser cuwanîya Memê zendegirtî dibin. Yek ji ya dî ra dibêj ku di cîhanê da kes weke Memê bedew nîne û kesek tune ye ku bibe heval û hevta ji Memê ra. Lê kevoka dî dibêjê na li Cizîra Botan qîzek heye navê wê Zîn e. Ew qîza dikare bibe heval û hevta ji wî ra. Kevoka dî bersivê dide û dibêje were em Mem hildin bibin bal Zînê (û her duyan bidin rex hev û bizanin kanê kîjan ji wan cuwantir e.) Lê hevala wê bersivê dide û dibêjê: Ma tu nizanî û te ji mezinmirovana nebihîstîye ku he berê ber da jin hantîne dîtin û xwastina mêran, ne ku mêr çûne dîtin û xwastina jina. Ev axiftinê durust bi wê şêweyê di beyta Mem û Zîna Soranî ya ku Oskar Mann ji zarê Rahmanî Bekir anîye ser kaxezê û di pirtûka *Tuhfey Muzeferîye* da weşandîye da jî heye, ku metna axiftina qîzên padişahê perîyan weha ye:

*„Xûşkî çikole gutî be xûşkane*

*Xûşkê ezû bibim be qurbane*

*Bila eme kake Memî helgirîn bibeyne Cizîr û Botane*

*Bizanîn kake Mem zerîftir e, ya yaye Zîn zêde cuwan e*

*Xûşkî nêwincî gutî be xûşkane*



*Xûşkê be qanûn û qaidane*

*Kes neydîwe mêrd biçê le dûy jinane*

*Her jin hatûnete le bo mêrdane...“<sup>300</sup>*

Şêzad Tayîfî û Muhsin Rehîmî di gotarekê da ku li ser mîtolojîya di Mem û Zînê da nivîsîne dibêjin: „Ev hinda di beytê da nîşaneyeke dayîksalarîyê ye ku jin diçûne xwazginîyê mêran ne ku mêr diçûnê xwazginîyê jinan...“ û ewê rê û resmê bi bîr û bawerîyên Mîtraîzmê va girê didin.<sup>301</sup>

Di vê mesnewîyê da tenê mijara ku bîhna mîtolojîyê jê tê ev bûyera hebûna kebûteran û hanîna Zînê ji Cizîra Botan bo Yemenê ye, wekî din em di vê mesnewîyê da rastî mijarên mîtolojî nayên.

Lê mesnewî bi hişmendîyêke Îslamî hatîye darêjtinê. Gava ku mirov evê mesnewîyê dixwîne, mirov rastî helbestkarekî dîndar tê, ku ne tenê bixwe di ragehandin û vegêrana çîrokê da mirovekî dîndar û musulman e, belkû qehremanên serpêhatîyê jî wekî xwe dike musulman û hemû hels û kewtên wana bi pêka cîhanbînîya xwe dadirêje.

Mesnewî bi 14 beytên tehmîdîyeyê dest pê dibe û Mîrza bi zimanekî pir bilind û bi hostatî gazeya xwe ya kurt diqedîne û li ser mijara teqdîra ilahî bîr û boçûna xwe radigehîne û bi ragehandina wê hindê ku hemû teqdîr û muqeder di destê Xudê da ye û tiştê ku Xudê bixweze kes nikare biguherre dadikeve vegêrana çîrokê û çîrokê bi hatina du kevokan dest pê dike. Ew peydabûna her du kevokan jî bi emrê Xudê va girê dide û dibêje bi emrê Xudê cotek kevok li esmanan perwaz kirin û hatin li ser sivandeka eywana Memê venîştin.

Mîrza binêşa çîrokê jî bi dîn û dîndarîyê va girê dide û nimûneyan ji gotinên mirovên dîndar diîne û weha dibêje:

*“Paseşan watin bizorgani dîn*

*Razişan mendin ne rûy serzemîn”<sup>302</sup>*

Mîrza qehremanên berhema xwe weke musulmanên ku erkên xwe yên musulmanîyê bi cî diînin, raberî xwêneran dike. Dema ku Mem piştî dîtina Zînê ji xewê radibe, gazî Bengînî dike, ku aftawe û legenê/misîne û teştê jê ra biîne ku destnimêja xwe bigire û nivêja sibêdeyê bike.

Bengîn jê ra aftawe û legenê diîne û jê ra çarika nimêjê radixe û ber bi quble dadine. Li cîhê hawilî û qedîfe û desmal û mendîlan da Bengîn ji Mem ra êhrami zerdûz diîne. Wate

<sup>300</sup> Mann, *Tuhfey Muzeferîye*, r. 146.

<sup>301</sup> Tâyîfî-Rehîmî, „*Costârî der Esâtîr-ê Menzûme-yê Kurdi-yê Mem û Zîn*“, r. 67.

<sup>302</sup> mal. 108

peyv û têngînên Îslamî li dewsa peyvên asayî bi kar dibe. Bengîn bi gotina bismilahê avê li ser destê Mem da dike, da ku Mem destnimêja xwe bigire.<sup>303</sup>

Mem dema ku dixwaze destnivêja xwe bigire, gustîla Zînê di tilîya xwe da dibîne û dibêje Bengînî, pîrozeya gustîla min çima sor bûye. Herçiqas ku Mîrza dinivîse, pîrozeya gustîlê sor bibû, lê di nav ra dibêje qaşa gustîla sor bi keskî dihingavt. Rengê kesk li bal musulmanan renekî pîroz e, lewra di gel wê hindê ku Mîrza bixwe dibêje qaşa gustîlê sor bibû, lê ji bo ku tewaşê Îslamîyetê jî tevî wê mijarê bike, dibêje bi keskî va dihingavt.<sup>304</sup>

Li cîhê qaşa gustîlê yan nigîna gustîlê da Mîrza peyva seb'he bi kar dibe. Seb'he wate tesbîhê ku ji morîyan pêk hatîye û ew dîsan kirina tesbîhatan û biwêja dinî diîne bîra mirovî. Seb'he wate tesbîh, morî, lê Mîrza ew peyva di cîhê qaşa gustîlê da anîye.

Dema ku Mem ewê gustîlê dide ber tavê û li jêr tîrêjên tavê da dîna xwe dide qaşa wê û navê Zînê li ser qaşa wê dibîne, ji xwe va diçe. Bengîn li ser wî ayatan û du'aya Heft Hesarê û pirtûka Zatuşşefayê dixwîne.

Mem sê şev û sê rojan nehiş dikeve. Dema ku ew tê ser hemdê xwe, bavê wî ji Xudê ra secdeyê dibe û nimêj dike. Bavê Mem qurban û sedeqeyan dide û girtîyên zindanan azad dike.

Bavê Mem ji bona tendurustîya wî xwarin û vexwarinê dide hemû kesî û li ser sifra wî hemû ji tendurustîya Mem ra du'a dikin.

Dema ku bavê Memê ji hegera nexweşîya Memê agadar dibe, ji Xuda dixwaze ku evî derdî ji serê Memê derîne û ji Memê ra dibêje: “Şeytanê recîm dil û hinavê te tijî tirs kirîye, le'netê lê bîne, bila ji te bireve.”

Dema ku Mem û Bengîn ber bi Cizîra Botan rê dikevin, rê da kûvîyekê nêçîr dikin û ser jê dikin. Mîrza li wir jî dibêje, ewana serê kuvîyê bi emrê Xudê jê kirin. (çun bi pêka rêbazên dînî, Xudê kuştina wê helal kirîye, lewra Mîrza dibêje bi emrê Xudê ew ser jê kirin.)

Dema ku Mem diçe ser kanîyê ku bi Zînê ra xeber bide, Zîn dibêje: “Eger dixwazî destnimêja xwe bigirî, kerem ke!”

Wate Mîrza di gelek cîhê mesnewîyê da kirasê musulmantî û dîndarîyê li kar û kiryarên pişkek zor ji qehremanên çîrokê kirîye û wana wekî xwe musulman nîşan dide.

Lê di vê mesnewîyê da ew musulmantî û kiriyarên dînî tenê li bal Mem, Bengîn û bavê Mem di pişka yekem da dîyar dibe. Hindî ku Mem tê derbara Mîrê Cizîrê, li dewsa nimêj û du'a û biwêjên musulmanîyê, kişkanê, nerd û textwazî, xwarin, vexwarin, qelîyan û qawe û raw û nêçîr û geşt û seyran heye. Mirov dikare bêje ku li ser bîr û bawerîya Mîrza dîndarî û musulmantî li derbara Mîrê Botanê da lawaz bûye.

---

<sup>303</sup> mal 130-137

<sup>304</sup> mal. 138-143

Di pişka zor ya jêderên vê çîrokê da Mem bi jehrîya henarên Beko dimire û Zîn jî xwe dikuje, lê çun kuştin û xokujî di dînê Îslamê da heram e, Mîrza her du qehremanan jî bi emrê Xudê dimirîne. Mem dema ku Zînê dibîne dimire û Zîn jî hind li ser gorina Memê digirî û du'a ji Xudê dixwaze ku canê wê bistîne û Xudê jî du'ayê wê dipejirîne û ruhê wê jê distîne. Piştî mirina Memê û Zînê ew têne şuştin û kefn û defn kirinê.

Bi giştî fezaya Îslamîyetê di vê mesnewîyê da serdest e.

## PIŞKA SÊYEM

### 3. BERAWIRDKARÎ

#### 3.1.Edebîyata Berawirdî

Di vê pişka lêkolînê da em du metnên Kurdî ku her yek bi zaraveyekî cuda û heryek di qalibekî toreyî yê cuda da hatine afirandinê, lê mijara wan yek e, didin ber hev.

Ew jî beyta Mem û Zînê versiyona Oskar Mann û mesnewîya Mem û Zîna Mîrza ye.

Beyt bi zaraveyê Kurmancî û mesnewî jî bi zaraveyê Hewramî ye û herdu jî li ser evîna Memo û Zînê hatine vehûnan û darijtinê.

Emê van herdu metnana di du tevereyên cuda da bidin ber hev. Tevereya yekem daneberheva her du metnan li bara ruxsarî da ye.

Tevereya duyem jî daneberheva wan li bara naverokê da ye.

#### 3.1.1.Daneberheva Ruxsarî

Ev herdu berhemane li bara ruxsarî da dikevin nav pişka toreya vehûnandî/helbestkî. Lewra di van herdu berhemana da çend teybetmendî hene ku wana ji toreya pexşankî cuda dikin. Ew taybetmendî jî di pileya yekem da kêş û serwa û cuwankarîyên toreyî ne ku wana ji dîtir celebên toreyî vediqetîne. Yekîneya beytê bend û rêzik û yekîneya mesnewîyê jî malik û nîvmalik wate beyt û misra' in. Beyt ji 64 bendan pêk tê, ku 47 bendên wê helbestkî û 17 bendên wê jî pexşankî ne. Bendên beytê bi pêka serwayan jêk cuda dibin. Ev bendana hemû 644 rêzikan pêk diînin. Mesnewî jî ji 974 malikan pêk tê. Me mesnewî bi pêka mijaran jêk cuda kir û ji ew li ser 49 xelean parve kir u ji bo her xelkê serenavek danî.

#### 3.1.2. Kêş û Serwa di her du Metnan da

Mesenvî bi kêşa kîteyî hatîye vehûnandin. Her yek ji nîvmalikên vê mesnewîyê ji deh kîteyan pêk tê û ev kêşa di hemû nîvmalikan da bi durustî û rêk û pêkî hatîye raçav kirin. Kêşa kîteyî kêşa xomalî tete hejmarê û hema hema hemû mesnewîyên ku bi zaraveyê Hewramî hatine nivîsînê bi vê kêşê hatine darijtinê.<sup>305</sup>

Di beytê da kêşeke taybetî û hevgirtî di nîveka hemû rêzik û bendên wê da nehatîye raçav kirinê. Tenê beytbêj di dema gotina beytê da bi bilindkirin û nevikirina dengê xwe û bi kurt û dirêj kirina dengdêran kêş û rîtmekê didine beytê.

<sup>305</sup> Weke mesnevîyên *Xosrew û şîrîna* Xanayê Qubadî, *Nadirnameya* Elmas Xanê Kendoleyî û yên mayîn...

Di mesnewîyê da her malikek xudanê serwayeke serbixwe ye. Wate her du nîvmalik xudanê yek serwayê ne û peywenda serwaya malikekê bi malikên dî va tune ye. Lê di beytê da her bendek ku ji çend rêzikan pêk tên xudanê yek serwayê ye. Di beytê da hindêk caran hejmara serwayekî di bendekî da digehine 80 serwayana, lê hindêk jî tenê ji du rêzikan pêk tên.

### 3.1.3. Cuwankarî di her du Metnan da

Em di van her du berhemana da jî weke du berhemên toreyî rastî cuwankarîyên toreyî dihên. Lê çunku beyt edeba gelêrî ye û ji layê kesên nexwandî va tene gotin û vegotinê, rade û endazeya cuwankarîyên toreyî di wan da li himber edebîyata klasîk da kêma e. Cuwankarîyên toreyî di beytê da zor sade ne û pişka zor ji teşbihên sade pêk tên. Lê di vê mesnewîyê da berewajî beytê cuwankarîyên toreyî têr û teji ne. Kesê ku mesnewî danaye û nivîsiye, xwenda ye û haya wî ji cuwankarîyên toreyî heye û di gelek cîyan da hewl daye ku babetê bi cuwankarîyên ber bi çav bixemilîne. Di vê berhemê da em rastî gelek cur û celebên cuwankarîyê tên. Lê ji hemû celebana zêdetir teşbih û isti'are di vê berhema klasîk da serdest e. Di van her du berhemana da tewsîf û salixdan di pileyêke bilind da ye. Di pişka yekem da me ji her du berhemana çendîn nimûne raber kirine, li vira tenê ji bo berawirdkarîyê emê nimûneyekê raber bikin.

Nimûneyek ji hunera teşbihê di her du berhemana da:

#### **Mesnewî:**

*424. Korpe hey ta'ran sîyah su'ibanî*

*Kerdin serawêz texti pêşanî*

*427. Ebrû çun kemani gorigîr Behram*

*Yan bedri hilal yekşewey tamam*

*428. Neqqaşi qudret dû 'eyn kerden meşq*

*Bîyen we sermeşqi 'aşiqani 'eşq*

Di van çend malikana da Mîrza pêş da porik û egrîceyên Zînê diwekîne têjemarên reş û enîya wî jî diwekîne textekî ku ew têjemar rijyane ser wî textî. Li dû ra birûyên Zînê carekê diwekîne kewana Behramê Gor û careke dî jî diwekîne dasika hîva yekşewî ya zirav û dilbir. (Çawa Behramî bi wê kewana xwe gor nêçîr dikrin, Zînê jî bi wan birûyên xwe yên kewanî dil nêçîr dikirin.) Di malika 428an da her du biskên Zînê ku serê wan li ser lamên wê da tewandî ne, diwekîne du tîpên 'eynê „ع“ û dibêje ew her du biskên weke tîpên 'eynê ji kesên ku pê danîne mekteba evîndarîyê, ji wana ra bûne sermeşqa fêrbûna evîn û evînbazîyê...

Lê ev hunera di beytê da lawaz û sade ye.

Nimûneyek ji beytê:

*179-180. Mêze ke, li sing û berê min mîne xalî heft rengîn e.*

*Mîne sîne Toqatê dor bi çîn e.*

*274. Insan mîne gulan e.*

Em dibînin ku hunera cuwankarîyê li beytê da li himber mesnewîyê da gelekî lawaz e.

### 3.1.4. Daneberheva Qehremanên Serekî yên her du Metnan

Gava ku em van her du berhemana didin ber hev em dibînin ku hejmara qehremanên wan hema hema hindî hev in. Hejmara qehremanan bi giştî di mesnevîyê da 17 û di beytê da jî 18 lib in. Di nava van hejmarana da her du berhem di 14 qehremanan da hevpişk in. Di tabloya hejmar 12 da me qehremanên her du berhemana dane ber hev.

#### Tabloya hj. 12. Qehreman di her du Metnan da

hj.	Qehremanên Beytê	Qehremanên Mesnewîyê
1	‘Alî paşa	Padişahê Yemenê/ nav nehatîye
2	Mem	Mem, Şay Mem.
3	Zîn	Zîn
4	Sitî	Sitî/Estî
5	Mîr ‘Azdîn	Mîr Zînedîn
6	Birayê Memê yê axiretê	Bengîn/Bengîne
7	‘Hesen	Qere Tacedîn
8	Çeko	Çeko
9	Qere Taclîn	‘Efo
10	Beko	Bekir
11	Zîna qîza Beko	Melek Rey’han Qîza Bekir,
12	Keniza Zîne	Keniza Zîne
13	Îşqebanû	Kebûteri ewel
14	Qemerbanû	Kebûteri duyem
15	Gulpêrî	tune
16	Zelîxa	tune
17	Apê Memê	tune
18	Xocê Xizir	tune

19	Bozê Rewan	tune
20	tune	Keniza Melek Rey'hanê
21	tune	Dayena Melek Rey'han
22	tune	Coftar

Beyt û mesnewî di navê 14 qehremanan da hevpişk in, lê hindek cudatî di nav û neqş û kiryarên wan da heye:

Di beytê da navê bavê Memê 'Alî Paşa ye.

Di mesnewîyê da navê wî tune ye, tenê bi xwandina metna mesnewîyê ra mirov agahdar dibe ku ew padişayê Yemenê ye.

Di beytê da navê Mem, Memê Alîyan e.

Lê di mesnewîyê da navê Mem, Şay Mem û Emîrî Enam e. Di hîç yek ji van her du berhemana da navê Memê weke Memê Alan nehatîye.

Di beytê da nasnavê Zînê, Zîna Zêdan e.

Di mesnewîyê da Xatû Zîn e.

Di beytê da navê mîrê Cizîrê, Mîr 'Azdîn e.

Di mesnewîyê da navê wî Mîr Zînedîn/Zîndîn e.

Di beytê da navê Bengîn nayê, tenê beytbêj dibêje ku destebirayê Memê yê axiretê, lê di mesnewîyê da navê wî wekî Bengîn û Bengîne hatîye û ew xizmetkarê Memê ye û herdem di gel Memê ye.

Di beytê da ji her sê mêrxasên bajarê Cizîrê ra Celalî tê gotinê û 'Hesen birayê Mezin û Qere Tajlîn û Çeko birayên biçûk in. Lê di mesnewîyê da Qere Tacedîn birayê mezin e û her du birayên dî 'Efo û Çeko ne.

Di beytê da nasnavê Beko 'Ewan û Qumsî ye. Lê di mesnewîyê da nasnavê wî; Bekir A'xa, Bekiri merdûd, Bekiri mirdar e.

Di beytê da navê qîza Beko jî Zîn e û ew keniza Zîna Zêdan e. Lê di mesnewîyê da navê wê Melek Rey'han e. Ew reqîba Zînê ye û keniz û dayena wê jî heye.

Di beytê da gelek kenizên Zînê hene, ku yek ji wan ew e ya ku Zîn ji xwe ra dişîne ser kanîya Gulan, avê. Di mesnewîyê da jî gelek kenizên Zînê hene, lê ya ku neqşa serekî dilîze ew e ya ku bi destûra Zînê dizîva xwarekê ji Memê ra dibe zindanê.

Di beytê da sê qîzên padişahê perîyan Zînê ji Cizîra Botan diînin bajarê Mu'xribistanê cem Memê û navên wan ev in: Îşqebanû, Qemerbanû û Gulpêrî. Lê di mesnewîyê da du kevok neqşa qîzên padişahê perîyan dilîzin û navê wan jî tune ye.

Di beytê da du apên Memê hene, ku yê biçûk Xocê Xizir di xewna xwe da dibîne. Lê di mesnewîyê da ne navê Xocê Xizir hatîye û ne jî li ser apên Memê agadarî hatine dayînê.

Di beytê da navê dayîka Memê, Zelîxa(n) e. Lê di mesnewîyê da çî agahdarî li ser wê tune.

Di beytê da Bozê Rewan, kurûyê be'hrî heye, lê di mesnewîyê da navê wî nehatîye.

Di beytê da dema ku Mem tê ber çemê Cizîrê Xocê Xizir buhrê çem nîşanî wî dide. Lê di mesnewîyê da ew rastî cotkarekî tê, cotkar rê û rêbazan nîşanî wî dide.

Bi giştî di gel hemû wekhevî û cudatîyên di nîveka qehremanan da em dibînin ku neqş û karakterên Mem, Zîn, Mîr, Beko, Qîza Beko, hersê Mêrxasên bajarê Cizîrê û Sitîyê di van her du berhemana da kê û zêde wekî hev in.

### **3.1.5. Vegêran**

Me di pişka yekem da got ku vegêran yek ji hêmanên sereke yê edebîyata çîrokî ye. Çîrok bi şeweyên cuda tên vegêranê, ku yek ji wan vegêrana zincîrî ye.

Ev her du berhemên me jî bi şeweya zincîrî hatine vegêranê, lê hindek xelekên wê zincîrê di mesnewîyê da ketine:

Ev gêrneveya di beytê da ji serî ta dawîya çîrokê berdewam û rêk û pêk e. Di beytê da bi gêraneveya beytbêjî em pêş da bi Mem û malbata wî û bajarê wî ra nasiyar dibin û beytbêj çîrokê ji serî ta dawîyê weke zincîrekê li dû hev ra ji me ra vedigêre. Lê di mesnewîyê da em malbata Memê nas nakin û em nizanin ka Mem kê ye, xelkê ku ye û çî kare ye. Nişkav da du kevok fir didin û diçin li sivandeka eywana Memê dadinin. Li dû ra em agadar dibin ka Mem kê ye. Ji bilî vê kêmasîyê di dîtir pişkên mesnewîyê da her çiqas ku helbestkarî mijar kurt vebirîye jî, lê çîrok bi başî hatîye vegêranê.

Di herdu metnan da jî bêjer yan nivîser ji goşe nîgaya kesê sêyem wecê werdigirin û her du jî danayê kul in. Lê bêtbêj ji mesnewînivîs kêmtir xwe têkelfî mijarê dike. Di pişka têt da em ê vê mijarê bi berfirehî şirove bikin.

### **3.1.6. Huzûra bêjer yan danerê berhemê di metna berhemê da**

Di mesnewîyê da bêjer yan nivîserê mesnewîyê gelek caran hebûna xwe radigehîne û weke bêjerekî xwe têkelfî qewimînan dike û dibêje, min filan pişka çîrokê got û ez ê niha ji we ra li ser filan pişkê bêjim, yan we li ser filankesê bihîst, niha jî em ê li ser filan bûyerê biaxivin.

Çend nimûn ji xwetêkelkirina mesnewînivîs di metan çîrokê da:



15. *Ewsa dumay medihi yektay yegane*

*Goş der we destan dewri zemanê*

53. *Îmcar bişnewe to ce Zîn xeber*

*Ce xwabi mestî ser awerd we ber*

96. *Emcar bişnewe ce Xatûn û Mem*

*Dest kirdin balîn dem we bani dem*

349. *Înbar bişnewe Emîrî namdar*

*Ce seray Tacdîn çun girtiş qerar*

399. *Îmcare bişnew şemmê ce Xatûn*

*Pey dîdenî Mem dest kerd we efsûn*

596. *Înbar bişnewe ce ÊEfo û Çeko*

*Yawan we xane şêrani şiko*

876. *Emcar bişnewe ‘eceb dasitan*

*Ce rûy rasitî bikerû beyan*

Lê ev hinda di beytê da li ber çavan nakeve. Em hebûna beytbêjî di beytê da seh hankin. Beyt bixwe bi şiroveya bûyeran bihîster yan xwîner li dû xwe ra radikêşe, lê di mesnewîyê da nivîskar bûyerê diîne bîra xwîner yan bihîsteran.

### 3.1.7. Ziman

Ziman yek ji serekîtirîn hêmanên gotin û nivîsîna çîrokan e. Di her berhemeke toreyî da lawazî û zengînîya zimanî yek ji giringtirîn pîvaneyên serratî û kêmasîyên berheman tête hejmarê. Yek ji amûrên ku dibe hegera serratîya berhemeke toreyî zengînîya zimanî ye. Gava ku em ji vê dîdegahê ra dûra xwe didin van her du berhemana, em dibînin ku ziman di van her du berhemana da jî di pileyeke bilind da ye.

Ev her du berhemên me jî bi zimanê Kurdî hatine nivîsînê. Mijara her dukan yek e. Beyt bi zaraveyê Kurmancî û bi devoka Ruhayê hatîye vehûnandinê. Mesnewî jî bi zavareveyê Goranî û devoka Hewramî hatîye nivîsînê.

Her du berhemên me jî li bara zimanî da zengîn in. Di her dukan da jî rewanbêjî û dewlemendîya zimanî dîyar e.

Herçiqas ku ev her du berhemên me li bara zimanî da di pileyeke bilind da xwe dinimînin, lê disan jî li ber ho û hegerên cur be cur nikarîne xwe ji zimanên serdest dût bixin. Lewra em dibînin ku di van her du berhemên me da hejmareke zor ji peyvên zimanên; Erebi,

Turkî û Farsî hatine guncandinê. Emê van her du berhemana di vê barê da bidin ber hev û bibînin kanê radeya bandora zimanên bîhanî li ser her yekê ji wan çend û çûn e.

Lê em ê tenê li ser kartêkiran zimanên Turkî û Erebi li ser van her du beheman agahdarîyan bidin û em ê xwe ji kartêkirina zimanê Farsî li ser van her du berheman biparêzin. Hegera wê jî ew e ku her du zimanên Kurdî û Farsî di gelek peyvên da hevpişk in û destnîşankirin û etimolojîya peyvên di van her du zimanan da karekî dijwar û dervayî vê lêkolîna me ye.

Em dizanin ku edebîyata klasîka gelên Rojhelata Navîn bi tundî ketîye jêr bandora ziman û edebîyata Erebi. Di nav edebîyata klasîk da bikarbirina peyvên giranê Erebi nîşaneya zengîniya wê toreyê dihate hejmarê. Helbestkar tédikoşin ku peyvên wisan giran bi kar bibin ku têgehîştina ji çemk û wateya wan diwartir be û ew hinda ji xwe ra nîşaneya bilindbûna pileya berhema xwe dizanin.

Lê beyt weke toreyeke gelêrî hindêkê cudatîya wê di gel edebîyata klasîka nivîskî heye. Beyt bi zimanê gel û bi gotinên sade û sakar hatine darêjtinê û têgehîştian wan ji her kesî ra sanahî ye. Di pişkên bê da em ê tédikoşin ku radeya peyvên zimanên Turkî û Erebi li van her du berheman da destnîşan bikin.

### **3.1.8. Rêjeya Peyvên Bîyanî di Her du Berheman da**

Pêdivî ye ku em bizanin radeya bikarbirina peyvên bîyanî di van her du berhemên me da çiqas e.

#### **3.1.8.1. Rêjeya Peyvên Bîyanî di Beytê da**

Ev beyta ji 644 rêzikan pêk hatîye ku bi giştî dibe 6176 peyvên. Hejmara peyvên ferhengî <sup>306</sup> yên vê beytê 1606 lib in, ku ji wan 210 lib peyvên bîhanî ne. Ji wan peyvên bîhanî 33 lib Turkî û 177 lib jî Erebi ne. Pişka zor ji van peyvana ew peyv in yên ku êdî gelê Kurd di jîyana xwe ya rojane da bi kar dibin û kêma kes dizanê ku ew peyv ne Kurdî ne.

Peyvên Erebi yên wekî: ‘aciz, ‘adet, ehâlî, ‘alem, ‘aqil, ‘aşiq, ‘eşq, carî, cima’et, da’wet, xelq, xezîne, ‘xurbet... Yan peyvên Turkî yên wekî: xatûn, xanim, qona’x, oyîn, oxir, oca’x, îş, eteg...

---

<sup>306</sup> Peyvên ferhengî ew peyvên yên ku ji dubarebûna wan tenê libek bête hejmarê. Bo nimûne peyva xûşk di vê beytê da eger deh caran jî hatibe, tenê carekê tê hejmarê, ku ji wê ra hejmartina ferhengî dibêjin.

Ev cure peyvana herçend ku bi reh û rîşeyên xwe va ne Kurdî ne, lê êdî bûne Kurdî. Her kurdek çî xwenda û çî nexwenda ji wateya wan tê digîje. Bi gotineke dî hebûna van peyvana di edebîyata devkî da karekî asayî ye û nikare bibe kêmasî ji vê beytê ra.

Di zimanê vê beytê da gelek caran peyv û navdêrên mêza weke navdêrên nêrza hatine. Ew jî yek ji taybetmendîyên zaraveyê Ruha- ‘Efrînê ye, ku dikare bibe mijara devoknasîyê.

### 3.1.8.2. Rêjeya Peyvên Bîyanî di Mesnewîyê da

Mesnewîya Mem û Zînê bi giştî ji 974 malikan pêk tê ku hemû ser hev dibin 11024 peyv. Ji van peyvana 3441 peyvên ferhengî ne. Ji 3441 peyvên ferhengî 592 lib peyvên Erebi û 3 lib peyvên Turkî hene.<sup>307</sup> Di gel wê hindê ku hejmara peyvên Erebi di vê mesnewîyê da ber bi çav in, lê zortir ew peyv in yên ku di edebîyata klasîk da baw in û rewaka wan heye. Yan jî zortir peyvên ayînî ne.

Bi giştî zimanê vê mesnewîyê zimanê edebîyata klasîka Kurdî ye û di pile û payeyeke pir bilind da hatîye darêjtinê.

Gava ku em van her du berhemana didin ber hev, em dibînin ku ji sedî panzdehê (%15) peyvên mesnewîyê Erebi ne û ew hejmara li beytê da kême û dike ji sedî danzde (%12). Lewra zimanê mesnewîyê zimanê klasîkan û zimanê dîwanî ye, lê zimanê beytê zimanê gelêrî ye. Zimanê mesnewîyê zimanê mizgeft û medreseyan e, lê zimanê beytê zimanê dîwanxaneyê û zimanê gel e.

Gava ku em bi hûrgilî dîna xwe didin van her du berhemana û radeya peyvên bîhanî di wan da mêze dikin, ev rastîya ji me ra derdikeve meydanê ku mesnewî weke berhemeke nivîskî û babeteke klasîk li jêr kartêkirina ziman û edebîyata Farsî û Erebi da maye, lê beyt weke berhemeke gelêrî li jêr kartêkirina zimanê rojane yê gel da hatîye afirandinê.

### 3.1.9. Peyvên Erebi û Turkî yên Hevpişk di Her du Berheman da

Di tabloya jêrê da ew peyvên Erebi û Turkî yên ku li her du berheman da hatine û ew her du di wan da hevpişk in, dihêt:

**Tabloya hj. 13. Berawida peyvên hevpişk di her du berheman da**

hj.	Beyt	Mesnewî
1	‘Aciz	‘Aciz

<sup>307</sup> Ji bilî peyvên ‘Erebi û Turkî gelek peyvên Farsî jî di vê mesnevîyê da hene, lê çun pişkek zor ji van peyvana peyvên hevparên di nîveka Kurdî û Farsî da nin, destnîşankirina wan dervayî mijara vê lêkolîna me ye.

2	'Alem	'Alem
3	'Aqil	'Aqil
4	'Aşiq	'Aşiq
5	Axiret	Axiret
6	Cebbar	Cebbar
7	Cemal	Cemal
8	'Acaba	'Eceb
9	Ahalî	Ehli
10	Elwan	Elwan
11	Emr	Emr
12	'Eqil	'Eqil
13	'Eşq	'Eşq
14	Fuqare	Feqîr
15	'Hakim	'Hakim
16	'Hasret	'Hesret
17	Haram	'Haram
18	'Hukm	'Hukm
19	'Hûruk	'Hûr
20	Ixtîyar	Ixtiyar
21	Lîyaq	Layiq
22	Mabên	Mabeyn
23	Maqam	Muaqam
24	Meqbûl/maqbûl	Meqbûl
25	Qefes	Qefes
26	Qerar	Qerar
27	Qerar	Qerar
28	Qetil	Qetl
29	Qewl	Qewl
30	Rebb	Rebb
31	Rebbil'alamîn	Rebbul'alamîn
32	Re'hme	Re'hmet
33	Resm	Resm

34	Seyd	Seyd
35	Wezîr	Wezîr
36	‘Xerîb	‘Xerîb
37	Xatir	Xatir
	<b>Peyvên Turkî</b>	<b>Peyvên Turkî</b>
1	oyîn	oyîn
2	qapî	qapî

Em dibînin ku di hemû peyvên Erebî da ev her du berhem di 37 peyvên da hevpişkin û di peyvên Turkî da jî di du peyvên da hevpişk in. Peyvên hevpişkên van her du berhemana ew peyv in yê ku gel bi kar dibin û karbirda wan ya ayînî heye, yan jî êdî hind di zimanê Kurdî da hatine, kêk kes dizanê ku ew peyv ne Kurdî ne.

### 3.1.10. Dîyalog

Di her du berhaman da jî em rastî gelek dîyalogan tên.

Di beytê da em rastî dîyalogên nîveka hersê qîzên paşayê perîyan û herwisan dîyalogên nîveka Memê û Zînê di qesra memê da û li ser kanîya Gulan tên.

Di mesnewîyê da dîyaloga nîveka her du kevokan, ya Memê û bavê wî û ya nîveka Memê û Bengîn nimûneyên here balkêş yê vê berhemê ne.

#### **Nimûneyek ji dîyaloga nîveka Memê û Zînê ya di Beytê da:**

158. *“Memê sewtekê ban kire mîvana şevane.*

159. *Memê go: “Xweyîng! Mi tu qewl û qerar bi eksîyê xelqê ra bera nedane.”*

160. *Zînê serê xwe rakir ji xewê, li destî xwe giran(de) dawa Memê Alîyane.*

161. *Go: “Tu merîkî xerîb î, belkî heye da’wake te girane.*

162. *Te gotîye: Belkî va qona’xa, qona’xeke camêrane.*

163. *Ezê da’wê te çê bikim bi qebzê şûrane.*

164. *Na ku da’wê te bi şor û mehakimane.*

165. *Ezê da’wê te çê bikim li huzûrê Mîr ‘Azdîn, li cim’atê mêrane.”*

166. *Memê go: “Xweyîng! Were, em ban kin gelî carîyan û gurcîyane!”*

#### **Nimûna Dîyalogê di Mesnewîyê da:**

Zîn:

56. *“Awaz da we Mem Xatûni dulber*

*Watiş ey cewan ce hal bêxeber*

57. *Mer heddit çêşen darî ser ce çend ?*

*Amay beî otaq hiç namay ne wend*

58. *Er Emîr dano qesem be dadar*

*E' zay saşimit merîzo be dar,,*

Mem:

62. *“Watiş ey nazdar bînayî çeman*

*Firiştey şerîf nadirey dewran*

63. *Mayey heyatim roş û rewanim*

*Quwweti zemîr cesed û canim*

65. *Min ne cagey wçm neşyemim we ber*

*Xaş nigah biker bawer we menzer,,*

### 3.1.11. Mekan/Cîh

Me di pişka yekem da li ser mijara mekan û zeman şirovkinên pêdivî dane, pêdivî nîne careke di li vir em wê mijarê dubare bikeyn. Di vê pişkê da em ê her du berhemên mijara xwe li bara cur û celebên mekanî û zemanî da bidin berhev.

Tabloya hejmar 14. cur û celebên mekanan di her du berheman da nîşan dide.

#### Tabloya hj. 14. Mekan di her du berheman da

hj.	Celebên Mekan	Mekan di Beytê da	Mekan di Mesnewîyê da
1	Mekanê rastîn yên Taybetî	Bajarê Mu'xribistanê- Qesra 'Alî Paşa- Be'hra 'Umîyan- Be'hra Belek- Qesebeyî Cizîra Botan- Qesrên Memê û Zînê- Çemê Cizîrê- Gola Mar û Masîyan- Buhurê Çemê Cizîrê- Sûk û Tarîkê Bajarê Cizîrê- Qonaxa Celalîyan- Kanîya Gulan- Nêçîrgeha Cizîrê- Zindana Bajarê Cizîrê-	Cizîr û Bot- Dicle- Ke'be- Nîl- Şarî Cizîr- Tetaran- Xorasan- Yemenîşar- Çîn - Maçîn- Bedexşan- Hindûstan- Eywana Memê- Dîwexan- Oda Zînê- Seray Emîr- Xaney Qeretacedîn- Yaney Bekir- Qapî Şahî-

		Şam- Birca Belek- Meydana Bajarê Cizîrê- Mekanê Keçan û Bûkan- Hêla Heremê- Dîwana Mîr- Bajarê Toqatê- Sînorê ‘Ecem û Muslimîn	
2	Mekanên rastîn yên Giştî	Zozan û Yaylî - Çol û Kerbela- Çol û Berrî (Nêçîrgeh)- Qabristan- Tewlê Hespan- Sînorê ‘Ecem û Muslimîn- War- Mehelle- Qapî- Etegê Heft Çîyan- Merg- Kanî- Yazlix- Qonax- Mal- Erd- Xan- Dewrê Dinyayê- Gêçît- Sahra- Ode- Hewlî- Heyat-Serî Kaşan- Koşk- Welat- Xezîne- Sînorê Ecem û Muslimîn- Meqam- Tirb- Taq- Pencere- Hefê Bilind- Bербendê Asê- Camî-	‘Xar- Aşîyan- Ba’x- Bazar - Bala- Bani ser- Bêd- Bêd û berr- Bend- Berr- Bilad- Bîrûn- Bostan -Ca- Cage- Çah- Cehan- Çeşme- Enderûn- Dam -Der û deşt- Derga -Dîwexan - Dîyar - Ecem- Erebe -Eywan - Gilko- Gorr- Gulzar- Hewa/asiman - Ko- Kosar- Kûçe- Kûrey nar – Mawa- Me’xar -Menzil- Meqam- Metbex - Mezar- Mezargeh- Ode/ Otaq- Otira’x- Payîni şar-Pasar- Pest- Qapî Şahî -Qefes- Qonax- Ra/ Rah- Şaneşîn- Şebustan- Sehni bostan- Se’hra - Sema -Seqf- Seraw- Serzemîn- Talar- koşk- Taq û der- Terane- Tewîlexanan- Wadî- We’degah- Welat- Xak- Xaki rûm- Xane- Xumxane- Yage- Yane- Yextexane - Zemîn- Zindan- Cayê Xelwet- Metbex- Şanişîn-

3	Mekanê mîtik	Hewza gulan- Baxçê gulan û sêvan (baxçê qîzên paşayê perîyan)-	Irem/Rewzey Irem – Qaf-Serçeşmey Heyewan-
4	Mekanên ayînî	Qatî esmanî heftan-	Ba'xi berîn- Dehri donya-Donyay Fanî- Firdewsi berîn-Kewser- –Rewzey Rizvan – Seqer- cehennem- Weheşt/Cennet/Cennetulmawa- ‘Erş-Qapî Qeyomi Dana- Me'hşer-Qiblega-
5	Mekanên Xeyalî	Goleke xwînê ya birca nehan-	‘Xari nehanî- Lamekan mawa- Gerdûn-
6	Mekanên Metaforîk	tuneye	Besat/ser besat- Çerxi exzer- Çerxi kecreftar- Çerxi Mu'elleq- Perdey ‘ismet-Texti can- Çerxi keçzen

Dema ku mirov dîna xwe dide vê berawirdîyê, mirov dibîne ku ev her du berhem di nav mekanên rastîn da tenê di navê Cizîra Botan da hevpar in û mekanên rastîn yên taybetî ku di beytê da hatine ji yên mesnewîyê zêdetirin û hemû jî bi çîrok û serpêhatîya beytê va girêdayî ne, lê hejmara mekanên rastîn yên taybetî ku di mesnewîyê da hatine, pişka zor têkelîya wan bi çîroka beytê va girêdayî nîn. Mekanên taybetî yên ku di mesnewîyê da hatien, ew mekan in yên ku zortir di edebîyata klasîk da weke sembol dihên û tekilîya wan ya taybetî bi çîroka Mem û Zînê û cîhê bûyera serpêhatîyê va tuneye. Mekanên wekî: Ke'be, Nîl, Tetaran, Hindûstan, Bedexşan, Çîn û Maçîn...

Lê hejmara mekanên rastîn yên giştî û mekanên ayînî di mesnewîyê da ji yên beytê zêdetir in. Ew mkanana jî dîsan mekanên sembolîk in û têkelîya wan bi bûyera serpêhatîya Mem û Zînê va yan tuneye, yan jî kêma in.

Di beytê da tenê navê mekanekî ayînî hatîye, ew jî ne mekanekî dîyar û şênber e: Qatî esmanî heftan. Lê di mesnewîyê mekanên ayînî mekanên naskirî û sembolîk ên dînî û ayînî ne, weke: Rewzey rizvan, cennet, cehnnem, me'hşer, qiblegah...

Mekanên metaforîk ku taybetî edebîyata klasîk in, di beytê da nehatine, lê di mesnewîyê da hatine.



. Mirov dikare zêdebûna hejmara mekanên ayînî û giştî û hebûna mekanên metaforîk di mesnewîyê da bi şeweya hizirîn û cihanbînîya Mîrza va girê de. Haya Mîrza bi edebîyata klasîk heye û herwisan ew di gel mekanên ayînî nasiyar e û nasiyarîya wî di gel edebîyata klasîk û nasyarîya wî di gel cuwankarîyên toreyî ew han daye ku mesnewîya xwe bi hanîn û afirandina mekanên ayînî û metaforîk zengîntir bike.

Di vê barê da beytbêj li himber Mîrza da di asteke pir nizim da ye û ew di beytê da zortir mekanên rastîn yên taybetî ku bi bûyerê va girêdayî ne bi kar dibe û mekanên metaforîk nas nake û mekanên ayînî jî bi kar nabe. Mirov diakre bêje ku beytbêj bi çavekî cidî û rastîn dîna xwe dide bûyerên beytê, lê Mîrza bi çavekî edebî û xeyalî çîrokê dinihêre. Cihanbînîya Mîrza cihanbînîyeke ayînî û edebî û cihanşimûl e, lê cihanbîya beytbêj gelêrî û navçeyî û bertesk e.

### 3.1.12. Zeman/Dem

Zeman jî di van her du babetana da weke mijara mekanê newekhevî dîyar dike. Çawa ku di mijara mekanan da me dît, wisan jî di mijara zemanî da em dibînin ku bikarbirina zemanên ayînî û zemanên metaforîk di mesnewîyê da gelektir ji beytê hatine. Em dikarin vê mijarê jî dîsan bi cihanbînîya helbestkar û beytbêj va girê bidin.

Di tabloya hejmar 15 da zeamanên ku di van herdu babetana da hatine, tê raberkirinê.

**Tabloya hj. 15. Zeman di her du berheman da**

hj.	Navê Demên Çîrokî	Di Beytê da	Di Mesnewîyê da
1	Dema dîrokî	tuneye	tuneye
2	Dema salhejmêrî (sal, demsal, meh, hefte, şev, roj, danên şev û rojê)	Şev, binê şevê- şeva çûnî- nîvê şevê- hîşev- meh- roj-sibe -êvar-hîro- nîvro -roj -hefte -	Aro- Weqti şam- Sitarey seher- Dûşîn- Ro- Sal- Şebaneroj/ şeban û rûz- Seher- Şew- Sipêde dem- Sub- Tulû'I qemer- Êwar- Îmşew- Leyl - Mah - Nehar
3	Dema demjimêrî	Sa'et	Sa'et-
4	Dema rêzimanî	Hersê dem jî heye	Hersê dem jî heye
5	Dema ayînî	Rojên eydan û erefatan- roja qamê- nimêja sibê-	Axerelencam- Axerzemna- Weqti şu'ley şewqi nûr- Xurûs bangdan- Yewmulmat- Weqti nemaz-

		acel-	Wadey selat- Roy merden-Roy restaxêz- Muezin bangdan- Qîyamet-
6	Demên bêpîvan	tune	Axer- Wade- Daim- Dem- Dem be dem- Daimulmedam- Dereng- Dersat- Dewri zemanê -Dewran- Dewri cehan- Dûrîney dewran - Serencam- Rozgar- Endek weqtê- Ga ga/Gah û bêgah- Gerdişi çerx- Qedîm
7	Demên metaforîkî	tune	Sopay ebyezî- Sopay hebeş- Sopay hind- Sopay seyl- Sopay xawerî- Şay hebeş- Kafûr

Dema rêzimanî di van herdu metnan da wekî hev e. Di her du metnan da jî ji her sê demên rêzimanî wec hatîye wergirtinê. Nimûne li vê bareyê da di pişkên yekem û duyem da hatine. Ji bo dubarenebûna mijarê em xwe ji înanî nimûyan di her du babetan da diparêzin.

### 3.2. Tevereya Duyem Daneberheva Naverokî

#### 3.2.1. Naveroka her du Berheman bi kurtî

Her çiqas ku mesnewî li bara toreyî da di pileyeke bilind da hatîye darêjtinê, lê li bara darêjka çîrokî da kêmasîyên wê hene. Mîrza bêy wê hindê ku me pê agadar bike ka Mem kê ye û çî kare ye û li ku dijî, piştî tehmîdîyeyeke kurt du kevokan dişîne ser banê eywana Mem û kevok li ser cuwanîya Mem zendegirtî dibin. Li dû ra jî di gelek cîyan da di çêkirina koregirêyan da serketî nîne. Bo nimûne dîyar nake ka Memê kê ye? Xelkê kîderê ye? Yan ka Melek Reyhanê ji ku zanî Mem dê bête ser şetê Cizîrê û hatina wê li rex çem bi heceta kirassoyê çî bûye û herwisan em nizanin ka Bekir çima dujminaya Memê û Tacedînî dike. Bi giştî zincîreya çîrokî û li hevanîna mijaran di mesnewîyê da lawaz e. Lê berewajî mesnewîyê ev hinda di beytê da rêk û pêktir e. Beyt bi şiroveya bajarê cîhê jîyana Memê û bavê Memê dest pê dibe. Bi xwandina beytê ra mirov dizane ku Mem kê ye, kurê kê ye, li ku dijî. Herwisan zincîreya çîrokê bi ser û ber hatîye û hemû ho û heger û koregirêyên çîrokê bi mentiq in. Lê çun beyt nivîskî nîne, di gelek cîyan da mirov agahdar dibe ku mijar di bîra

beytbêjî da nemaye. Li ber wê hindê ye ku beyt di destpêkê da li hemû layan da zengîn û rengîn e, lê bere bere hindî ku ber bi dawîyê diçe lawaz û lawaztir dibe.

### **3.2.2. Berawirdîya Rêçên Ayînî di Mesnewî û Beytê da**

#### **A. Mesnewî**

Gava ku mirov evê mesnewîyê dixwîne, mirov rastî helbestkarekî dîndar tê, ku ne tenê bixwe di ragehandin û vegêrana çîrokê da mirovekî musulman e, belkû qehremanên serpêhatîyê jî dike musulman û hemû hels û kewtên wana bi pêka cîhanbînîya xwe dadirêje.

Mesnewî bi 14 beytên tehmîdiyeyê dest pê dibe û piştî te'hmîdiyeyê du kevok bi emrê Xudê peyda dibin. Mîrza binêşa çîrokê jî bi dîn û dîndarîyê va girê dide û di destpêkê da dibêje ku mezinên ayînî weha gotine.<sup>308</sup>

Mîrza qehremanên berhema xwe jî wekî xwe dike musulman, destnimêjê bi wan dide girtin, nivêjê bi wan dide kirinê.

Fezaya Îslamîyet û dîn û dîndarîyê li ser nîveya yekem ya vê mesnewîyê da hakim e û heta ku Mem û Bengîn neçûne Cizîra Botan hemû kar û kiryarên qehremanên mesnewîyê bi pêka ayînê Îslamê ye. Lê dema ku ew digehene Cizîra Botan êdî nêçîr û rav û leyza kişikanê cîhê nivêj û ita'etan digire.

Di dawîya mesnewîyê da jî cenazeyên Mem û Zînê têne şuştin û têne kefn û defn kirinê.

Bi giştî fezaya Îslamîyetê di vê mesnewîyê da serdest e.

#### **B. Beyt**

Lê fezaya ayînî û dîndarîyê di beytê da kêr û bêreng e. Tenê despêka beytê da em rastî çend motîvên dînî tîn: rojên 'aydan û 'arefatan. Yan Mem 'hifz dike 'ilmî rebbil-'alemîn, xetîm dike sî cuzû Qurane...

Bi giştî berewajî mesnewîyê di beytê da fezayeke istûreyî serdest e, ta fezayeke dînî. Ew biwêj û peyvên dînî jî ku di beytê da hatine pişka zor biwejên hevpar in di dînê Îslamê û bawerîyên gelên rojhelata navîn da. Weke rojên 'eyd û erefatan, nimêj û...

Di beytê da zortir em rastî motîvên efsaneyî û rêça ayînên Îranî yên kewn tîn. Navê hersê qîzên padişahê perîyan ( di gel li ber çav girtina celebên beytê yên dî) her sê makeyên bawerîya Mîtraîzmê; tav, hîv û îstêrê diînin bîra mirovî. Di beytê da em dibînin ku qîza Beko ku navê wê jî Zîn e, xwe dike libsê Zîna Zêdan û tê li ser bihurê şettê Cizîrê da ku bi pîlanên bavê xwe Beko, Memê bixapîne û bi Memê ra bizewce, eger nekarî jî Memê di gola mar û masîyan da wer bike. Ev hatina Zîna qîza Beko û bihurê şettê Cizîrê pira çînwetê ya dînê

---

<sup>308</sup> mal. 108

Zerdeştîyan diîne bîr mirovî. Bi pêka nivîsîna pisporên dînê Zerdeştî, dema ku kesek dimire, piştî sê rojan canê/ruhê wî diçe ber dadigaha Îzedê Mêhr, li dû ra ew ber bi pira çînwetê rê dikeve. Eger ew kesekî/e xudanxêr û qencekar be, li ser pira çînwetê keçikek xweşik tê pêşewazîya wî/ê û ewî/ê ber bi bihiştê rênimûnî dike. Lê eger ew kesekî neqenc û bedkar be, pîrejineke pintî û kirêt tê pêrgî wî û ewî di pira çînwetê ra davêje nava dojhê.<sup>309</sup>

Em dikarin hatina Zîna qîza Beko di libsê Zîna Zêdan û buhurê şettê Cizîrê biwekînin pira çînwetê û firîşteya rênimûnker. Zîna qîza Beko pêş da xwe weke Zîna Zêdan (keçka xweşik) dide nasandinê. Lê paşê rûçkê wê yê rastîn eşkere dibe (pîrejina pintî) Û Memê wê nas dike. Çun Mem mirovekî pak û xudanxêr bûye, hezretî Xizir tê hewara wî û buhurê şettê Cizîrê nîşan wî dide û ewî ber bi bihiştê wî ku Cizîra Botan e dişîne.

Di dawîya beytê da jî dema ku Mem bi jehrîya henarên Beko dimire, Zînê jî xwe dikuje. Lê di mesnewîyê da her du qehremanên sereke yên çîrokê jî bi emrê Xudê dimirin. Di beytê da li ser merasima kefn û defn û şuştina cenazeyan tiştê nehatîye gotinê. Lê di mesnewîyê da ew mijara weke mijareke dînî hatîye helêxistinê.

### 3.2.3. Meqamê Jinê di her du Berheman da bi Nihêrîna Ayînî û Civakî

Gava ku mirov evê mesnewîyê dixwîne, mirov dibîne ku hişê baviksalarîyê di vê mesnewîyê da wekî çawa ku di beytê da jî heye, serdest e.

Her çiqas ku di beytê da neqşa dayîka Memê hind ber bi çav nîne jî, lê navê wê hatîye, lê di ve mesnewîyê da navê wê jî nehatîye.

Di beytê da navê her sê qîzên paşayê perîyan navên jinane ne, lê di mesnewîyê da navê wan yên jinane jî tune ye û li cîhê sê qîzan ew tenê du kevok in.

Di Mesnewîyê da dema ku her du kevok Zînê ji bajarê Cizîrê diînin bajarê Yemenê û ew û Mem pêkve diaxivin, helbestkar wêya li himber Memê da dadixe. Bo nimûne dema ku Zîn ji Memê ra dibêje gazî xulamên xwe bike, helbestkar dibêje; Zîn ‘erz kerd we xidmet Emîrî Enam. Lê ji dema ku Mem dibêje Zînê gazî kenizên xwe bike, dibêje: watiş awaz ker kenîzan wêt...

Di Mesnewîyê da dema ku Zîn pê dihesê Mem hatîye diwanxanê, pir sade tev digere. Ew kevir û xîzê tevî xwarekê dike, da ku Mîr han bide ku hegera wê hindê bipirse. Dema ku Mîr hegerê dipirse, ew dibêje; ez naçim ser kanîyê û ez ava xwarekê nayînim, keniz û xizmetkar diînin, lewra xîz û kevir di xwarekê da heye. Mîr destûra wê dide ku here ser kanîyê. Wate Zîna xûşka Mîr mafê wê tunebûye ku bêy destûra birayê xwe here ser kanîyê jî.

<sup>309</sup> Hinnells, John R. *Persian Mythology*, wer. Âmûzgâr, Jâle- Tefezzulî, Ehmed, Neşr-ê Çêşme, Tehran, 1386 hş., rr. 98-99.

Dema ku Mem û Zîn hevdu li ser kanîyê dibînin, li wir jî dîsan helbestkarê me ji zar Memê sivikatîyê bi jinan dike û evê gotina pêşîyan ji Zînê ra dibêje: “Zen û esp û şîr wefa nedaran.”<sup>310</sup> Û îlaveya bêwefatîyê li Zînê dike. Lê dîsa jî Zîn rêzê ji Memê ra digire û daxwaza lêborînê dike.

Di mesnewîyê da dema ku Mîr û Mem kişikanê dileyzin, Zîn meygêrî û avgêriya wan dike, ku ew hinda hem di gel rê û rismên Kurdî nagunce û hem jî pile û payeya Zîna ku xudanê keniz û berdestkan e û qewlî Xanî (1650/1-1707) va gotî, Zîna ku dused perî perestar, nabe ku avgêriya dîwanxana Mîr bike, herçiqas ku xûşka Mîr be jî.

Lê Zîn di evîna xwe da wefadar e. Ew dema ku Mem di zindanê da ye, dizîva ji Memê ra xwarekê dişîne.

Gava ku mirov Zîna beyta Memê Alîyan û Zîna mesnewîya Mîrza dide ber hev, cudatîya nîveka wan gelek e. Zîna di beytê da serbesttir û bistetir e. Ew xwenda û zana û xeybgo û remildar û biwêr e.

Ew weke şehzadeyekê fermander e. Dema ku di koşka Memê da di gel Memê diaxive, dema ku li ser kanîya Gulan di gel Memê diaxive, serdestî ya wê ye. Ew biriyarê digire. Lê bi giştî Mîrza bi çavê kiçeke gundî û rei’yetê li Zînê dinêre, wê dişîne ser kanîyê amanan bişo, dişîne dîwanxanê ku qawe û çayê bigerîne.

Zîna ku em di vê menzûmeyê da dibînin, Zîneke nexwandî, nezan, avgêr û xizmetkar e û kir û berkîrên wê sawîlke û bêy desthelat e.

Di beytê da ew hind ji evîna xwe ra wefadar e, ku bixwe ji bo Memê xwe dikuje, lê di mesnewîyê da ew nikare xwe bikuje, belke du’a ji Xudê dike, Xudê wê dikuje.

Di van her du berhaman da jî jin pir lawaz, nezan, kopeser û bêdesthelat hatine nîşandanê. Di her duyan da jî kenizên Zînê hind lawaz in, dem ku çav bi Memê dikevin ji xwe va diçin û hişê xwe derdidin.

Bi giştî di her du berhemana da jî jin biçûk hatîye dîtinê, lê di beytê da hindekî jin serbesttir û zanatir ji jîna di mesnewîyê da hatîye nîşandanê.

---

<sup>310</sup> Ev gotina pêşîyan di Kurmancî da jî heye û weha tê gotinê : “*Sê tişt bê îtbar e, tiving e qundaxa wê dar e, hesp e nigê wî nal e, jin e parxanê wê xwar e.*” Di *Xosrew û Şîrîna* Nizamî da jî ew gotian weha hatîye :

نشاید یافتن در هیچ برزن  
وفا در اسب و در شمشیر و در زن  
زن از پهلو چپ گویند برخاست  
مجوی از جانب چپ جانب راست

wer. : Di hîç tax û kolanê da wefa di hesp û şûr û jinê da nayê dîtinê (tuneye) Dibêjin ku jin ji alîyê/parestûyê çepê çê bûye, ji alîyê çepê li alîyê rast negere.

### 3.2.4. Berawirdek Giştî û Encamî di nîveka Her du Berheman da

Em ê di dawîya vê pişkê da van her du berhmana bi giştî li sê bareyan da bidin ber hev, ku birîtîne ji:

**Wekhevî û Hevpişkî**

**Newekhevî û Cudatî**

**Wêkçûn û Hevrenî**

#### 3.2.4.1. Wekhevî û Hevpişkîya her du Berheman

Ev her du berhem di çend xalan da durust wekî hev in:

Her du berhem dikevin nav pişka edebîyata helbestkî.

Her du jî bi zimanekî toreyî hatine vehûnandin.

Her du jî heman çîrokê vedigêrrin.

Her du jî bi zimanê Kurdî hatine nivîsînê.

Navê her dukan jî Mem û Zîn e.

Ev her du berhem di navê pênc qehremanan da hevpişk in: Mem, Zîn, Sîfî, Çeko, Beko/Bekir.

Mem di her du berheman da jî şah e.

Zîn bi şêweyeke esraramêz ji Cizîra Botan bo qonaxa Memê tete hanînê. Her yek ji her du qehremanên çîrokê yên serekî wate Mem û Zîn hevdu bi hatina qonaxên hev tawanbar dikan.

Mem û Zîn di sera yan qonaxa Memê da digehine hevdu û li dû axiftin û xwenasandinê ra dibine evîndarên hev û paşê her du jî di xew ra diçin û dîsa Zîn ji seraya Memê tê zivirandinê bo Cizîra Botan.

Mem ji bo peydakirina Zînê ber bi Cizîra Botan diçe.

Qîza Beko li bihurê şetê Cizîrê tê pêşîya Memê.

Mem dibe mêvanê hersê birayên mêrxas yên Cizîra Botan.

Mem û Zîn careke dî li ser kanîyê hevdu dibînin.

Mîr bi leşkerên xwe va diçe nêçîrê, lê Mem li bajarê da dimîne.

Mem û Zîn di seraya Mîr da hevdu dibînin.

Mîr ji Nêçîrê dizivire û di ser Mem û Zînê da tê.

Zîn di dîwanxanê da xwe di bin kurkê Memê da vedişêre.

Mazûvanê Memê ji bona rizgarîya Memê mala xwe agir dadayî dike.

Beko li cem Mîr dijî Mem û Zînê fesadîyê dike.

Mem û mîr kişkanê dileyzin.

Bi pîlanên Beko Zîn li pencerê ra dîna xwe dide lezya Memê û Mîr û dibe hegera derdana Memê.

Mem dikeve zindanê.

Mem û Zîn her du jî dimirin.

Mem û zînê li rex hevdu da têne çalkirinê...

### **3.2.4.2. Newekhevî û Cudatî**

Ev her du berhem di gelek xalan da ji hevdu cuda ne:

#### **Pêkhate:**

Mesnewî ji 974 malikan û beyt jî ji 644 rêzikan pêk tê.

#### **Yekîneya hejmar û pîvanê:**

Yekîne di mesnewîyê da malik û misra' in, lê di beytê da rêzik û bend in.

#### **Ziman:**

Herçiqas ku ev her du berhem bi zimanê Kurdî hatine nivîsîn û darijtinê, lê heryek bi zaraveyê cuda ji yê dî ye. Beyt bi zaraveyê kurmancî û devoka Ruhayê, lê mesnewî bi zaraveyê Goranî û devoka Hewramî hatîye nivîsînê. Ev her du zaraveyên zimanê Kurdî di gelek bareyan da ji hevdu cuda ne. Cudatîya wan wê radeyê bilind e ku axêverên wan ji axiftin û gotinên hevdu tîna jî.

#### **Teşe:**

Herçiqas ku ev her du berhem dikevin nav pişka edebîyata helbestkî, lê beyt bi şeweya helbesta gelêrî, mesnewî bi şeweya helbesta klasîk hatîye hûnandinê.

#### **Kêş û Serwa:**

Kêş di mesnewîyê da kêşa kêteyî ye û her misra'ek wê ji 10 kêteyan pêk tê.

Lê di beytê da kêşeke sabit tune ye û her rêzikeke wê bi serê xwe xudanê kêşekê ye. Serwa di mesnewîyê da di nîveka du misra'an da ye û her malikeke wê bi serê xwe ye. Lê serwa di beytê da serbest e û rêzîkên her bendeke wê bi hevdu ra hevderwa ne. Li ber wê di hindê bedndan da hejmarra serwayan digehene 80 serwayî, lê di hindêkan da jî hejmarra serwayan du lib tenê ye.

#### **Te'hmîdîye**

Mesnewî bi te'hmîdîyeyê dest pê dibe (malîk 1-14), lê beyt bi nasandina cîhê bûyerê û qehremanê çîrokê dest pê dibe. Di beytê da te'hmîdîye tune ye.

#### **Huzûra bêjer yan nivîserê berhemê di vegêranê da:**

Di beytê da beytbêj xwe têkelî bûyerên vegêranê nake, lê di mesnewîyê da helbestkar di gelek cîyan da hebûna xwe radigehîne û bihîster û xwîneran bi hebûna xwe agahdar dike û dibêje me filan serbihorî gotin û em ê niha jî li ser bêvan mijarê ji we ra biaxivin, lê ev hinda di beytê da tune ye.

### **Danasîna çîrokê:**

Di Mesnewîyê da danasîna çîrokê tune ye. Mekan dîyar nîne. Mesnewînivîs bêt pêşgotin û nasandina cî û qehremanên serekî û demê nişkava me rastî du kevokan dîne ku li hewa ketine. Lê di beytê da, beytbêj pêş da bajarê cîyê bûyerê bi hûr gilî şirove dike û li dû ra li ser rewşa qehremanên destpêkê agahdarîyên pêdivî dide. Cîhê qewimînê û qehremanê çîrokê yê serekî, wate ‘Alî paşa û bajarê wî û hêz û hukmê wî destnîşan dike. Mirov agahdar dibe ku mijar çî ye û beyt bi danasîneke têr û tijî di 20 rêzikan da tê şirove kirinê. Lê ev hinda di mesnewîyê da tune ye.

### **Bavê Memê**

Di beytê da Memê kurrê ‘Alî paşa, şahê Mu’xribistanê ye. Lê bi pêka mesnewîyê da ew kurrê şahê Yemenê ye û navê bavê wî nehatîye.

### **Xewna Destpêka Bûyerê**

Di beytê da xewna destpêkê heye. Birayê ‘Alî paşa Xocê Xizir di xewna xwe da dibîne ku dibêje gereke ‘Alî paşa bi kiçeke Qurêşîyan ra bizewice, da ku bibe xudanê zarkî. Ev mijara di mesnewîyê da tune ye.

### **Şevra Wezîr û Wekîlan ji bona Zewaca ‘Alî Paşa**

Di beytê da wezîr û giregire li dû çareyekê ne, ku ji ‘Alî paşa ra qîzeke Qureşî peyda bikin, ku pê ra bizewice, da ku warwenda nemîne. Alî paşa bi qîzeke ji bera Qureşîyan ra dizewice. Navê wê Zelîxa ye.

Di mesnewîyê da ev mijara tune ye.

### **Bûyîna Memê**

‘Alî paşa bi Zelîxayê ra dizewice û Zelîxa piştî neh meh û neh roj u neh saetan zarokekê dîne ku giregire dîwanxana Alî paşa navê wî dadinên Mem.

Ev mijara jî di mesnewîyê da tune ye.

### **Çawanîya Perwerdekirina Mem**

Di beytê da, li şeş salîya Memê da, Memê didin ber destê murebî, xoce û ‘alimên dînî ji bo fêrbûna zanistan. Mem li neh salîya xwe da dibe hafîzê Qurianê û hemû zanistên gûna xwe diqedîne û li deh salîya xwe da dibe îmam û rêvberê leşkerî û ‘Alî paşa text û tacê xwe dide wî û Mem dibe şah.

Ev mijara jî di mesnewîyê da tune ye.



### **Bozê Rewan**

Di beytê da torçî û masîgir torê davêjin behrê ku masîyan bigirin, li dewsa masîyan kurûyekî behrî derdixînin, kurû didin Memê û navê wî dibe Bozê Rewan.

Di mesnewîyê da ne mijara peydabûna hespê û ne jî navê Bozê Rewan heye.

### **Çûna Nêçîrê û Ba'xçê Qîzên Paşayê Perîyan**

Di beytê da piştî ku Memê dibe xudanê Bozê Rewan, rojekê bi heval û hevsalên xwe ra diçe nêçîrê û qîzên paşayê perîyan postê kevokan li xwe dikin û ewî li dû xwe ra dibin ta ku digehîje ba'xçê gulên û li wir Mem rastî sê qîzên paşayê perîyan tê ku di hewza gulên da avjenîyê dikin. Mem kirasê ya biçûk direvîne...Qîzên paşayê perîyan li ser cuwanîya Memê mendehoş dimînin û ahd dikin ku Zînê û Memê bînin bal hev kanê kîjan bedewtir e.

Ev mijara di mesnewîyê da tune ye.

### **Xwelîya Mirîyan**

Di beytê da hersê qîzên padişahê perîyan xwelîya mirîyan li ser cîhê Zînê direşînin û ewê di xew ra dikin û hildidin diînin bal Memê.

Di mesnewîyê da mijara xwelîyê tune ye, lê dema ku her du kebûter diçin koşka Zînê, dibînin ku ew di xewê da ye û her du kebûter navê Xudê diînin û Zînê ji Cizîrê diînin bal Memê.

### **Rêya Hatûnehatê**

Di beytê da Memê li Bozê Rewan siwar dibe û tenê berê xwe dide Cizîra Botan.

Lê di mesnewîyê da Bengîn di gel deh hezar leşkerî va pê ra ye. Li her qonaxê da du hezar leşker jê diqetin û di qonaxa pêncem da ew û Bengîn tenê dimînin.

### **Dûrik**

Di beytê da dema ku Memê ji bajarê Mu'xribistanê bi rê dikeve, dayîka wî dûrikekê davêje ser .

Di mesnewîyê da dûrik nehatî ye.

### **Wendakirina rê**

Di beytê da Memê şeş mehan rê diçe, rîya xwe şaş dike û dîsan dizivire bajarê Muxribistanê û Xoceyî Xizir li pêşîyê dikeve û rê nîşanî wî dide.

Ev mijara di mesnewîyê da tune ye.

### **Xocê Xizir**

Di beytê da sê caran Xocê Xizir dîyar dibe.

Lê di mesnewîyê da em rastî navê Xizir nayên.

### **Nêçîra di rê da**

Di mesnewîyê da hatîye; piştî ku leşker hemû ji Memê û Bengîn diqetin, ew di rê da birsî dimînin û kuvîyekê nêçîr dikin û dixwen.

Ev mijara di beytê da tune.

### **Cotkar**

Di mesnewîyê da cotkar rêka Cizîra Botan nîşanî Memê û Bengîn dide, lê di Beytê da Xocê Xizir rê nîşanî Memê dide.

### **Reml û Remldarî**

Di beytê da Zîn û Beko her du jî remldar in.

Lê mijara reml û remldarîyê di mesnewîyê da nehatîye.

### **Qîza Beko**

Di beytê da navê qîza Beko jî Zîn e û ew berdestk û keniza Zîna Zêdan e, lê di mesnewîyê da navê wê Melek Rey'han e û di evîna Memê da reqîba Zînê ye.

### **Dayen/Dadoka Qîza Beko**

Di mesnewîyê da dayeneke Melek Rey'hanê heye. Ew li ser daxwaza qîza Beko dixwaze Zînê li ber çavên Memê reş bike.

Ev mijara di beytê da tune.

### **Mazûvanên Memê**

Memê li bajarê Cizîra Botan da dibe mêvanê hersê mêrxasên bajêr. Di mesnewîyê da navê hersê mêrxasan: Qere Tacedîn, Çeko û 'Erfî ye, lê di beytê da navên wan: 'Hesen, Çeko û Qere Taclîn e.

### **Eşkrebûna Evîndarîya Memê li Qonaxa her sê Birayan da**

Di beytê da dema ku Memê dibe mêvanê Celalîyn, 'Hesen birayê mezin ji her du birayên xwe ra dibêje: Memê yan qetlek kirîye, yan wezîrekî ew dûrwelat kirîye, yan jî evîndar e.

Ev mijara di mesnewîyê da tune.

### **Mîr Zînedîn Mêvanê Qere Tajdîn Vedxwîne Dîwanê**

Di mesnewîyê da dema ku Memê û Bengîn dibin mêvanê Qere Tacedîn, ew û her du birayên xwe li ber mêvanê xwe sê şev û sê rojan naçin dîwana Mîr. Mîr kesekê rê dike bal Tajdînî ku hegerê bipirse, Tajdîn bersivê died ku Mêvanê min heye. Mîr ewî û mêvanê wî vedxwîne dîwanxanê.

Ev mijara di beytê da tune.

### **Dilê Zînê Dixwaze Here Ser Kanîya Gulan**

Di beytê da, Zînê ku ew şeş meh bûn ji malê derneketibû û ketibû behîyê, wê roja ku Memê dihête Cizîrê, tiştêk dizêwîre dilê wê û dilê wê ava kanîya Gulan dixwaze û kenizeke xwe ji xwe ra dişîne ava kanîya Gulan û keniza wê bi hatina Memê agahdar dibe.

Ev mijara di mesnewîyê da tune.

### **Zîn ji bo Dîtina Memê Diçe Ser Kanîya Gulan**

Di beytê da, gava ku Zîn pê dihesse Mem hatîye bajarê Cizîrê, ji reş û matemê derdikeve û xwe dixemilîne û fermanê died ku qîz û bûkên giregiran werin da ku pêkve biçin ser Kanîya Gulan. Mem û Zîn li ser kanîya Gulan hevdu dibînin û qîrarê xwe didin.

Ev mijara bi cureke dî di mesnewîyê da hatîye.

Zîn diçe ser kanîyê amanan bişo. Mem jî bi arîkarîya hersê birayan diçe ser kanîyê û bi Zînê ra xeber dide

### **Beko jî Evîndarê Zînê ye**

Di beytê da Beko jî evîndarê Zînê ye.

Di mesnewîyê da behsa evîndarîya Beko nehatîye.

### **Beko bi Hevdudîtina Memê û Zînê Agahdar dibe û li dû Pîlanan digere**

Bi pêka beytê dema ku Beko agahdar dibe ku Zînê û Memê hevdu li ser kanîya Gulan dîtine, diçe bal Mîr û digirî û li dijî Memê û mazûvanê wî diaxive.

Ev mijara di mesnewîyê da nehatîye.

### **Nêçîr**

Di mesnewîyê da, cara pêşîn Mîr bi mêvanên xwe ra diçin nêçîrê û li wir mîr Memê dike serraw.

Ev pişka di beytê da tune.

Lê nêçîra cara duyem Mem naçe nêçîrê û di bajêr da dimîne, da ku xwe bi Zînê ra bigehîne. Ev mijara di mesnewîyê da weha hatîye: Bi ferman Mîr hemû leşker û nêçîrvan diçin nêçîrgehê, lê Memê xwe bi nexweşî davêje û di mal da dimîne.

Lê di beytê da ew mijara weha hatîye: Bi fermana Mîr ra herkes ber bi nêçîrgehê diçin. Memê jî bi neçarî bi suwaran ra diçe. Lê di rê da Memê bi qelemteraşê zenda xwe birîndar dike û bi wê behaneyê dizivire bajêr da ku Zînê bibîne.

### **Mem û Zîn di Seraya Mîr da**

Bi pêka beytê, dema ku Memê zenda xwe bi qelemteraşê birîndar dike, 'Hesen ewî ji nêçîrgehê dizivirîne. Ew yeksere diçe jivangeha Zînê. Ew û Zîn di seraya Mîr da bi hev ra dikevin nav dildarîyan û her du di paşela hevdu da xew ra diçin.

Bi pêka mesnewîyê, Memê xwe bi nexweşîyê davêje. Dema ku Mîr û leşker hemû ji bajarê Cizîrê derdikevin û bajar xalî û xelwe dibe, Mem diçe seraya Mîr û ew û Zîn digihin hev û bi hevra dikevin nava henek û laqirdîyan û di paşela hevdu da di xew ra diçin.

### **Mîr bi ser Mem û Zînê da tê**

Mîr bi leşker û giregiran va li ser Mem û Zînê da tîn. Mazûvanê Memê ji bona

rizgarkirina wan mala xwe agir dadayî dike. Di mesnewîyê da ew Qere Tacedîn e, lê di beytê da ‘Hesen e.

### **Vemirandina agirî**

Bi pêka mesnewîyê, Mîr fermanê dide xelkê Cizîrê û xelk bi sedan kûzik û ‘eyarên avê di hewara mala Tajdînî da diçin û agirî vedmirînin.

Mijara vemirandina agirî di beytê da tune.

### **Berhevkirina Barebûyê ji bo Tajdînî û Fesadîya Bekoyî**

Bi pêka mesnewîyê, dema ku mala Tajdînî şewitî, tiştê ji wî ra nema. Mîr ferman da ku barebûyê ji Tajdînî ra berhev bikin. Xelkê Cizîrê ji dara û nedaran arîkarîya Tajdînî kirin û kom komî zêr û zîv jê ra anîn. Lê Bekir ne di hewarîya agir vemirandinê da çû, ne jî barebû da.

Ev mijara di beytê da tune.

### **Pîlana dûrxistina Qere Tajdîn û Birayên wî ji Memê**

Bi pêka mesnewîyê Bekir pîlanekê dikişîne, Tajdîn û birayên wî dişîne nava êlatê ku xeracê berhev bikin, da ku Mem li bal Mîr bimîne û destê wan ji hevdu diqetîne.

Ev mijara di beytê da tune.

### **Kişkanê**

Di beytê da Mem û Mîr carekê kişkanê dilîzin û bi pîlana Beko Zîn tê ber pencera ku piştê Memê lê ye li leyza Mem û Mîr dinêre û bi pîlanên Beko Mem û Mîr cîyên xwe diguherrin û berê Memê dikeve aliyê Zînê û bi dîtina Zînê ra hiş di serê Mem da namîne û leyze derdide. Lê di Mesnewîyê da du caran leyza kişkanê yan jî text û nerd dihête lîstinê. Cara yekem Mem bi pîlanên ku Beko kişandine, navê dildara xwe diîne û Mîr fermana kuştina wî dide, lê mazûvanê Memê li wir in û bi zora şûr û xenceran Memê ji wan distînin û nahêlin kes derbekê li Memê bide. Lê li dû ra Beko pîlaneke di dikêşe, mazûvanên Memê dişîne berhevkirina bac û xerac û dema ku Mem tenê dimîne, dişînin pey wî û vê carê ew û Mîr dîsan kişikanê dileyzin û Mem derdide û Mîr wî davêje zindanê...

### **Mem di zindanê da ye û Zîn dizîva jê ra xwarekê dişîne zindanê**

Bi pêka mesnewîyê dema ku mîr bi fesadîya Bekir Memê davêje zindanê, Zînê dizîva jê ra xwarekê dişîne, lê Bekir pê dihese û nahêle xwarek ji Memê ra here.

Ev mijara di beytê da tune.

### **Mirina Memê bi hinarên jehrîkirî**

Bi pêka beytê, dema ku Beko dibîne Mîr dê Zînê bide Memê. Zû xwe bi malê ra digehîne û şeş hinaran dihîne û zikê sisîyan tijî jehrî dike û dide qîza xwe û dibêje here vana bide Zînê bila ji Memê ra bibie.

Mem bi xwarina henarên jehrîkirî dimire.

Ev mijara di mesnewîyê da tune ye. Bi pêka mesnewîyê Mem bi dîtina Zînê ra dimire.

### **Şîna Memê û mirina Zînê**

Bi pêka beytê, piştî mirina Memê, Zînê qelemteraşê li dilê xwe dide û xwe dukuje.

Lê di mesnewîyê da piştî mirina Memê Zînê du'a ji Xudê dixwaze û du'ayê we diqebile û ew jî dimire.

### **Kefn û defna Memê û Zînê**

Di mesnewîyê da, Mem û Zîn bi şuştin û kefenkirî tîn çal kirinê. Lê ev mijara di beytê da nehatîye.

### **Dirrîya Beko**

Bi pêka mesnewîyê dema ku Mîr Bekirî dukuje, çipikeke xûna Bekirî dipeke nîveka mezarên Mem û Zînê û ew xûna dibe dareke bi dirî û di gorê da jî nahêle ew her du evîndar bigehine hevdu.

Ev mijara di beytê da nehatîye.

### **Bengîn dizivire Yemenê**

Bi pêka mesnewîyê, dema ku Mem dimire, Bengîn bi leşkerekî giran va reş girêdide û hewarîya mirina Memê ji bavê wî, ji şahê Yemenê ra dibe.

Ev mijara di beytê da tune ye.

### **Bavê Memê Tê û tola Memê vedike û Cizîrê dagîr dike**

Gava ku Bengîn hewarîya mirina Memê ji bavê wî ra dibe, bavê wî bi leşkerekî giran va dihête Cizîrê dagîr dike û ji nesla Mîr û Bekir kesekê nahêle û Tajdîn li dewsa Mîr Zînedîn da dike Mîrê Cizîrê.

Ev mijara di beytê da tune ye.

### **3.2.4.3. Wêkçûn û Hevrenî**

Ev her du berhem di gelek cîyan da jî rengê hevdu didin, wate di gelek mijaran da durust wekî hevdu nînin, lê wêkçûneke di nîveka mijaran da heye.

### **Sê qîzên paşayê perîyan û du kebûter**

Di beytê da hersê qîzên padişahê perîyan diçin Zînê ji bajarê Cizîrê dînin qonaxa Memê li bajarê Me'xribistanê.

Di mesnewîyê da du kevok peyda dibin û diçin Zînê dîna qonaxa Memê.

### **Bengîn**

Bengîn di her du berheman da jî heye, lê di beytê da beytbêj ji wî ra destebirayê Memê dibêj û navê wî nayîne.

### **Guhorrîna Gustîlan**

Di her du berheman da jî guhorrîna gustîlan heye, lê di beytê da qîzên padişahê perîyan gustîlên Memê û Zînê li hevdu diguherin. Di mesnewîyê da Zîn ji Memê ra dibêje, were em gustîlên xwe bi hevdu ra biguherrin.

### **Ji Hevduqetîyana Herdu Evîndaran**

Di beytê da hersê qîzên padişahê perîyan dîsan Zînê ji Me'xribistanê hildidin û dibin bajarê Cizîrê û dadinin nav cîhê wê.

Di mesnewîyê da her du kebûter dîsan Zînê dibin dadinin nav cîhê wê.

### **Hişyarbûna ji Xewa Evîne**

Di beytê da gava ku Memê ji xewê radibe û Zînê nabîne, karê seferê dike. Lê di mesnewîyê da dema ku ew destnimêjê digire, gustîla Zînê di tilîya xwe da dibîne ê ji xwe va diçe.

### **Memê li ser Rîya Hatûnehatê**

Di her du berheman da jî piştî hevdudîtian Memê û Zînê, Mem dikeve rê û diçe here Zînê peyda bike. Di beytê da Memê ji birayê xwe yê axiretê ra dibêje; bêje day û bav û apên min bila nan û xoyê li min helal kin û Memê tenê li rê dikeve. Lê di mesnewîyê da Mem û Bengîn pêkve diçin.

### **Cotkar û Xizir**

Di mesnewîyê da cotkarekî pîr rêka Cizîrê nîşanî Memê û Bengînî dide, lê di beytê da Xocê Xizir rê nîşanî Memê dide.

### **Qîza Beko**

Qîza Beko di her du berheman da jî heye, di beytê da navê qîza Beko jî Zîn e. Lê di mesnewîyê da navê wê Melek Rey'han e

### **Sê Bira û Mêrxasên Cizîrê**

Di beytê da 'Hesen, Çeko û Qeretaclîn sê bira ne û mêrxasên Cizîrê ne. Ew Celalî ne. 'Hesen birayê mezin e.

Di mesnewîyê da jî ew sê bira ne. Her sê bira Qere Tacedîn, Çeko û 'Efo ne.

Qere Tacedîn birayê mezin e. Lê li ser Celalîbûna wan di mesnewîyê da tiştek nehatîye.

### **Kuşîna Beko**

Bi pêka mesnewîyê Mîr bi şûrekî Beko dikuje.

Lê bi pêka beytê Mîr balteyekî/tevreki li serê Beko dide û Beko dikuje.

Bi giştî kakil û sîsika van her du babetana û mijara wan yek tişt e, lê her yekê ji helbestkar û beytbêj bi pêka zanîna xwe, bi pêka ferheng û cihanbînîya xwe ewê mijarê vedigêrin. Lewra ev her du babet di gel wê hindê ku ji yek cîyî serekanîyê digirin, lê di gelek cîyan da di şeweya ragehandin û bîr û hizran da ji hevdu cuda ne.

## ENCAM

Di vê lêkolînê da em gehîştin wê akamê ku beyt yek ji janrên edebîyata Kurdî ya gelêrî ye û ew cuda ye ji peyva beyta Erebi û tenê navên wan rûva wekî hev lê wate û çemk û karbirdên wan ji hevdu cuda ne. Herwisan me dît ku beytên Kurdî gelek caran bûne jêderên nivîsîn û afirandina berhemên toreyî. Yek ji wan beytana jî Beyta Mem û Zînê ye, ku çend helbestkarên Kurd mesnewî li ber wê nivîsîne.

Li vê lêkolînê û daneberheva Mesnewîya Hewramî û Beyta Mem û Zînê da em dibînin ku kakilê her du berheman yek e û her duk heman çîrokê vedigêrin. Xalên bûyerê yên sereke ku tebereya çîrokê li ser wan digere, di her duyan da yan her yek in, yan jî pir nêzîkî hevdu ne.

Herdu berhem bi şeweyeke giştî di gelek xalan da hevpişk in. Lê newekhevîya wan jî ne hindike.

Di navê cî û welatê qehremanên serekî yê çîrokê da newekhevî heye.

Di beytê da Mem xelkê bajarê Mu'xribistanê ye û Zîn jî xelka qesebeyê Cizîra Botan e. Lê di mesnewîyê da Mem xelkê Yemenê ye û Zîn jî xelka şarê Cizîr û Bot/ Cizîra Botan e.

Me li ser bajarê Me'xrib û Mu'xribistanê yan Me'xribzemînê lêkolîn kir. Lê tesbît nebû ka gelo ew bajarekî xeyalî ye, yan navê bajarê Meiriba Yemenê ye ku ji layê beytbêjan va bi şeweya Mexirb û Mu'xribistan hatîye rabêj kirinê.

Li ser qehremanên her du berheman em giheştin wê encamê ku ev her du berhem tenê di neqş û navên pênc qehremanan da hevpişk in. Mem, Zîn, Beko, Sitî, Çeko. Qehremanên di yan navên wan ne wekî hev in, yan jî eger navên wan wekî hev bin jî neqş û karkirda wan ne wekî hev in.

Di mijara Mekan û Zemanan da em giheştin wê encamê ku ev her du berhem tenê di navê bajarê Cizîra Botan da hevpar in. Herwisan di Mesnewîyê da navên rastîn yên mekanaan pişka zor ew nav in yên ku di edebîyata klasîk da weke simbol derdikevin pêş û hîç peywendîyeke wan navana bi çîrok û serpêhatîya Mem û Zînê va tune. Weke: Bedexşan, Hindûsitan, Çîn û Maçîn...Lê di beytê da navên rastîn yên mekanaan ew nav in yên ku peywendîya wan bi çîrok û serpêhatîya Mem û Zînê va heye. Weke: Be'hra 'Umîyan, Be'hra Belek, Gola Mar û Masîyan, Kanîya Gulan, Birca Belek, Sînorê 'Ecem û Muslimîn...

Di beytê da navê mekan û zemanên ayînî û metaforîk nehatine, berewajî wê em di mesnewîyê da rastî gelek mekan û zemanên ayînî û metaforîk dihên, yên wekî: Axerelencam, Axerzemna, Textê beden, Perdeyê 'ismet, Ba'xi berîn, Kewser, Rewzey Rizvan, Seqer, Cehennem, Weheşt/ Cennet, 'Erş, Me'hşer, Qiblega...



Wisana dîyar dike ku danerê beytê mirovekî nexwanda ye û eger xwanda be jî, xwandina wî di pileyeke nizim da ye. Lê helbestkarê mesnewîyê mîrza û mela ye û xwandina wî di pileyeke bilind da ye. Mesnewî bi zimanekî bilind û dewlemend, mişt ji hunerên cuwankariyê hatîye nivîsînê. Lê beyt bi zimanekî sade hatîye darijtinê û hunerên cuwankariyê jî ji bilî tewsfî û salixdanê di wê da zor sade ne.

**narusseqer:** agirê cehennemê (607)  
**nasîyar:** nedîyar, nexûyan (213)  
**natewan:** nekar, neşîya (116)  
**nayaben:** nayab in, bi dest nakevin (40)  
**nazdar:** bi naz, nazenîn, xudannaz, xoşewîst, (62)  
**ne :** le, li, di, (5)  
**ne şehni bostan:** li naverasta bostanî da (79)  
**ne axûş:** li himêza (54)  
**ne beğel peywest:** xwe da kêleka wî, li rex wî sekinî (487)  
**ne boney towen:** ji bona te ye (159)

**ne boney:** ji bona (159)  
**ne cat sakin ber:** li cîhê xwe da raweste (92)  
**ne cemi‘ meclis:** di nav koma meclisê da (196)  
**ne cewab ezû yaft ne nam (û) nişan:** ne cewabek ji wê wergirt, ne jî nav û nîşanek (505)  
**ne Cizîr û Bot:** li Cizîra Botan (31)  
**ne demağ:** li mejîyê, li difina (316)  
**ne demağış da:** di mejîyê wî da (59)  
**ne der babi ton:** ne hêjayî te ye (213)  
**ne dewriş:** li dora wê (77)  
**ne diļ kerd birîn:** ji dil birrî, ji dilê xwe derxist (492)  
**ne eleman:** li el-emanê da (9)  
**ne gol endamê:** yeke endam ji gulê, gulendamek (33)  
**ne gor:** ji gorrê (49)  
**ne her terane:** ji her alî (254)  
**ne hezar destan:** bi hezar awayî, bi hezar dasitanê (79)  
**ne mawaş:** ji cîhê wê (47)  
**ne pam:** ji nigê min (121)  
**ne pay:** li biniya (425)  
**ne pehlûş:** li kêleka xwe (60)  
**ne perdey ‘ismet:** di perdeya pakî û dawênpakîyê da (37)  
**ne qelbi leyl:** di dilê şevê da (125)  
**ne ray nihani:** dizîva, bi rêyeke penî va (467)  
**ne rûy ser besaṭ :** li ser rûyê erdê (253)  
**ne rûy serzemîn :** li ser rûyê erdê (108)  
**ne ser :** li ser (214)  
**ne wend :** ji komê, ji civakê (57)  
**ne xak mibî pest:** tu dê li ser erdê pest û belengaz bibî (212)  
**ne xaki sîya :** di axa reş da, li ser axa reş (144)  
**ne xwab :** di xewê da (563)  
**ne:** ne, na, pêşgira nerênîsaz (172)  
**neba:** nebe ku (101)  
**nebat:** cewhera qendî, şûşa şekerê, şekerê bihujtî (382)  
**nebê:** nebû (330)

**neberd:** şerr, ceng, xebat (133)  
**nebo:** nebe (456)  
**necat bidarî:** rizgar bikî (759)  
**necatim bide:** min rizgar ke (751)  
**Necdî:** hespên ji resena Necda Erebestanê (68)  
**neda:** nida, deng, seda (897)  
**nedamet:** poşmanî (227)  
**nedarî gunah:** sûcê te tune (576)  
**nedaro derman:** dermanê wî tune (198)  
**nedaro:** nîne, tune (174)  
**nedarûn exbar:** haya min jê nîne (477)  
**nedîyênim:** min nedîtîye (28)  
**ne<sup>‘</sup>em:** erê (773)  
**ne<sup>‘</sup>re:** norrîn (257)  
**nehad:** buniyad, naxa dilî (143)  
**nehanwar:** penî ve (587)  
**nehar:** roj (95)  
**nek ce fesadan biwînîm zerer:** ne kû ji fasidan zererê bibînîm (93)  
**nek:** ne kû (93)  
**nekerîm goftar:** em neaxivin (338)  
**nem:** nê, şê, terratî (199)  
**nemami ‘er<sup>‘</sup>er:** şêneya dara ‘er<sup>‘</sup>erê (438)  
**nemend:** nema (263)  
**nemeşûn:** ez naçim (405)  
**nemez çêş kerûn:** nizanim ka ezê çi bikim (182)  
**nemikero:** nake (186)  
**nemiyo:** nayê (386)  
**nemnak:** nêmdar, ter, şêdar, şil (123)  
**neqşi ‘uhûdit:** nivîsîn û nigarên peymanê te (12)  
**nerd:** leyza şeş û bêşê, jê ra tawla, tabelê, şeş û pênc jî dibêjin (411)  
**nerdbazî:** nerdlîstin (412)  
**nereft:** neçû (650)  
**nergis:** nêrgiz, mebest jê çav in (46)

**nergisan:** her du nêrgiz, mebest jê her du çav in (123)  
**neŕo:** neçe, neherre, nerre (267)  
**neşî:** neçû (351)  
**neşineft:** nebihîst (897)  
**neşineftenîş:** te ew nebihîstîye (43)  
**neşî:** nifş, nejad (416)  
**neşo:** neçe (603)  
**neşunasî:** nas nakî (445)  
**neşyemim:** neçûme (65)  
**new baği berîn:** di wî ba'xê mezin û berîn da (80)  
**new ca:** li wê derê (618)  
**new dîyar:** ji wî dîyarî, ji wî welatî (235)  
**new neğmey Dawûd:** ji wî dengê Dawûdî (59)  
**new:** ji wê/î (48)  
**newa:** nekû (119)  
**newber nemaman:** şêneyên nûber (907)  
**newbeti şahî:** nobeta şahîyê (126)  
**newcewan:** nûcewan, gencê nûgiheştî (161)  
**newîd:** mizgînî (305)  
**newênan:** girê nedan (783)  
**newhe:** ah û zarî, şîn (196)  
**newtûl:** newnemam, şêneya nû, nûnîhal (438)  
**nexêza:** ranebû (635)  
**ney çerxi keçzen:** li vê çerxa xil û xwar û feleka xayîn (44)  
**ney kar û bazar:** ji vî karî û vê bazarê (55)  
**ney:** (ne î), ji vê/î (44)  
**ney:** saz, qamûş (32)  
**neyama:** nehat (527)  
**neyawa:** negehiştin (85)  
**nezanam tonî:** min nizanî tu yî (480)  
**nezd:** bal, cem, lali (850)  
**nezer kerd:** dîna xwe dayê (140)  
**nêişan:** nayên (918)



**nifrîn kerd:** nifirr kir (347)  
**nigah biker:** mêze bike (65)  
**nigah ker:** dîna xwe bidê, lê mêze bike (778)  
**nigeh kerd:** dîna xwe dayê (366)  
**nigehdarende:** xudan‘ker, ragir (1)  
**nigehdarende y zemîn û zeman:** ragirterê erdê û zemanî (1)  
**nigîn:** qaşa gustîlê, li vir mebest gustîl bixwe ye (101)  
**nihan:** veşartî (191)  
**nikûkar:** qencîkar, durustkar (91)  
**nimanan:** nîşan dan (335)  
**nimaz:** nimêj, nivêj (495)  
**nimebo:** nabe (16)  
**nimeşî we der:** der nediket, der nediçû (391)  
**nimetaw waço:** ez nikarim bêjim (201)  
**nimetaw:** ez nikarim (201)  
**nimez ane cufî kamîn wejaten:** nizanim ew cotê han cotê kîjan welatî ye (288)  
**nimez:** nemez, nizanim (71)  
**nimezanûn:** ez nizanim (669)  
**nişand:** rûniştand, da rûniştinê (376)  
**nişaney yagey to çêşen:** nîşaneyên cîhê te çi ne? (71)  
**nişatefroz:** xweşîhilker, xoşîhîner (158)  
**nişt:** rûnişt, ket (257)  
**nişte bê:** rûniştibû (409)  
**nişten:** rûniştîye (60)  
**niştin çenî hem:** bi hev ra rûniştin (537)  
**niştin:** rûniştin, veniştin (19)  
**niwîştey teqdîr:** nivîsara teqdîrê, sernivîs, sernivişt (16)  
**nizûl kerd:** nazil kir, jorda şand (522)  
**nîkibext:** bextewer, xoşbext (582)  
**nîknam:** xoşnav, xudanê navê xweş, kesê ku bi qencî nav beder bûye. (89)  
**nîkû:** qenc, baş (91)  
**Nîlê kerd we pa:** çemê Nîlê li darxistin, nîlek li dar xist, mebest jê hind alayên şîn hildan te digot qey çemê Nîl e. (948)  
**nîlî:** rengê şînê asimanî (848)

**nîmeawaz:** nîvedngî (822)

**nîya:** danî (515)

**nîyan:** danan danîn (667)

**nîyaşan:** danînê (381)

**nîyazim:** nîyaza min, daxwaza min (10)

**nîyen:** nîne , nabe, tuneve (16)

**nobet lêdan:** berê li derbara şahan da rojê du ta sê caran li duhol û defikan didan û ji wê ra nobetlêdan digotin. Nobeta şahîyê lêda: lêdana duhola şahîyê, daxwaz û ragehandina serxwebûnê ye) (126)

**noker:** çaker, xulam (530)

**nuql:** noql, şîranîyek şekirokî ye (nuqlên Êrmîyê bi nav û bang in) (382)

**nuşfe:** dol, nesil (960)

**nûri çemanim:** ronahîya çavên min (194)

**nûri dîde:** ronahîya çavan (160)

**nûşîn:** şîrîn (173)

**O, o:** نو

**ostad:** hosta (142)

**otrag:** niştîngêh, êwirge (566)

**oyîn:** leyz, listik (413)

**P, p:** پ

**pa furûd awer:** peya be (311)

**pa nîya we ferş:** pê danî ser mafûrê (579)

**pa:** pê, ling (258)

**padişay e' zem:** padişahê here mezin (8)

**pak uftade:** ji nejada pak (416)

**pakdîn:** dînpak, behdîn, kesê/a ku xudanê dînekî pak û durust be (392)

**parçe:** perû, qumaş, tîkeyek ji tiştêkî (242)

**pasar:** goşa banê xanî û avahîyan, sîvî, sivande, gwêy banan (19)

**pasê:** parek, hindek (260)

**pase:** wisa (105)

**paseban:** nobedar, notirvan (88)

**paseşan watin:** wisa gotine (108)

**pay sitûr:** pîyên hespan (258)

**pejare:** istrês, taw û têt, peşêwî, şepirzetî (175)

**peldêz:** pelreş, bisk û kezîyên Zînê wekandîye pelgên reş (825)

**pelîd:** pîs, pelîşt (925)

**penem waçe:** ji min ra bêje (195)

**penem:** ji min ra (67)

**penet biwaçûn:** ez ji te ra bêjim (467)

**perakende kerd:** reşand (818)

**perdenîşînan:** yên ku li pişt perdê da rûdinên, xanim û xatûnên heremserayê . (216)

**perê behane:** ji bo hecetan, ji bo birîna behane û hecetan (697)

**perê werdey nan:** ji bo nanxwarinê (359)

**perê:** ji bo (154)

**peře:** perr, goşe, kuj, ji goşe û kujê parçe yan kaxezan ra tê gotinê (252)

**perêm bigêran:** ji min ra bigirin (817)

**perêm:** ji min ra (203)

**peřendan:** perrendeyan, firrindan, balindeyan (25)

**perêşan:** ji wan ra (350)

**perêt bawerûn:** dê ji t era bînim (215)

**peřey ‘elem şend:** goşeyê alayê hejand (252)

**perîmeqamê:** yeke di meqam û pileya perîyan da (33)

**perîendam:** kesa endamên wê weke yên perîyan e (484)

**perîruksar:** perîrû (462)

**perîzade:** zadeya perîyan (33)

**perwanan:** perwaneyan, perperokan (127)

**perwaz kerd:** perwaz kir, firrî (17)

**perwaz:** firrîn (903)

**pesend:** pesinî, ‘ecibandî (362)

**pesende:** pesinî, pesinandî, ecibandî (91)

**pesendey şahan:** şahpesend, kesê/a ku cîhê pesinda şahan be (91)

**peşêwen:** aloz e, şepirze ye (145)

**peşîman:** poşman (798)

**pest:** jêr (24)

**peşt:** pişt, piştîvan (313)

**pewse bê:** wisan bû (887)  
**pewse:** lewra (405)  
**pey şewab:** ji bo xêr û qencîyê, ya rast (30)  
**pey çêş:** ji bo çî (139)  
**pey def' i:** ji bo dûrkirina, ji bo ji navbirina (520)  
**pey dîdenî:** ji bo dîtina (399)  
**pey ekli te' am:** ji bo xwarina xwarekê (178)  
**pey kerdin:** pey kirin, kuta kirin, li dû ketin, jê derbas bûn (18)  
**pey wêş:** ji xwe ra (110)  
**pey wêt bistane:** ji xwe ra bistîne (703)  
**pey:** ji bo, le bo, bona (2)  
**pey:** li dû, ji bo (267)  
**peyapey:** li dû hevdu ra, peyderpey (114)  
**peyman:** ehd û qirar (238)  
**peywendê kerîm:** peymanekê bikîn (362)  
**peywest:** bi hev va, miçandî, girtî (46)  
**peywest:** her dem (114)  
**pêç:** ba, qurûşk (270)  
**pêçaşan ' inan:** dizgîna hespan badan (332)  
**pêm den:** bidine min (189)  
**pêş:** bi wê (85)  
**pêşan do exbar:** agahîyekê bide wan, gel wan biaxive (343)  
**pêşanî:** pêşenî, enî, ne'itik (424)  
**pêşendaz:** pêşgîr, berpêşîrk (381)  
**pêşkeş:** pêşkêş, dîyarî (244)  
**pêwar:** jêr, xwar, erd (879)  
**pider:** bav (197)  
**pinhan biker:** veşêre (575)  
**piř alet:** pir baharat, pir edvîye (381)  
**piř hoş:** 'aqilmend (35)  
**piř zat:** gelekî biwêr, pîr cesûr (90)  
**piř hoşn:** pîr bedew, zor cuwan (27)  
**piř:** gelek, pîr (27)

**piřen:** tejî ne (68)

**piřtab:** biguj, pirtaw, bihêz (608)

**piser:** kur, law (40)

**pîya ban:** peya bibin (328)

**pîyade:** peya, peyatî (797)

**pol:** arî, xwelî, xulemêş (851)

**polengîpoşan:** cinsekî hespan, reng e ji cinsê polendî be. Wateya du peyvên: mincolî û polengîpoş bi durustî ji bo me nehate peydakirinê, tenê li gor kontêkstê mirov dikare bêje ku navê du cinsê hespan in. (68)

**porsa:** pirsî (292)

**poşa serzemîn:** rûyê erdê vepoşand (258)

**poşa we baļaş:** li bejna xwe kir (577)

**poşa:** vepoşand, nixawt/niqabt (258)

**poşan:** li ber kirin (249)

**pûr:** kur (168)

**pûri şa:** kurê şahî (168)

**pûş:** pûsane, baca gîya û dexil û danan (697)

## **Q, q: ق**

**qab û hacat:** aman û pêdawîstî (465)

**qabiz:** yê ku digire, mebest jê ru'histîn (823)

**qadir:** kara, şîya, tiwana, nasnavekî Xudê ye (29)

**qanûni îlat:** qanûna 'eşîretan (703)

**qapî:** dergah, dergeh (126)

**qaqum:** ajeleke weke simoreyê ye ku ji kevilê wê kurk û serkurkan çê dikin (577)

**qaqumbêz:** weke qaqumê, qaqum pêve kirî (577)

**qar û qîn:** qehr û kîn, kîn û kerb (673)

**qar:** qehr, xeyd (644)

**qebaħat:** zişî, nebaşî, pîsatî, ruswatî (14)

**qebûl nedarûn:** ez napejirînim (407)

**qe'ri çah:** binê çalê, kûranîya zindanê (802)

**qefes:** rike (130)

**qehqeşan cem kerd:** qebeqeba xwe berev kirin, wate êdî nekirin qebeqeb

**qeļa qeļaş kerd:** ew kela be kela kirin, carê kelayek di nava xwe da lê dikirin û yek jî dirrijand, mebest jê carê hizrek dikir (493)

**qeļade:** xelêtk, gerdenbenda tajî û seyên nêçîrê (860)

**qeļaş:** sêhirbaz, efsûnkar (321)

**qeļax:** kela'x, qelereşk (161)

**qeļaxî:** weke qelereşkê, navê desmaleke reşe jinane ye jî (161)

**qeliyan:** nêrgêle, xorxork, şîşa, (384)

**qemerruxsar:** rûhîv (417)

**qemerţel'et:** rûhîv, kesa ku rûyê wê wekî hîvê xweşik be (35)

**qenawêz:** xamek, perûyekî armûşî ye (834)

**qend:** şekir, (li rojhelatê ji şekirê hûr ra şekir û ji yê hebe, tîke û kelle ra qend dibêjin.) (181)

**qerağ:** qira'x, kinar, lêvar (938)

**qerar da:** danî, ediland (97)

**qerîn:** nêzîk, heval (160)

**qesem be dadar:** sond bi Xudê (58)

**qesem yad kerd:** sond xwar (297)

**qesem:** sond (28)

**qet' i merahil:** birrîna qona'xan, mebest jê çûyîn e (285)

**qetî û 'am:** qetili'am, komkujî (960)

**qetre:** dilop (29)

**qewl:** gotin (225)

**qewli zaļi pîr:** gotinên pîra sersipî (373)

**qewm:** kom, desteyek hev xûn yan hev welat ji mirovan, (ez li ser wê hizrê me ku ev peyva heman koma Kurdî ye ku Ereban kirine qom/qewm) (153)

**qeydê nedaro:** qeydî nake, tişteke nabe (624)

**qeyran:** bu'hran, alozî û tevilhevî (784)

**qeyyom:** qeyyûm, li ser xwe, rawestayî, bi'kar, bê heval û bê hemta (3)

**qeyyomi dana:** Xudayê payedar û bikar û zana (206)

**qişşas:** qessas, xûnxwahî, kirina karê sûcdarî/ê bi wî/ê bixwe (252)

**qişşasi dûşîn:** qessasa şeva borî, toleya şeva bihorî (252)

**qiblega:** qiblegah, rûgeh (64)

**qiblegay dînim:** rûgeha dînê min, rûgeha dîtina min (64)

**qirmiz kerd:** sor kir (834)  
**qital:** şerr (421)  
**qîn:** kîn, kerb (889)  
**qonaà:** êwirgeh, qerargeh (234)  
**qonat:** qanat, bask (45)  
**qoşan:** qoşin, leşker, sipah (871)  
**qudret:** karîn, şîyan (106)  
**qudûmit:** qedemên te, pîyên te (377)  
**qumrî:** balindeyek e ji malbata kevokan (77)  
**qurtas:** kiras, kurtek, dikare bi wateya zîn û pûsad û kurtanên pêroyan be jî (874)  
**quwwet:** hêz, karîn (63)

## **R, r:** ر

**ra:** rê (186)  
**rahî ber ne rat:** bikeve rîya xwe herê (465)  
**rahî bîn:** li rê ketin, hatin şandinê (257)  
**rakeş girt ne wer:** rêya xwe dane ber xwe, li rê ketin (314)  
**ranaşan sitûr:** hesp hajotin (285)  
**raħim:** bexşînkar (2)  
**rast waçe:** rast bêje (308)  
**rastişan waten:** wana rast gotine (174)  
**raş:** rêya wî (186)  
**rawî:** riwayetker, çîrokbêj (456)  
**rawî:** şikarî, hespên nêçîrê (69)  
**rawîyan:** yên ku riwayet dikin, çîrokbêj (456)  
**ray nadîyarî:** rêka nedîyarîyê, rêka ne eşkere (213)  
**rayihe:** bêhna xweş, bayê bêhinxoş (317)  
**raz:** xeberdan, axiftin, qise, gotin, sir, raz (98)  
**razan mikerdin:** xeberdidan, diaxiftin (98)  
**razan:** xeml û rewş (23)  
**razani dujem:** gotinên tund (367)  
**razişan:** gotina wan (108)  
**razîyan we rexti rêzey mirwarî:** rextê wan bi rêzên mirwarîdan hatien xemilandinê (69)



**reb:** xudan, Xuda (207)

**red bedel kerîm:** li hevdu biguherrin (101)

**re‘aya:** pirjimarîya re‘îyet, komek ji mirovan ku di welatekî da li jêr fermandarîya hukûmetekê da dijîn, gundîyên ku li jêr destê erbabekî da bin. (153)

**reha ber:** azad be (406)

**reha dan ‘inan:** dizgîn ji dest dan û mebest jê dizgina hişî ji dest dan e. (39)

**reha:** berdayî, azad (39)

**rehakonende:** rizgarîker (750)

**rem kerd:** revî, silikî (127)

**remz:** îma û îşare, amaje (587)

**renc:** derd û êş û azar (105)

**renci werînim:** renc û zehmeta min ya berê (479)

**reḥîm:** dilovan, dilovanîkar (2)

**resmi te‘zîye:** rê û rîsma şîngêrrîyê (891)

**restaxêz:** roja helsanê, roja qîyametê (9)

**rewan kerd:** şand (149)

**rewîley:** rewîye, şêwe (423)

**rewneq:** ronakî, biriqîn (415)

**rewşîn:** rewşen, ronahî (495)

**rewze:** ba‘x (82)

**rewzey Irem:** baxçeyê Iremê (222)

**rewzey rizvan:** ba‘xê bihiştê (82)

**rext:** fişekdan, amûrên şerrî, cil û berg, nivîn (859)

**rezayi Xuda:** rizaya Xudê (230)

**rêw:** rîw, derew, xap û lêp (185)

**rêza:** rijîya (273)

**rêze:** hûrik, pirtî (202)

**rêzina:** rijand, reşand (137)

**rêziyan:** rijandin, reşandin (250)

**rêzîyan:** xemilandî, xemilandine (23)

**rimkêş:** rimhavêj, nêzehavêj (423)

**riziq:** risq, her tiştta xwarinê ku ji eredê biruske. Ev peyva Kurdî ketîye nav zimanê Erebi û risk/risq bûye rizq û ismê fa'îl jê çêkirine û bûye rezzaq, raziq, wate kesê ku risqan dide û nasnavekî Xudê ye, risk ji riskîn/ruskînê tê. (4)

**riziqdehinde:** raziq, rezzaq, kesê ku risqan dide, Xuda (4)

**riżvanî:** bihêştî (342)

**riżvan:** notirvanê ba'xê bihêştê, ev peyva ji Kurdî ra ketîye nev zimanê Kurdî, heman rezvan a Kurdî ye. (82)

**rîg:** xîz, zîx (400)

**rîşşifîd:** rîsipî, ridênsipî (305)

**ro:** roj (165)

**roh û rewanim:** ruh û rewanê min (63)

**rohi remîde:** ru'hê reviyayî, canê ji leş derketî (515)

**rohim bo fedat:** canê min bi gorîyî te be (274)

**roşinî:** ronîtî (253)

**rox:** rex, kela, du berikên kişikanê ne ku heryek li rexekî textê kişikanê da cî digirin (735)

**roz:** rûz, roj (715)

**rozigar:** rojgar, cîhan, gerdişa zemanê (28)

**rumman:** henar (435)

**ruxsar:** rû (752)

**rû kerd:** berê xwe dayê (182)

**rûd:** amîreke mûsîqayê ye (385)

**Rûm:** rom, Kurd ji rojavayê welatê xwe ra Rom dibêjin. (216)

**rûş:** rûyê wê (74)

**rûsiyay bedgo:** rûreşê bedbêj (640)

**rûz:** roj (165)

**S, s:** س

**sa perwerîde:** di jêr sîberê da perwerde bûyî, rûyê rokê nedîtî (429)

**saçağdar:** bi rişî (73)

**sakin bîn merdim:** xelk bêdeng bûn (170)

**salar:** serdar, serok (546)

**saîim:** tendurust, durust (58)

**sam:** saw, tirs, heybet (171)

**sahib ‘eql û fam:** xudan hiş û têgehîştin (268)

**sahib zubanen:** xudan ezman e (312)

**sawa:** negîhayî, virrnî, terr û teze (21)

**sawa:** sût, helsût, giheştê (317)

**saxite:** sexte, çêkirîyê/a (134)

**sazende:** sazinde, çêker (49)

**sazinan:** saz kirin, çê kirin (29)

**sebhe:** morik, mebest jê qaş e, seb’he morîyê tesbîhan (141)

**sebze:** şînkatî, sewze, pincar (278)

**sedayê:** dengek (897)

**se‘î:** çaliş, koşîş (149)

**sema:** asiman (18)

**semend:** hespê şêh (566)

**senceq:** sencaq, nîşan, ala, navçeyek ji ustanê, yekînyeke parvekirina welatî di dewra Osmanîyan da, qeza (152)

**senceqnişîn:** yên ku di navçeyan da rûdinên, lêre mebest jê birêveberên dîwanî yên şar û navçeyên welatî ye. (152)

**send:** istand (252)

**sendenim wuzû:** min destnimêj girtîye (466)

**sendin:** istandin (163)

**senewber:** kaj, dareke ji malbata selwîyan (438)

**seng û xak:** kevir û ax, ax û ber

**seng:** kevir, ber (400)

**seharî:** sê’hirbazî (715)

**seher:** sibêde (112)

**seqf:** ban, berban, arûk (70)

**seqir:** balindeyekî nêçîrê ye (567)

**ser awerd we ber:** serê xwe rakir (53)

**ser kêşan:** serî lêdan (76)

**ser we xwab berdîn:** ser di xewê da birin, mebest jê razan e (102)

**ser zuban:** ser zarkî, derew da (696)

**sera:** koşk, qesir (349)

**seranser:** hemû, ser ta ser (195)  
**serasîme bî:** serasîme bû, tirsîya (55)  
**serasîme war:** weke mest û şeydayan(387)  
**seraw:** avsark, gol, hewz (77)  
**serawêz:** serberjêr, daliqandî (76)  
**serawiş:** serawa wê, avsarka wê (77)  
**serazad mibo:** serbest dibe, dê serbest bibe (111)  
**serçeşme:** serekanî (414)  
**serçeşmey heyewan:** serekanîya ava jînê (545)  
**serd:** sar, sard (114)  
**serencam:** dawî, kutayî (211)  
**serencamiş de:** kuta bike, bigehîne dawîyê (246)  
**serheng:** serokê leşkerî, pileyeke leşkerî ye (240)  
**serî raşan girt:** serê rîya wan girt (321)  
**serim ha ne rat:** serê min va ye di rîya te da (90)  
**serkeşî:** serlêdan (891)  
**serloxt:** serqot, servekirî, bêkum (797)  
**sernigûn gîna:** sernixûn ket (853)  
**sernigûn:** sernixûn, dernexûn, deneqot, li ser serî ketî (144)  
**serniwêşt:** serniwişt, sernivîs, çarenivîs, qeder (512)  
**serraw:** mîrşîkar (391)  
**sersam:** sersemî (171)  
**serwan ser kêşan:** darên selwîyê serî kişandine/bilind bûne (76)  
**serwer:** serok, serdar (612)  
**serzemîn:** rûyê erdê, welat (258)  
**setrenc:** şetrenc, kişikanê (398)  
**sewdaş:** sewdaya wê, evîna wê (39)  
**sewday bañil:** evîna betal (207)  
**sewî:** serw, dara selwî yê (438)  
**sexten azarim:** derdê min giran e (583)  
**seyd:** nêçîr, şîkar (391)  
**seylat:** sêlat, lêmişt (878)  
**seyr:** seyran, geşt, gerriyan, gerdiş (847)

**seywan:** sîvank (437)  
**seyyar:** istêrka gerok (881)  
**sezayêt midon:** ez ê sezaya te bidim te, ez ê te bisizînim (643)  
**sêhem:** sêyem (165)  
**sida:** seda, deng (287)  
**sişam kerd weneş:** silav lê kir (291)  
**sipêdedem:** dema sipêdê (283)  
**siř:** raz, nihênî (220)  
**sireşten:** histiryayî, şêlayî, hatî mizdan û şêlandin (422)  
**sitare:** istêr, sitêr, siteyrik (92)  
**sitarey seher:** istêrka sibêdê (92)  
**sitem:** zor û zulm (11)  
**sitemkar:** zorkar, zalim (103)  
**sitûni eywani keywan kêşawe:** istûna eywana asimanî hate kişandinê, eywana keywanê bê sitûn ma, asiman jorda hate eredê. (858)  
**sitûr:** çarpê û bi taybetî hesp û hêstir (258)  
**sîm:** zîv (306)  
**sîma:** reng û rû (502)  
**sîne:** sîng (437)  
**sîya û kebûd:** reş û hêşîn (874)  
**sîya:** sîyah, reş (249)  
**sîyah şu'ibanî:** wek marên reş (424)  
**sîyah badamê:** behîvke reş (32)  
**so mida:** diteyîsî (138)  
**so:** ronahî, teyîsîn, soz û şewat (138)  
**soçaşan:** şewitandin (385)  
**soda:** sewda, evîn (173)  
**som:** sim, neynûkê ajelên simdar (275)  
**sopend asayîm:** ez wekî sipendê me (117)  
**sopend:** sipend, ispend, (ûzerik) (117)  
**sopordîm we hem:** me siparte hev, me bi hevdu ra derbas kir (475)  
**sorx:** sor (139)  
**soxen:** xeber, peyv, axiftin, gotin (219)

**Subhan:** pak û pakij, nasnavekî Xudê ye. (111)  
**sûdê pêt nîyen:** sûdek ji te ra tune ye  
**sufte:** sotî, şewitî, helsûtî (116)  
**sułtanani ğem:** sultanên derd û ‘xeman (493)  
**supa:** supah, leşker (125)  
**supahan salar:** salar û serokên leşkerî (602)  
**supahi ebyezi:** leşkerên sipî, mebest jê roj e. (251)  
**supahi Hebeş:** leşkerên ‘Hebeşî, mebest jê reşatîya şevê ye (248)  
**supay mewt ama:** leşkerê mirinê hat (904)  
**supay seyl:** leşkerê lêmişta (ronahîyê), mebest jê tav e (127)  
**sû:** semt, alî, la(419)  
**sûrax:** kun, qul (671)  
**sûrey kelam:** sûreya Qurianê (974)

**Ş, ş:** ش

**şa:** şah, padişah (5)  
**şah:** berikekî kişikanê ye (735)  
**şahan ce sewdaş:** şahan di evîna wê da (39)  
**şahen:** şah e (5)  
**şahi sermed:** şahê sermedî, şahê herehereyî (201)  
**şahîn û baz:** du teyrên nêçîrvan in (67)  
**şale:** însallah (744)  
**şam:** şîv (337)  
**şamar:** şamaran, şahê maran, mebest jê kezîyê Zînê ye (833)  
**şanan:** havîtin (668)  
**şanişîn:** eywan, balkon (72)  
**şanişîniş:** şanişîna wê (72)  
**şaxiş:** çiqê wê/wan, şax û çiqên wê/wan (76)  
**şay biwat peneş:** şahî jê ra got (239)  
**şay Mem:** Şahê Mem, Mem Şah (20)  
**şay Hebeş:** şahê Hebeşê, mebest jê şev e (252)  
**şeb:** şev (165)  
**şeban û roz:** şeveroj, şev û roj (350)

**şebgîr:** sibêdeya zû (316)  
**şebustan:** şebistan, heremsera (215)  
**Şeddad:** padişahê zalim û bi nav û bang ku idiaya Xudêtîyê dikir. (788)  
**şehd:** hingivîn (430)  
**şehr:** şar, bajar (256)  
**şehriyar:** şah (152)  
**şekerfeşan kerd:** şeker reşand, xeberên şîrîn weke şekerî gotin (84)  
**şekergul:** gulşeker, mebest jê zimanekî şîrîn e (94)  
**şekkerab:** şerbet, şerbeta şekirî (181)  
**şekkerîn zar:** zarşekker, şîrînbêj (36)  
**şekkersêb:** sêvên şîrîn (436)  
**şemaļe:** ba, nermeba (316)  
**şemaļey şebgîr:** nermebayê sibêdê (316)  
**şemm:** hesta bêhnkirinê, mecazen ji demek yan pareke biçûk ra jî tê gotinê, bêhn (399)  
**şemmame:** şemamok, xirçe, qirre (436)  
**şemşêr:** şûr, şwêr (797)  
**şend:** hejand, (252)  
**şendişan:** hejandin, li ba kirin, weşandin(45)  
**şeqqe dan ne baļ:** şîrqînî li baskên xwe xistin, bskên xwe li hev dan (51)  
**şêraşe:** pêtî, gurrî (600)  
**şerîf:** mezin, xudan şerafet (50)  
**şermesar:** şermezar, şerminde (115)  
**şerh:** şirove (164)  
**şerhi waqî'at:** şiroveya bûyeran (204)  
**şerî edeb kerd:** şertê edebê bi cî anî (375)  
**şest:** tilîya beranî (421)  
**şewq:** ronahî, şemal (228)  
**şexşê:** şexsek, mirovek (149)  
**şeyTani řecîm:** şeytanê recîm, ehrîmenê dûrkirî û raqityayî (209)  
**şêri jîyan:** şêrê tûrre (251)  
**şikest da leşker:** leşker işkand (125)  
**şikest dan:** işkandin, li bin xistin, zora kesekê/î birin (249)  
**şineft:** bihîst (84)

**şî ne waqî' ey şehî şehriyar:** çû xewna şahê şahan (932)

**şî:** çû (193)

**şikarî:** yên nêçîrê (69)

**şîlaf:** şîlane, zerdele (81)

**şîn we xwabi xoş:** ketin xeweke xweş da

**şîn:** çûn (238)

**şîngêran:** tazîyegêrran (865)

**Şîrîni Xosrew:** Şîrîna jina Xosrew Perwîzê şahê Sasanî (34)

**şîrînkêlam:** şîrînaxêv, zarşîrîn, xeberxweş (31)

**şîrînkêlamê:** şîrînaxêvek (31)

**şîwen:** şîn, tazî, behî (875)

**şîyen:** çûye (266)

**şo ne rageşan:** here ser rîya wan (798)

**şo:** herre, birro (798)

**şo:** şev (227)

**şo:** şomar, hejmar (346)

**şokriş kerd:** sipasî kir, sipasîya wî kir (301)

**şoş:** şu' ile, gurrî, pêtî, alav (20)

**şor engêzna:** şoriş ber pa kir, hêvirzeyek çê kir (248)

**şor:** şoriş (248)

**şostuşoş mikerd:** karê şuştinê dikir, cilk dişuştin (318)

**şoxi bêneOîr:** cuwana bê heval (295)

**şu' a':** tîrêj, tîrêjên tavê (140)

**şukrane goyan:** bi gotina sipasaneyê (170)

**şukrane:** sipasane, dayîna xêr û xêratê ji bo sipsadarîyê (170)

**şunasa:** nasî, nas kir (114)

**şûr û foaan:** gazî û heyecan (170)

**Ş, ş:** ص

**şun'î:** sen'et, afirandin, huner (29)

**T,t:** ت

**ta min bişorûn:** ta ku ez bişom (465)



**ta necat yaban:** ta ku rizgar bibin (637)  
**tabût:** sindirûk, sendoqa ku cenazeyan dikenê (867)  
**tak:** tek, tik û tenê (60)  
**taq:** ban û bi taybetî banê bi kewane (250)  
**taqan û der:** der û ban (250)  
**taqî mezanûn:** ez bi rastî dizanim. (360)  
**tar:** ta, tal, tayê porr (826)  
**tar:** tarî (877)  
**tarac:** talan, ye'xme (192)  
**tañan:** tayên pirçê (424)  
**tazî:** Erebi (243)  
**tazîmerkeban:** hespên Erebi (69)  
**teşeddoq:** sedeqe, qurbanî (167)  
**teb:** tab, germa (569)  
**tebah:** xerab (264)  
**tebar:** nifş, nejad (190)  
**tebdîl keran:** biguherin (730)  
**teb'î:** sirişt, xû (188)  
**teber:** tevîr, tevrezîn (852)  
**tecdîd biderûn:** nû bikim, ser ji nû dest pê bikim (755)  
**tedbîriş êden:** tedbîra wî/ê ev e (232)  
**te'am:** xwarek (178)  
**te'cîl:** lezandin (341)  
**te'îlîmiş mikerd:** fêr fikir (647)  
**te'yîn ker:** te'iyîn bike, destnîşan bike (233)  
**tegbîr:** tevbîr, peydakirina rêçareyê bi arîkarîya hiş û hedam û meşveretê (16)  
**tejar:** talar, şaneşîn (937)  
**temam bîn tebah:** hemû xerab bûn (264)  
**temam îhzarat:** amadebûyî hemû (604)  
**temam nimebo:** tamam nabe, kuta nabe, bi dawî nayê (7)  
**temam:** hemû (257)  
**temam:** tekûz (35)  
**temkîn:** sazigarî, fermanburdarî (139)

**temteraq:** bi şan û şikoh, bi deng û herra û qerebalix (252)

**ten:** leş, beden (95)

**tenawol kerdin:** xwarin (664)

**tenim:** leşê min (271)

**teniya:** tenê (60)

**tehrîr kerd:** nivîsî (204)

**tehrîr:** nivîsîn (386)

**tepli baz:** duhola taybetî suwarîyê, miqamekî duholjenîyê ku taybetî suwarîyê ye jê ra duhola hewarîyê jî dibêjin (526)

**tepli şîwen jend:** li duhola şînê da (875)

**teqşîr:** kêmasî (669)

**teřik:** terrik, ter û teze, terr û can, şil û mil (31)

**tertîb da we kam:** bi dilê xwe pêk anî, bi dilê xwe rêk û pêk kir (178)

**tertîb da:** rêk û pêk kir (178)

**tesdî' it kêşan:** te ze'hmet kişand (823)

**Tetaran:** Tataran, Tatar qewmekî Asiyayî ye, askên Tatarî yên bi misk bi nav û bang in (37)

**tewanger:** bikar, şîya, dara (496)

**tewatir:** li dû hev ra, pey der pey, hemêşe (929)

**tewazî' ş kerd:** jê ra kurniş kir, serê xwe jê ra xwar kir. (378)

**tewîlexan:** isteblxane, tewlexane (68)

**tewleha:** tewl û bendên hespan, Wateya vê peyvê bi durustî dîyar nebû, lê bi arîkarîya kontekstê mirov diakre bêje ku wateya tewl û bendên hespan dide. (871)

**text û nerde:** textê kişik û nerdanê (411)

**textey 'ac:** lewhê ji 'acê, mebest jê sîngê Zînê ye (835)

**tey kerdî rahan:** te rê pîvan (843)

**tey kerdin:** pîvan, mebest jê pîvan û çûna rê ye (277)

**tezwîr:** durûtî, dek û dolab (364)

**têg:** tî'x, şûr (97)

**têgît ce ferqî doşmen biřan bo:** şûrê te li ser serê dujminan herdem birran be (585)

**tiflan:** zarrokan (644)

**to mikerî kar:** tu kar bikî (231)

**to ne cagey wêt:** tu li cîhê xwe (218)  
**to:** tu (53)  
**tomar:** tûmar, name yan nivîsîneke dûvdirêj (7)  
**toř:** davik, torr, telle (113)  
**toşnem nîyanan:** ez ne tîhnî me (466)  
**toy sebebkarî:** tu sebebkar î, tu serê sebeba yî (758)  
**tûl:** nehal, ting, şêne, nemam (32)  
**tûli ney:** şêneya qamîşê, nîhala neyê (32)  
**tulû' i qemer:** dema ku hîv hil tê, dema ku hîv ser dide (388)  
**tuřey dêz:** porik û temorîka reş (835)

**Ṭ, Ṭ:** ط

**Ṭaha û Yasîn:** du nasnavên Pêxemberê Îslamê ye, dx. (974)  
**Ṭalib:** xwastekar, xwazer (727)  
**Ṭawûsxeram:** meştawûs (36)  
**Ṭeļa:** zêr (134)  
**Ṭeleb kerd:** xwast, gazî kir (228)  
**Ṭifli gehware:** zarika di landikê da, zarroka di dergûşê da (592)

**U, u:** نو

**umêdewarim:** hêvîdar im (13)  
**umêdim:** umêda min, hêvîya min (8)

**W, w:** و

**waçe:** bêje, bibêje (67)  
**waçin:** bêjin (183)  
**waçûn:** bêjim (544)  
**wadey şelaten:** we'idê nimêjê ye (288)  
**wadey neşaṬen:** dem dema xweşîyê ye (821)  
**wa' id:** weideder, peymander (498)  
**wala:** bilind (190)  
**walatebar:** bilindnejad (190)

**wana:** xwandin (180)  
**wanaş:** ew xwand (494)  
**wanaşan:** wan xwandin (50)  
**waḥid:** yek, nasnavekî xudê ye (2)  
**waḥidulqehhar:** tenê û qehrkar, nasnavê Xudê ye (4)  
**wapes negerdan:** paş da nezivirîne (533)  
**waqif bî:** agadar bû (590)  
**war:** xwar, jêr (50)  
**wardin:** xwarin (180)  
**wardşan:** ew xwarin (282)  
**warid bîn:** çûne jor, ketin hundur, giheştin hev (374)  
**wasîl bî:** gehîşt (562)  
**wat:** got (30)  
**waten:** gotine (174)  
**watiş:** gotê, gote wê/î (27)  
**waye:** wayî, ahî, yumin, xêr (831)  
**we bani çem:** li ser çavan (721)  
**we çem:** bi çav(an) (25 )  
**we çerxi gerdûn:** li ser felekê ra, li esmanan ra (51)  
**we demaà:** bi kêf, kêfxweş (20)  
**we endek zeman:** di demeke kin da (251)  
**we fewqi kafûr:** li ser kafûrê ra (248)  
**we hem:** bi hevdu ra (238)  
**we koy ḥulî:** bi berhevkrina xişran (819)  
**we lay xatûni zeman:** bo alîyê xatûna cîhanê, bal xatû zînê (42)  
**we lay:** ber bi alîyê (193)  
**we nîm nefes:** bi nîv canî, bi nîv nefesê (130)  
**we ḥicab:** bi ‘hicab, bi şerm û ‘heya (461)  
**we paş kerd:** li dar xist, bilind kir (255)  
**we ser berd:** bi ser bir, derbas kir, borand (226)  
**we şitab:** bi şitab, bi lez (563)  
**we surûr:** bi kêfxweşî (765)  
**we xebbî:** penî ve, dizî ve (589)

**we yek şad kero:** bi hevdu ra şad bike (110)  
**we zêrû:** bi neçarî (471)  
**we:** be, bi, vi (8)  
**weşf:** şirove û pêhelagotin, salix, pesin û ragehandina rewşa tişt yan kesekî/ê (7)  
**weşl:** pêkgehîştin (221)  
**weçe:** bêje (195)  
**wefadar:** bi wefa, xudanemek (91)  
**wefakêş:** wefadar, xudanwefa, kêş di vir da bi wateya mezheb e. (850)  
**weheşt:** biheşt, bihîşt, cinnet (422)  
**wehhab:** bexşînger, nasnavekî Xudê ye (29)  
**wela bîn:** belaw bûn, bijiqîn (547)  
**welede:** zarok (429)  
**wendişan:** jê ra xwandin, xwandin (857)  
**wenem dan eşer:** li min eser kirin (410)  
**weneş:** ji wê (138)  
**wenet bî qerîn:** bi nêzîkî te ket (160)  
**wenet:** bi te ra (160)  
**weşî:** hov, ajela ku kedî nebûye, dirinde (4)  
**weqti şam ama:** dema şivê hat (664)  
**wer ce karûzar:** berî karezarê, berî bûyera diltezîn (560)  
**werdenîş nîyen:** nayê xwarinê (402)  
**werînan:** yên berê, yên bihorî (421)  
**werne:** û eger na, we eger na, dena, eger wisan nebe (40)  
**weş amay:** tu bi xêr û xweşî hatî (377)  
**weşbo:** bêhinxoş (317)  
**weşhal:** xweşhal, şad (301)  
**wesselam:** û selam, hevbendeke Erebi ye, di dawîya axiftin û nivîsaran da têt û têt bi wateya êdî bese û tamam. (224)  
**wey baz:** derdbaz (419)  
**wey ker:** derdaferîn (419)  
**wezîr:** şalîyar, serok û berpîrsê wezaretê (223)  
**wê m:** ya min bixwe (65)  
**wêney:** wekî (21)

**wêran;** kavi, xerab (445)  
**wêş arayış da:** xwe xemiland (808)  
**wêş bikero qeşt:** qesta kuştina xwe bike, xwe bikuje (162)  
**wêş dî:** xwe dît (54)  
**wêş hem migêlo:** dê bixwe jî bizivirre (236)  
**wêş kerd qelaxî:** xwe reş û heş kir (161)  
**wêş:** yên xwe (85)  
**wêt durust biker:** tu bixwe durust bike, tu çê ke (407)  
**wêt fermûdenî:** te bixwe fermayışt kirîye, te bixwe gotîye (13)  
**wêt:** ya te xwe, tu bixwe (8)  
**wîyerdey werîn:** serpehatîyên pêşîn (538)  
**woş aman:** hûn xweş hatine, hûn bi xêr hatine (327)  
**woş/weş:** xoş (327)  
**wust ne rûy qefa:** xiste pişt xwe (577)  
**wust:** xist (117)  
**wusten:** xistin, raxistine (22)

## **X, x : Ğ**

**xaş:** baş, resen (65)  
**xaşş û ‘am:** hemû kes, nas û nenas (219)  
**xaşş:** yên taybetî, kes û kar (219)  
**xaşşey şehriyar:** nêzikên şahî, berdevk û şêvirmendên taybetî yên şahî (152)  
**Xaşşey Xatû Zîn:** milk û xaliseya Xatû Zînê (295)  
**xaşen:** baş e (101)  
**xak:** ax, mebest jê welat e. (216)  
**xak:** ax, xwelî (123)  
**xakister:** arî, xwelî, xulemêş (156)  
**xal:** şanik (437)  
**xam:** xav, negihîştî, bêtune (211)  
**xamê:** yeke xav û nûgîhayî (32)  
**xamoş bê:** bêdeng bû (348)  
**xamoş ber:** bêdeng be (224)  
**xanan:** xaneyên, malikên (734)

**xane:** mal (332)  
**xaney wêten:** mala te bixwe ye (711)  
**xaney zîn:** mala zînî (263)  
**xar:** dirik (928)  
**xari xemînim:** dirka xemgînîya min (64)  
**Xatû Zîn:** Xatûn Zîn, Yaye Zîn, Zînê Xanim(31)  
**Xatûni zulfdêz:** xanima porreş (577)  
**xaţir biker şad:** dilê xwe şad û xweş ke (239)  
**xaţir cem:** bi aramî, bi hizreke aram (19)  
**xaţir guşad:** bêhnvekirî, bi bêhneke fireh (708)  
**xaţir teş:** dilter, evîndar (136)  
**xaţir:** dil, bîr û hizir (64)  
**xaţirşad:** dilxweş, kêfxweş (756)  
**xaw xaw hêdî hêdî** (440)  
**xaw:** xew (128)  
**xawerî:** rojhelatî (125)  
**xebardariş ker:** wî pê agadar ke, pê bihesîne (560)  
**xelaşit kerdim:** min tu rizgar kirî (771)  
**xeltan bî:** gîrrêl bû (281)  
**xem werden we hem:** li ser hevdu da tewiyayî, qurûşk (437)  
**xem:** xwar, li vir da bi wateya qurûşkê hatîye (270)  
**xeraman:** meşa bi naz (440)  
**xêramayîş kerd:** serçavanî da wan (336)  
**xergoş:** kergoşk (389)  
**xerîk:** meş'xûl (396)  
**xeyle bî weşhal:** gelekî xweş'hal bû (301)  
**xeyle teixîr kerd:** gellekî gîro bû, gellekî gêzirî (562)  
**xeyle:** gelekê (301)  
**xeyr:** qencî, başî (172)  
**xêza:** rabû (253)  
**xêziya:** bilind bû, rabû (863)  
**xidmet :** xizmet (150)

**xilafîş nîyen:** derew tê da tuneve (75)

**xilel:** nedurustî, kêmasî (404)

**xîre bîn:** zendegirtî bûn (789)

**xofte:** razayî (564)

**xorak:** xwerek, xwarek, xwarin (192)

**Xorasan:** Xorastan, Xorhestan, rojhelat, navê ustaneke Îranê ye li bakûrrojhelata wî welatî(22)

**xord:** biçûk, hûr (177)

**xorden:** xwarin (187)

**xoş çerîde:** xweş çêriyayî (429)

**xoşgewart:** xweşguvar, xwarina ku xweş tete gevirandinê (81)

**xoşkelam:** xoşxeber, xoşaxêv (472)

**Xudanetirs:** ji Xudê netirs (420)

**Xudawend:** Xudê (307)

**xulaşe:** bi kurtî (263)

**xum:** xûm, kûpik, kûpikê meyê, kûpê rengan (113)

**xumar:** mest û xewar (46)

**xumxane:** cîhê xuman, dikare du wateyan bide: 1. Cîhê rengizandinê, cîhê ku kûpê rengan lê ye û tiştan tê da reng dikan. 2. Meyxane (113)

**xûnî:** xûnîn, bi xûn (123)

**xurşîd tarîk bî:** xor tarî bû, rok reş bû (258)

**xurşîd:** xor, rok (258)

**Xurûs bena kerd ‘Elîelâhî /‘ela Elâhî:** mebest jê banga Ellahu Ekberê û bi taybetî banga sibêdê ya kelokan e. (128)

**xurûs:** kelok, dîk, keleşêr (128)

**xwab:** xew , razan (53)

**xwahr:** xwa, xwûşk (401)

**xwahrê daro:** xûşkeke wî heye (370)

**xwahrîş:** xûşka xwe (369)

**xwan:** sifre (179)

**xwêş û bêgane:** xizim û bîhanî (524)

**xwêşan:** xizm û kesan (153)



**Y,y :** ع

- ya reb reḥmetê ce ser key nazîl:** xudêyo tu rehetekê li ser da nazil bikî (519)
- yageşen:** cîhê wî/ê ye (109)
- yagey meḥşer:** me'hşergeh (909)
- yagey:** cîh, mekan (71)
- yane be yane:** mal be mal (254)
- yane:** xane, mal, xanî (309)
- yanet bo wêran:** mala te xerab be (908)
- yaney derûn:** mala hundurr, mala dilî (445)
- yara:** karîn, şîyan, tab (297)
- yarani yar:** dostên dost, yarên can canî (103)
- yariş:** yara wî/ yara xwe (317)
- yawa be heşar:** giheşte 'hesarê (565)
- yawa we cayê mewa' id miqam:** gihîşte wî cîhê ku bi hevdu ra qîrar danîbûn. (501)
- yawa:** gehîşt (133)
- yawanit we ser:** ketîye serê te, gihîştîye serê te (195)
- yawer:** heval, hevkar (27)
- yawinan:** gehandin (52)
- yawo:** giheştîye (788)
- ye çe ḥalêwen:** eva çi rewş e (183)
- ye çêş miwaçî:** ew çî ye tu dibêjî? (677)
- ye kari dêwen:** eva karê dêwî ye. (145)
- ye:** ev (145)
- yek dayaniş bê:** dayeneke wê hebû (339)
- yekbare:** carekê, bi yekcarî (700)
- yekdem:** demekê, qasekê (338)
- yekê henîş:** yeke dî jî (506)
- yekêşan:** yekê ji wan (26)
- yekî henî:** ya dî (30)
- yekser:** yekcar, hemû (184)
- yeksere:** carekê da (733)
- yektay yegane:** yektayê tikî tenê, mebest jê Xuda ye (15)
- Yemenşar:** şarê Yemenê, mebest jê welatê Yemenê ye (256)

**yewmelmatenan:** di roja mirinê da ne. (784)

**yewmulmeşer:** roja me'hşerê (973)

**yex:** sehol, qeşa, bûz (904)

**yexbendan:** seholbendan (904)

**yextexane:** tewlexaneya hespan, istebl (334)

**Yûsifi şanî:** Yûsifê duyem, ji kesên pir xweşik ra dibêjin ku weke Yûsif pêxemberî xweşik bin (342)

**Z, z : ذ**

**zatiş:** zatê wî (6)

**Zatuşşefa:** pirtûkeke Erebi ye li ser kar û akarên Pêxemberê Îslamê û xelîfeyên wî hatîye nivîsînê (147)

**zenb:** guneh (14)

**zeŕê:** zerreyekê, tozqalekê (48)

**zîşewket û şan:** xudan şan û şikoh (481)

**Z, Z: ظ**

**zahir:** eşkere, dîyar, rûva, nasnavekî Xudê ye (6)

**zebî û rebî:** girtin û berdan, îdarekirina welêt (970)

**zerayif:** zirav û nazik (31)

**zulmati tûn:** tarîtiya cehennemê (605)

**Ž ž: ض**

**za'îf:** ze'îf, lawaz (176)

**žemîr:** dil û derûn (63)

**žerer:** zirar, zîyan (93)

**žerûren:** zerûrî ye, pêdivî ye (272)

**žiyafet:** mêvandarî (716)

**Z, z : ج**

**zali pîr:** pîra porsipî (341)

**zali werîn:** pîra berîn, pîra dewra berê (365)

**zam:** birîn (143)  
**zamanxeTer:** birîndarê birîn kûr, kesê ku kul û birînên wî xeternak bin (143)  
**zamiş:** birîna wî/ê (852)  
**zana:** zanî (206)  
**zanû:** ejnî, jinû, çok, kabok (157)  
**zar:** belengaz, jar (878)  
**zarî bê ne goş:** dengê ah û zarîyê dihate bihîstin (165)  
**zarîş bolend kerd:** girîn û zarîna xwe bilind kir(219)  
**zayeley zigar:** gazî û zarîya nexweş, ah û azar (840)  
**zeban:** ziman (137)  
**zebûn:** belengaz (568)  
**zêd:** zadigeh, cîhê ji dayîkbûnê, welat (361)  
**zehraîûd:** jehirdayî, bi jehrê av dayî (162)  
**zelzele:** bûvelerze, erdhej (154)  
**zemîn:** erd (135)  
**zen û esp û şîr wefa nedaran:** wefaya jin û hesp û şûran tune (470)  
**zen:** jin (44)  
**zeneqdan:** çene (433)  
**zeř:** zêrr (136)  
**zerbaft:** bi zêr vehûnayî, zêrvehûn (73)  
**zerd:** zer (176)  
**zerdûz:** zêrvehûn, bi zêr dirûyî . (136)  
**zeřîne bazin:** bazinê zêrr (487)  
**zeřiston:** istûnzêrr, bejinzêrrîn (21)  
**zeřnigar:** zêrrîn, bi zêrr neqîşandî (243)  
**zerwerek:** pelgzêrrîn, pelgên ji zêr (415)  
**zindeganî:** jîyan (753)  
**ziwêr:** zivir, aciz, dilgiran, nîgeran (226)  
**zîyan:** zerer (23)  
**zor:** hêz (217)  
**zuhre:** navê istêrkekê ye (52)  
**Zuleyxa warê:** yeke weke Zuleyxayê (33)  
**Zuleyxa:** Jina ‘Ezîzê Misrê ku dil berda Yûsif pêxemberî (33)  
**zulfan çun zencîr:** bisk wek zincîran (223)

**zuwan:** ziman, zeban, ezman (157)

**zûxaļ:** rejû, komir (116)

## **Jînenigarîya Xwandekarî**

### **Jîyan û xwandin:**

Sala 1955an li gundê Belesora jêrîn ser bi bajarê Xoyê hatîye cîhanê. Debistanên seretayî û kutayî li bajarên Xoy û Selmasê xwandîye. Li zanistgeha Peyamê Nûr li Êrmîyê ziman û edebîyata Farsî qedandîye û sala 1993 lîsansa karnasîya ziman û edebîyata Farsî ji wê zanistgehê vergirtîye. Salên 2002-2004- 2008- 2009, li zanistgeha Zûrich ê li fakûlteya Felsefê pişka Islamwissenschaft xwandîye.

Sala 2015an li zanistgeha Mardîn Artuklu bi nivîsîna têzekê li ser Leyl û Mecnûna Sewadî, lîsanas bilind vergirtîye.

### **Kar û pişeyên resmî:**

Ji salên 1975-1981, 6 salan weke mamostayê debistana seretayî li gundê Belesorê ser bi bajarê Xoyê xwandebêjî kirîye. Sala 1983-84 wek lêkolînerê li ser jîyana koçerên Kurd li Sazumna Eşayirî ya Êrmîyê da xebitîye. Salên 1984- 88 li radyoyên Kurdî yê Tehran û Êrmîyê da weke nivîskar û bêjerê du bernameyên ferhengî xebitîye. Tevî karê radyoyê sala 1984an di gel mamosta Hêmin Mukrîyanî û komeke dî ji nivîskar û helbestkarên Kurd li bajarê Êrmîyê da Intişarata Selahedîn Eyûbî û kovara Sirwe damezrandine. Ta sala 1995an weke cîgirê rêdaktor û berpirsê pişka kurmançî ya kovara Sirwe di Intişarata Selahedîn Eyûbî da xebitîye.

Ji sala 1999 ta 2009 li Siwîsrayê di sazumana penaberan da weke wergêr bi şêweyeke neberdewam xebitîye.

Çar salan ji 2013- 2016 weke mamostayê ziman û edebîyata Kurdî li zanistgeha Mardîn Artuklu da dersên zimanê Kurdî ji bo xwandekarên lîsans û lîsansa bilind daye.

### **Berhemên wî yê ku hatine weşandinê:**

1. Tiranskirîpsîyona Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Êrmîye Weşanên Selahedîn Eyûbî sala 1987
2. Tiranskirîpsîyona Nûbara Biçûkan ya Ehmedê Xanî, Weşanên Selahedîn Eyûbî sala 1987
3. Rênivîsa Kurdî bi her du şêweyan, Weşanên Selahedîn Eyûbî sala 1988
4. Peyam, komelekurteçîrok, weşanên Bûyerên Rojhelat, „Orient Realites“ Isviçre 1997
5. Ax Şilêrok, helbest, weşanên Apec. Stockholm, Sweden, 1997
6. Alole, komelekurteçîrok, weşanên Doz, Istenbol, 2002
7. Hezarav, ferhengek tematîk li ser Avê, weşanên Doz, Istenbol, 2004
8. Bilîcan, roman, weşanên Doz, Istenbol, 2005

9. Mem û Zîna Xanî (1650/1-1707) bi şirove û rave, weşanên Nûbihar, istenbol 2007
10. Wergerra çarîneyên Omerê Xeyyam, weşanên Nûbihar, Istenbol, 20015
11. Çîrokehelbest, ji folklorê Kurdî, weşanên Wardoz, Amed, 2019
12. Biratîya Quling û Ruvî, berhevokek ji folklorê Kurdî, weşanên Sîtav, Wan 2019

Ji bilî van pirtûkana berhemên wî weke gotar, helbest û kurteçîrokan di gelek kovarên Kurdî yên cur be cur da hatine weşandinê. Di gelek bajarên Kurdistanê û yên Awropayê da semînar li ser ziman û edebîyata Kurdî dane û di gelek konferansan da beşdar bûye.

**Zimanên ku dizane:**

Farsî li pileya karnasîyê da  
 Kurmancî li pileyeke bilind da  
 Soranî li pileyeke bilind da  
 Azerî li pileyeke bilind da  
 Turkî asayî  
 Hewramî asayî  
 Almanî asayî  
 Erebi xwandin û têgehîştin  
 Inglîsî xwandin û têgehîştin